*Abdusamet Yîgît*

# Dîroka felsefeyê li Kurdistanê

soran felsefe

Abdusamet Yîgît
Dîroka Felsefeyê li Kurdistanê

Çapa 1.
Berlin / 1 Gulan - 2016
Berg Design: Gazîn Han

Çap û Girêdan:
Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlin

## Dîroka felsefeyê li Kurdistanê

Nivîsandina dîroka zanebûna civata Kurd a ku li Kurdistanê li ber Diclê û Firatê bi felsefeyê û pêvajoyên re ku pêşketina, di serî de zanebûnek mazin ya bi dîrokê û mejûya civatê re ji mirov dixwezê. Bêgûman, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi dîrok û mejûya dîroka felsefeyê li ber Diclê û Firatê, pirr kevn diçê. Gelek zanînên ku em dizanin, bi kifşkirinên bi demê re ku bi aqilê mirov re dibin, didina gûharandin. Her wisa, dîroka aqil û zanebûnê a li ber Diclê û Firatê û ankû di navbera Diclê û Firatê de ku pêşketiye, ji ya ku em dizanin pirr zêde kevntira. Îro, tenê bi zanebûna me ya ku em heya, em dizanin ku têgîna baweriyê, li ber firatê, weke ku em li xirabreşkê kifş dikin, diçêt berî zayina îsa heta duwanzdeh(12) hezar salan. Her wisa, di vê çerçoveyê de çendî ku mirov dîrokê dikolê û lêkolînê di wê de dikê, mirov kûrtir û zêdetir diçêt. Her wisa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku dîroka aqil, wê di serî de tevî hemû kêmesiyên me ên b aqilê me re wê tiştekî ji me re bide nîşandin. Ew jî, ew pêvajoyên jiyana şariştanî û biaqil ku êdî hin bi hin bi hin pêş dikevin û biaqil zêdetir pêş dikevin. Hemû pêşveçûn, li ser wê temenê dibin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hertimî pirsgirêka rast fahmkirinê, xwe bi aqilê felsefeyê ê li berDiclê û Firatê re xwe daya li der. Em dema ku behsa rast fahm kirinê dikin, em behsa navaroka wê aqilê nakin. Em behsa nêzîkatiya ji dervî herêmê a li herêmê dikkin. Di vê çerçoveyê de wê pirsgirêk her hebê.

Aqilê mirov, wê bi demê re di xwe de şoreşan bide çêkirin. Weke ku di dema bi çanda enlîl re, bi têgihiştina Urugakîna, têgîn û rastiya Kawa re, bi felsefeya Mîtra û Zerdeşt re û hwd, wê xwe bide nîşandin. Destpêk, hertimî pêşî xwediyê wê destpêka di aqil de ye. Her wisa mirov vê yekê bi teybetî fahm dike. *Çanda Enlîl,* wê di demên sûmeriyan de bi hezaran serdest bê. Piştre çanda Harbê û ankû weke ku Hûriyan bi nav dikir «hebedê» wê xwe bi wê re bide nîşandin. Hebedê, di bin navê ´kîbelê´ de herîkiya li anatolia jî. Lê li vir, mirov tiştekî kifş dike ku hemû jî li ser pêvajoyên aqil û zanebûnê re wê dem bi dem pêşbikevin û xwe bidina domandin. Demên berê ên jiyana herêmê, ji ber ku bi jiyana xelkan a bi hevdû re dihat pêşketin, bi wê e di çerçoveya ku wê wateya bi hevdû re jiyankirinê bi xwe re werêne ser ziman, gotina Mesopotamiya hatiya bi wate kirin. Gotina ´Mesopotamiya´ di Kurdî de her wisa ji gotina ´mezra-bota´ ye. Her wisa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku heta roja me li Kurdistanê hebûna herêma botanê û weke navenda wê herêmê ber diclê û hwd, di vê çerçoveyê de di aslê xwe de temenê vê gotina Mesopotamiya, rastiya wê û bi demê re heta roja me hatina hebûna wê dihêne ser ziman.

Pêvajoyên aqil, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê di vê çerçoveyê de di nava wê jiyana wan xelkan de xwe bide domandin. Li Kurdistanê, li ser xate gotina Mesopotamiya û têgîna wê re ku mirov dihizirê, mirov dibînê ku xelkên weke Kurd û babil bi demê re çendî ku bi navên cuda hatibibina ser ziman jî, wê bidina diyarkirin. Her wisa, di demên qasîtiyan de bi hevdû re bûna qasîtî û babiliyan, wê bi demê re heta dema Mediya û desthilatdariya Mediya a li herêmê wê hebûna xwe bide domandin. Nav, tenê weke navê desthilatdariyan mana.

Rastiya pêşketina aqilê civatê, di vê çerçoveyê de piştî ku di nava jiyana şariştanî de pêş dikevê û pê de, pirsgirêka sereka wê xwe di nava rastiya civatê û desthilatdariyê de bide diyarkirin. Bi demê re her wisa mirov dikarê behsa rastiya wan bike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku civat, weke rastiyeka dîrokî heya. Civata dîrokî ku em behsa wê dikin, ew civata ku bi dîrokê re heta roja me hebûna xwe haniya û xwediyê mejûya xwe ya bi wê re ye. Di vê çerçoveyê de rastiya civatî û pêvajoyên zanebûnê, di vê çerçoveyê de wê hevdû bidina pêşxistin. Aqil, wê li gorî pêîwîstîniyên jiyanê xwe bi demê re bide pêşxistin. Her wisa, di vê çerçoveyê de wê xwe pêşbixe. Aqil û civat, wê hevdû bi têgîna şariştanî biafirênin. Her wisa, divê ku em dûbare werênina ser ziman ku weke aqilê dema şariştaniyê felsefe, wê bi jiyana civatê re pêşketinên civatî ên weke çandê û hwd jî bide pêşxistin. Li vir, aqil, weke ardnîgariya jiyana şariştaniyê ye. Li ser wê re xwe dide pêşxistin. Her wisa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî, bi wê re werêne ser ziman ku pêvajoyên aqil, bi jiyana civatê re di çerçoveya têgîna gotina şariştaniyê de têgînek baş didina me. Em li vir, divê ku vê rastiyê jî baş fahm bikin û werênina ser ziman ku pêvajoyên aqil, her wisa, wê weke pêvajoyna, ku dem bi dem li gorî têgîna ”rast” a ku hatî kifşkirin ku jiyan were rastkirin û ankû adilandin. Her wisa, di vê çerçoveyê de aqil bûya xwediyê wateyekê jî. Dema ku Urugakîna li dijî keyê Lageşê serî rakir û raperîn kir, wê balê bikişênê li ser zilma wî ya ku wî li xelkê di bin desthilatdariya xwe dikir. Divê çerçoveyê de Urugakîna, wê dervî jiyana ku wan ji xelkê re rast dibînê, wê rastiyek din ku hemû mirovên ji nava xelkê ku ew xwe di wê de bibînin, wê werêne ser ziman. Bi vê re jî, wê hemûyan li piştxwe bibînê. Pişt Urugakîna, di xate wî de ku tê Gueda-ensî, wê bi aqilekî pêşketî û zagonên ku ew dinivîsênê weke ”rastteqîn” wê derkeve ber xelkê. Hizrên Gueda-ensî, wê weke hizirna ku ´xwenûkirinê ên di dewama hizrên Urugakîna de bin. Di vê çerçoveyê de Gueda-ensî, di parastgehên ku ji Nîngîrsû re çê dike de wê, behsa rastiya jiyanê a aqilê mirov bike. Di vê çerçoveyê de wê aqilekî li gorî demê bide pêşxistin. Pêvajoya Urugakîna û piştre ya Gueda-ensî, dişibêhê ya Mîtra û piştre hatina Zerdeşt. Raperîna Urugakîna, wê di rengekî wê raperîna kawayê hesinkar ku heta roja me di nava Kurdan de li herêmê bi jiyana xelkên herêmê re dihê ser ziman de bê.

Mîtra bi hizrên xwe serdemek zêr bi Mîtanniyan re dide jîn kirin. Piştî wî re Zerdeşt, bi hizrên xwe yên ´Avêsta´ re wê temenê pêşketina Mediya pêşbixe. Mediya, wê serdema zêr a hizrên Avêsta a di demê de bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov Avêsta weke binetera nivîskî û Mediya jî bi pêşketina wê ya di jiyanê de weke kirinî û ankû ´piretîka´ wê ya ku pêşketî werêne ser ziman. *Avêsta-Mediya,* di vê çerçoveyê de wê di xatekê de di dewama wê pêşveçûn û pêşketinên berî xwe de weke pêvajoyek nû ya pêşketina jiyana şariştanî a demê bê. Piştre jî, li ser temenê Avêsta-Mediya, pêşketina civatên Avêstayî, wê pêvajoya wê bi xwe re bênê. Ev rastiya pêşketina xate pêşketina şariştaniyê bê. Her wisa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku civatên Avêstayî, wê piştre temenê pêşveçûn û pêşketinên demên piştre bi xwe re biafirênê.

Piştre jî, ev pêvajo, wê di xate Yazdaniyê de wê bi ezdayî û pêşveçûnên ku bi baweriyên din re ku ji wê hatina bişavtinkirin re wê xwe bide domandin. Pêvajoyêmn jiyana herêmê, lê hertimî wê rastî mudahaleyên desthilatdariyên herêmê hatina. Pêvajoyên xwe nûkirinê ên şariştanî, bi mudahaleyên rêveberiyên herêmê were ji holê rakirin. Hertimî mudahale li jiyana xelkên herêmê hatiya kirin. Ev mudahaleyên ku hatina kirin, bi xwe re jiyana xelkên herêmê, ji wê xate wê ya pêşketinê ku heta wê demê hatiya kiriya ku derxê. Di vê çerçoveyê de bi mudahaleyên ku hatina kirin e li ser desthilatdariyan re tengezeriyên şariştanî û jiyanî li herêmê rûdana. Di vê çerçoveyê de herêm bûya weke girêka pirsgirêkan.

Pêvajoyên demên bûhûrî ên jiyana xelkên herêmê ku baş were fahmkirin, wê bê rûhniyek jî ji pêşketinên demên wê yên piştre jî. Her wisa di vê çerçoveyê de fahmkirina rastî û rastteqîniya jiyana herêmê di xate wê de û rastrast, wê temenê pêşketina wê û domandina wê jî bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi awayekî vekirî li ser demên wê yên bûhûrî serî biwastênê. ..

Di demên berî zayîna Îsa de dîroka zanebûnê û pêşketina wê li Kurdistanê, giringa ku mirov wê werêne ser ziman. Rast nivîsandin û hanîna li ser ziman dîoka herêmê, wê temenê pêşketinek rast a bi pêşaroja herêmê re jî bê. Pêşaroja herêmê di dîroka wê de vêşarî ye. Her çendî ku mirov dîrok û mejûya wê fahm dikin, em pêşaroja wê jî bi awayekî rast dikin ku biafirênin. Ya ku wê pêşaroja herêmê biafirên, wê xelkên herêmê bin. Bo vê yekê, di serî de dîroka van xelkên herêmê bi awayekî rast hanîna li ser ziman jî, giring dibê. Xelkên herêmê dîrokî, di afirandina wê dîrokê de xwedî weyn in. Di vê çerçoveyê de dîroka wan ya civatî û zanebûnê wê, wê asoya wê ya pêşarojê jî ye. Ku mirov dîroka hizir a li Kurdistanê hilde li dest, divê ku mirov dîroka wê ya ku heyî, bi wê re pirr kevn herê. Herêmêmn ber Diclê û Firatê, weke herêmên herî kevn ên ku li wan şariştanî pêş dikeve na. Di vê çerçoveyê de ew jiyana şariştanî ku pêş dikeve, mirov wê dibînê û dihêne ser ziman. Her wisa dema ku behsa nivîsandin û kifşkirina tîpan dihê kirin jî, şariştaniya dema sûmeriyan, weke destpêka wê dihê hanîn ser ziman. Di aslê xwe de hin bi hin bi lêkolîn û

kolanên binardê dihê dîtin ku dîroka şariştaniyê a ku dihê jiyîn, li ber Diclê û Firatê pirr kevn diçê.

Dema ku mirov lki nava jiyana civata Kurd dinerê jî, mirov ji gelek aliyan ve nîşanekên wê dibînin. Gelek bermehî û jêderkên jiyanî ku bi hevdû re û di zikhevdû de dijîn û Îro jî, em em nîşaneke wan kifş dikin, di çerçoveya jiyana şariştanî de xwediyê dîrokna pirr kevn in. Minaqa herî li berçav, mirov dikarê jiyana koçeriyê weke minaq bide nîşandin. Jiyana koçeriyê bi rengê jiyana wê re weke jiyaneka bi axê ve girêdayî û bi xwezayî re jiyandin e. Her wisa, di dewama wê de divê ku mirov werêne ser ziman ku jiyana koçeriyê, weke bineterek jiyana demên berê a Kurdistanê ku li ber Diclê û Firatê hatî jiyîn e.

Het roja me, hinek şîroveyê tang û kin ku li ser koçeriyê hatina kirin, di wan de koçerî, weke «goçberî» û ankû «pênaberiyek» ji axa xwe hatiya hanîn li ser ziman. Lê ev rengên şîrove û teoriyên ku di çerçoveya têgîn û têgiha ´goçberî´ û ankû ´pênabariyê´ de ku hatîna pêşxistin, rastiya jiyana jiyana koçeriyê û temenê wê û rastiya wê nikarin werênina ser ziman. Ti şîrove û teoriyên ku bi rengê ´goçberî´ û ankû ´pênabariyê´ nikarin wê werênina ser ziman. Teorî û şîroveyên li ser goçberî û ankû pênabariyê ku ava na, rastiyê, di çerçoveya jiyana mirov a ku mirov cih û warê xwe li şûn xwe dihê û diçê deverek din û wê deverê ji xwe re dike weke war de ku dihêne ser ziman, rastiya koçeriyê nikarin werênina ser ziman. Berî ku koçerî, ne rastiya jiyanê ku war û cihê xwe di terikênê ye. Her wisa, dema ku Kurdên herêma serhadê ku sawalgeriyê ve mijul dibûn, wê li dora diclê li herêmê ku bi şînahiya xwe re dewlemend a, wê kifş bikin û wê bi sawal û konên xwe re werina wir. Piştî ku demsal bûhûrt, ew jî divegeriyana cih û warê xwe yê ku ji wê hatina. Cih û warê wan ê ku ew jê hatina, li wir malên wan hena. Divegeriyana malên xwe. Ev rewşa koçeriyê, ku weke pergalek xwezayî a jiyanê bû, wê li gorî demsalan bihata pêşxistin. Piştî ku demsal bûhûrt û pê de, ew dem koçeriyê jî dawî li wê were.

Di vê çerçoveyê de ev rengê jiyana koçeriyê, em nîşanakên wê ta di demên şariştaniyê ên sûmeriyan de jî wê kifş dikin. Her wisa, gotinên weke ´jiyana deştê´ û ´jiyana zozana´ û ankû ´çûyîna zozana ku weke gotinên bingîhîn in û ên jiyana koçeriyê na, hem di wan demên bûhûrî ên şariştaniyê de dihatina bikarhanîn û hem jî di roja me de jî, di dev de dihên bikarhanîn. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê rastiyê jî werêne ser ziman ku Jiyana koçeriyê, di vê çerçoveyê de weke jiyanek civatî a Kurdistanî mirov dikarê werêne ser ziman. Mirov dikarê weke felsefeyek jiyanê jî werêne ser ziman. Bêgûman, bi aqilê felsefeyê ê dema şariştaniyê, mirov dikarê ji gelek aliyan ve wê rewşa jiyana koçeriyê wê werêne ser ziman. Jiyana koçeriyê, wê weke rastiyek jiyanê bê ku di çerçoveya jiyana mirovê ku bicihbûyî û xwedî cih û war a de mirov wê, li aliyekî wê jiyana sawalgeriyê bibînê, li aliyekî mirov wê nêçîrvwaniyê bibînê û li aliyekî jî mirov wê çandinî û cohtkirinê bi wê re bibînê. Di vê çerçoveyê de li gorî rewşên jiyanê, mirov dikarê behsa wê bike û werêne ser ziman.

Rastiya jiyana koçeriyê, weke rastiyeka jiyana civatî ye. Mirov ne dikarê wê bi rengê jiyana komên ku bi goçberî herikîna û hatina herêmê re werêne ser ziman û ne jî mirov dikarê bi rengê jiyana mirovên goçber werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de weke pergalek jiyana civatî a şariştanî, lê ku li şûna ku li gorî bcihbûn û pêşketîna bajariya jiyana bajarên şariştaniyê ku pêşbike, di nava xwezayê de ku bi wê fahmkirina xwezayê re ku karibê di nava wê de hem ji wê sûd bigrê û hem jî bi wê re bijî ye. Di vê çerçoveyê de rengekî jiyanê ê vê jiyanê heya. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov hewl bide ku rastiya felsefeya vê jiyana ´koçeriyê´ fahm bike, mirov dibînê ku di nava rengê hizirkirin û jiyankirina Kurdistanê, weke xoslet û teybetiyek giring wê, mirov koçeriyê dikarê werêne ser ziman. Dema ku mirov hinekî din, li ser koçeriyê dike ku kûr û dûr herê, mirov her wisa dikarê heta dema neolîtîkê û berî wê jî, li ser rengê pêşketinên jiyana koçeriyê ên bi demê re herê û bigihijiyê de.

Li vir, divê ku mirov vê rastiyê jî baş fahm bike ku têgîna felsefî a Kurdistanê, her wisa, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov di çerçoveya jiyana mesepotamiya de wê weke jiyanek pirr alî û pêşketî wê kifş dike.

Jiyana koçeriyê, wê weke pergelek hizirkî a di nava jiyana şariştaniyê de xwe bide diyarkirin, Her wisa mirov çawa divê ku bijî, di nava wê jiyanê de bi xwezayê re li beriva wê hatiya lêgerîn. Bersivên wê bi rengên jiyanê û jiyana ku hatî jiyankirin a bi xwezayê re jî hatiya dayîn. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov behsa jiyana şariştaniyê a li Kurdistanê bike, divê ku mirov werêne ser ziman ku ji gelek aliyan ve di nava rengê hizirkirina bi wê re de xwe dihêne ser ziman. Rengê jiyanê, wê rengekê feslefeyê jî bi xwe re bide diyarkirin. Her wisa, mirov wê çawa bihizirê û kîjan nûqtê esas bigrê û ji wê bidest hizirkirinê bike, her wisa di vê çerçoveyê de mirov wê di vê çerçoveyê de wê kifş bike.

Têgîna hebûnê û rengê jiyana hebûnê, di vê çerçoveyê de wê bi fahmkirina wê jiyana re xwe bide diyarkirin. Jiyan û hizirkirna wê, her wisa wê bi hevdû re giringî û hebûna aqil û bi wê re ya zanebûnê jî bide hanîn li ser ziman. Li vir, dema ku mirov behsa gotina ´zanebûnê´ bike, mirov wê di vê çerçoveyê de di fahmkirina wê de tê digihijê ku ev gotin behsa fahmkirineka ku mirov ji jiyanê girtî dike. Zanebûn, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku pêvajoyên wê ên bi demê re bi jiyana civatî re ku pêş dikevin, wê temenê pêşketina bi demê re biafirênin. Her wisa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku rastiya aqilê zanebûnê, wê di vê çerçoveyê de bi fahmkirina ji jiyanê re wê xwe bide hanîna li ser ziman.

Li vir, divê ku di dewama wê de behsa jiyana bikin. Her wisa, mirov weke zindiyekî xwediyê wê jiyana ku ew wê dijî ye. Her wisa, mirov çi dijî, wê bi demê re bike û bixwezê ku wê fahm bike. Wê bikeve, nava hewldana fahm kirina wê de. Her wisa, tekoşîna fahm kirinê a di jiyanê de wê di vê çerçoveyê de xwe bi aqil û pêşketina re wê re bide diyarkirin. Li vir, di dewama wê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Aqilê mirov ê civatî, her wisa, weke aqilê jiyanê wê bi demê re xwe bi pêşketinên jiyanê re bide hanîn li ser

ziman. Mirov, di fahmkirinê de çendî ku serdikeve û gavan bipêş de diavêje, her wisa êdî xwe serkevtî û bi ´hêz´ hîs dike. Di vê çerçoveyê de wê weke ancama wê pêşketina bi aqil re wê têgîna û hêsta ´hêzbûnê´ xwe bi mirov re bide diyarkirin.

Li vir, ez divê ku vê yekê bi teybetî binxat bikin ku rengê jiyanêe civatî, dema ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de mirov wê êdî bi gelek awa û rengan wê karibê wê werêne ser ziman. WÊ karibê pêşî, wê ji gelek aliyan ve bibînê. Dîtina bi aqil, wê pêş bikeve. Ev jî, weke ku di Kurdî de dihê bi navkirin jî wê ´hiş´ bê. Hiş, wê têgîna aqil û zanebûnê bê. Bi demê re wê ew pêş bikeve. Bi hişbûn, weke di farqê de bûn, di bîrê de bûn û her wisa bi dîtina bi mejî re xwe dihêne ser ziman. Li vir, dema ku mirov behsa dîroka aqil bike, her wisa divê ku mirov li ser gotina dîtina bi mejî re pirr zêde bike ku wê fahm bike. Ev gotin, wê ji gelek aliyan ve fahmker bê. Wê temenê fahmkirina me bê. Temenê gotina dîtina bi mejî re jî li ser têgîn û hebûna gotina xêvê ye. Di vê çerçoveyê de piştî ku xêv afirî û di wê de dîtin ku weke zanînê civiya û pê de, wê êdî êdî wê ew bi hiş bibê. Hiş, wê her dîtina ku me berê dîtiya, wê bike bîr. Bîr, weke navê wê zanîna di xêvê de mirov dikarê werêne ser ziman. Lê bi wê re jî mirov dikarê weke rastiya fahmkirina bihiş jî werêne ser ziman. Bîr, di vê çerçoveyê de dema ku mirov wê bi wateya gotina hiş werêne ser ziman, wê rast bê. Lê li vir, ev wate, dema ku xêvê dike hîm û temen ji xwe re, êdî ji aliyekî ve bi zanîna xêvê re şenberiyekê bi xwe re dide çêkirin. Weke ku wateyeka din ya gotina bîrê´ ´ devere kûr a bi navê bîrê´ jî ye. Di vê çerçoveyê de di nava Kurdan de gelek deverên ku di ardê de dihatina kolandin bo derxistina avê ji binê ardê ji wan re jî bîr dihat gotin. Di vê çerçoveyê de bîr, ji vê têgîn û wateya wê ku mirov gav biavêjê, mirov wê bi têgîna kûrbûnekê jî re wê werêne ser ziman. Têgîna bîrê, weke rewş û rastiya aqilê ku hatî bizanîn kirin a jî. Divê çerçoveyê de jî, mirov dikarê rastiya gotina ´bîrê´ werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de gotina ´bîrê´ dibê navê zanebûnek zelal jî, di vê çerçoveyê de ew zanebûna zelal ku mirov li wê dihizirê her wisa bi wê re wê êdî li ser wê re hişê mirov zêdetirî pêş bikeve. Bi gotineke din, wê ew bîr, temenê pêşketina hiş bê. Hiş û bîr, di vê çerçoveyê de wê êdî bi rastiya pêşketina ji aqil a aqil re wê xwe bi demê re bi pêşketina aqil re bide hanîn li ser ziman.

Li Kurdistanê, pêvajoyên pêşketina zanebûnê, wê dîroka wan pir kevn herê. Her wisa, bi dîroka şariştaniyê re wê pirr kevn herê. Me hinekî li jor, behsa jiyana koçeriyê ku li Kurdistanê bi pergalê heya kir. Ev jiyana koçeriyê, her wisa di pêvajoyên jiyana şariştaniyê de jî hebûna xwe dide domandin. Lê di aslê xwe de jiyana koçeriyê, di çerçove û rengê pergelek jiyanî a xwezayî deku pêşketiye, xwediyê teybetiyên jiyanî ên berî jiyana şariştaniyê ku di dema şariştaniyê de dijîn e. Her wisa, di vê çerçoveyê de weke xosletekî hîmî û bingihînî, divê ku mirov di nava jiyana Kurdistanê de bi dîroka wê ya hizir re rewşa jiyana koçeriyê ku li wê heya, werêne ser ziman.

Bi giştî, di rewşa jiyana koçeriyê de teybetiyên jiyanadema neolîtîkê ku di dema jiyana şariştaniyê de hatî bihişkirin û şîrovekirin, mirov bi wê rengê kifş dike. Di vê çerçoveyê de li ser wê rengê jiyanê de bi jiyana şariştanî re wê çawa bi xwezayê re bijîn û ankû werê jiyandin, her wisa mirov bi wê re kifş dike. Ev rengên pêşketina jiyanî ku weke ku bi pêşketina jiyana koçeriyê re xwe bi sawalgeriyê, nêçîrvaniyê û hwd re xwe dide li berçav, wê her wisa li ser wê jiyana şariştanî a ku pêş dikeve re şîroveyên wê werina pêşxistin. Ev jî, wê bi demê re xwe bide domandin. Koçerî, çendî ku di demên jiyana şariştaniyê de xwe di nava jiyana şariştaniyê de dide domandin jî, lê di aslê xwe de pirsgirêka wê hertimî bi jiyana şariştaniyê rewê hebe. Wê nebê, rengekî ji wê. Rewşên jiyana koçeriyê ku di nava wê jiyana xwezayê de dijîn, wê bi hêz û têgîna ku ji wê nava xwezayê dihê girtin, wê li hemberî ´têgîna bişavtinê´ a di nava jiyana şariştaniyê de ku heya wê xwe bide jiyankirin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jiyana koçeriyê li berxwe bide. Di vê çerçoveyê de gotina ku bo Kurdan dihatî bikarhanîn a ”ew çiyayî na”, di aslê xwe de wê vê rastiyê ji xwe re bike hîm û bingeh. Her wisa, Koçerî, wê lingekî wê yê di nava jiyana şariştaniyê de ku dihê jiyîn, wê bi wê re pêş bikeve. Lingê jiyana koçeriyê ê ”jiyana deştê”, her wisa di vê çerçoveyê de mirov dikarê di nava jiyana şariştanî de wê şîrove bike û werêne ser ziman. `Jiyana deştê´, her wisa divê ku mirov werêne ser ziman ku, di nava wê de mirovê ku li jiyanê bicihbûyî, xwedî mal û semyan û her wisa li gorî pêşketinên jiyana şariştaniyê dijî, bi xwe re bi wate dike û dihêne ser ziman. Lê lingê din ê duyemin ê jiyana koçeriyê ku mirov bi gotina ”jiyana zozana” û ankû ”zozana” re ku dihêne ser ziman, bi tememî, weke lingê jiyanê ê bi xwezayê û li gorî rêzikên xwezayî bi rêgezî û fahma xwezayê ku dijî jî, mirov dikarê werêne ser ziman. Mirov di nava jiyana xwezayê de di çerçoveya gotina ”jiyana zozana” de wê hemû teybetiyên ku bi wan dikarê bijî, wê ji xwezayê fahm bike. Nêçîrkirin û ankû girtina sawalan û kedîkirna wan, wê du xosletên wê lingê jiyana koçeriyê ê bi navê ´jiyana zozana´ bin. Di nava Kurdan de gotina ´çûyîna zozana´, wê pirr bi nav deng bê. Her wisa, di vê çerçoveyê de li Kurdistanê, li dora Nisêbînê, Hezexê, cizira bota, silopî û hwd, herêmên li dora çemê diclê ên avê, weke herêmên ku li wan ´çûyîna li zozana´ ku dibû bû.

Herêmên ku li wan diçûna ´zozana´ herêmên ber çemê diclê ên avî bûn. Lê herêmên ku ji wan diçûna zozana jî, herêmên Kurdistanê ên weke Serhadê, rojhilatê Kurdistanê û Xorasanê û hwd bûn. Bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê dûbara werêne ser ziman ku wateya çûyîna zozana, ewbû ku dema ku mirovên ku xwedî keriyên sawalan bûn, bo ku ji wan sawalên xwe baş şîr bigrin, herêmên şîn dibijartin û diçûna wan. Ji vê rewşê re çûyîna zozana dhat gotin. Mirovên ku diçûna zozana jî, ne mirovna ku bêmal û bêcih û war bûn. Mirovna ku xwedî mal, cih û war bûn. Li gorî demsala salê, wê çûban zozana. Her wisa, wê di demên salê ên ku pirr zêde şînahî heya û geş a, wê kifşkiriban û bi sawalên xwe re çûban li wan. Piştî ku demsal bi dawî bû û şînahî zûwabû

û hişk bû, wê êdî vegeriyaban, li malên xwe. Lê dema ku divegeriyan jî, hinekî din zêdetirî dewlemend divegeriyan. Di wê dema ku li herêma ku lê pirr zêde şînahî hebû ku diman de wê, pirr zêde şîr bidest bixistan. Wê ji wî şîrî, gelek mast û panîr çêkiriban. Bi wê re jî, wê ji sawalan pirr hîrî bidest xistiban. Ji wê hîriyê jî, wê cil û berg çêkiriban, pêwestîniyên malê çêkiriban.

Di dema jiyana şariştaniyê de di vê çerçoveyê de wê ahengek di nava jiyana li deştê û jiyana li zozana de wê hatiba çêkirn. Demsalekê, wê li deştê ban. Demsalekê jî, wê li zozana ban. Di vê çerçoveyê de wê bi hevdû re di ahengekê de ew biheta jiyîn. Ew gerîna mirovan li herêman, wê bi nasîn û dîtina wan re zanebûnek bi wan re çêkiriba.Bi wê re jî, bi wê serboriya wan re wê biheta ser ziman. Piştî ku nivîsandin pêşket û pê de, ew serborî û zanebûna wan bihevdû re biheta ser ziman. Jiyana şariştaniyê jî, di vê çerçoveyê jî, bi wê nivîsandina ku bû, wê êdî hatiba pêşxitin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku jiyana şariştaniyê, di vê çerçoveyê de pêşketineke mazin wê di vê çerçoveyê de bi jiyana xwezayê re di temenê wê de hebê.

Di aslê xwe de weke ku mirov bi Kurdên berê re dibînê, wê hertimî hewl bidin ku di nava jiyana deştê û jiyana zozana re ahengekê çê bikin. Yanî, bi gotineke din, ne wê bihêlin ku aliyê deştê li ser yê zozana re bê û ne jî aliyê zozana li ser yê deştê re bê. Ev rewş, wê xwe bi jiyana koçeran ku di nava jiyana şariştaniyê de dikin ku bijîn jî, wê xwe bide nîşandin. Piştî ku jiyana şatiştaniyê pêşket û pê de, wê nikaribin xwe ji wê pêşketina şariştaniyê dûr bikin. Her wisa, bi wê re jî, wê çawa ahengekê di nava jiyana xwe ya bi xwezayê re çê bikin, wê bikevina nava lêgerîna wê de. Herdû lingên jiyana koçeriyê ê lingê ´jiyana deştê´ û ´lingê jiyana zozana´, wê di vê çerçoveyê de lingên jiyana koçeriyê ên di nava şariştaniyê û xwezayê de bê.

Li vir, di vê ku mirov vê aliyê jê baş werêne ser ziman ku Koçerî, di vê çerçoveyê de weke pergaleka jiyanî a ku li tihêleka wê xweza heya û li tihêla wê ya dina duyemin jî, her wisa jiyana şariştanî a ku pêş dikeve heya. Di vê çerçoveyê de lingê jiyana koçeriyê a ´jiyana deştê´, wê aliyê wê yê li tihêla şariştaniyê werêne ser ziman. Lingê wê yê duyemin ê ´jiyana zozana´ jî, wê tihêla wê ya bi jiyana xwezayê re bê.

Her wisa, dema ku mirov vê rengê pergalî ê jiyanî ku pêşketiye wê bi rastî kifş nekê, mirov wê nikaribê, bi başî demên bûhûrî ên jiyanê jî baştir bibînê û fahm bike û werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastiya wê lêbikolê û werêne ser ziman. Rastiya jiyana şariştaniyê, her wisa divê ku mirov werêne ser ziman, wê bi aqilê ku pêşketî re ku pêş dikeve bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov şariştaniyê wê rastiya pêşketina bi aqil jî werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de dîtina bi mejî re ku dike ku xwe bigihêne hertiştî û bibînê û fahm bike, wê di vê çerçoveyê de temenê pêşketina vê jiyanê bê. Mejî, wê xwezayê kifş bike. Mejî, ew xwezaye ku bi xoslet û teybetiyên wê re kifşkir û pê de, wê li gorî wan bidêmenkirina di nava xwe de bike. Her wisa bi dîmenkirna tişta ku hatî dîtin, wê temenê wê pêşketinê jî bê. Li vir, pêşketina

bi aqil, di vê çerçoveyê de çendî u pêş dikeve û pêşve diçê jî, lê wê aliyekî wê yê ku hin bi hin xwe li ser xwezayê re dihêne ser ziman re jî wê hebe. Ev jî, dîtina bi aqil a hizrî ye. Li vir, fahmkirina rastiyê, wê weke têgîneka bi gotina ´rastteqîniyê´ re bê ku aqil wê di nava xwe de bike ku bike bê. Di vê çerçoveyê de ji aliyekî ve çendî ku aqil pêşket û weke ancama wê çendî ku jiyana civatê pêşket û şariştani afirî û pêşde çû, wê ji aliyekî ve ji xwezayê jî dûrketin bibê. Aliyê ku lingê jiyana koçeriyê jî naxwezê wê ev bê. Bo vê yekê, nakokiya ku di nava jiyana şariştaniyê û xwezayê de ku xwe dide diyarkirin, wê di vê xalê de xwe bide diyarkirin. Ya ku car bi car li gorî wê pêşketina şariştanî bê, wê ne li gorî ya xwezayê û rastiya wê bê.

Aqil, hertimî dike ku xwezayê di nava xwe bidîmen bike û di nava jiyana şariştaniyê de bi wate bike. Di vê çerçoveyê de xweza wê weke dîmenekî di nava wê aqilê de bijî. Di vê çerçoveyê de têgîna ´aqilê xwezayê´ û hwd, her wisa ku weke ´teoriyekê´ xwezayê dihêne ser ziman, di vê çerçoveyê de wê bike ku bi aqil xwezayê di çerçoveya afrîneriyekê aqilî de xwezayê di jiyana şariştanî de bikarbênê. Bi dîmenkirina xwezayê di nava jiyanê de wê temenê wê pêşketina biaqil a jiyana şariştanî bê. Di vê çerçoveyê de jiyana şariştaniyê wê xwediyê rengekî pêşketinê ê bi demê re bê. Her wisa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku aqilê xwezayê, weke têgîneka şariştanî, wê êdî xwe bijî. Lê li vir, bi wê re jî, hin bi hin çendî ku ev pêşketin bi aqil re dibê, wê bike ku derkeve li pêşiya hebûna xwezayê ya rastî ku dijî û di jiyanê de heya. ..

Li vir, divê ku mirov hinekî din, di nava vê rewşa ku weke nakokî di nava xwezayê û jiyana şariştanî de ku diafirê li ser wê bisekinê. Ev wê giring bê. Dema ku mirov li rewşa jiyana şariştanî a li Kurdistanê dinerê, her wisa mirov dibînê ku her timî li ahenge di nava jiyana biaqil a şariştanî û xwezayê de li wê hatiya lêgerîn. Pergala jiyana koçeriyê, weke minaq, birhan û nîşaneke vê rastiyê ya ku mirov divê ku wê werêne ser ziman. Her wisa, pêvajoyê piştre ên şariştaniyê ku pêş dikevin, mirov wê kifş bike ku wê hewl bê dayîn ku li rêgezên wê jiyanê werina kifşkirin. Demên şariştaniyê ji dema sûmeriyan û pê de, wê bi aqil pêş bikevin. Weke rengê aqilê dema şariştaniyê, wê felsefe, bi pêvajoyên yên weke serdemên anamismê, totemîsmê, mîtolojiyê û aqilê felsefeyê û hwd re wê pêş bikeve. Dem bi dem ku pêş dikevê jî, wê bi awayekî di **zikhevdû** de wê ev rengên pêşketinê wê xwe bi hevdû re bidina pêşxistin û jiyankirin.

Her wisa, li Kurdistanê ji dema Sûmeriyan û heta dema Qasîtiyan, zaneyên xwûdewend ên weke gulla, wê bi rêgezên xwe werin û derkevin. Wê bi nivîskî li ser kevir, xalên xwe yên ku weke zagonî di nava jiyanê de û li kêleka jiyana şariştaniyê ku mirov çawa dikarê bijî, wê werina hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de jiyana keviyê û ya navendî a şariştanî, wê bi awayekî vekirî xwe di dema qasitiyan de bi awayekî rengê xwe bide diyarkirin. Piştre jî, di dewama wê de wê di dema xanadana Ur a sêyem de û berî wê a yekem û duyem de jî, wê ev rewş xwe bide diyarkirn. Wê rêgez û zagonên ku li gorî

wan were jiyankirin, wê hewl bêdayîn ku were kifşkirin. Di dema qasîtiyan de ku bi hevdû re dijîn bi babiliyan re wê, hewl bê dayîn ku ew pergale jiyana şariştanî bi desthilatdarî, wê xwe bide domandin. Her wisa, Derketina Hemûrabî û nivîsandina wî ya zagonên xwe, wê di vê çerçoveyê de weke aliyekî giring bê ku mirov di vê çerçoveyê de li ser wê bisekinê bê. Li vir, ev bo çi giringa? Li vir, dema ku em ji aliyê pêşketina jiyana şariştanî ve li rewşê binerin, ya ku wê derkeve li holê, her wisa, wê weke aliyekî giring weke ancama wê pêşketina biaqil jî bê. Di vê çerçoveyê de wê di nava wê jiyanê de nêzîkatiya li hevdû û di nava hevdû de ku çawa bê, wê pêş bê hanîn li ser ziman, binivîskî. Her wisa, di vê çerçoveyê de bi demê re rêgezên nivîskî ku dem bi dem êdî di nava wê jiyanê de dihên nivîsandin, wê weke aliyekî giring ê wê jiyanê bê. Wê temenê pêşketina wê jî, bi demê re bi xwe re bidina pêşxistin û diyarkirin. Her wisa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku aqilê şariştanî, di pêşketina wê de wê ev nivîsandinên weke rêgezî û hwd, wê temen bin. Bi wê re jî, wê rengekî pêşketina aqil ê jiyanê û şariştaniyê bi xwe re werênina ser ziman.

Li vir, çi jiyanê di de diyarkirin? Jiyanê çawa destpêkir? Destpêka jiyanê ji kû ya? Jiyan çii ya? Û hwd, li dûv hevdû wê bi vî rengî pirsên ku werina pirsîn û ku li bersiva wan dihê lêgerîn di nava aqilê ku pêşketî de wê bibe. Di vê çerçoveyê de di nava pergaliyek jiyanî de hewldana fahmkirinê, wê di vê çerçoveyê de temenê pêşketinê jî bê. Li azmana, hebûna stêrkan, heyvê û dunyê din û hwd, wê di vê çerçoveyê de temenê mereqa mirov biafirêne. Dunya mirov çawa ya û çawa afiriya û çerçoveya wê çawa ya, wê li ser wê bê hizirin. Her çar demsalên ku tên û diçin û bi wê re xweza reng digûharênê, wê temenê lêpirsînên di mejî de bin. Ev rewş û gelek rewşn bi vî rengî, wê her wisa rewşên ku mirov bi aqilê xwe yê ku hin bi hin pêş dikeve û ku serî li ser wan diwastênê bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku aqilê mirov di vê çerçoveyê de wê di nava lêgerîneka di jiyanê de bê. Ev lêgerîna ku em bahseê dikin, bi rengekê din em dikarin bi gotina hewldana fahmkirina jiyanê û hewirdorê jî werênina ser ziman. Fahmkirina mirov a di jiyanê de wê bi hizirkirina mirov re di demê de hin bi hin zêdetir bê. Her dem jî, wê bi xwe re bi wê asta wê aqilê pêşketî re wê jiyanê ji nû ve bi rêxistin bike, bi adilênê û pêşbixe û di pîvanekê û astekê de bide afirandin. Li vir, piştî ku aqil bidest pêşketina xwe kir û pê de wê bi demê re di vê çerçoveyê de pêşketinê bi xwe re hin bi hin bide çêkirin. Aqilê mirov, wê pêş bikeve Mirov wê, biaqilê xwe bibînê û li dunyê, hewirdorê binerê û fahm bike. Fahmkirina biaqil, wê her wisa temenê hewldan, tevger û kirina mirov a di jiyanê de jî bê. Di vê çerçoveyê de Hewldan, tevger û kirinên mirov ên di jiyanê de mirov wê, wê li ser wê re bi aqil êdî bibînê û bike.

Li vir, ya ku tê dîtin ew a ku çendî ku aqil pêş dikeve, wê weyna wê ya di jiyanê de jî hin bi hin xwe bide diyarkirin. Wê li jiyanê, serwaxt bibe. Mirov wê bi wê serwaxtbûnê re bike jiyana xwe bihiş biadilênê. Mirovê ku hin bi hin

ji şikeftan derdikeve, wê ji xwe re malan çê bike. Her wisa, dema ku em behsa şikeftên ku weke malan bikardihênin bikin, li vir, di cih de li Kurdistanê **kevnerayên heskîfê** dihên berbîra mirov. Ev kevnerayên heskîfê, ku lêgerînek cidî li ser wan werê kirin, wê were dîtin ku ew di demên berî şariştaniyê de ku weke demên naolîtikê û berî wê ên peleolîtîkê û hwd, dihên hanîn li ser ziman, wê di wan de jiyan pêş bikeve. Di vê çerçoveyê de dîroka heskîfê, ji aliyê aqil û pêvajoyên jiyana şariştanî ve çendî ku bi heyînî giring in, bi heman rengî jî ji aliyên demên berî şariştaniyê û demên bûhûrînêr ên li demên şariştaniyê jî, wê bo wan û fahmkirina wan jî di xwe de aqilekî biparêzên.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku ev herêma Kurdistanê a heskîfê, mirov divê ku weke herêmek giring a ku li wê şariştanî pêşketina werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de di **sêkoşeya** weke ji kevnerayên hêtên sûra amedê û heta ´**şikefta hîlêrê´ a li erxanî** û li ´**şikefteya hasûnî´ a ku li farqînê û heta ´hêtên sûra amedê û kevnerayên Heskîfê**, wê di vê çerçoveyê de bi hevdû re weke navendek jiyanî a ku li wê jiyan pêşketî bê. Her wisa, divê ku mirov li Kurdistanê binxat bike ku ew di ´**şikefta hîlêrê´ a li erxanî** û li ´**şikefteya hasûnî´ a ku li farqînê,** wê ji aliyê pêşketina jiyana bicihbûyî û her wisa pêşketina temenê wê yê bi sawalgerî, çandînî û cohtkariyê û hwd re wê têgînna baş bidina me. Di vê çerçoveyê de ev herêm, wê weke herêmek giring a ku mirov divê ku mirov herêmêndi ´**şikefta hîlêrê´ a li erxanî** û li ´**şikefteya hasûnî´ a ku li farqînê,** bi giringiya wan re weke herêma Reha a ´xirabreşkê´ û her wisa kirmanên kevn ên li dora amûdê û Afirînê êmn dîrokî, wan werêne ser ziman. Ev herêmên weke navendên şariştanî, wê ji gelek aliyan ve temenê pêşveçûn û pêşketinên bi aqil ên di jiyanê de bin. Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi van herêman re ku wisa kevn xwediyê temenekî ku li ser wê jiyan pirr zû di çerçoveya bicihbûnê de pêş dikeve, divê ku mirov, herêmên şirnax, Cizîra bota û nivîsêbînê werêne ser ziman. Ew qada ji nisêbînê û heta hezexê a li Kurdistanê, wê dîroka bicihbûna li wan, herê berî serdemên şariştaniyê ên dema sûmeriyan jî. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê werêne ser ziman ku çendî li van herêman lêkolîn werina kirin, wê were dîtin ku ev dîrok pêşketina dîrokê û pêvajoyên aqil bi xwe re ji ya ku em dizanîn hê kevntir dibin.

Li Kurdistanê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de pêvajoyên şariştaniyê her wisa di çerçoveyek kevn de wê werêne ser ziman. Pêvajoyên aqil, wê bi aqilê xwwezayê re di ahengekê de xwe bi demê re bi pêşketina xwe re bidina domandin û diyarkirin. Her wisa pêvajoyên pêşketinê ên aqilê felsefeyê ên dawî ku bi Mîtra û Piştre bi Zerdeşt re dihên dîtin, wê êdî vê rastiyê biawayek vekirî di çerçoveya aqilê pêşketî ê bi demê re bide diyarkirin. Her wisa, pêvajoyên pêşketina aqil, li vir, dem bi dem bi hanîna aqilê xwe li ser ziman û nivîsandina wê re wê xwe bi demê re bide diyarkirin. Ji mînaqên ku em dihênin ser ziman, pirr zêdetir, rastiyên ku derketina li holê hena. Her wisa, Weke Lipît Îştar, Urugakîna, Urnammû û hwd, bi wan re mirov dikarê gelek

minaqên din jî, werêne ser ziman. Her navek ji wan, bi aqilê xwe yên ku bi rengên cûr bi cûr hanîna ser ziman, mirov dikarê di çerçoveya jiyana şariştanî de wan weke filosofên aqilê dema wan êdî wan werêne ser ziman. Bi heman rengî, di dema Sûmeriyan de ku weke navne mîtolojîkî hena, **Enlil, Enkî, Lîllît, Anû, Şamaş, Utnapîştim** û hwd, bi gelek navên din re mirov, divê ku wan bi hizrên ku bi wan re dihên ser ziman û ankû wan hanîna ser ziman re wan werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de wan, bi wê aqilê ku bi wan re û ankû li ser wan re hatî ser ziman, bi wê re weyna xwe ya dîrokî di pêşketina jiyanê de leyistina. Em di vê çerçoveyê de di xate pêşketina aqil û zanebûnê de wan di vê ku werênina ser ziman. Ew jî, ji xwe bi aqilê xwe yê ku hanîna ser ziman û ankû ku li ser wan re ew aqilê ku dihê ser ziman, bi wê re ew dibina aqilmend û ankû ´filosofna dema xwe´ bi aqilê xwe yên ku wan di pêvajoyên pêşketina jiyana de hanîna ser ziman û dana diyarkirin in.

Li vir, di dewama wê de divê ku mirov werêne ser ziman ku her dem û ankû serdem wê li gorî rengê pêşketina xwe wê bi xwe re pêşketinê bijî. Ya ku mirov di serî de divê ku kifş bike jî wê ev bê. Her wisa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku teybetiya demên sûmeriyan, ew a ku bi şariştanî, xwediyê rengekî pêşketinê na. Her wisa, teybetiya hevbeş a civatbûnê, wê di çerçoveya wê de pêşketina wan bajar-welat bi bajar-welat li herêmê bibê. Her wisa, di vê çerçoveyê de weke ku li Lageş´ê wê Urugakîna bi hizrên xwe re şoreşekê bide çêkirin û bi wê re wê bandûrê ki hevdorê bike, di vê çerçoveyê û rengê wê rengna pêşketinê xwe li herêmê bidina diyarkirin. Piştî Urugakîna, wê weke ku bi demê re dibê, wê Gûeda ensi wê derkeve û ew jî di dewama wî de weke ku çawa ku piştî Mîtra Zerdeşt bi hizrên xwe re şoreşek da çêkirin, wê ew jî, bi vî rengî şoreşekî bi hzrên xwe re bide çêkirin. Ev rengên pêşketinê, her wisa, dide diyarkirin ku dem bi dem û cih bi cih bi mirovên zane ên ku derdikevin re hizrên ku ew bi demê re weke hizrên xwe ku dihênina ser ziman, wê bi wê re pêşketinê li herêmê di nava jiyana şariştanî de bidina çêkirin. Her wisa, wê hertimî, hewldana kifşkirina ji nû ve rengê jiyankirinê bê.

Lê li vir, dema ku em behsa rengê pêşketina jiyanê û hizir û zanebûnê li ber Diclê û Firatê ku li Kurdistanê bike, divê ku mirov her wisa di vê çerçoveyê de wê rastiya wê bi wê re di vê çerçoveyê de werêne ser ziman ku wê ev di çerçoveya xateka pêşketinê û ya bi aqilbûnê de wê bibe. Ev jî, wê bi demê re bibe. Her wisa, em dibînin ku li ber Diclê û Firatê, wê teybetiyên ku pêşketinê didina diyarkirin, wê weke hizirna ku di nava olên herêmê de xwe didina diyarkirin, wê werina ser ziman. Her wisa ola Yazdanî û ankû êzdayî, li vir, divê ku mirov weke birhan, minaq û nîşanak hildina li dest. Her wisa, ev ol, wê çerçoveyek wê ya ku bi pêşketina herêmê re ku ew dihênê ser ziman wê hebe. Her wisa li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku Weke ezdayî dihênina ser ziman, wê destpêka wê bi ´melekê tawis´ re bê. her wisa, weke cihê bergê, wê ´laleş´ jî bê. Ev rewş, wê bi xwe re têgînekê werênina ser ziman. Li vir, dema ku em bixwezin ku xate pêşketina aqil li ber Diclê û Firatê fahm bikin, divê ku

em di vê çerçoveyê de vê rengê pêşketina êzdayiyê weke destpêkekê di wê de di çerçoveya jiyana civatî de werênina ser ziman.

Pêvajoyên pêşketina jiyana civatê, yek-Yazdanî û pirr-Yazdanî wê di zikhevdû de ku bi hevdû re di ahengekê û hevdû ji aliyekî ve bi bandûr dikin û diafirênin, wêxwe bidina diyarkirin. Em vê yekê bi rengê pêşketina herêmê re kifş dikin. Her wisa, pirr-Yazdanî û yek-Yazdanî, çawa ku di zikhevdû de pêş dikeve, mirov bi wê re kifş dike. Ya ku bi demê re wê hizrên ser dema pirr-Yazdaniyê re pêş bixe bi navê ´xwûdê´, ´Yazdan´ û ankû Yazdanekî serdestî hemû tiştî û gerdûnê, wê li gorî wê û pêwîstîniyên wê yên hizirkirinê wê nerînê bi xwe re bide afirandin. Ev jî, wê bi demê re temenê nakokiya di nava pirr-Yazdanî û yek-Yazdaniyê de bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku têgîna yek-Yazdaniyê, her wisa, bi xwe re wê hem rengên pêşketinên baş û ne baş bi hevdû re di zikhevdû de werêne. Aliyê baş, wê ew bê ku wê di çerçoveya jiyana civatî de pêşketineka hizrî ya civatî bê. Di vê çerçoveyê de wê pêşketinê bi jiyana şariştaniyê re bide diyarkirin. Lê di aslê xwe de aliyê ne baş ê hizra ´yek-Yazdaniyê, zêdetirî li pêş a û ancamên wê zêdetir li pêş in. Ev jî, her wisa wê ji gelek aliyan ve xwe bi pirsgirêkên ku bi demê re di nava jiyana mirov de ku derkevina re wê xwe bidina diyarkirin. Hizra yek-Yazdaniyê, ji ber ku weke baweriyekê ya, zora bo mirovan ku wê bikina berlêpirsînê de. Lê ji aliyekî din ve jî, ev hizra yek-Yazdaniyê, di çerçoveya yekkirinê de wê di nava jiyana civatê de bê temenê tûna hasibandin û ankû tûnakirina hemû pêşketinên ji hevdû cûda ên civatî, jiyanî û mirovî jî. Her wisa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku yek-Yazdanî, di dîrokê de weke hizra giring a gelemper ku temenê pêşketina têgîna împaratoriyan jî diafirênê ye. Her wisa, serdestiya li cihanê, wê weke têgîneka bi wê re bê. Yan kû, weke hizreka ku mirov di mejiyê xwe de ku bi wê dihizirê ku bibê xwediyê hemû tiştî. Di vê çerçoveyê de ´ezbûniyek giştî´ bi xwe re dihêne ser ziman. Ev ezbûniya giştî, wê bixweê ku xwediyê hertiştî û hemû tiştî bê. Ev jî, wê bi demê re bi pêşketina aqil re wê xwe zêdetir pêş bixe.

Pêvajoyên pêşketina bi aqil, wê bi demê re zêdetir bibin. Her wisa jiyana mirov a ku dijî, wê temenê wê pêşketina aqil bê. Jiyankirn û ankû demên bûhûrî, wê weyneka wisa jî bileyizê ku rengekê xêvgirtinê wê bi wê rengê bûûyînê re bi xwe re bihawênin. Her wisa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku jiyan û pêvajoyên pêşketina aqil û zanebûnê, wê du-dîmenên ku bi hevdû re pêş dikevin bin.

Têgîna ye-Yazdaniyê divê ku mirov bi teybetî wê bi pêvajoyên pêşketina jiyana civatî, aqil û baweriyê re wê dahûr bike û werêne ser ziman. Her wisa, li vir, ev wê weke aliyna giring bin. Li vir, dema ku mirov li ser têgîna yek-Yazdaniyê dihizirê, ya ku mirov di serî de kifş dike, ew a ku bi ancamên wê yên ku bi dîrokê re bûna û rûdana wê têgîna yek-Yazdaniyê, xwediyê xateke pêşketinê a di nava jiyana şariştanî de bê.

Di dema Sûmeriyan de ev rewş, bi awayekî vekirî dihê dîtin. Lê ji wê zêdetirî û giringtirî, bi demê re wê ew têgîna ´giştî´ ku wê temenê pêşketina felsefeyê jî bi afirênê, wê bi wê re xwediyê hebûnekê bê. Dema ku mirov bi dîrokê re dihizirê, her wisa weke çerçoveya yek-Yazdanî a giştî ku weke aqilê rêveberiyê dihê bikarhanîn, wê di vê çerçoveyê de temenê kirina weke hevdû ku bi şêwayê bişavtinê bê û ankû bi şêwayên din bê. Her wisa, şerê bi desthialtdarî li ser wê re pêş dikeve. Ev têgîna giştkî a yek-Yazdanî, wê di dema sûmeriyan de bi keyê aqadî key Sargon re xwediyê pêvajoyek nû ya giring bê. Her wisa, pêvajoya bindestkirina bajar-welatên din ên sûmerî ku ew die destpêkirin, wê di vê çerçoveyê de xwe weke serekê û ankû serokê hemûyan di çerçoveya ´keyê cihanî´ de denezênê. Bi vî rengî, wê pêvajoyek ku piştre wê temenê ji dîrokê çûna bajar-welatên sûmerî jî bê, wê bi xwe re werêne. Her wisa pêvajoyên piştre ên ku pêş dikevin, di vê çerçoveyê de wê xwe bide diyarkirin. Pêşveçûnên piştre ku weke ku bi keyê babilî hamûrabî û hwd re rû dide, wê tenê weke pêşveçûn û pêşketinna ku li ser vê rengê pêşketinê ku di demên piştre rûdidin bin. Qasîtî, wê bi xanadanî xwediyê pêvajoyên demdirêj bê. Her wisa, keyê qasîtî Burnaburîaşê yekem ku li dora sedsale 15´min a berî zayina îsa jiya ya, wê destpêkek mazin bibe. Di aslê xwe de Burnaburîaşê yekem, wê pêvajoyek nû a duyem di çerçoveya xanadanên Qasîttan de bide destpêkirin. Piştî Burnaburîaşê yekem, wê newiyê wî Qadaşmanê yekem ku xwe weke «kur gel» jî bi nav dike, wê werê. Wê piştre li ser van herdû navan pêvajoyên xanadanên qasîtan wê bi demê re xwe bidina domandin. Gotina «kur», her wisa weke gotina ku navê ´Kurdî´ çendî ku mirov dikarê werêne ser ziman, bi heman rengî di Kurdî de di wateya zaro û ankû ´kûr´ jî mirov dikarê behsa wê bike. Gotina «gel», di Kurdî de wateya navê civatê dide mirov. Her wisa, gotinên ´kur´ û ´gel´ bi hevdû re bikarhanîna wan, li dawiya navê xwe, wê nesibê Qadaşmanê yekem bê. Piştî wî re wê ev kevneşopî bidomê. Lê kevneşopiyeka qasîtan hebû. Ew jî, ew bû ku keyê wan, navê ´Yazdanên xwe li dawiya navê xwe didanîn, dakû bidina nîşandin ku ew dişopa wan de na. Her wisa, bi heman rengî, navê ”Enlîl” jî wî bikarbênin li dawiya navê xwe. Di vê çerçoveyê de wê kevneşoiyek hebê. Di aslê xwe de mirov, kifş dike ku **çanda ´Enlîl´ wê hin bi hin weke çandek serdest wê di nava qasîtan de** derkeve li pêş. Mirov, li ser navên keyên qasîtî ku me Îro ew kifşkirina ku mirov li wan dihizirê, mirov dibînê ku pirraniya wan, wê navê `Enlîl´ li dawiya navê dênin. Ev yek, vê rastiyê dide nîşandin ku Qasîtî, di dema wan de çanda Enlîl, pirr zêde pêşketiye. Li ser wê re jî, pêvajoyek pirr zêde pêşketî di nava xwe de bi têgîhiştinî dijîn. Burnaburîaşê yekem, di aslê xwe de wê demek zêde bide jiyan kirin di dema qasşîtiyan de. Lê ew bixwe jî, wê weke bavê xwe Agûm- kakrîmê yekem bi zanebûn bê. Agûn-kakrîmê yekem, wê têgihiştinek mazin li şûn bihêlê. Piştî wî re, kî tê dewsa wî, wê ji wan re zor nebê ku rêya xwe ya ´rast´ bibînin. Bo vê yekê, wê ew weke destpêkêrê pêvajoyek giring a giştî di dema qaşîtiyan de jiya. Têkiliya Babil û

qasîtiyan, wê di demê de ew dênê. Her wisa, li herêmê, ev herdû xelk, di wê demê de wê bi hevdû re di ahengekê de ku dem bi dem cihê desthilatdariyê ji hevdû re dihêlin, wê bihevdû re bijîn. Wê mazinatiya hevdû herê bikin. Babilî, bi çanda qasîtiyan, wê xwe pirr zêde pêş bixin. Her wisa, derketina hamûrabî û weke ku di dîrokê dihê ser ziman ku ”diçê hûzûra Enîlî” û zagonên xwe yên ku nivîsandin ku pêşwazî wî dike û ew herê dike, ev herêkirin, wê bê temenê herêkirina zagonên wî ji aliyê qasîtiyan û babiliyan bi hevdû re. Her wisa bi wê re jî, wê xelkên din jî, wê weke ku qasiîtî û babilî herê dikin, wê herê bikin. Di vê çerçoveyê de dema qasîtiyan, wê di vê çerçoveyê de bivî rengî û bi vê çandê wê xwe bide domandin.

Weke ku di mîtolojiya sûmeriyan de dihê ser ziman ku Enlîl weke Yazdanê sereka û mazin û giştî ku tê herêkirin, wê bi vê çanda wî, êdî li gorî wê mazinahiya wî wê jiyan kirin bibê. Li vir, divê ku mirov vê yekê, mirov dikarê vê yekê jî werêne ser ziman ku wê pêvajoyên mazinbûn û pêşketina qasîtiyan, weke pêvajoyên mazinbûn û giştîbûna çanda Enlîl jî bê.

Di çerçoveya wê serdemê de mirov vê yekê kifş dike ku çanda `harbê´ pêşketiye. Ev weke têgîn û çanda ´bereketê´ jî tê bi navkirin û herî zêde wê di dema hûriyan de xwe zêde derxê li pêş û heta ku weke çandek serdest li Mesopotamiya û anatolia jî wê serdest bibê. Çanda kîbela, wê weke ji wê çanda Harbê bê.

Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de Qasîtiyan, dema ku mirov li ser dema wan dihizirê, her wisa mirov kifş dike ku ew weke ku xwediyê serdemna avaker in li herêmê. Çanda wan kifşkar e. Serdema duyemin a Qasîtiyan ku bi demek zêr re bi Agûm-kakrîmê yekem re destpê dike, wê li herêmê serdest bibe. Piştî Agûm-kakrîmê yekem re wê kûrê wî ku bi navê wî mazin dibê, wê bi wê çandê serdema wî bide domandin. Weke demeka ku du key wê dijîn e. Piştî hatina Qadaşmanê yekem, wê vê çanda Harbê bi navê xwe pirr zêde pêşbixe û mazin bike..

Li vir, serdema qasîtiyan, wisa dihê dîtin ku weke serdemek ku van nav û çandên têgînî ên weke Enlîl û hwd, ku wan di jiyanê de pêşdixin û dirûnênin. Di aslê xwe de em, divê ku serdema qasîtiyan, weke serdemek ku wê temenê yek-Yazdaniyê bi demê re li gorî rengê pêşketina hemdem ku bi aavêjê bê. Di vê çerçoveyê de wê serdemek were jiyankirin. Bi navê ´Enlîl´ wê ku piştî Qadaşmanê-Enlîlê duyem tê Kûdûr-Elîl tê û xwe weke **´kûrê enlîl´** bi nav dike û serdestiyek mazin li bajar-welatên demê li pirraniya wan didemezrênê. Pêvajoyên pêveçûnê ên van deman, di vê çerçoveyê de li ser fahmkirinê na. Wê aqil, pêşbikeve.

Çanda a baweriyê, her wisa bi demê re gûharîn bi wê re çê dibin. Hinek pêşveçûnên ku di zikhevdû de ku dibin, mirov bi wê re kifş dike. Her wisa, çendî ku serdemên dawî ên qasîtiyan ên melî-şipakê yekem û Apla-Îddînayê yekem de mirov dibînê ku navê ”merdûk” derdikeve li pêş jî, dem bi dem mirov vê yekê kifş dike di demên berê de jî di nava çanda serdest de dihê ser

ziman. Apla-îddînayê yekem, wê çanda Merdûk derxe li pêş û heta wê xwe weke ´kûrê merdûk´ û ankû bi navê ”merdûk(navê merdûk´ di nivîsên sûmerî de weke ”**amar-utu´** tê ser ziman.)´ werêne ser ziman. Navê ´merdûk´ Kurdî de tê wateya ”yê ku mal da” û ankû ”mal dide.” Bi gotineke din, yê ku zêdebûnê û bereketê dide jî, mirov dikarê vê rengê navê wî bixwênê. Di destana sûmeriyan a bi navê ”Enûna Elîş” ku weke ´destana afirandinê´ dihê bi navkirin, di wê de weke Yazdanê azmana jî hatiya bi navkirin û ser ziman. Ji ber ku navê Merdûk, piştre jî heta vanên dawiya Qasîtiyan jî dijî, êdî hatiya bawerkirin ku piştre, navê ´merdûk, li wê destanê hatiya zêdetir kirin. Lê li vir, ya ku mirov bi serekayî kifş dike, ew a ku merdûk, bi têgînên ´Yazdanî´ ên demên berê dijî ye. Her wisa, têgîn û tefsîrên weke şêr, ga, mar û hwd ku hatina bi watekirin, wê di salixkirina wateyên Merdûk de werina bikarhanîn. Bi demê re çendî ku têgînî pêşketin di jiyanê de dibê, wê bi çanda Yazdanî re şîroveyên nû lê werina zêde kirin.Minaq, gelek şîroveyên ku bi **”baal” û ”tammûz”** re hatina kirin, wê di nava çanda Merdûk a vê demê de jî jî werina hanîn li ser ziman. Mirov, dikarê di vê çerçoveyê de fahm bike ku ev weke geşbûna têgîna çandê û serdestbûna wêya. Ev bi xwe re nîşaneke pêşketinek mazin ya bi aqil a di demê de ku dihê jiyîn e. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ev çanda qasîtiyan a xwe bi navê ´Yazdanê´ xwe re hanîna li ser ziman, wê vê rastiyê jî kifş bike. Herwisa, navê Merdûk, piştre jî, li gorî gelek dîrokzanan hatiya. Heta ku navê keyekî babilî ´merodak-baladan´ bû ku tê gotin ku ji wî tê. Lê li vir, rastiyek heya ku di dema qasîtiyan de û bi teybetî di vê dema wan ya dawiyê de ev jî dihê dîtin ku gelek vegotinên berê ku hatina nivîsandin, di dema vegotinê de tiştên nû li wê dihên zêdekirin. Navên keyên qasîtî, piştî wan re bi pîrozî hatiya hanîn li ser ziman. Gelek tefsîr bi wan û navê wan re hatina çêkirin. Ew tefsîr jî, piştre bûna temenê wê fahmkirinê û domandina wê jî. Bi vê yekê re wê ev çand, xwe derxin li pêş. Li vir, teybetiyek heya. Ew jî, ew a ku mirov kifş dike ku xelkên ku bi hevdû re di nava hevdû de dijîn hena. Her wisa pêşveçûnên di nava wan de jî dihên ser ziman. Di vê çerçoveyê de dem bi dem, wê derkevina li pêş, weke ku dûbare navê ´**merdûk**´, derdikeve li pêş.

Li vir, divê ku mirov vê jî werêne ser ziman ku serdema Qasîtiyan, di vê çerçoveyê de weke serdemeka giring derdikeve li pêş. Çendî ku weke ku li misra kevn û her wisa li hin deverên din ên cihanê key, xwe weke ´xwûdê´ didenêzê û navê ´xwûdê´ bi xwe re dihêne ser ziman, di nava qasîtiyan de çandeke ku Yazdan, weke têgîn, bawerî û rastîtiyeka ku li gorî wê û bi wê dijîn, dihênina ser ziman. Divê çerçoveyê de mirov dikarê bibêje ku rengê pêşketina qasîtiyan li pêşî dema wan e. Herwisa, nîşaneke vê jî, ew a ku weke ku di dema qasîtiyan de dihê dîtina çanda, Enlîl, Harbe, Gulla, Zînê û Merdûk ku bi serdestî heya û dijî jî, di vê çerçoveyê de weke ku keyên qasîtî dikin, wê parastgehên mazin ava bikin û bi wê navê Yazdanên xwe mazin bikin. Çanda Enlîl, li vir, weke çandeke giring a ku divê ku mirov li wê bihizirê wê fahm

bike ye. Rengê pêşketina çanda Enlîl, weke ku di serdemên berê ên sûmeriyan de ku bi mîtolojikî bi navê wî re dihê hanîn li ser ziman, di vê demê de ji wê zêdetirî bûhûriya û weke aqilekî jiyanî ê bi çanda xwe re ku pêş dikeve bi serdestî derketiye li pêş û pêşketinên di nava jiyanê de dide kifşkirin.

Li vir, ya ku mirov wê kifş dike, weke çanda Yazdanî, çanda Enlîl wê bi kevnerî û serdestiya xwe ku ji deman dihûhûrê li deman derdikeve li holê. Piştî demên sûmeriyan jî, wê çanda Enlîl derdikeve li pêş. Lê li vir, ev heya ku key û serdestên demê xwe bi wê çandê re dihênina li ser ziman. Her wisa, Merdûk jî, wê xwe giştiya hemû çandên bi vî rengî ên serdest werêne ser ziman. Destpêka çanda Merdûk, di çerçoveya têgîna civatiyekê û raperînvanî a li dijî zilmê de xwe dide diyarkirin. Lê di demên dawî de bi serdestbûnê re wê xwe bi şîroveyên nû ên demê re werêne ser ziman. Têgîna xwedewandî a serdest, wê bale herkesekî bişênê. Her wisa têgîna Yazdanî, bi rengê serdestî û serdestbûna wê re wê balê pirr zêde bikişênê. Her wisa xwe serdest dayîna nîşandin û ankû bênîqaş xwe û hebûna xwe û gotinên xwe dana herêkirinê wê li ser wê re bê. Di vê çerçoveyê de minaq hamûrabî pirr balkêşa ku divê ku mirov wê hilde li dest û fahm bike ye. Hemûrabî, wê xwe wisa bide tefsîrkirin ku zagonên wî yên ku wî nivîsandinn ku dest de na û diçê li ber Yazdan Enlîl disekinê û dike ku wan ji wî re pêşniyar dike. Ev jî, wê temenê herêkirina wan zagonên wî weke ên ´xwedewendî´ bê. Ev jî, wê temenê kirina wan li jiyanê jî bê. Bi wê re divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Ev rewş, hemû wê xwe werênina ser ziman. Ew kevneşopiya Enlîl ku weke ku li şûna bavê xwe Anûm bilind dibê weke Yazdanê sereka, di vê çerçoveyê de di demên piştre de xwe bi wî re hanîna li ser ziman re wê di rengê vê kevneşopiyê de bike ku xwe ”weke wî” hanîna li ser ziman û ankû ”xwe li şûna wî hanîna li ser ziman” wê derkeve li holê. Ev, di çerçoveya xwe mazinkirinê de derdikeve û pêş dikeve.

Kevneşopiya Enlîl, li vir, wê ji gelek aliyan ve derkeve li ber me. Li vir, dema ku em xate pêşketina jiyana şariştanî dinerin ji demên sûmeriyan û piştre heta demên qasîtiyan û hwd, mirov dem bi dem hebûn û serdestiya vê çandê dibînê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov li vir dûbare werêne ser ziman ku, teybetiya rengê pêşketina çanda Enlîl a di vê dema Qasîtiyan de ew a ku bi rengekî aqil û ku ji awayekî xwe yê mîtolojikî ê dema berê bûhûrî bi çandî pêş dikeve. **Çanda Enlîl**,wê derkeve li ser hemû çandan re. Piştre jî, wê bi gelek navan werê ser ziman. Her wisa navê Enlîl, di her demê wê de wê bi rengna cuda xwe bide diyarkirin. Keyên Qssîtî, navê xwe bi navê Enlîl re dihênina ser ziman. Her wisa, bi wê re jî bi wateyên mazin ew hatiya bi çandkirin. Pêşveçûnên demî ên ku bûna, wê di vê çerçoveyê de xwe bi rengekî mazin ê demê bide diyarkirin. Li vir, ya ku mirov dibînê ku çanda Yazdaniyê, pêvajo bi pêvajo, xwediyê rengekê pêşketinê ê bi demê re ku mirov nikarê înkar bike ye.

Di aslê xwe de pirr-Yazdaniyên ji vê demê û pê de, ku dibin jî, çendî ku weke pirr-Yazdanî jî dihên hanîn li ser ziman jî, di cewherê xwe de ew pirr-Yazdanî wê têgînna yek-Yazdanî bihawênin. Ya ku divê ku mirov di aslê xwe

de dike ku fahm bike jî, wê ev bê. Li vir, tê dîtin, ew a ku bi pirr-Yazdaniyê ne qatek têgîn lê rengekî têgînê ku êdî dihê salixkirin û ser ziman. Lêgerêna bi gotina ”başbûn” û ankû ”ne başbûnê”, wê wateyekê bi vî rengî di xwe de bihawênê.

Pêvajoyên pêşketina jiyana herêmê, wê di nava xwe de gelek pêşketinên demdirêj bi xwe re bide pêşxistin. Dema ku mirov dîroka herêmê û mejûya civatên herêmê dixwênê û li wan dinerê, ya ku mirov dibînê jî ew a ku civatîtî li herêmê, di vê çerçoveyê de xwe dide diyarkirin. Li vir, tiştek mirov bi awayekî vekirî dibînê. Ew jî, ew a ku ji aliyê civatê ve ku civat dixwezê ku di nava xwezaya xwe de bijî û jiyana xwe bide domandin, li ser rêveberî û desthilatdariyên herêmê ên ku pêşketina re mudahaleyên ku li wê bûna, ev rewş ji holê rakirina. Nakokî û pirsgirêk, li herêmê, di vê çerçoveyê de di nava jiyana xelkan û desthilatdariyên ku li herêmê pêşketiye de dibê.

Ji demên Sûmeriyan û pê de û heta ku dem tê serdema qasîtiyan, wê di vê çerçoveyê de dîrokek mazin ya civatî hebûna xwe bide domandin. Li vir, divê ku vê yekê werênina ser ziman ku em di dema qasîtiyan de vê yekê kifş dikin ku gotinên aqil û zanebûnê hin bi hin rengê xwe didina diyarkirin Gotinên weke ´hiş´, ´jîr´ û hwd, ku weke gotinên aqil û ênku zanebûnê dihênina ser ziman, di vê demê de mirov wan kifş dike. Her wisa divê ku mirov vê yekê jî, werênê ser ziman ku Gelemperiyek bi têgînî li herêmê pêşketiye. Her wisa, ev gelemperî ku li ser ziman re bê û ankû li ser têgîn û têgihiştina ku bi rengê ´baweriyê´pêş dikeve re bê. Lê li vir, ya ku em dibînin ku gelemperiyek pêş dikeve. Her wisa, ew bajar-welatiya dema sûmeriyan, di vê demê de weke ku demên xwe yên dawî ên pirr zêde pêşketî dijîn. Têkiliyên di nava herêman de û çûn û hatina li herêman zêdetir bûya. Ev di dema qasîtiyan de zêdetir bûya.

Rewşa ku keyên qasîtî, Enlîl weke Yazdanê mazin û serdest ji xwe re dibijêrên û bi navê wî parastgehan çê dikin, wê ev rewş, ne tenê li herêmê û bajar-welatekî bê. Hin bi hin, wê bi vî rengî rewş zêdetir bibe û li herêmê zêdetir pêş bikeve. Her wisa, ev rewşa qasîtiyan, wê bi heman rengî di serdema Gûtiyan a pêşî ku li dora 2300 berî zayîna îsa dibê de jî. Her wisa Di nava Gûtiyan de ku herêma botanê ber çiyayê cûdî ji xwe re kirina navend ûû heta ber rêza çiyayên zagrosan, wê di qadeke mazin de wê serdestiya xwe bidina domandin. Her wisa, wê rewşna qasîtiyan ên weke jiyan û çandê di dewama Gûtiyan û demên wan pêşî de bin. Di vê çerçoveyê de gûtî bi gotinî wê heta ku werê roja me, wê bê ´Kurd´ û ankû ´kord´. Di demên berê ên sûmeriyan de bi rengê ´kur´ mirov wê kifş dike. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgînên Yazdanî ên ku pêş dikevin, mirov bi wan re tiştekî kifş dike, her wisa, ev weke pergalna zanebûnê xwe didina diyarkirin. Di aslê xwe de ev rewş, wê di zikhevdû de bin. Di vê çerçoveyê de bi pergale zanebûnê, astronomî, matamatik, felsefe û hwd, wê bi gelek aliyên din re bi hevdû re pêş bikeve. Li vir, ya ku mirov wê kifş dike, ew a ku rewşa Gûtiyan a bi zanebûnê pergale zanebûnê re pirr zêde xort pêşketî ye. Ev di dewama wê de xwe di

dema qasîtiyan de bi awayekî vekirî li ser rewşa wan ya pêşketî û pergale wan ya civatî re bi zanebûna wan re xwe dide diyarkirin.

Di jiyanê de pêşveçûnên ku bûna, wê di vê çerçoveyê de xwediyê wê pêşketinê bin. Gûtiyiyan, di dirokê de yek ji pêşiyê Kurdan e li çiyayê Zagros û li kêlêka çemê Zapê jiyan e, 2700 sal beriya zayînê, dewleteke xurt û serbixwe sazdikin û tênê heta Mezopotamya, lewre axa wir gelek xweş û bijun bû. Di sala 2649'an a pêşiya zayînê de êrîş dibin ser sumer û ekediyan welatê ekediyan ji zevt dikin du qerna wan îdare dikin, peşe di sala 2400'î ya beriya zayînê de bi biraye xwe gele loriyan re yekbunê çêdikin dewleta wan bi vî rengî gelek xurt û pêşve diçe. Lê piştre li hember ekedayî dîsa mexlûb dibin û diçin warê xwe yê kevn çiyayê Zagrosê. Piştre di sala 2270'î ya beriya zayînê de di dema padişahê asûriyan Salmanasarê yekem de bi wan re şereki giran datinin. Keyê gutiyan Tîrîgan, bi navê ´Utu-hengal´ li dora 2050 wê pêvajoyek nû bide destpêkirin. Li herêmê teybetiya desthilatdariyên jî, desthilatdariyên qasîtiyan jî û ên demên ên li herêmê jî, ew a ku li herêmê bi rêveberî û desthilatdariyên ên li herêmê re di zikhevdû de dijîn. Demna derketina li pêş, wê ji destpêkekê zêdetirî, weê weke demeka wan ya zêr bê. Piştre, dema ku li gorî demê deshilatdariyek din derket li pêş, wê ne bi rengê tûnabûn û nabûna nebûna wan desthilatdariyan re xwe werêne ser ziman. Her wisa, bi hevdû re di ahengekê çawa karîna bijîn, bi awayekî mirov dibînê ku bi hevdû re dijîn.

Guti dema wan de, serdestiya wan pirr mazin hebûya. Bi teybetî, Li dora Çiyayê Cudî û heta ku digihişt ber Zagrosan serdestiya wan mazin hebûya. Ku dikeve bakûrê Şirnaxa Roja me de û ji Şîrnaxa Roja me 35 kîlometre dûr a ji navendê Bajarê dema berê bi navê "finîkê ku Mîrên botan hertimî ji xwe re weke cihekî seyrangehê bihardihînin jî, kirmanên wir, tê gotin û bawer kirin ku ji dema wan in. Kirmanên bilind, peylekê mirovekê i ser hasp sûwar, û hwd, çend ji wan bermehiyên ku mana ji wê demê û hê jî li wir ku heyîna xwe diparêzên in. Her wisa, rewşa zanebûna wan, mirov baş kifş dike. Mirov dibînê ku Gûtiyan, aqilê xwe rijandina li ser rûpelan. Di vê çerçoveyê de nivîsgehên wan ên ku wan tişî nivîs kirina mirov kifş dike.

Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku heta roja me jî, di nava Kurdan de dihê ser ziman ku Cizira bota, weke navendeka Gûtiyan jî bû bi navê «gerzû-baqarta.» Her wisa, di vê çerçoveyê de ev herêma li ber çiyayê cûdî, wê zêdetir pêş bikeve. Şariştaniyek bi têgînî kûr û demdirêj, wê bi destê Gûtiyan li wir were avakirin. Her wisa, weke ´axa wan´ di bin destê wan de û bûyîna warê Gûtiyan herêmên zagrosan, wê di vê çerçoveyê de wê, rengê pêşketina wan bide diyarkirin. Gûtiyan, di dema xwe de li giştiya Mesopotamiya jêr û jor serdeest bûna. Di vê çerçoveyê de bajarên Gudea, Lageş, Uruk, Lullubi, Armannu, Nikku, Nippur û hwd, wê çend ji wan bajar-welatên Gûtiyan bin. Her wisa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku navê «enlîl» mirov di vê dema wan de jî kifş dike. Bi wê re jî, navê ´xwûdê´ di zimanê wan de heya. Têgîna giştî a gelemperî ya Yazdanî,

pêşketiye. Di vê çerçoveyê de destanê keyê Urukî ´Gilgamêş´ ku bi navê di Kurdî de tê wateya «weke gayekî gir», wê di vê warê de hinek têgînna bide me. Ev destan, wê weke destaneke dema Gûtiyan a giring a nivîskî bê. Şîroveyên di derbarê dunya serardê, binrdê û li azmana, wê di wê de xwe de bidina diyarkirin. Li vir, dema Gûtiyan, weke demeka giring a têgîna çandî ya Yazdanî ku di wê de pêş dikeve ye. Her wisa, pêşketina çanda **Utnapîştim**, wê di vê demê de pêşbikeve. Ev dem, di vê warê de wê weke demeka ku di wê de têgîna Yazdanî xwe gihandiya sazûmana civatî. Nîşanakên di destana gilgamêş´ de, vê rewşê dide diyarkirin. Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku destana gilgamêş weke destaneke dema Gûtiyan, wê di derbarê dema wan de jî, aqilekî baş bide me.Gûtî, her wisa, bi aqilê xwe yê ku nivîsandin re temenekî giştî ê gelemper diafirênin. Her wisa, ev destanên vê dema Gûtiyan ên weke destana gilgamêş, nîşanakên vê na. Piştre jî, em di demên ên pêvajoyên pêşketina herêmê de jî, di bineterên nivîskî ên li herêmê ku dihên dîtin de mirov, kifş dike ku navê gilgamêş û hwd, wê serdest bibe.Herwisa, di dema qasîtiyan de jî, di dema hûriyan de jî û di dema mitanniyan de jî mirov kifş dike di awayekî di dewama hevdû de ev rewş dihên domandin.

Dema Gûtiyan, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman u wê weke demeka pêşketî û ku wê di warê têgînên weke Yazdanî de ku wê gavên mazin werina avêtin bê. Her wisa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di dema Gûtiyan de têgîna Yazdanî wê bi pergalî bidest pêşketina xwe bike. Dema ku mirov li fîgûr û tefsîrên ji wê demê ku mana li roja me, ku mirov li wan dinerê mirov rastiya têgînî ya Yazdanî bi pêvajoyên wê yên civatî ên ku pêşketî wê kifş dike. Pêvajoyên jiyana civatî ên di dema Gûtiyan de wê piştî demên piştre jî wê kifşkar bin. Di vê çerçoveyê de her wisa pêşveçûnên dema Gûtiyan, giring in ku mirov wan pirr baş lêkolîn bike û wan fahm bike. Ev rewşên têgînî ên ku di vê demê de pêş dikevin, wê kifşkar bin. Her wisa, minaqe utnapîştim a di destana gilhamêş de nîşaneke vê ye. Destan û vegotinên civatî ên dema Gûtiyan, dema ku mirov li wan dinerê, weke ku mirov bi gilgamêş re kifş dike, ahengekê mirov di hûnandina wan de kifş dike. Ev jî, nîşaneke pêşketineke aqil ya giring e.

Di derbarê jiyana Gûtiyan de ew jî dihê ser ziman ku berî zayinê li dora 2700 bi aqadiyan re dikevine cengekê de û wan têk dibin û di bin desthilatdariya xwe de dihêlin. Her wisa, em dema ku li dîrokê dinerin, navê Kurdan bixwe jî, di wê de heya. Keyê Lageşê Ekednarî bixwe jî ku ji aşîra karda ya, wê di vê demê de desthilatdariya xwe bide domandin. Lageş, wisa dihê dîtin ku wê weke navendek giring a desthilatdariya Gûtiyan bê. Lê di vê dema destpêka Gûtiyan de wê rewşên nû biafirin. Ya ku wê rewşa Gûtiyan xort bike, wê bi aşîra mazin ya loloriyan re ku di wê demê de Anûbanînî keyê wan a, wê levkirinek çê bikin û bi wê re wê hêza xwe xort bikin. Lê Anûbanînî zêde li ser taxt namênê. Piştî ku ew dimirê, wê ku weke avakerê desthilatdariya Gûtiyan jî dihê bi navkirin Kamassî wê were dewsa Anûbanînî û wê

desthilatdariya Gûtiyan a xort li herêmê ava bike û serdest bike. Li gorî ku mirov ji dîrokê û herîkîna wê fahm dike, di vê demê de wê Gûtî desthilatdariya xwe ya xort ava bikin. Wê xelkên din ên weke aqad jî di bin desthilatdariya wan de bijîn. Lê di wê demê de keyê aqadî Munişţsu ku naxwezê wisa bijî, wê bi keyê demê ê Gûtiyan Errîdûpiçir re bikeve şerekî de û wê têk herê. Tê gotin ku ev şer, wê piştî wê re gûtî, li herêmê êdî ti kesek nemênê ku bi wan re bikeve şer de. Piştî wê re wê welatê xwe yê mazin ava bikin. Piştî vê rew ê gûtî, bina serdestê yekanê li ser axa Mesopotamiya. Di aslê xwe de ev rewşa Gûtiyan ku wê di dema Errîdûpiçir de li Mesopotamiya bina hêz û desthilatdariya yekana li ser axa Mesopotamiya, wê di rengê împaratoriyekê de bê. Weke destpêkekê vê rewşê wê Errîdûpiçir bê. Ev rewşa Gûtiyan, wê bi sedsalan li herêmê bi serdestî bidomê. Ev rewşa mazin a Gûtiyan wê heta dema ku hinek ji wan aşîrên mazin ên Gûtiyan ên weke Lolo, Sûs, Kimaş, Urbîlum, kaurhî û Erbela û hwd, ku ji navenda Gûtiyan in, wê têkiliyên xwe hin bi hin bibirrin wê bidomê. Piştî ku hinek aşîrên Kurd ên weke van aşîran ku têkiliyên xwe ji navendê dibirrin, wê navend lawaz bikeve. Hin bi hin wê ahenge desthilatdariya giştî a Gûtiyan ji holê rabê. Piştre jî, hêrîşên ku tên ser herêmê û welatê Gûtiyan, wê gûtî bikevina zorê de ku xwe li hemberî wan biparêzên. Bi lawazbûna navend Gûtiyan re ku ew jî weke herêmeka girêdayî navenda Gûtiyan a Urî, wê ji vê rewşê sûd bigrin û hizir bikin ku xwe weke van aşîrên din ên Kurd ji navendê ku têkiliyên xwe qûtkirina ew jî têkiliyên xwe bibirrin û li herêma xwe serdest bibin. Ew jî, wê dikin. Piştî vê re wê desthilatdariya Ur, pêş bikeve bi alikariya hin ji wan aşîrên Kurd ku xwe ji navendê dana alikî.

Di vê rewşê de gelek hêrîş êdî li navenda Gûtiyan tên kirin. Ev dema ku navenda Gûtiyan rastî hêrîşan tê, wê dema keyê gûtiyî ê bi navê ”tîgran” bê. Tîgran, di hûnera şer de serkevtî ye. Wê fermanê bide hemû hêzên xwe ku bi gelek xelk re xwe bişipêrêna rêza çiyayên zagrosan. Di vê demê de jî, çendî ku êdî hêrîş li wan dibin, wê nikaribin, zêde zirarê bidina Gûtiyan. Ev rewşa vekişîna ber rêza çiyayên zagrosan a Gûtiyan, wê bi salan bidomê. Piştre Tîgran, wê welat û desthilatdariyek nû a bi navê ”Anzan” li wir avabike ku vêcarê rêza çiyayên zagrosan navenda wê na. Ev welatê ku navenda wê weke zagrosan a, wê hin bi hin êdî ji zagrosan destpê bike û sînorên xwe fireh bike û bi ber navenda xwe ya berê ve werê. Her wisa, piştî Key Tîgran wê weke keyê vê welatê Gûtiyan ê li zagrosan wê Henî-kûtî amerdî wê derkeve li pêş. Ji ber zagrosan û heta herêmên din ên Mesopotamiya ên ku desthilatdariya Gûtiyan lê serdest a, wê rê û cihên jiyanê bidest avakirinê bike. Bi vî rengî wê hizirbike ku xwe cardin li giştiya Mesopotamiya jor û jêr weke berê serdest bikin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ´anzan´ weke nav, dibê navê aşîreke pirr mazin a Gûtiyan ku em dikarin weke ´êlek´ mazin jî werênina ser ziman e. Ev desthilatdariya anzan, wê weke desthilatdariyek Gûtiyan ku rastî demên wan ên dawî tê. Lê ku em li dîroka Gûtiyan dinerin, em dibînin ku

dîroka wan heta li dora 3150 berî zayina îsa diçêt. Li dora 3100 berî zayîna îsa wê keyê gûtiyî ê bi navê Emnatom ku bi navê ”Annatom” jî dihê bi navkirin, wê desthilatdariyek xort û mazin li herêmê ava bike. Piştî wî re wê desthilatdariya Gûtiyan, demek zêr ya xwe bijî. Em dema ku li rewşa desthilatdariya Gûtiyan dinerin, em dibînin ku wê di rengê aşîrî de bê û her aşîr, wê bi hêzî li herêma xwe serdest bê. Lê wê bi navendê ve girêdayî bin. Di vê çerçoveyê de wê desthilatdariya Gûtiyan, di rengekî konfederelî de pêş bikeve. Gûtî, wê bi konfederelî bijîn. Aşîrên Gûtiyan ên weke Kaurhî ku bi êlî mazin bûn, wê weke navenda desthilatdariyê bin. Her wisa, kaurhî, wê li dora ´cûdî´ xwe bicivin. Li vir, divê ku em weke gotinekê li vir werênina ser ziman ku navê ´cûdî´, di wê demê de weke xwe heya.

Her wisa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku navên Gûtiyan giring in. Wê piştre jî, dîtin. Gûtiyî, Îro gelek navên ku em dikarin di çerçoveya gotina ´gûtî´ û ankû ´Kurdî´ de ji wê demê kifş bikin ên weke ”karda”, ”Kardohî”, ”kartohî”, ”Gurdî”, ”Kardak”, ”Sirtî”, ”kirtî”,”gordiyê”, ”kardo”, ”kardaviya”, ”kotî”, ”kardaya”, ”kardavaya”, û hwd, weke gotinna ku ji heman gotinê ku em dikarin weke navna jî werênina ser ziman in. Her wisa, divê ku mirov di dewama vê de werênê ser ziman ku gûtî, nivîsa bizmarî bikardihênin û her wisa ev biakrhanîna wan ya nivîsa bizmarî, heta roja ser 3 hezar salan re diçê. Di vê çerçoveyê de gûtî, weke xelkekê ku pêşî ê ku nivîs kifşkiriya û bikardihênê ye. Her wisa, kedîkirina haspan û weke sawala sûwariyê bikarhanîna wê, wê rastî van deman werê ku wê gûtî, wê pêşî bikin. Bi wê re jî gûtî, di çêkirina gûstilk, bazin û gardanlikan de jî li pêş in. Çêkirina cêr û sevîlên avê, wê di dema wan de zêdetirî pêş bikeve.

Her wisa ji aliyê aqil û têgihiştinê ve jî miriov kifş dike ku gûtî ´ ya baş´ û ´ya ne baş´ ji hevdû cuda dikin. Di vê çerçoveyê de bi vê aqilê wê Yazdanên xwe yên baş û ne baş jî werênina ser ziman. Ev rewşên ku em bi gotinên Yazdaniyê kifş dikin, em di dema Gûtiyan de rastî wan jî tên.

Di dema Gûtiyan de weke k u dema ku demekê gûtî lawaz dibin û Urî derdikevine li holê û desthilatdariya xwe ava dikin, wê bi heman rengî Lolo jî wisa bikin. Loloyî, di sale 2334´an de wê derkevina li pêş. Wê desthilatdariyek xort li herêmê ava bikin. Wê li mesopotamya jêr û jor serdestiya xwe çê bikin. Ji **hilwanê** û heta herêmên şehrîzor, zahaw û silemenêyê dikina bin desthilatdariya xwe de. Wê li dora zagrosan, desthilatdariyek xort ava bikin. Anûbanînî, weke keyê loloyî ku demek zêr di destpêkê de di dema Gûtiyan de bi loloyan dide jînkirin bê. Çandeke pêşketî diafirênin. Piştî ku vê serrakirina loloyan û bi pêşketina wan re derketina li dika dîrokê û pê de, wê şer di nava xanadana Aqad û loloyan re rû bidin. Ev şer, wê bo loloyan baş ancamê bixwe re newênin. Wê hêza loloyan kêm bike. Herî dawî li dora 2300 û 2233 de şerekî mazin di nava loloyan û aqadiyan de rû didê û loloyî di vê şerê de têk diçin. Ev jî, wê bê sedema cardin derketina dika dîrokê ya aqadiyan. Di vê dema vê şerê de keyê Loloyî Satûnî, wê dil bikeve destê keyê aqadî Naramsîn

de. Lê loloyî, ji vê şerê wê fêrêk mazin derxin. Wê di cih de di sale 2233´an de bi aşîrên din ên Gûtiyan re wê peymanekê çê bikin û wê li herêmê hêzek mazin biafirênin. Ev peymana ku di dema Gûtiyan de bi pirraniya aşîrên Gûtiyan re çê dike, wê loloyan biserbixe. Wê vê çarê serkevtina loloyan li hemberî aqadiyan bi xwe re werênê. Loloyan, piştî wê re dema ku bihêzbûn û cardin serkevtin, wê aqadiyan bi rêveberiya wan re bi xwe ve bigirê bidin. Êdî demek zêr a nû bo loloyan di dema Gûtiyan de destpêkiribû.

Loloyan, di destpêka serkevtina xwe de weke ku Anûbanînî ji wan re dabûbû kifşkirin, paytaxta wan ´**Zimrî**´ bû. Ji korek´a roja me û heta ber zagrosan, wê herêmek giştî ku babil jî di nav de wê di nav sînorê desthilatdariya loloyan de bê. Ji hinek bineterên nivîskî ên dema loloyan ku di roja me de hatina kifşkirin, ku di dema Satûnî de hatina nivîsandin hatina dîtin. Her wisa, bi wê re gelek sevîl, guhar, bazin û gustîlkên naqişandî ji dema loloyan ku mana û rengê pêşketina wan bi asta wê de dide diyarkirin, hatiya dîtin. Ev jî, dana nîşandin ku loloyî, xwediyê çandeke pêşketî a di dema xwe de na. Loloyî, wê piştre di demek dirêj de bi dîrokê re hebûna xwe bidina domandin. Heta serdema Mediya û desthilatdariya wê jî, wê hebûna xwe bidina domandin. Di dema Mediya de jî wê di bin desthilatdariya Mediya hebûna xwe bidina domandin. Îro, dihê zanîn ku loloyî, zîv û zêr, bikarhanîna û gustîlk, bazin, gardaniyên jinan û her wisa bi naqişandinê re pirr zêde li pêşbûna. Bazirganiya ku li welatê loloyan lolîstanê û ku ji wê bûya, pirr zêde behsa wê dihê kirin. Di vê çerçoveyê de weke mirovna mêr, mert û zane navê xwe li dîrokê hiştina. Piştre di demên piştre, ku li herêmê desthilatdariya babiliyan û ya asûriyan jî pêş dikeve, ew jî wê bixwezin ku ji zanebûn û hûnera loloyan sûdê wergirin. Giriniyek mazin dana hûner û zanebûna loloyan.

Serdestiya loloyan, wê li dora 2000 berî zayîna îsa, wê cihê cardin ji serkevtin û bilindbûna qasîtiyan re bihêlê. Di vê demê de qasîtî, wê herîkîna wan ya bi ber babil de bibê. Her wisa, hamûrabî û piştî wî re Samsuiluna weke keyên babilî, wê ji wê bilindbûna qasîtiyan bitirsihin. Bo vê yekê, wê hewl bidin ku pêşiya wan bigrin ku bi ber babilê ve werin. Lê wê nikaribin, pêşiya wan bigrin. Heta ku tê gotin ku Samsuiluna, li devera ku ava çemê ´diyala´ ku dirijihê diclê wê kirmaneke mazin çê bike bo ku pêşiya qasîttan bigrê. Qasîtî, li herêmê ji serdemên pirr berê de jî li herêmê hebûn. Ji aliyê naqiş û hûnerê ve pirr zêde pêşketî bû. Heta ku dihê gotin ku keyên babilî bo naqişkirinê, ji hûner û zanebûna qasîtiyan sûdwerdigirt.

Qasîtî, wê li herêmê bina weke hêz û serdest bibin bi babiliyan re. Ev rewşa qasîtiyan wê bi babiliyan re ku bi hevdû re wê were bi peyman kirin jî. Serdestiya qasîtiyan, wê li herêmê êdî cardin pêş bikeve. Ev rewşa babiliyan û qasîtiyan, wê di sale 1595´an de wê derkeve li pêş. Di vê demê de dema ku hîtîtî seferekê dikin ku li herêmê bikin bo serdestiya xwe, hingî wê dewlemendên babilî ji herêmê bi mal û semyanên xwe re bikin ji herêmê biravin. Lê wê qasîtî bi xelkê babilî re artişeke mazin ava bikin û wê li hemberî

hîtîtan bisekinin û wê li ber wan bikevina şer de bo parastina herêmê. Di wê demê de hîtîtî seferek mazin li herêmê dikin. Lê qasîtî, dema ku fahm dikin ku ew hebûna wan ya li babilê û dora wê, wê têrê nekê ku serkevtinekê li dijî hîtîtan û sefera wan bidest bixin, wê di cih de xaberê ji aşîrên din ên qasîtiyan ku li zagrosan dijîn re bişênin û wê alikariyê ji wan bixwezin. Bi wê re jî, wê qasîtiyên li zagrosê wê bi hawara qasîtiyên li babilê ve bibazin. Wê bi wê re hîtiyan bikina nava xwe de wê derbeyên mazin li wan bixin. Ne hiştin ku hîtîtî werina herêmê û bikevina babilê de. Di wê demê de babil, weke deverek dewlemend û navend bû. Herkesekê dixwestku li wê serdest bibê. Ev şerê qasîtan ê li dora babilê li dora babilê wê bê sedema demek nû ya zêr ji qasîtiyan re. Keyê qasîtî ê demê qastîlyasê yekem, wê serkevtinek dîrokî bidest bixê wê welatê "kardûnaj" ava bike. Berî vê demê babilî û qasîtî bihevdû re di bin desthilatdariya babiliyan de dijîn. Bineterên ku ji dema keyê babilî Samsudîtanas(1695-1625) mana, behsa hûner û zanebûna qasîtiyan dike. Ji wan bineteran mirov fahm dike ku qasîtî, di wê demê de li babilê di rêveberiyê de hena, bi baweriya xwe lê serdest in û bi leşkerî xwediyê artişa xwe ya parastinê na. Qasîtî, berî wê demê jî û piştre jî, weke ku mirov ji bineterên wê fahm dike, niştecihên babilê na. Piştî vê serkevtinê wê qasîtî ser 400 salî re li babilê serdest bibin û wê sînorê welatê xwe kardûnajê jî berfireh bikin li herêmê. Rojhilatê Kurdistana roja me û heta ku digihişt ber gola Ûrmiyê û ji wir jî heta ber bahre hûrmûzê wê qasîtî lê serdest bibin. Qasîtî, wê di dema keyê xwe Agûmê duyem de wê li van herêman bigiştî serdest bibin. Heta ku dem tê dema Agûmê sêyem, wê sînorê welatê qasîtiyan bigihijê ber misre kevn û di vê demê de mirov dibînê ku di nava desthilatdariya qasîtiyan a key Agûmê sêyem û ya misre kevn de balyozê wan yê ku li welatan hatiya şandin wê bê dîtin. Welatê qasîtî ê kardûnaj, li herêmê pirr zêde pêşketi bû. Weke ku mirov di dema keyê qasîtî Burnabariyê duyem de dibînê wê pere û ankû wereqe wê, wê bo krîn û firotinê wê bên bikarhanîn. Di vê demê de mirov dibînê ku hin bi hin asûrî derdikevina li holê û dixwezin ku bibina hêz. Asûrî bo ku têkiliyên xwe bi qasîtiyan re baş bikin, banûyekê dişênina qasra qasîtiyan ku keyê qasîtî Burnabariyê duyem û ankû yek ji kûrê wî re bizewicê. LÊ di dema keyê qasîtî Kurîgalçûyê duyem de şerê wî yê bi asûriyan re ku ew li ber çemê diclê dike de wê derbe bixwê. Bi wê re jî, wê mecbûr bimêne ku peymanekê nû çê bike li sr sînoran. Ev jî, wê êdî bo asûriyan û qasîtiyan jî wê bê destpêkek nû li herêmê. Hee wisa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî ji aliyê çanda civatî ve bi qasîtiyan re werêne ser ziman ku mirov kifş dike ku çanda enlîl bi wan re li pêş e. Li paşiya navê navê enlîl danîn jî, nîşaneke vê rastiyê ye. Her wisarewşa kadaşmanê duyem ku navê ´enlîl´ li pêşiya navê wî ya û keyê qasîtiyan a, di vê dema Gûtiyan de, wê nîşaneke vê rastiyê bê. Di van deman de derketina asûriyan li herêmê, wê temenê pêvajoyek nû bê. Asûrî, dema ku hêrîşên xwe lu welatê kardûnaj dikin û zêde dikin, wê xelkê qasîtî, xwe bişipêrê zagrosan û cardin xwe bihêz bike li herêmê. Di heman demê de Elamî jî, wê vê rewşê

weke firsandekê bibînin û wê hêrîşî ´diyarê qasîtiyan(´welatê qasîtiyan´) bikin. Di destpêkê de wê, hêrîşî bajarên welatê gûtî-qasîtiyan ên weke Esnuna, dur, Kurigalçû, Oppî û Sipphar bikin. Hinekî bajarên din ên li ber çemê diclê û xabûrê ku hena, wê ew jî di heman demê de rastî hêrîşê werin. Wê bi wê re karibê li hemberî hêrîşan li ser lingan bisekinê.

Di dema qasîtiyan de zanebûn û têgihiştin pirr zêde pêşketbûbû. Li gorî wan, sedema hemû nexweşiyan, ji nerazîbûna Yazdanan diafirê. Qasîtî, di dermankirin û başkirina bi fîzyolojikî de li pêş in. Her wisa, di fizikûterapiyê de bi firikandinê, xwediyê teherna başkirinê bûn. Bo vê yekê, mirov dikarê bibêje ku nexweşiyên giyanî û ankû rûhî, wan bi nerazîbûna Yazdanan a ji mirov ve girêdana. Bikarhanîna bênzînê wê di dema qasîtiyan de were kifşkirin. Bineterên nvîskî ên bizmarî ji dema gûtî-qasîtiyan ku dihên dîtin, ji wan dihê fahmkirin li ser têgîna dadê û dadweriyê xabat di dema qasîtiyan de dibin. Her wisa, di van waran de pêşketinên bi felsefeya dadî û têgîna haqaniyetê, mirov di dema wan de rastî wê tê. Her wisa, falvannî, afsûnkarî, astronomî di nava wan de pêşketî ye. Di dema qasîtiyan de mirov rastî têgînên destûrên bingihî tê. Bi zagonî wê çawa mal û malbat, mirov û hwd wê têkiliyên wan bi hevdû re hebin, li ser wê xabatên felsefî mirov di dema gûtî-qasîtiyan de kifş dike. Her wisa têgîna xwedanê(´mulkiyetê´), xwedî derketina li zaroyên bê dêûbav, dabeşkirina mîreteyê di nava andamên malê de piştî mirina dêûbavê û hwd wê li pêş bê. Wê herêm ji aliyê xwedî û waliyên desthilatderiyê ve werina birêvebirin. Her wisa, rewşa di welatekî de ku çi pêwîst bê, weke parastvan, hêza aşayîşê û hwd wê hebe. Bi wê re jî ku piştî key, weke mirovê duyem ê bi erk ”şukallu” hebû. Weke saziyek şêwmirmendîtiyê jî kar û xabat dikir. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bibêje ku aqil û şêwirmendî pêşketibûbû. Felsefe, bi aqilê xwe di wê de pêşketiye. Her wisa, bi wê re mirov vê rewşê kifş dike. Di vê çerçoveyê de rêgezên jiyanê ku wê çawa bin, ew hatina kifşkirin û nivîsandin. Rastiya gûtî-qasîtiyan li herêmê, bi fahmkirina wê re, wê ji aliyê zanebûnî û pêşketinên din ên şariştanî ve wê gelek tişt û rewşan jî bigihênê rohniyê.

Di çerçoveya têgîna pirr-Yazdaniyê de weke ku pergalek baweriyê ya dema gûtî-qasît hebû. Pirr-Yazdanî û yek-Yazdanî, di dîmenekî de di zikhevdû de wê xwe bide diyarkirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku Yazdanên dema Gûtiyan a qasîttan, wê di vê çerçoveyê de xwediyê rastiyekê bê. Her wisa, Yazdanên wekeAnu, Enlîl, Ea,Hoza, Sûrîtas, Maruttaş û Bûrîas çend ji wan navên piçûk mazin ên mîtolojikî ên dema gûtî-qasîtt in. Bi wê re jî, divê ku miirov werêne ser ziman ku bi navê Yazdanên piçûk û mazin, wê gelek Yazdanên wan ên bi demê re ku diafirin wê hebin.

Her wisa li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku zimanê qasîtiyan, zimanekî ku di wê de zanîn pêşketiye ye. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bibêje ku gotinên biaqil ên dirêj ên weke ”kerpîç”, ”kerkerî”, ”piç”, ”pijî”, ”piç-pijî”, ”gawir”, ”gilgamêş”, ”hiş”, ”jîr” û hwd, weke gotinên ku mirov

dikarê ji dema qasîtiyan werênê ser ziman bin. Di vê çerçoveyê de dihê fahmkirin ku qasîtî, demeka dirêj û pêşketî a serdema Gûtiyan bi xwe re diafirênin. Her wisa, ji rengê gotinan û têgîna wan mirov fahm dike ku rengê pêşketina wan, çawa ye. Minaq, gotina ´kerpîç´, wek gotineka di dema avakirinê û ankû tiştên ku bi wê hêt tên avakirinê dihêne ser ziman. Ev jî, dide nîşandin ku qasîtî di wê dema xwe de xwediyê rengekê pêşketinê ê ku ew di dema xwe de malan bi vîî rengî ava dikin û her wisa bi wê re jiyana xwe di nava wê de pêşxistina. Qasîtî, wê rengekî aqil ê şariştanî bi xwe re bidina diyarkirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di dema qasîtiyan de, wê hin bi hin hûriyî pêşbikevin û derkevina dika dîka dîrokê Hûriyan, bi rengê pêşketina xwe weke ku mirov dibînê wê navenda wê pêşketina wê, wê êl û ankû aşîra mazin a Kurd ku ji wê re ”subaro” dihê gotin, wê temen û destpêka pêşketina hûriyan biafirênê. Her wisa, piştre Mîtannî jî ku tên wê biheman rengî ji heman kokê û temenê bin. Li vir, çendî ku em weke ku dema gûtî û qasîtiyan dikarin ji demekê û pê de, bi hevdû re şîrove bikin û di zikhevdû de werênina ser ziman, wê biheman rengî, piştre ji demekê û pê de, piştî ku hûriyan bidest pêşketina xwe kir û pê de, wê destpêka wan û dema qasîtiyan d zikhevdû de heta dema ku hûriyî bi tememî mazin bibin û li jêr û joriya Mesopotamiya serdest bibin, wê bi hevdû re bijîn. Piştî hûriyî mazin bûn û pê de, wê qasîtî di bin desthilatdariya hûriyan de xwe bidina domandin. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman, hûriyî, her wisa ber diclê ji xwe re dikina destpêka pêşketinê. Lê hin bi hin li berfiratê li rojavayê Kurdistana roja me û li bakûrê Kurdistanê û heta herêma amedê, wê di qadeke fireh de bidest pêşketina xwe ya bi demê re bikin. Li vir, divê ku mirov vê yekê, werêne ser ziman ku herêma Heskîfê, li vir, divê ku mirov bi giringiyeka dîrokî bi destpêka pêşketina hûriyan re wê werêne ser ziman. Ev herêma hêskîfê, wê weke herêmek navendî a şariştanî bê. Her wisa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku, di roja me de jî hê jî hêskîf ji van aliyên xwe yên dîrokî ve bi başî mihtacê fahmkirinê ye. Kirman û bajariya li dora heskîfê, wê her wisa vê dîrokê bi xwe re werêne ser ziman. Bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku kirmana sûrê ku bajarekê dike nava xwe de wê avakirina wê ji dema hûriyan bê.

Birca Belek ku li Cizra Bota ya, ew hê di dema Gûtiyan de hatiya çêkirin. Gelek navend û kirmanên bi vî rengî ku dever bi dever ji nisêbînê û heta hezexê û ji wir jî heta şirnaxê û hewirdorên ku wê hatina çêkirin, wê di dema Gûtiyan û hinekî berî wan de jî bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov van aliyan bi teybetî werêne ser ziman. Hûriyan, piştî ku bidest pêşketina xwe kirin, wê bi kirmana sûrê a li amide re ji xwe re bikina navendek mazin. Piştre jî, wê biheman rengî kirman û avakirinên nû li rojavayê Kurdistana roja me li herêmên weke Afrînê, qamişlo, amûdê û hinek deverên din ên wê çê bikin. Piştî ku çanda Mîtra pêşket û pê de, wê wê li herêmê ev çêkirin û nqaşkirina li

ser keviran û bi keviran, wê zêdetir bibê. Lê berê wê, mirov di dema hûriyan de vê rewşê pirr zêde dibînê. Gelek tefsîrên ku ji dema hûriyan mana heta roja me ku weke serê eylo bi laşê mirov ve, baskê eylo bi şêr ve serê key bi şer ve û ankû eylo, şêr û hwd weke xwe ku hatina çêkirin mirov dibînê. Her wisa, tefsîrên ku weke di dema Mîtanniyan de bi Mîtra û gûrandina wî ya ga´ re ku dihên dîtin û ankû weke tefsîrkirina gilgamêş û hwd, mirov di vê çerçoveyê de dibînê. Ku heta roja me, di malên Kurdan de maya ´naqşaya şahmaran´ bi vegotina wê re mirov divê ku li vir bibîr bixe. Her wisa naqşaya şahmaran, wê rengekî afirandinê ê bi demê re ku di van deman de dihat kirin wê bi xwe re werêne ser ziman. Hevgirtina naqşaya şahmaran, di vê çerçoveyê de bi rengên ku bi wan tê çêkirin û ankû bi tefsîrên weke ên jinê û mar ku dihê çêkirin, mirov dikarê werêne ser ziman. Her wisa reng û tefsîrên bi nirx û pîroz di çêkirina wê de hatina bikarhanîn. Rengên weke kesk û sor û zer, wê rengna ku pîroz bin di nava xate baweriya Yazdaniyê de. Her wisa jin jî, bi heman rengî pîroz e. Têgînên ku berî vê demê ku di dema Gûtiyan de pirr zêde li pêşin lipît îştar, lillît, zîna, gulla û hwd, wê çend ji wan navên Yazdanî ên pîroz bin. Piştre jî di dema hûriyan de ji w kevneşopiyê Harbê û ankû ´hebedê´ û hwd, mirov dikarê werêne ser ziman. Ev rengna pêşketinê ên di jiyanê de na. Her wisa, di çerçoveya xate baweriyê de jî wê gelek têgînna bidina mirov. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku temenê vê xate baweriyê a li Mesopotamiya, heta serdemên berî şariştaniyê jî diçêt, weke ku çawa ku nîşanakên dema berî demên şariştaniyê ku mmirov bi pergale jiyanî a li Kurdistanê a koçeriyê re kifş dike.

Ev navên ku weke navên Yazdanî jî di nava civatên gûtiyî, qasîtî û hûriyî de derdikevina li pêş, wê navna têgînî û têgihiştinî bin. Her wisa, mirov dikarê di wê çerçoveyê de werêne ser ziman ku her keseyetiyek ji van navan ku hatî afirandin, wê di reng û weyna filosofekî de bê. Weyna ku van navan leyistiya di nava jiyana civatê de wê, dîrokî û kifşkar bê. Her wisa, di serdema Gûtiyan de keseyetiya bi navê ûtnapîştim re wê heman weynê bileyizê. Di vê çerçoveyê û rengê wê gelek keseyetiyên din ên ku derdikevin wê hebin. Bi çi hizrê û ev keseyet dihên ser ziman, wê bi wê re di nava civatê de di mejiyan de bicih bibe. Her wisa, ew wê bina dager û mînaqe hizrna di mejiyan de bicih dibin in. Bi wê re jî keseyetiyên weke keseyetiya gilgamêş ku bi reng û tefsîra ku bi wê re dihê hanîn li ser ziman, wê xwediyê weynekê bê. Di vê çerçoveyê de wê keseyet, bi afirin. Di aslê xwe de ev rengên têgînî, wê temenê pêşxistina keseyetê di mirov û civatê de bin. Di vê çerçoveyê de pêvajoyên van pêşketinan di xate dîrokê de wê pirr zêde watedar bin.

Dema Gûtiyan, wê weke demeka pêşketî bê. Her wisa, êdî rewşa jiyanî û şariştanî, ji rewşa ´bajar-welatî a dema sûmeriyan bûhûriya. Êdî demek ku di wê de di bin têgînekê û ankû baweriyekê de bigiştkî bigihina hevdû destpêkiriya. Her wisa ev dema nû, weke demeka pêşketî a bi aqil e. Hizrên Yazdanî û baweriyî ku pêşketina û ankû hena, wê bi serdestiya xwe re pergale

civatî a şariştanî biafirênin. Di vê warê de gûtiyî, xwediyê zanîn, têgihiştin û pêşketineke biaqil a ku mirov ji xwe re hayranmayî dihêlê ye. Her wisa, dema Gûtiyan, wê di di çerçoveyek giştî de bê. Wê rengê pêşketina dema Gûtiyan, piştre ku di nava serdema wan de pêşdikevin, wê di demên qasîtiyan û piştre hûriyan de jî, kifşkar bê. Heta ku piştre mirov dikarê werêne ser ziman ku wê di dema Mediya de jî serdest û kifşkar bê. Gûtiyî, li herêmên xwe serdest in. Heta hêrîş li mal û jiyana wan nebê, ew hêrîşî ti kesekî nakin. Di nava jiyana xwe ya bixwezayê re di asayiyekê de dijîn.

Gûtiyî, bi baweriya xwe re xwediyê pergalek dûalîte ye. Her wisa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ew dûaliteya di nava rengê baeriya dema Gûtiyan de wê di çerçoveya têgîna giyane baş û û têgîna giyane ne baş de wê xwe bide diyarkirin. Di vê çerçoveyyê de Yazdanên baş û ne baş, wê di çerçoveya baweriya wan de xwediyê rengekî pêşketinê bê.

Teybetiya rengê baweriya Gûtiyan, ew a ku ew ne tenê ji Yazdanên xwe yên ku baş dibînin re boraqan didin. Her wisa ji Yazdanên xwe yên xirab re jî wê boraqan û ankû ´korbanan´ bidin bo ku xwe ji xazaba wan xilas bikin. Bo ku rastî xazab û tûfaana wan newin. Bo ku xirabiyê bi wan nekin û ´mudahaleyî jiyana wan nekin.” ”Bo ku mudahaleyê li baxtê wan nekin.” Di vê çerçoveyê de gûtiyî ji wan re jî boraqê didin. Ev rewşa ji Yazdanên xwe yên baş û ne baş re dana boraqê a Gûtiyan û nifşên berî wan, wê bê sedema wê ku ji welatê Gûtiyan re bê gotin ku ”welatê şaytan.” Her wisa, hinek gotinên bi vî rengî jî, di nivîsênin ji dema wan û sûmeriyan ku mana de bo Gûtiyan û nifşên wan ên berî wanhatiya gotin.

Dema ku mirov behsa jiyana Gûtiyan bike, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di çerçoveyekê de aqilê wê hatiya pêşxistin. Bi wê aqilê ku bi wê jiyana xwe pêş dixin, wê ahengekê bidina pêşxistin. Ev ahenge ku di nava ´başî û nebaşiyê´ de ku wan çêkiriya û li gorî wê di ahengekê jiyanî de dijîn, wê rengê xwe bide rengê pêşketina jiyana wan û baweriya wan jî. Di xate Yazdaniyê de di vê çerçoveyê de têgîna baş û nebaş, ´bihûşt û dosejeh´, ´rastî û nerastî´, ´xweşik û ne xweşik´, ´jiyan û ne jiyan´ û hwd, wê di vê çerçoveyê de têgihiştinekê pêşbixin. Gûtiyî, di vê çerçoveyê de xwediyê aqilekî giirng in. Jiyana xwe bi xwezayê re di ahengekê de dijîn û wê dihênina ser ziman. Her wisa, di vê çerçoveyê de aqilê xwediyê, di nava wan de pêşketiye.

Jiyana Gûtiyan, temenê wê li ser esasê pêşketina jiyana şariştanî û pêvajoyên wê ava ye. Di vê çerçoveyê de saziyên şariştaniyê ên biaqil, parastin û xwe rêvebirinê wan pêşxistina. Her wisa, di vê çerçoveyê de ´şûr û mirtal´, ´mizrak´ û bikarhanîna wê, ´li ser arabokên ku bi du tekelleken ku ew yên şer in´ û hwd, wê gûtiyî wan pêşbixin. Di vê çerçoveyê de amûrên xwe parastin û bi wan jiyankirinê, pirr zêde pêşxistina.

Gûtiyan, di dema xwe de jiyanek bi zagon û destûr pêşxistina. Her wisa, ´destûrên Yazdanê mazin´ kifşkirina û hanîna li ser ziman. Li gorî wan,

zagonên xwe yên jiyanê, bi kevneşopiyên xwe yên civatî re pêşxistina. Kevneşopî, di demên Gûtiyan de pirr zêde pêşketî na. Ew kevneşopiyên wan, di çerçove û esasê zagon û destûrên jiyanî de li ser serê jiyana civata wan kifşkar in. Di vê çerçoveyê de jiyana xwe pêşxistina.

Em dema ku behsa jiyana Gûtiyan bikin, em divê ku werênina ser ziman ku Gûtiyan bi aqilê xwe yê civatî, pêşveçûnên xwe didina didina diyarkirin. Li ´diyarê Gûtiyan´, jiyan bi reng e. Her wisa, di vê çerçoveyê de rengê bawerî û pêşketina wan, wê di wê demê de pirr zêde li pêş bê. Em dema ku li navaroka destana gilgamêş´ dinerin, her wisa divê ku mirov werênê ser ziman ku rengê jiyana civatî a li herêmê ku pêşketî bi gelek nîşanakên wê re kifş dikin. Gilgamêş, weke keyê Urukê, wê bikeve pey jiyaneke nemir de. Her wisa, rêwîtiya gilgamêş a li ser çemê xabûr û diclê, wê di vegotina destanê de werê ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî ji destanê kifş bike û werêne ser ziman ku gûtiyî, di nava jiyana xwe de di rewşeka ku hem li ser kirinên xwe re dihizirin bo fahmkirinê û hem jî di rewşeka lêgerîna kifşkirinê a di nava xwe û ya hewirdora xwe de na. Her wisa, lêgerîna gilgamêş, vê rastiyê bi xwe re dihênê ser ziman.

Destana gilgamêş, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê weke destaneke dema Gûtiyan bê. Her wisa rewşa Urukê a ku di wê destanê de dihê ser ziman, wê di derbarê wê demê de gelek rastiyan bide nîşandin.

Li vir, li ser rengê hizirkirina demê dema ku mirov dihizirê, her wisa ya ku mirov dibînê ew a ku hevokên dirêj, dihêne avakirin. Gotinên dirêj dihên gotin. Gotinên pirrtîpî, di derbarê rengê hizirkirna wê demê de jî, aqilekî û hizrekê didina me. Piştî dema gûtî-qasîttiyan re wê di dema hûriyan de her wisa ev rewş zêdetir xwe bide pêşxistin. Rewşa derketina li holê a hûriyan, wê giring bê ku mirov wê fahm bike. Her wisa, hûriyan, di paytaxta xwe ´waşokanî´ de siyeseta herêmê didina diyarkirin. Di nava hersê çemên mazin ên çemê diclê, çemê firatê û çemê xabûrê, bi ketina bin desthilatdariya hûriyan de wê êdî temenê destpêk û destpêkirina dema wan jî bê. Dema hûriyan, di vê çerçoveyê de di aslê xwe de piştî serdema gûtî-qasîtiyan de destpêka bi dema hûriyan de wê bi fahmkirna wê re di derbarê rengê xate pêşketina jiyana civatî de jî hizrek baş bide me. Her dema ku navenda Gûtiyan, lawaz bûya, wê li têhêlên wê, pêşveçûnên civatî û desthilatdarî ên bi vî rengî bibin. Piştî serdestiya Gûtiyan, di demeka lawazbûna têkiliyên dordorê bi navendê re wê xanadana Urî derkeve li holê. Bi heman rengî, piştre bi pêşveçûnên bi loloyan û qasîtiyan re jî, wê rewş bi heman rengî bê. Li vir, dema ku dem tê dema hûriyan jî, wê bi heman rengî rewş xwe bide diyarkirin. Li vir, ev rewşên pêşketinê ên weke di dema Gûtiyan de ku bi xanadana Urî, bi xanadana lolo û bi xanadana qasîtiyan re, wê bi heman rengî xwe bide diyarkirin. Her wisa di vê dema hûriyan de jî, wê heman rewş xwe bide diyarkirin. Rewşa hûriyan, wê ji gelek aliyan ve teybetiyên wan ên hemdem wê hebin. Her wisa, piştî serdemên sûmeriyan ên

bi pêveçûna civatî û şariştanî re ku bi hezaran salan didomin, wê serdemên Gûtiyan û piştre di navaroka wê de pêşveçûnên demkî ên weke ya xanadana uri, lolo û qasîtî bibe. Piştre jî, pêşveçûna hûriyan, hem ji aliyekî ve em dikarin di dewama vê pêşketina wan de werêne ser ziman û hem jî ji aliyekî ve mirov dikarê weke hevgirtin(´sentez´)eka ku di hemû ancamên bi zanînê û şariştanî ên demên berî xwe di xwe de bi wate dike, wê dema hûriyan xwe bide diyarkirin. Di vê çerçoveyê de dema hûriyan, giringa ku mirov wê fahm bike.

Dema hûriyan, her wisa, dema ku mirov li zimanê wan dihizirê, bi gotinên wan ên zimanî re mirov kifş dike ku zimanê wan pêşketiye. Her wisa gotinên weke ”hûwar” ku di roja me de weke ´hawar´ dihê zanîn, sittar, zanîn, hiltan, û hwd, wê çend gotinên ji dema hûriyan bin. Her wisa, binetera nivîskî a dema hûriyan ku navê ”**marî**” li wê hatiya kirin, di vê çerçoveyê de aqilekî baş li ser ziman re bi aqilê demê re dide me.

Hûrî, di vê çerçoveyê de em divê ku werêne ser ziman ku serdema wan, wê weke serdemek hemdem a wê demê bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werêne ser ziman ku hûriyî, demek şariştaniyê a civatî ku bi aqil pêş dikeve bi xwe re di dema xwe de dijîn. Di vê çerçoveyê de rastiya hûriyan, bi rengê pêşketina wan a li pêş re derdikeve li pêş. Hûriyî, aqlê xwe yê ku dihênina ser ziman, wê piştî wan jî temenê pêşveçûnên şariştanî ên ku li herêmê û li herêmên li dora herêmê ku rû didin, wê di temenê wan de xwedî weyn bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hûrî, wê di vê çerçoveyê de dema xwe bi navê xwe re mayînda bikin. Ya ku wê dema hûriyan li şûna dema Gûtiyan û pêvajoyên wê de weke serdemekê êdî werêne ser ziman, wê ew pêşketina wan ya demî a bi aqilê wan re bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bibêjê ku ew bi aqilê xwe re serdestî demê na. Weke ku çawa ku Gûtiyan, di dema xwe de pêvajoyên pêşketinê bi xanadanên weke ên Urî, lolo û qasîtiyan re jiyan, wê bi heman rengî hûriyî jî pêvajoyên bi wê rengî bi demê re bi pêvajoyên şariştanî ên Mîtanniyan û hwd re bijîn.

Li herêmê pêvajoyên civatî ên weke bi asûriyan, aqadiyan, elamiyan û babiliyan û hwdjî wê di dewama vê rengê pêşketinê de bi wê re di ahengekê de xwe bide domandin. Li vir, ya ku mirov dibînê ew a ku pêvajoyên xelkan ên civatî, weke ku mirov li ber Diclê û Firatê dibînê di zikhevdû de pêşve diçin di demên bûhûrî de. Li vir, em vê yekê jî, di vê çerçoveyê de dibînin. Lê hertimî jî, wê di çerçoveya jiyana xwe ya li herêmê de wê karibin, hebûna xwe bidina domandin.

Dema hûriyan, di vê çerçoveyê de divê ku mirov pirr zêde li ser wê bisekinê. Dema hûriyan, piştî serdema Gûtiyan û demên urî, lolo, qasîîtiyan tên. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê di dewama wan de jî vê dema hûriyan a nû werêne ser ziman. Di dema hûriyan a destpêkê de, wê ev nav û desthilatdariyên din jî, wê hebûna xwe bidina domandin. Minaq, çend ku weke demeka serdema Gûtiyan dema qasîtiyan, wê piştî serdestbûna dema hûriyan jî, wê hebûna xwe li ber çiyayê zagrosan û heta ku digihijê herêmên rojhilatê

Kurdistana roja me ên ûrmiyê û kirmanşanê û hwd, wê hebûna karibin bidina domandin. Li Mesopotamiya jêrin, wê hûriyî serdest bibin. Wê li ber çemê diclê, çemê firatê û çemê xabûrê hûriyî hebûn û serdestiya xwe pêşbixin. Weke navendek pêşketîna wan ku herêma Reha(´Edes´)yê, wê ji wê û heta amedê, wê di qadeke mazin de serdest bibin. Her wisa, sûra amedê, kirmaneke xwe parastinê a ji hêrîşên ji derve ku tên a hûriyan a ku çêkirin e. Bi heman rengî li dora ava heskîfê, wê avakirinên bi wê rengê çê bikin. Li deverên din ên rojavayê Kurdistana roja me, wê heman avakirinan bi wê mazinahiyê çê bikin.

Li herêmê ku rastî wê dema derketia hûriyan tê, wê hin bi hin li anatolia ku weke hêzek herêmî derdikevin wê hîtîtî derkevin. Ew jî, wê bixwezin ku hewirdora xwe serdest bibin. Bo vê yekê, di destpêkê de hin seferên wan li herêmên weke ber xateya roja me, wê bikin. Li vir, çemê mazin ê ku diharikê, wê weke astengiyekê bê li pêşiya wan ku pêş de herin. Lê, di wê demê de wê, nikaribin, zêdetirî pêş de herin. Asûrî, berî wê demê jî di bin desthilatdariya qasîtiyan de di dema pêşî de dijîn. Lê di dema piştre de wê hin bi hin li ber çemê diçlê wê hin raperînna bikin û wê bi artişa qasîtiyan re bikevina şer de û hin serkevtinna jî bidest bixin. Ev rewş, wê wan li herêmê hin bi hin di herêma wan de bike hêz. Lê tevî ku rewş wisa ya, ew jî, wê rewşê dibînin ku dema ku bi serê xwe bin, wê nikaribin li hemberî hêrîşên ku li herêmê dibin ku karibin bijîn. Bo vê yekê, di wê dema pêşî a hûriyan de ku li herêmê serdest dibin de pêşî, dixwezin ku dervî wan desthilatdariya xwe ava bikin. Lê dema ku dibînin ku hîtîtî dixwezin ku li herêmê seferê bikin û ku ew jî wê fahm dikin û ku fahm dikin ku ev wê bo wan jî ne baş bê, wê bi hûriyan re tevbigerihin û bi hevdû re weke hêzek parastinê li hemberî seferên hîtîttan bisekin in.

Ev rewş, wê hem bê rewşek ku alî hûriyan bike û hem jî bê rewşek ku alî asûriyan jî bikê. Di vê çerçoveyê de li herêmê karîna ku hebûna xwe bidina domandin. Di dema dawî a gûtî-qasîtiyan de hêrîşênElamiyan ên li bajarên gûtî-qasîtiyan ên weke Esnuna, dur, Kurigalçû, Oppî û Sipphar ku dikin û van bajaran demekê dikina bin dest û sehêta xwe de jî, lê wê ev rewş di serdema pêşî a hûriyan û pêşketina desthilatdariya wan de bigûharê. Elamiyan, dixwestin ku i bajarên xwe sasû û berekse, desthilatdariya xwebidomênin û wê xwesteka xwe dihênina li cih. Lê wan jî, fahmkiribû ku bi tenêbûn, wê ji wan re zor bê ku xwe û bajarên xwe biparêzên. Bo vê yekê, ew jî herê dikin ku tevlî konfedeliya hûriyan bibin, weke ku d dema gûtî û qasîtiyan de bû. Her wisa, hûriyî wê cardin, serdestiya xwe li herêmê pêşbixin û ava bikin û wê elamiyan jî, weke asûrî û babiliyan û qasîtiyan, wê bi xwe ve girêbidin. Di vê çerçoveyê de ew rewşa welatî a ´konfederelî´ ku hebû, wê ji kevneşopiya xwe ti tiştî winda nekê û wê di dema hûriyan de jî hebûna xwe bide domandin. Hûriyî, wê di vê çerçoveyê de demek pirr zêde di nava xwe pêş bixin. Hûriyî bixwe, wê di nava xwe de çendî ku ji heman xelkê na, wê ji gelek aşîr û êlên Kurd ên demê pêk were. Her wisa, weke navenda wan êl û ankû aşîran ku hûriyî na, Subaroyî, wê hebin. Her wisa Mîtannî henna. Mitanniyî, ku di zimanê wan

Kurdî de ku tê wateya ´mêreniyê´ ji xwe re weke nav gotina ”**marî-annî**” bikardihênin. Di vê çerçoveyê de wê ew jî di nava serdema nû a hûriyan de wê hin bi hin derkevina li pêş.

Di aslê xwe de navê ”marî-annî” ku mitannî li xwe dikin, wê di destpêka sedsale 16´min a berî zayîna îsa de wê bidest bixin. Di vê demê de wê hêrîşên hîtîttan li hûriyan pirr zêde bin. Hûriyî û welatê hûriyan wê ji van hêrîşan kal bikeve. Wê were bertûnabûnê. Di vê demê de hin aşîrên qasîtî û hin aşîrên hûriyî ku ên weke subaroyî wê bo parastina war û diyarê xwe wê pêvajoyek berxwedanê li hemberî hîtîtan bidina destpêkirin. Piştre jî, ev wê navê ´marî-annî´ bi wan re derkeve li pêş. Di aslê xwe de Mîtannî, hinekî jî wateya mêraniyê di navê xwe de dide mirov. Wê wateyê jî ji vê rewşê digrê. ..

Rewşa Mîtanniyan ku derdikevina li pêş, wê li şûna hûriyan û desthilatdariyan, wê mitannî derkevina li pêş. Zêdegan û ankû pêşengên Mîtanniya ´marîannu´yan jî, wê di vê çerçoveyê de civatekê di bin sehêta xwe de pêşbixin. Ên ku wê dema mitanniyan êdî bidina destpêkirin jî, wê ev bin. Mitannî, bi kok û rastiya xwe re ji hûriyan in. kalkên wan jî, weke ya hûriyan wê gûtî-loloyî.qasîtî bin. Her wisa wê di vê çerçoveyê de mitannî, êdî piştî wê rewşa hûriyan û şerên wan ên li herêmê ên bi hîtîtan re wê wê derkevina li pêş. Li vir, ez divê ku vê yekê jî werênima ser ziman ku Mîtannî, serdemek nû ya vê xate civatî a li herêmê ku piştî gûtî, lolo, qasît û hûriyan re tên in. Rengê desthilatdariya mitanniyan, her wisa, wê di çerçoveya dewama ya hûriyan de bê. Lê wê hinekî ji ya wan pêşketîtir jî bê. Bi demê re wê, zane û filosofên weke Mîtra wê di dema Mîtra de derkevin û wê temenê wê yê civatî hê kûrtir û xorttir bikin û têgînek hemdem a wê demê.

Pêşveçûnên dema Mîtanniyan, dema ku mirov li rengê wan dinerê, her wisa, divê ku mirov werêne ser ziman ku ji rengê yên roja me ên hemdem ne cudatir in. Her wisa divê ku mirov werêne ser ziman ku Mîtannî, wê pêvajoyek nû a desthilatdarî a li herêmê bê. Rastiya Mîtanniyan divê ku mirov di dewama dema dûyemin a hûriyan de wê hilde li dest û werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de weke ku çawa ku dema dûyemin a hûriyan wê bi dema qasîtiyan a dawî re di zikhevdû de bibûhûrê, bi heman rengî wê dema hûriyan a dûyemin jî bi destpêka pêşketina Mîtanniyan re di zikhevdû de bibe.

Pêvajoyên civatî ên ku em divê ku li vir wan fahm bikin, wê her wisa ew in ku wê di çerçoveyek hemdem de xwe bidina diyarkirin. Li herêmê, di çerçoveya têgîne desthilatdarî a demê a ´împaratorî´ de pirr zêde şerê desthilatdariyê pêşketiye. Ew xate weke ´konfederelî´ jiyankirina hûriyan û berî wan di dema Gûtiyan de ku hebû, wê bi heman rengî di dema Mîtanniyan de jî pêşbikeve. Her wisa, rewşa aşîrên Mîtanniyan ku heya, wê temenê vê biafirênê weke ku di demên bûhûrî de bûya. Zêdegan û ankû torînên Mîtannî ´marî-annû´yan, wê di vê demê de pergalek civatî a serdest ava bikin. Her wisa şariştaniya bajarî, wê di vê demê de zêdetirî derkeve li pêş. Hebûna bajaran, wê zêdetirî derkeve li pêş. Lê dîsa ya ku mirov di serî de kifş dike, ew a ku

weke ku çawa ku di demên berê ên gûtî, lolo, qasîtî û hûriyan de hebûya, wê karê çandiniyê, cohtkirinê, kedîkirina sawalan û şivanî û hwd, wê derkeve li pêş. Her wisa, di vê çerçoveyê de wê ahengekê di nava jiyana bajêr ku weke ku heta roja me di Kurdî de tê ser ziman ´jiyana deştê´ û jiyana dervî bajêr ku dîsa heta roja me di Kurdî de bi navî tê ser ziman ´jiyana zozana´ wê hebe. Ev jî, wateya xwe di jiyana koçeriyê de dibînê ku van herdû lingên jiyanê ên şariştaniyê bi hevdû re di ahengekê de bi rêve dibêt.

Rewşa Mîtanniyan, ji aliyê fahmkirina pêvajoyên pêşketina hemdem ên şariştaniyê ve divê ku mirov wê, hilde li dest û fahm bike. Her wisa, ji aliyekî din ve jî, ew a ku mirov dikarê wê hilde li dest û fahm bike, ew a ku ji aliyê civatîtiya dîrokî ve ku ew di dewamiya wê de ku ew pêşketina xwe dijîn e. Rastiya mitanniyan, divê ku mirov di çerçoveya destpêka pêvajoyên hemdem ên şariştaniyê de bi teybetî hilde li dest. Her wisa ji aliyê ziman, têgihiştin û felsefeya wan ve divê ku mirov hilde li dest. Serdema Mîtanniyan, li vir, divê ku mirov gotineke din jî di dewama wê de bo wê werêne ser ziman. Ew jî, ew a ku Mîtannî, wê di dema xwe de weke ku çawa ku gûtî û qasîtiyan û piştre hûriyan di dema xwe de kir û desthilatdariyek giştî li herêmê pêşxstin û bi wê serdestiya xwe li herêmê avakirin, wê ew jî di wê çerçoveyê de bi wê re bikin. Mîtanniyan, welatekî mazin û xort li herêmê avakirin.

Pêşketina Mîtanniyan, wê li herêmê weke pêşketinek giring bê. Her wisa pêşketina wan ya civatî ku wan pêşxist, wê bandûrê li pêşveçûnên dema wan û ên piştî dema wan jî bikin. Mîtanniyan, ew desthilatdariya ku avakiribûn, di wê de cih dabûbûn hemû êl û aşîrên xwe xwe. Her wisa, wê xelkên din ên li herêmê ên weke babilî, elamî, asûrî û hwd jî wê ew jî di nava wê konfedeliya mitannî de cih bigrin. Desthilatdariya Mîtanniyan, wêser çarşad salî re wê hebûna xwe hebûna xwe bidomenê. Lê bi wê re jî, hin bi hin li herêmê û desthilatdariya Mîtanniyan rastî hêrîşên etiyan were. Pêvajoya hêrîşan wê bi demê re etiyan ku didomê, wê demek dirêj bidomê. Her wisa piştre jî ku dem tê sedsala 12´min a berî zayîna îsa, wê hêrîşên asûriyan jî li desthilatdariya Mîtanniyan bibin. Welatê Mîtanniyan, wê di pêvajoya van hêrîşan de pirr zêde wê zirarê bibînê. Herî zêde di dema keyê Mîtannî key Tuşratta de wê ew hêrîş zêdetir bibin li desthilatdariya Mîtanniyan. Di asta dawî de dema ku bi sr van pêvajoyên hêrîşan de ku desthilatdariya hîtîtan dihizirê ku desthilatdariya Mîtanniyan ji wan hêrîşan zayi bûya û ku ew hêrîşê wê bike wê karibê wê têk bibe û pê de, wê ew jî bike ku hêrîşna li herêmê bike. Ev hêrîş, wê waletê Mîtanniyan werêne ber tûnabûnê. Li herêmê qasîtî li dora zagrosan, wê sînorê xwe zant bikin û bikin ku xwe ji hêrîşan rizgar bikin. Li dora diclê jî, desthilatdariya Gûtiyan ku weke desthilatdariya ´mezra-bota´ jî dihê bi navkirin, wê pişta xwe bide çiyayê cûdî û bike ku xwe biparêzê. Hûrî û Mîtannî jî, li rojavayê Kurdistane roja me û heta ber firatê û amedê û rehayê ku weke navende wan a, wê di wê de hewl bidin ku xwe û desthaldariya xwe biparêzên.

Li herêmê di vê demê de ahengek nû ya desthilatdarî hin bi hin derdikeve li holê. Welatê Mîtanniyan, bi hêrîşan weke ku hatiya dorpêçkirin. Hêrîşên etiyan ji aliyekî ve û piştre ku hêrîşên Asûriyan jî li wê zêde dibin, wê rewşa Mîtanniyan bikina rewşek pirr xirab de. Mîtannî, di dema xwe de ji ber çemên diclê, firat û heta û heta ku digihişt ber çiyayên torosan, di qadeke mazin de li giştiya Mesopotamiya û anatolia wê serdest bibin. Li Anatolia, pêşketina serdestiya hîtîtan, wê li herêmê temenê pisgirêkan bê. Lê ev demên dawî ên weke sedsale 10´min û heta sedsale 9´min û hwd, wê li herêmê hin bi hin hîtîtî jî li herêmê weke rêveberiyek welatî a herêmkî bimênin. Wê wê hêza xwe li herêmê winda bikin. Li herêmê, dem bi dem asûrî xwe didina diyarkirin. Lê asûrî jî, heta ku ew ji aliyekî ve bi xelkên din ên herêmê re têkiliyê nedênin û hevkariyekê bi wan re çênekin, wê nikaribin serdest bibin. Teybetiyek xwe bi rêveberiyên herêmê re dide diyarkirin. Li şûna ku hebûna xelkên herêmê nas bikin û bi wan re di çerçoveyekê de li herêmêê pêş bikevin, wê bikin û bixwezin ku hemû xelkên din ên li herêmê bikina bin sehêt(´kontrol´)a xwe de. Ev jî, wê ji aliyê xelkên herêmê ve newê herê kirin. Ya ku wê êdî bike ku ew desthilatdarî li herêmê xwe di nava şerpevçûnan de bibînê wê ev rastî bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Mîtanniyan û berî wan qûtî, qasît û hûriyan ev rastî fahmkiribûn. Wan hertimî rêveberiyên xwe di çerçoveyek ´konfederelî´ de pêşxistina. Ji ber ku hem weke civat, di nava wan bixwe de jî êlî û aşîrî hebû û diviyabû ku wê esas bigrin û hem jî divîbyabû ku xelkên din ên herêmê bi hebûna wan re nas bikin û wan jî esas bigrin. Di vê çerçoveyê de wê li herêmê rewşek, bi vî rengî wê xwe bide diyarkirin. Di nava wê rewşa weke ya ´konfederelî´ de ku kengî hêzekî serê xwe dirakir û dikir ku serdestiyê û sehêtê li ser serê xelkan çê bike, hingî wê bûba sedem û temenê şer û pevçûnan li herêmê. Her wisa li vir, ev rewş, wê di demên berê de jî xwe bide diyarkirin. Li vir, li ser xate civatî ve di dewama vê rewşê de me divê ku vê jî werênina ser ziman ku li Kurdistanê û ankû Mesopotamiya, rewşa civata Kurd, wê hertimî xwediyê teybetiyek ku em divê ku li vir werênina ser ziman bê. Ew teybetî jî, wê di vê çerçoveyê de ew rewşa wan ya êlî û ankû aşîrî, wê ji wan re di gelek wan de bê temenê gelek derfetên demkî ên desthilatdarî jî. Her wisa, rewşa wan di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev rewşa xate civatî a civata Kurd, wê di vê çerçoveyê de watedar bê. Piştî serdemên duyenin ên sûmeriyan û pê de, wê gûtiyî serdema wan bi ya aqadiyan û hwd re destpê bike. Şer û pevçûnên wan ên bi aqadiyan re wê, li herêmê wan bike desthilatdar. Lê li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku weke êlî û ankû aşîrî ku bi konfederelî´ ku bi Gûtiyan re dijîn, ku mirov ji derve li wê dinerê weke desthilatdariyek bi navendî dihê li berçav û ku mirov diçê nava wê, mirov rastî gelek navendên wê yên piçûk tê, wê di vê çerçoveyê de rewşekê bide li berçav. Li vir, rewşeka ku dihê li berçav ew a ku bi demê re çendî ku dem bi dem navenda giştî bêdeng ma û weke ku lawaz ma, wê di tihêl û keviya wê de desthilatdariyên nû ji wan êl û aşîrên wê bilind bibin. Di demên

destpêkê de weke desthilatdariya xanadanên Uriyan. Piştre jî, desthilatdariya lolo, qasîtan û hwd, wê di vê çerçoveya hebûna Gûtiyan û serdema wan de bibê.

Çendî ku di ancama hêrîşên mazin ên ku tên ser herêmê de gûtiyî û bi wan re qasîtî, wê dema wan were bertûnabûnê û piştre dema hûriyan di dewama wan de destpê bike, di vê çerçoveyê de wê weke serdestiyek civatî ku dem bi dem desthialtdariya li gorî demê û pêşveçûnên wê ên bi aqil û zanebûnê ku di afirênê wê xwe û rengê xwe bide diyarkirin.

Rewşa hûriyan û bi wan re ya Mîtanniyan, di vê çerçoveyê de wê di çerçoveya rengekî pêşketî ê demê de bê. Mîtanniyan welatek hemdem ava kirin. Têgîna ´hemwelatîtiyê´, wan di welatê xwe de wê ”hanîgalbatle” wê pêşbixin. **Hanîgalbatle**´, hemwelatiyên azad dihêne ser ziman. Bi wê re jî wê weke çîna serdest a rêveber ”marî-annu” wê hebe. Ev jî, di nava wê de ´leşker, oldar û rêveber´ hena. Lê çîna bi navê hanîgalbatle´, wê di çerçoveya hemwelatiyên azad ku xwediyê hemû mafê na di nava wê welatê de. Her wisa bi wê re jî, biqasî ku mirov ew nivîsa bizmarî a ku navê ”nuzî” li wê hatiya kirin û di derbarê serdema Mîtanniyan de gelek agahiyan dide me, di wê de behsa çîneka sêyemin a bindest ku neazad lê ku bi tememî bi çîna serdest a bi navê ´mar--annu´ ve girêdayî ya, behsa wê jî dike. Rewşa vê çîna sêyemin ku behsa wê dihê kirin jî, çendî ku ne zelal jî bê, hinek lêkolînvan, weke çîna ´koledar´ wê bi nav dikin û dihênina ser ziman.

Mitannî, di vê çerçoveyê de weke welatekî bi destûr ku xwediyê zagon pp destûrên xwe yên rêvebirinê ye. Divê çerçoveyê de mirov, bi wê re û bi rewşa wê re rastî rewşekê tê. Rewşa desthilatdariya Mîtanniyan, bi aqilê xwe re li pêş e. Her wisa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku desthilatdariya Mîtannî, wê ji sedsale 9´min û 8´min û pê de, wê rastî gelek hêrîşên ku ew bi wan tê bertûnebûnê jî wê werê. Lê Mîtannî, weke kalkên xwe gûtî, qasît û hûriyan, wê desthilatdariya xwe ya ku avakirin û destûr û zagonên xwe yên ku nivîsandina, wê bi wan karibin ku xwe û hebûna xwe bidina domandin. Li vir, weke gotinekê em divê ku wê, werênina ser ziman ku Gûtiyî, di dema xwe de xwediyê bineterên nivîskî ên destûrî û zagonî na. Di serdema navîn a Gûtiyan de di dema qasîtiyan de babilî, wê vê rewşê baş bixwênin. Bi teybetî, keyê babilî Hamûrabî, wê vê rewşê baş bixwênê û ji wê jî gavê biavêje û wê destûrên xwe yên nivîskî binivîsênê û pêşniyarî Yazdan enlîl bike. Her wisa, di vê çerçoveyê de ev rewş, wê piştre di dema hûrî û Mîtanniyan de jî xwe bide diyarkirin.

Lê li vir, berî ku em cardin vegerihina dema Mîtanniyan, li ser dema Gûtiyan û qasîtiyan û pêşketiye wan a destûrî, em divê ku hinekî din rawastihin. Ev, wê di derbarê pêşketina wan ya biaqil û zanebûna wan de jî wê aqilekî bide me. Her wisa, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku bajar-welatên demê ên weke lageşê, divê ku mirov li vir navê wan bi teybetî bibîr bixe. Ji aliyê têgînên xwe yên destûrî û bi zanebûna xwe re weke bajarên ku

wê pirr zêde derkevina li pêş bin. Babil jî, wê van ji xwe re weke minaq bigrê. Her wisa, li lageşê, keyê lageşî, bi destûr û zagonên xwe dijîn. Hertiştê xwe li ser wan destûrên xwe re dikin. Tevgerên civatî jî, ku li ber wê pêş dikevin, wê ji nava wê civatê li ber wê ya key pêş bikevin. Her wisa, li Lageşê rewşa ku mirov rastî tê, ew a ku rewşek giring e. Weke ku çawa ku di nava Kurdan ku heta roja me, navê wî hatiya ´kawa´ û berxwedana wî, rewşek bi heman rengî mirov li lageşê bi rewşa Urugakîna re rastî wê tê. Urugakîna, weke pîr û ankû mirovekî ji nava gel e. Keyê lageşê, zilmê li xelkê dike. Malê wan ji wan distênê. Urugakîna, li ber wî serî radike û biser dikeve. Piştî ku bi serket jî, wê destûrên xwe yên nivîskî binivîsênê û wê bi xelkê bide herê kirin. Her wisa binetera nivîskî a ku Urugakîna nivîsandî, hinek beşên wê ku bi nivîsên bizmarî hatî nivîsandin, wê heta roja me, were. Ji wan beşên wê ên ku mana roja me, mirov, fahm dike ku bi destûrî Urugakîna li hemû aliyên jiyanê hizirî ye. Her wisa, têkiliya mirovan a bi hevdû re, rewşa malbatê, têkiliya zaro, dêûbav a bi havdû re, nêzîkatiya desthilatdar û ankû rêveber wê çawa bê ji xelkê re, hemûyan xal bi xal wê di wê de binivîsêne û werêne ser ziman. Ev rewşa Urugakîna û destûrên wî, wê di dîrokê de weke destpêka pêvajoyek nû ya civatî û pêşketna wê jî werina hanîn li ser ziman. Piştre jî, wê li ser wê temenê ku Urugakîna bi destûrî haniya ser ziman, wê jiyan pêşbikeve li lageşê. Piştî **Urugakîna**, ku bi demeke ser dused salî re wê **Gueda-ensî** derkeve û wê bineterek nivîskî binivîsênê. Ev binetera nivîskî a Gueda-ensî, piştî ya Urugakîna re weke bineterek nivîskî a dadî û destûrî ku di çerçoveya rewşek xwenûkirinê de ku piştî ya Urugakîna hatî hanîn li ser ziman wê were bibîrhanîn.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ev rewşên bi vî rengî wê zêdetir werina ser ziman. Bi di dema Gûtiyan de, ev rewşên nivîsandina bineterên nivîskî ên dadî û destûrî, wê zêde bibe. Bi demê re bineterên ku hatina nivîsandin, wê li wan ên nû ku tên nivîsandin wê werina zêdekirin. Minaq di dema xanada Urî de ku di dema Key Urnammû de ya, key Urnammû wê di çerçoveya jiyana ku dijîn li dora parastgehê, wê zagonên xwe binivîsênê. Her wisa wê jiyanek civatî a bihevdû re bi wan xelkên xwe re temenê wê bi awayekî ´komînalî´ jî wê werêne ser ziman. Zagonên key Urnammû, wê di derbarê rengê pêşketina demê de têgîneka baş bidina me. Her wisa, piştî serdema duyemin a sûmeriyan û ankû di dawiya dema sûmeriyan a duyemin de wê ev zagonên nivîskî, wê temenê pêşketinek civatî a jiyanî a bi hevdû re biafirênin.

Piştre jî, heta ku dem tê dema hûriyan, di vê çerçoveyê de wê dem bi dem bineterên nivîskî ên bi têgîna dadî û destûrî ku dihên nivîsandin wê hebin. Her wisa, dema hûriyan, wê demek pêşketî a civatî di vê çerçoveyê de li ser wê temenê pêşketî ên bûhûrî re di dema xwe de birêxistin bike. Rastiya hûriyan, di vê çerçoveyê de wê gelek tiştan bi me bide fahmkirin.

Piştî hûriyan wê Mîtannî di van waran de pêşketinek zêdetir li pêş bi xwe re bidina çêkirin. Wê jiyana xwe dewlemendtir bikin. Wê jiyanek bi reng pêşbixin. Ji aliyê aqilî ve zaneyên weke Mîtra, wê di dema wan de derkevin û wê hizrên xwe werênina ser ziman. Mîtra, di aslê xwe de weke ku çawa ku piştî wî ku Zerdeşt tê û serdemek nû bi dema Mediya re dide destpêkirin ew jî biheman rengî wê bi dema xwe ya Mîtanniyan re bide destpêkirin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê Mîtra û hizrên wê, biawayekî zelal bi rengekê aqil ê felsefeyê re bi zelalî werênina ser ziman. Piştî Mîtra re wê Mîtannî, tevî ku dem bi dem li wê gelek hêrîş hena jî, wê demek xwe ya zêr bijî. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastiya wî bi dema wî re werêne ser ziman.

Ji sedsale dawiya 8´min û pê de, wê li herêmê rewşên din ên weke ya Xaldiyan û ankû ku weke ku di roja me de behsa wan dihê kirin wê ´urartûyî´ derkevina li holê. Ew jî, wê di destpêkê de li hine bajarên Mesopotamiya ên li berçemê xabûrê û heta ku digihijê berçemê diclê, wê bikin ku wan serdest bibin. Xaldî(´xaldî´,ku bi navê ´kaldî´ jî tê bi navkirin, navê Yazdanek mazin bû), wê ji ber diclê û heta ku herêmeka li nêzî herêma ûrmiyê wê li wê serdest bibin. Lê wê nikaribin, nêzî herêmên zagrosan bibin. Hê jî, li zagrosan, êl û aşîrên qasîtiyan hena û li wan herêman jiyanek ji xwe re avakirina û bi wê dijîn. Bo vê yekê dikin ku bi aliyê bifiratê û torosan de werin. Ew jî, wê bi desthilatdariya navendî a Mîtanniyan re bikevina şer de. Her wisa, heta wê demê de jî, ji herêma Reha, Afrîn Anteba roja me û heta Meletiyê wê li wê xwediyê desthialtdar in. Xaldî û ankû urartûyî, dema ku dibînin ku wê nikaribin bi şûn ve bi ber zagrosan û wan ve herin, berê xwe didina van herêmên desthilatdariya Mîtaniyan. Xaldî û ankû Urartûyî, wê bi êl û aşîrên herêmê ên Kurd û babilî re jî têkiliyê dênin û wê weke ku berê çawa bûbû, wê di çerçoveya konfedeliyekê de wê bikin ku bijîn. Di çerçoveya wê konfedeliyê de wê bijîn. Xaldiyî, ji Asûriyan, ditirsihin. Bo vê yekê, bi tenê jî, di zanin ku wê nikaribin xwe li hemberî seferên asûriyan li ser lingan bigrin. Êdî ew jî, di vê çerçoveyê de têkiliyê didênin.

Rewşa Xaldiyan, ne wisa xorta e. Lê piştî ku xanadana Mîtanniyan a li dora Meletî(`**melîde**´) ku ew jî xwe tevlî wê konfedesyona ku Xaldiyan û ankû Urartuyan kir, wê weke ku rewşek xort bi wê konfederesyonê re derkeve li holê. Ev rewşa xanadana Kurd a meletî ku tevî wê bû, wê rewşa desthialtdariya navendî a Mîtanniyan jî lawaz û zayif bike. Lê Xanadana Kurd, naxwezê ku rastî hêrîşên mazin were û axa xwe û mirovên xwe winda bike. Ji ber van sedeman wê tevlî wê konfederesyonê bibe. Bi wê re jî, gelek êl û aşîrên din ên ku bi wê re ji heman kokê na û Kurd in ku di nava wê konfederesyonê de hena, wê ji aliyekî din ve rewşa wê xorttir bike. Xanadana Kurd a Medî jî, di vê çerçoveyê de xwe nêzî wê konfederesyonê dike. Her wisa, di çerçoveya alikariya hevdû bikinde bi leşkerî ku li hemberî hêrîşên asûriyan ku li wan bibin, wê peymanna jî bi hevdû re çê bikin. Ev rewş, çendî ku wê ji henek aliyan ve wê alî xaldiyan bike, bi wê re jî wê alikariyek mazin jî bide xanadana

Kurd a Mediya. Ji xwe, bi tevlî wê konfederesyonê bûna çend xanadadên Kurd ên weke li meletiyê û hwd, wê rewşa wan li wir jî xorttir bike. Di vê çerçoveyê de ev rewş, wê bi awayekî weke ku êdî ji nû ve herêm were dîzaynkirin, wê di wê çerçoveyê de li ser têkiliyan re wê rewşekê werenê li holê.

Di dema di sale 764´an hatina li ser taxt a key **Sardurê duyem** li şûna bavê xwe key Argiştiyê yekem, wê weke destpêke demekê bê. Di vê demê de asûrî, hêza wan hinekî kêm bû û lawaz bûn. Sardûrê duyem, vê lawazbûna wan ji xwe re weke fersandê dibînê li nava axa aşîrên ku tevlî wê konfederesyona ku avabûyî ku bûna seferekê dike. Di vê çerçoveyê de seferê li meletiyê jî dike. Ev rewş, wê bê sedema pirr nexweşiyan di nava hemû aşîr û xanadadên din ên di nava konfederesyonê de. Di aslê xwe de ev rewş, wê weke rewşeka ku mirov dikarê weke destpêka bi berjêr de çûyina wê konfederesyonê jî mirov dikarê werêne ser ziman. Piştre, xanadanên Kurd ên weke ên meletî a Mîtanniyan û her wisa ên li herêmên din bi aşîrên xwe ve wê xwe li dora xanadana Kurd a Mediya bicivênin. Wê xwe zêdetirî nêzî wê bikin. Ev rewş, wê bê sedema ku medî êdî derkevina li pêş. Di aslê xwe de serdema Mediya, wê êdî destpê bike. Asûrî, wê vê rewşê weke ji hevdû belavbûna wê konfederesyona xaldiyan û ankû urartûyan jî bixwênin û w seferna li herêmê bikin. Piştî ku sefer li herêmê hatina kirin. Vêcarê, wê hemû êl, aşîr û xanadanên Kurd û her wisa a babil û ku ya urartûyan jî tevlî wê dibê, wê bihevdû re bikin ku li hemberî wan seferên asûriyan bisekin in. Ev jî wê, bi serkevtina wan re biancam bibê. Di ancama wê serkevtinê de wê konfederesyona Urartûyan a di bin serkêşiya key Sardûriyê duyem de wê xort nebê. Vajî wê, wê Medî xort bibin û derkevina li pêş. Vê carê, wê êdî konfederesyona Mediya derkeve li pêş ku di pêşengiya med û babiliyan de ye. Lê tevî wê jî, asûriyan di sefera xwe de derbeyek li desthilatdariya urartûyan dan.Bajarên weke ên Wan´a roja me, wê ji destê wan bigrin û bikina bin sehêta xwe de. Ev windahiyek mazin bû bo urartûyan û dewra wan. Piştî wê re wê med û babilî derkevina li pêş. Piştre Kurd û babilî bo ku rewşa xwe xort bikin, wê xanadanên Mîtanniyan ên weke ya meletî û herêmên din ên rojavayê Kurdistane roja me, wê bidest tevlîbûna li nava wê konfederesyona Mediya bikin.Bi wê re wê, wê weke ku hêzek û desthilatdariyek nû ya herêmî wê derkeve li holê. Asûrî, dema ku vê rewşê, wê rewşê dibînin bi pêşketina Mediya û desthilatdariya Mediya re wê, bihizirin ku ew weke ku werina dorpêçkirin wê li wan werê. Bo vê yekê, wê bidest hêrîşên li xanadanên Kurd ên medî û Mîtanniyan bikin. Li hemberî vê, ku desthilatdariya Mediya weke desthilatdariyek navendî ya, wê stretejiyên xwe yên bersivdayînê pêşbixe. Bi wê re jî, wê artişa Mediya, ji gelek aliyan ve bi awayekî birêxistinkirî wê her bi navende Asûrî Mediya û herêmên din ên ku ew li wê serdest in. Ev rewş, wê piştre biserkevtina Mediya û hêzên Mediya re bi ancam bibe. Medî, wê serkevin û wê êdî bi wê re li herêmê dewra wan destpê bike. Bi wê re jî Mediya, wê bi desthilatdariya xwe re weke hêzek ku Mesopotamiya jor û jêr

ku dike bin sehêt(´kontrol´)a xwe de wê bibe hêz. Piştre jî, wê berê xwe bide herêmên din ên li dora xwe. Ji rojhilat ve, wê heta bi ber bahre hûrmûz wê herê. Ji aliyê rojava ve jî, wê hemû herêmên ku berê desthilatdariya Mîtannî li wan serdest bû, wê li wan serdest bibe. Xanadanên Mîtannî ên herêmî ku serdest din, di pêşengiya çîna xwe ya serdest de wê tevlî Mediya bibin. Bi wê re jî, êl û aşîrên **qasîtiyan** ku heta wê demê jî li dora zagrosan hebûna xwe didomênin û civatek hemdem li wan herêman avakirina, wê ew jî di bin banê desthilatdariya Mediya de wê desthilatdarî û rêveberiya xwe bi jiyana xwe re bidina domandin.

Medî, wê di vê demê de serkevtinên mazin bidest bixin. Wê li piranniya Mesopotamiya jêr û jor serdest bibin. Xanadanên Kurdan ên weke yên Mîtanniyan, xanadanên mezra-bota, qasîtiyan û gelek xanadanên wê tevlî wê bibin. Bi wê re jî, Keyê Xaldiyî û ankû Urartûyî, dibînê ku medî bûna hêzek pirr mazin. Ew jî, bi wan re wê êdî tevbigerihê. Wê di bin sêwane Mediya de di nava wê konfederesyona Mediya de cihê xwe bigrê. Ev rewş, wê ji aliyekî din ve wê êdî wî bihêz bike. Wê ji wî re bê temen ku karibê hêza biparêzê. Di wê demê de hêrîşên kîmeran ên li herêmê, wê zêde bibin. Desthilatdariya med, ji urartûyan dixwezê ku sînorên xwe sînoran biparêzê ku kîmerî karibin wrina hundûrê wan û xirarê bidina wan. Di vê çerçoveyê de di xadeke mazin de wê urtatûyî bi alikariya Mediya li hemberî wan bikevina tevgerê.

Ev rewşa Ûrartûyan, wê piştî **Sardûrê duyem** bi kurê wê key **Rusayê yekem** re jî wê bidomê. Key Rusayê yekem, wê ji wê alikariya Mediya sûdbigerihê û heta ber bahra hazarê jî wê karibê herê. Rêveberiyên Mediya, di farqê de bûn ku telûkeyên din din tên li pêşiya wan. Bo vê yekê, dixwestin ku xwe ji wan hêrîş û belava kîmeran rizgar bikin. Hêrîşên kîmeran, wê ne tenê hêza artişa ûrartûyan lawaz û zayif bike, her wisa wê bi wê re hêza artişê med jî ji hin aliyan ve lawaz bike. Dema ku ji gelek aliyan ve bi awayekî hovane hêrîş dikin, wê ji gelek çenga ve artişa Mediya xwe rast bike ku herê pêşiya wan û karibê axa û warê biparêzê. Ev jî, wê di navendê de hêza Mediya kêm bihêlê ku desthilatdariya wan ya navîn karibê biparêzê.

Kurê key Sardûrê duyem key Rusayê yekem, li şûna ku wê bi hevdû re wê xwe ji wan hêrîşan weke ku bbi peyman kiribûn, wê xwe xilas bikin û êdî bi hevdû re di aşîtiyê de tevbigerihin. Ew devera ku diçûyê de wê hewl bide ku bike bin desthilatdariya xwe de. Vê rewşê medî, weke ku di nava dû agiran de hişt. Keyê Urartûyî key Rusayê yekem di sale 715´an de wê, tenê di rojekê de ser 23 deverên herêmkî ên bike bin sehêta xwe de. Ji vê rewşê, êdî medî biêmînî fahmkiribûn ku key Rusa ne tenê li pey sekinendina hêrîşên kîmeran ên tên li ser herêmê ye. Bi wê re jî, her devera ku bi hêzên xwe re diçiyê de weke herêmên ku kirina bin sehêta de dibînê û xwe weke keyê wê di denezênê. Vê rewşê ji gelek aliyan ve wê hêza Mediya jî lawaz bikira.

Di heman demê de asûr jî xort bûya û cardin bi serxwe ve hatiya û seferan li herêmê dike. Bi wê re hêzên asûr, dema ku dikevina hêrîşan de li herêmê wê

derbeyna mazin li hêzên medî bixin. Bi awayekîxwezayî dema ku medî derbeyê dixwûn, wê hêzên key Rusayê yekem jî nikaribê li hemberî Asûran bisekinê. Di heman salê(´715´an) de wê keyê Urartûyî key Rusayê yekem wê artişa wî bi artişa Asûriyan re rastrast were û wê bikeve şer det. Di şer de wê têkherê. Heta ku key Rusayê yekem jî wê li qada şer ji aliyê artûsa Asûr ve were kuştin.

Di vê rewşê de wê wisa lê were ku weke ku artîşa medî ya Urartûyê jî li hemberî hêzên Asûrî şikeştin xwaribê wê lê were. Lê wê dîsa karibin xwe li ser lingan bigrin. Her wisa, bi wê serkevtinê re wê asûr, ji nû ve bê hêzek li herêmê. Keyê Asûrî Sargonê duyem wê serdemekê bi wan serkevtinên ku bi dest dixê re wê bi wê bijî. Piştî wî re wê kûrê wî Senherîb û newiyê wê Esarhaddon, wê demên xwe yên desthilatdarî li herêmê bijîn.

Piştî wê rewşê re li ser wê têkçûnê Urartûyan peymanek bi asûriyan re çêkir ku karibin desthilatdariya xwe biparêzên.Asûriyan, di wê çerçoveyê de dixwezin ku bi wê peymanê ji wan sûdbigrin. Yê ku wê vê peymanê mohr bike wê keyê Urartûyî kûrê wî Agriştê duyem bû. Agriştê duyem, di wê demê de jî li hemberî pêlên hêrîşên kîmeran ên nû dikeve şer de. Wê di sale 707´an de wê serkevtinê li hemberî kîmeran bi têkbirina wan re bidest bixe. Ev jî, wê bê temen ku Agriştê duyem ku herêmên nû bike nava axa desthilatdariya xwe de. Di vê rewşê de Agriştê duyem, hêza xwe ji nû ve weke ku afirand. Medî jî, wê di demê de cardin bidina xwe ku hêza xwe li hevdû bidina hevdû. Hingî, di destpêka sedsalê de di sale 702´an û ankû hinekî din bi virdetir, wê hemû serokên xanadanên medî ên Kurd hemû wê li hevdû bicivin ku keyekê ji nava xwe derxin ku li ser serê wan bê. Wê civîna civata medî were li darxistin. Piştre, wê di biryarê bidin ku herin û Diyako, werênin û dênina ser serê xwe weke key. Diyako, hem bi zanebûna xwe, hem bi hûnere xwe ya şer û hem jî bi mazinahiya xwe pirr zêde pêşketî bû. Weke zanyarekî civatî jî di nava civatê de pêşî kar dikir**. Heredot, di pirtûka xwe ya bi navê ”dîrokê” de dihêne ser ziman ku ”Diyakos, dema ku hemû şêwîrmendên civata med serî li wî dixin ku ew were serserê wan, ew bersivê dide wan û ji wan re dibêje ku ”ez dixwezim ku xwe bidna pêşxistina civaknasiya civatê.”** Diyako, wê bê mirov û keyê mazin ê ku wê baxtê Mediya jî, baxtê urartûyan jî û baxtê asûriyan jî ku ji nû ve bide diyarkirin bê. Wê Diyako, di dawiya dawî de herê dike ku ew bibe key li ser serê desthilatdariya Mediya. Êdî wê dema wî dest pê bike. Ji vir û pê de, pirr zêde giring dibê ku em hinekî rewşa vî keyê mazin ku wê baxtê herêmê û xelkên herêmê ji nû ve bide kifşkirin hildina li dest û fahm bikin. Weke ´”keyê zane diyakos” ku nav li dîrokê hiştiya diyako, wê desthlatdariyek mazin di bin desthilatdariya Mediya de ava bike û wê Mesopotamiya jor û jêr bike bin desthialtdariya xwe de. Wê sînorê Mediya heta Asya dûr wê bibe. Urartûyî jî û asûrî jî, wê piştre di bin desthilatdariya wî de hebûn û rêveberiya xwe bidina domandin.

...

**Hatina ser taxt a ”keyê bi zane” key diyakos, serdema wî, pêvajoyên wî ên ji nû ve avakirina desthilatdariya Mediya û serdest kirina wê li herêmê**.

Welatekî ku weke welatê Mediya ku xweş û bedew, ma ka li ser rûyê ardê hebû? Yazdanê mazin dizanê ku nebû. Li welêt, jiyaneka ku di asayiya xwe de diharîkî û diçû jî hebû. Di wê jiyanê de wekhevî û xweşî bi hev re biwate bûn. Mediya, Dîroka wê, ku tê nivîsandin, tê gotin ku di naqabîna 612´an û heta ku digihijê 550´an avabûya û xûrûhaya. Lê divê ku ez bibêjim ku Mediya, berî vê dem û dem, ser sadan salan re jî dîrokeke wê ya ku ku mirov wê kifş bike û bêne ser ziman hebû. Mîtra´yê ku di dema Mediya de jî çanda wî bi bandûrî hebû, di dema Hûriyan de bi navê "Mitra” û ankû «<Mi-it-ra-aš-ši>" hebû. Mediya, Keyê wê yên ku xwe weke Yazdanan mazin didîtin, dem li ser demê û dewran li ser dewranê kiribûn. Lê demeka pirr dirêj jiya bûn.

Mediya, jiyana wê di wê demê de, divê ku mirov ji wê jî bi çend gotinan di serî de bahsê bike. Mediya, di wê demê de, jiyaneka wê ya rûniştî û ku di xwe de bitêgihişti hebû. Di nava jiyanê de ku weke pêşavan û serokna rêzanî û oldarî hebûn, rêmildar û oldarên wan yên bi nav û deng hebûn. Wan, di nava xwe de, jiyan û hemû tiştên ku têde hebûn bi wate û salixkiribûn. Bi vê yekê, divê ku ez bibêjim ku Wan rêmildaran, aqilekî mazin jî afirandibûn. Azman û stêrên ku lê hebûn, salixkiribûn. Heta ku bi wan rê jî naskirin. Di dema ku di rêyekê de diçûn, wê li wan bineriyan û di rêya xwe biçûyan. Êdî wê wan rêya xwe şaş jî ne kiriba.

Di nava wê jiyana pêşketî û xweş û weke bihûşt de, mazin û serekên civatî ên weke Diyaqo jî hebûn. Ew, mazinekî Kurd ê wê demê bû. Li dora wî êla wî û bi wê re jî pirr êlên din lev gihiştibûbûna hevdû. Diyaqo, yekî ku di rêya Hûrmûz de dimeşî bû. Bi zanî û têgihiştinî, Mediyaliyan bi Hûrmûz re qancî, başî û ya rast salixkiribûn û hanîbûn ser ziman. Lê ku weke birayê Hûrmûz jî dihat ser ziman Ahrîman, bi wî re jî ne başî zilm û zordarî û xirabî hatibû salixkirin. Herdû jî zaroyên Zerwanê yanê ’*dewrana mazin’* bûn.

Diyaqos, di wê rêyê de dimeşî. Wî xwe dabûbû aliyê başî û qanciyê û têde dimeşî. Li ser wê re jî, ew di serê xwe de bûbû bû xwediyê zanîn û aqilekî mazin jî. Wî, li dora xwe li jiyana xwe ya ku ew têde dijîn dinerî û li Hûrmûz jî dihizirî û piştre li key û Yazdanên weke Zarastan jî ku dihizirî, wî di serê xwe de xwe digihand, zanîn û aqilekî mazin. Hişekî mazin di serê wî de çêdibû. Di nava xelkê de qancî kirin û bi başî hizirîn û hanîna ser ziman, wî ji nirxdariyeke wê nirxa ku wî jê bawer jî dikir dihanî ser ziman. Ew, weke zaneyekêî mazin, li dora wî hertimî yên û remildar jî hebûn û lev digihiştina li hevdû. Li cem wî diaxiftin û dihanîn ser ziman. Zaneyên mazin mirovên kal ên ku di nava salan diçûn jî bûn. Ku wan jî gotina xwe digot, li wan dihate hisandin. Hizrên wan bibaşî lê dihat lê hisandin. Ew, weke mirovna kal serokna xweza ên civatê bûn ku di nava xelkê de bi aqilê wan mirovan di rêya xwe de dimeşî. Diyaqos, li ber wî di civata wî de zaneyên weke **rûsipî** jî hebûn. Kurê Diyaqos

Firortîşî jî li cem wî bû. Ew jî, hertimî li civata xwe bavê xwe û zaneyên li dora wî ku diaxiftin bû. Wî jî, li wan dihisand. De ne, di nava xelkê de weke gotineke ku bi kevneşop bû ku dihate gotin ku ”mirov li civata mazinên xwe ku lê rûnişt, divê ku lê bihisêne ku ka ew çi û çawa dibêjin”. ”Divê ku wê fahm bikin”. Piştre bi ser ve jî dikirin ku ”yên ku biaqil in, li civatê dirûnihin.” ”Lê yên ku li civatê rûniştin û aqilek di serê xwe de girtin jî, ew jî, êdî biaqil dibin.” Bi vê yekê û rengê, civat weke cihna bixwezayî ên ku mirovan xwe de perwerde jî dikir dihatin dîtin. Ya rastî jî ew wilo bû. Ji ber vê yekê, li civatê, hertimî mirov li hevdû dirûniştin. Lê dema ku lê dihat rûniştin jî, wê pêşî lê hisandin bibêt. Mirovên ku ciwan bûn, hisandin li wan diket. Lê mirovên ku nawserî xwe jî bûn yanî ên kal bûn, li wan jî axiftin dike. Herkesekê, bi vê yekê û rengê ya ku lê diket jî dizanî. Di civatê, kê wê çi bikira û çawa tevbigeriya, ew ya ku lê diket bû. Bi vî rengî jî dihat ser ziman. Di civatan de, mirov, li gorî ya ku lê diket, tevdigeriya û gava xwe diavêşt. Mirovên zane, gotina xwe ya bi zane, di civatan de dihanîn ser ziman. Ku wan gotina xwe dihanî ser ziman jî, li herkesekê li dora wan ku rûniştî jî diket ku wan pirr bibaldarî û heyîdarî li wan hisandiba û gotina wan gotiba di serê xwe de bigirta. Ku di civatê de gotin carekê hat gotin û mirov jî lê hisand û piştre ku ew gotina ku mirov lê hisand ku di hişê mirov de jî nema, êdî ew mirov bi vî rengî ku ji bîrkirî weke yekî ”bêfahm” û ”nejîr” dihat ser ziman û şîrovekirin. Ji ber vê yekê, tişta ku di civatan de dihat ser ziman, di aqil de girtin jî weke şop û çandekê jî bû. Bi wê re jî, ez karim bibêjim ku weke çandeke civatan jî bû. Ew gotina ku heta roja me jî di nava Kurdan de tê gotin ku ”gotina zane ya di nava civatan de ku hatiya ziman, ti carî nayê ji bîr kirin.” Ev gotin, bi wê re çandek û nirxek bi vî rengî bi wê re dihê ser ziman.

Di civata Diyaqos de jî mirov zane ên weke rûsipî ku hizrên ku xwe dihanîn ser ziman, ti carî ne dihatina ser ziman. Lê di serî de divê ku ez vê bibêjim ku Diyaqos xwe jî yekî ku biaqil bû. Tişta ku wî carekê lê hisand, êdî wî ew ji bîr ne dikir. Ji aqil û hişê wî ne diçû. Bi wê yekê re, ew xwediyê hişekî pirr xort jî bû. Ev aliyê wî jî pirr mazin derketibû li pêş. Ji vî aliyê ve jî pirr behsa wî dihat kirin. Navê wî derketibû. Weke yekî bizane jî navê wî derketibû. Gotineke ku li ser navê Yazdanê mazin ku dihat ser ziman ev bû. Dihat ku gotin ku ”hiş, bixwe jî nasîn û jiyan e”. Ev gotina ku bi qadr û qiymet, di serê Diyaqos de cih û war girtibû. Diyaqos, ew gotin, ji xwe re weke gotineke rênîşan dabûbû nîşandin di serê xwe de. Li ser wê re dihizirî. Di dema ku ew dihizirî jî, li jiyanê, ew pirr dihizirî. Wî li dora xwe hizir dikir. Li dora xwe dimeyîzend. Tişta ku wî didît. Wî di çerçova wê gotinê de qadr û qiymet jî dideyê de. Ji ber vê yekê, ez karim bibêjim ku qadrê jiyanê pirr li cem wan hebû, Bi wê qadrtiya jiyanê re fahmeke wan ya di derbarê wê de jî hebû.

Bi wê yekê Diyaqos,nêzî jiyanê dibû. Diyaqos, bi vê yekê û rewşa xwe re weke yekî têgihiştî û bizane jî dihat dîtin û zanîn. Hemû kesekên ku ew nas dikirin jî ew wilo bi vî rengî nas dikirin. Ew, bi aqilê wî yê di serê wî de nas

dikirin. De ne, divê ku ez bibêjim ku di nava civatê de mirovên kal û ku bizane û ku rêmildar bûn, weke mirovna ku biaqil û ên aqilane ên civatê jê dihatin dîtin. Diyaqos, bi aqilê xwe re hema bêja weke yekî serek ji wan re jî dihat dîtin. Ev yek, ne piçûk bû û ne jî ji rêzê bû. Tiştekî ku mazin bû. Bi vê yekê, di aslê xwe de Diyaqos, weke yekê serek û serok ê civatê bixweza êdî derdikeve li pêş. Navê wî mazin tê bihîstin. Haçiyê ku navê wî dibihîzê jî, bi zanebûn êdî behsa wî bi navê wî re dike. Bavê Diyaqos, jî ku bi gelek navên Yazdanan jî navê wî dihat hildan ji bo wê mazinatiya wî û aqilatiya wî ku navê wî **Firortis** jî navekî wî yê ji wan navê wî yê ku ew bi wê lê dihat bakirin, di wê demê de li ber çûyina xwe xwe li cem Hûrmûz bû. Pirr kal bûbû. Ew, weke keyê mazin û bavê keyan jî dihat ser ziman. Lê divê ku ez bibêjim ku navekî wî yê serek ê din jî Kawî bû. Kawa, navek ji wan navên ku torînên Medî jî ku kurkey jî ba lê dihat kirin bû. Navekî birêzdarî jî ku dihat pêşwazî kirin bû. Yekî ku ew nav bimaf bike, divê ku kurkey û yan jî ji wê şopê ba û her wisa jî diviya bû ku bizanebûna xwe re derketiba li pêş û ketiba wê rewşa ku ew êdî pêşeng û mazinakî serek ê civatê jî bû. Wê hingî, wî jî ew nav bi maf bikira. Firortîs, navê kurê Diyaqos Firortîş ji wê hatiya derhanîn. De ne, weke kevneşopiyekê bû ku ji aliyê kur ve navê bav û mazinên xwe yên bi vî rengî bi nav dayîna zaroyên xwe re hildaba û daba domandin.

Bavê Diyaqos, êdî li ber mirinê bû. Ji xwe piştî ku ew ketibû ber mirinê de, êdî ew demeke dirêj di nava nivînan de jî mabû bû. Di wê demê de jî, yê ku welat bi rê ve biribûn. Aqilmed, şêwirmed û wezîrên wî yên ku li ber destê wî bûn. Diyaqos, heta wê demê jî çend ku bavê wî çi kar dabûbû ber wî ku bike jî û ku kiribû jî, lê dîsan, wî xwe wilo zêde tevlî karê dewletê ne kiribû. Wî, ji aliyekî ve xwe ji wan karan dûr girtibû. Di wê demê de jî, wî hertimî demên xwe yên vala bi zane û aqilmendîn mazin re buhurandibû. Bi wan re jî ketibû danûstandinan de. Ji wan, hertimî aqil girtibû. Bi wê yekê, wî hertimî, aqilê xwe di serê xwe de mazin kiribû. Lê piştre, ku demeke dirêj bi ser ve naçê, êdî bavê Diyaqos jî diçê ber dîlovaniya. Hûrmûz giyane wî dihilde cem xwe. Hûrmûz li cem xwe cihekî didiyê de û wî li wir bicih dike. Di wê demê de jî, şêwirmendên wî, welat, bi awayekî rêk û pêk bi rê ve birina. Ti kêmesî jî, ne hiştina ku were û derkeve. Li welêt, aramî, parastina. Çend hêrîşên hovan ji derve ku bûna jî, wan ew dane bişûndexistin. Êdî bi vê yekê, mirov karê bibêje ku cihê keyê mazin vala ne hatiya hiştin. Ew aramiya di welêt de ya di dema key de ku hebû, piştî wî re jî, hatibû parastin. Lê êdî wê çi bûba? Keyê wan ku miribû, êdî weke ku bêserî mabû bûn. Êdî weke ku bêxwedî mabûbûn li wan hatibû. Her kesek li wê dihizirî. Lê ew bawerî jî hebû ku wê ti pirsgirêk derneketiban jî. Lê ji derve hin rewşên ku rewşa welêt nearam bikin jî hin bi hin weke ku dibûn. Li deverna welêt dibûn.

Piştî ku key çûbû bû ber dilovaniya xwe êdî Rûşayê yekem ku keyê Ûrartûyan bû xwestibû ku herême Wûrmê(Ûrmiyê) hilde û bike bin serdestiya xwe de. Li wir, di dema ku hêza wî bi ber wir ve diçê rastî hêza keyê babîlî

Sarûkê dûyem tê û bi wî re li levdixe. Li wir, ew Sarûkê dûyem keyê Babîlî têk dibe. Ev rewş ji aliyê Mediyaliyan ve jî tê bihîstin û êdî baldarî û heya wan li ser rewşê dide çêkirin. Rûşayê yekem weke Rûşayê kurê Agrîşt jî dihat zanîn, bi Mediyaliyan re di dema xwe de bi aramî biribû sêrî. Lê dema wî ya ku piştî bavê wî re, piştî bavê xwe re wî çavên xwe li tiştna din ên mazin kiribû. Di wê demê de ku ne zêde demeke dirêj jî bû ku bûbû keyê Asûr Şalmaneserê pêncemîn jî dimirê di wê demê de piştî re Tortanu´ ku weke serfermanderek bû di cih de bilez hêzê dihilde li dest li Samariya. Di vê dema ku li herêmê ewqas pêşveçûn dibûn, li ser serê Mediya, yekî weke Keyê mazin windakirina wî, windahiyeke mazin bû ji bo wan. Şalmaneserê pêncemîn, berî ku bimirê, hêza dabû der sînorê Kurdên Gûtî û Mîtanî li herêmên wan.Lê li wir,çend ku hinek şerên wî bi wan re bûbûn jî, wî ti serkevtinên mazin li wir bidest ne xistibûbûn. Lê li aliyê dersînor li dora Damasq(Şam) li wan deran hin deverên ku hata ku digihişt berbahre sipî,cih bi cih serkevtinna ku bidest xistibûn jî hebûn. Li ser vê yekê, Mediyaliyan, weke ku telûka li berderiyê wan bê êdî fahm kiribûn. Di wê demê de, pevçûnên di nava Babîliyan û Asûriyan de jî hebûn. Piştî têkçûna Sarûkê duyem, êdî kurê wî Sanherîb tê dewra wî. Wî jî, şerekî pirr mazin piştî ku hata ser taxt bi Babîliyan re kir. Sanharîb, piştî ku hata ser taxt û babîl têkbir û kira bin destê xwe de piştre kir ku herê û desthilatdarî û serdestiya xwe bigihihijêne aliyê din ê Firatê. Heta wanderan yanî ber Damasq(Şamê) bixwe jî şefer li dar xistin û gelek dever di şûr de buhurand. Mediyaliyan, di wê demê de tenê li van rewşan temaşa dikir. Lê divê ku ez bibêjim. Di sefera xwe de hinek herêmên wan jî kiribûbûna bin destê xwe de. Hinek herêmên wan jî di şûr buhurandibûn. Hê di dema bavê wî Sarûkê duyem de, bavê wî, bi Mediyaliyan re hin pevçûn kiribûn. Tevî ku pirr windahî dabûbûn Medyaliyan jî, lê dîsan, wî nekarîbû ku wan bike bin serdestiya xwe de. Wî nikarîbû ku mazinatiya xwe bi wan bide herê kirin. Lê Sarûkê duyem, bi bavê Diyaqos re di dema ku kiribû ku bikeve nava axa Mediya de li herêmê şerekî pirr dujwar kiribû. Ji gotina tê gotin ku wî şerî bi şev û roja doma. Ard, ji xwûna mirovan têr bû û sor bû. Kevirên li ardê, weke ku di nava kortekna xwûnê de bin man. Di wî şerî de bavê Diyaqos xwe bixwe jî birîndar bû. Birîneke pirr xadar jî girtibû. Lê ew di wî şerî de filitîbû û nemiribû. Piştre jî, tek jî ne çûbû bûn. Bavê diyaqos, piştî ku bi wê rengê birînfar bû, piştre ji xwe êdî demeke dirêj jî ku sax dimenê, piştre diçê ber dilovaniya. Lê ew birinên wî baş jî bûbûn.

Piştî ku Ew çûbû bû ber dilovaniya xwe, Mediyaliyan, 40 roj û 40 şevî şîna wî hatibû girtin. Di dema bavê xwe de Diyaqos, wî dem û valahiya xwe hemû dide xwandin û aqil. Bi zaneyên kal re dima. Hingî wî wilqasî xwe dabû bû zanebûnê jî, piştî çûna bavê wî ya li ber dilovaniya xwe, piştre zane û şêwirmendên qasrê çûbûbûna ber wî ku divê ku ew herê li ser taxt û li dewra bavê xwe rûnihê. Lê wî, di wê demê gotina ku ji wan re gotibû ku ”min xwe daya aqil di rêya hûrmûz de, di şop û kevneşopiya wî de dimeşîm.” Ji vê

gotinê, zane û şêwirmendên qasrê, pirr wate derxistin. Hineka got ku ” ew naxwezê ku bibe key.” Hinekan jî got ku ”ew, bi zanebûna xwe axiftiya û xwestiya ku tiştekî din bibêje.”. Di civatê şêwirmendan de, pirr li ser wan gotinên wî danûstandin di wê demê de bûbû. Piştre şêwirmendên ku biaqil, çûbûbûn hem ew gotinên wî ji rêmildaran pirsîn û hem jî ji wan pirsîn ku çi bikin. Di wê demê de, rêmildarekî pirr pîr û kal û ku navê wî **Zaxûstra** hebû û wî weha ji wan re gotibû, ” herîn, win şêwirmend û zaneyên mazin lev bicivin û civata xwe li dar xin. Agahiyê ji hemû mazinên civatê û serekên mazin ên civatê re bişênin ku werin û bi were li we bi we re rûnihin. Bila ew jî gotina xwe bibêjin. Win êdî paşekê, bi hev re lev bikin. Bi wê levkirinê herin û bakina Diyaqosê ku kurê keyê mazin û ku di rêya Hûrmûz de dimeşê. Ku ew hat bila ew jî li we rûnihê. Hingî, di nava xwe de pêşniyar bikin ku yek, weke serekê we derkeve li pêş û li ser civatê rûnihê û bibe serekê we, Lê win jî li gorî kevneşopiyê dizanin ku Diyaqos, kevneşopiya xwe dizanê û wê hingî ji bicih hanîna kevneşopiya xwe ne ravê. Wê weke bavê xwe êdî derkeve li pêş û wê bibe keyê we yê li ser serê we.”

Wî zaneyê rêmildar û kal wilo ku got, êdî ma sekinî di cihê xwe de. Piştre, rêmildaran jî çûn û wilo kirin. Pêşî civata xwe li dar xistin. Cihê keyê mazin ku wê lê rûniştiba vala hiştin. Li cihê ku vala hiştin. Weke nîmênêriya keyê mazin ku çûbû bû ber dilovaniya xwe tiştek hanîn û danîna li wir. Lê ew der vala ma. Piştre, ew mirovên ku weke serokê civata xwe bûn di nava xelkê de û qadrê wan jî pirr mazin hebû, lev civîn û bi hev re demeke dirêj axiftin. Lê çiqasî axiftin jî nikarîn ku ti bîryarê hildin. Ji ber ku cihê keyê wan vala bû. Piştre hemû mazinên ku li wir rûniştî bûn, di gotinekê de lev kirin û ew gotin weke bîryar dan nîşandin. Ew gotina ku weke bîryar jî ew bû ku ew çend mirovan ji nava xwe bişênina pey Diyaqos ku ew jî were û bi wan re rûnihê û ji wan re bibe serek di wê heyemê de.

Paşê, çend zane û şêwirmend rabûn ji cihê xwe û ketina rex hevdû de û çûn ku herina cihê ku Diyaqos lê dima. Cihê ku di wê demê Diyaqos, lê dima jî male Hûrmûz bû. Ew der, di wê demê de jî tişî zaneyên mazin bû. Ew zane jî rêmildar bûn. Ew di nava wan de weke serokekî wan jî di nava wan de rûniştibû. De ne, di nava zaneyan de, yê ku weke serek di nava wan de derkeve li pêş jî, hertimî diviyabû ku yê ku kal bû û bi zanebûna xwe re ku karîbû ku bersiva pirsên hemû zaneyên li dora xwe bida bû. Di wê demê de, ew jî, weke yekî ku hatibû wê astê bû. Zane û şêwirmendên ku hatibûbûna pey Diyaqos, ku dane devê dêriyê mezele ku ew lê li hevdû rûniştî na, di cih de sileva xwe dana nîşandin û rêza dane nîşandin. Diyaqos, dema ku ew dîtin, êdî weke ku wî tiştek fahm kiribê di cih de, ew hildane berxwe û bi wan re bidest axiftinê kir. Ku Diyaqos, bi wan re bidest axiftinê kir, di cih de wan jî ji wî re behsa sedema hatiya xwe ya li cem wî kirin. Jê xwestin ku ew bi wan re were nave civata mazinan. Jê re gotin ku “hemû zane, şêwirmend û mazinên civatê lev gihiştina li hevdû û li bendî te na.” Ku wan wilo got, piştre Diyaqos jî, ew ne

şikandin û di cih de bi nêzîkatiya ku ew jî rêza ya ji dilê xwe bide nîşandin tevgeriya da nîşandin li ber wan û ma sekinî wê heyemê de. Lê Piştre jî, ew hinekî din bi zaneyên li dora xwe ma.Bi wan re, hinekî din jî ji dil axift û da û stand.
Piştre Diyaqos, ku wî da xwe ku êdî ew bide rex zane û şêwirmendên ku civata mazin ji qasrê şandina pey wî û ew bi hev re herina qasrê. Lê dema ku wî da xwe ku ew herin, li wir çend mirovên zane û kal ên ku weke rêmildar li wir rûniştîbûn ku hebûn jî, bi wî re dana xwe û rabûna ser xwe.Wan jî, hingî kar û amedekariya xwe kir ku bi Diyaqos re bikevina rê de û herina qasrê.

Diyaqos, ku wî da xwe û rabû ser xwe û bi zane û şêwirmendên li dora xwe ket rê de, piştre yên din jî ku berê hingî bi wî re rûniştî bûn, bi wan re dana rex wan û ketina rê de û bi wan re hatina qasrê. Ku ew ketina rê de, hingî piştre ne bi gelekî re hatin û gihiştina hundurê qasrê. Dema ku ew gihiştina hundurê qasrê, hingî dîtin ku wa pirr zane şêwirmend, aqilmend, serok û bawermend wê li hevdû rûniştîna û wê li bendî wî na. Ku Diyaqos bi yên ku pêra na, ku dane devê dêrî û û ketina hundur de, êdî hemû jî ji ber wan rabûna li ser xwe. Hingî, hemûyan silev dana hevdû û sileve hevdû girtin û piştre li hevdû rûniştin. Hingî di wê demê de li cihekî ku Diyaqos, ku ji xwe re naqandibû di serê xwe de ku ew êdî lê rûnihê. Lê çawa ku wî kir ku ew li wir rûnihê, yekî herî kal ku li wir û heta wê demê jî weke ku pêşavanî û serektiya civatê dikir, ne hişt ku Diyaqos li wî cihê ku wî ji xwe di serê xwe de naqandibû ku ew lê rûnihê êdî lê rûnihê. Wî, ji Diyaqos, xwest ku ew li cihê ku dema ku bavê wî saxbana ku wê lê rûniştibana li wir rûnihê. Hingî, di wê demê de dema ku ev ji Diyaqos, hat xwestin, êdî jî ji wî re ne got na. Ji xwe li gorî kevneşopiyê ne biderfet bû ku wê gotiba na jî. Piştre ew li wir rûnişt. Ku ew li wir rûnişt, piştre heta wê demê de çi nîqaş di nava wan de bûbûn gotin bi gotin li ber Diyaqos hanîn ser ziman. Diyaqos, bi rêz û hûrmet li hemû gotinên ku li ber wî hatina gotin hisand û di serê xwe de girt. Piştî ku hemû gotinên ku wê li ber wî hatiban gotin ku hatina gotin, êdî piştre ji Diyaqos hat xwestin ku ew êdî li ser serê wan key bê li dewsa bavê xwe. Di dema ku ev jê hata xwestin, hingî Diyaqos, hinekî weke demeke ne zêde dirêj weke ku hizirî û piştre bi carekê û dengekî ji hemû mirovên mazin ên mazin û serek, zane û şêwirmend pirsî ku “ma herkesek hebûna herê dike(?)”. Ku Diyaqos, wilo pirsî, êdî di cih de bi dengekî bilind, herkesekê di cihê xwe de li ber wî got herê. Êdî ya ku li Diyaqos jî diket ku ew herêkiriba.Wî jî, ya ku lê ket kir û herê kir. ..

Diyaqos, piştre, êdî li ser serê wan li ser xwesteke wan jî bû keyê mazin yê ser serê welêt hemûyî.Diyaqos, pêşî li **Saknû** mabû.Li wir jî, wî demeke xwe ya cihê wir derbas kiribû.Lê divê ku ez bibêjim ku evder, ne cihekî ku dûrî dersînorê Asûriyan bû. Lê ji ber ku ew jî bi malbatî û êlî û her wisa bi hêzî mazin bûn, êdî bi ser wir de çûyin zêde ne dibû.Lê Di dema Sarûkê duyem de jî, êdî wî kiribû ku di dema sefera xwe ya di wê demê bi ser wir de herê. Li wir ew rastî berxwedaneke mazin ya bimêranî hatibû.Li herêmê Medî jî û Babîlî jî,

nêzî hevdû dijîn.Lê piştî ku desthildatdariya Asûriyan Babîlî dabûbûna ber xwe û çûbûbûna bi ser wan de û piştre çûbûbûna bi ser hin êl û herêmna Kurdan de jî, êdî piştre bêhtirî nêzî hevdû bûbûn. Keyê Demî yê Babîlî **Ûmakîstar**, nêzî Mediyaliyan bûbû.Bi wan re tevgeriya bû. Wî xwe ji her aliyê ve jî nêzî wan didît.Weke xîzm jî didît.Ew bixwe jî banûya wî keçeka Med(Kurd)î ya bi navê **Amîhêyê** bû û pêre jî Zewicî bû.Ev keçik jî, keçikeke ku bi malbatî ji male key bû. Peymanek di nava Mediya û Babiliyan de hat mohrkirin.Ev mahra ku bû jî, ew peyman û mohrkirina wê ya ku bûbû jî temenê wê xorttir û mayîndatir kir.

Di dema Diyaqos de, wê ew nêzîkatî bêhtirî mazin bibe.Diyaqos, yekî pirr bi aqil bû. Wî bigotin û aqilê xwe yê di serê xwe de, ne tenê yekî ku rê şanî Mediyaliyan dide.Bi wê re, gotinên wî, ku dihatina ser ziman, digihiştina nave Babiliyan de jî.Bandûra gotinên wî li wan jî dibû. Bi vê yekê, hê di wê demê wî ya destpêkê de, wî bigotina xwe mazinatiyek ava kir.

Diyaqos, di ciwaniya xwe de yekî ku pirr sûwar dibû bû.Wî, herêmên wê herêmê gelek ji wan nas dikirin.Kuder baş û bilind a, wî ewder nas dikirin. Bi teybetî, Heya ku digihişt ber Şehrêzorê û hwd jî, li wan herêman bigiştî, wî ewder di dîtin. Li wê herêmê ava diclê ya ku bilind, cokên wê yên ku av diwan de diharikî di gelek deveran ve diharikî. Bi vê yekê, ew herêm hemû jî, daristan bûn. Bi wê re jî, heta ku digihişt, ber çemê mazin ên Diclê ku hem berehiya çem bê û hem jî bilindahiya çem bê ew mazinahiya wan, gelek derfet dida çêkirin. Bajarên herî xweşik li ber çem hatibûbûna çêkirin.Pêşiyên Babiliyan jî, di wê demên wan yên berê de ku ji dema Hamûrabî ku mirov karê bide dest pê kirin, bajarna mazin li ber ava Firatê jî Ava kirin. Bandûra çandî ya li wan ku heyî ya Gûtî, Mîtanî, Qasîtiyan bû. Berî demên Gûtî, Qasîtî, lolo Mîtanî û hwd, di dema Kîengirî(sûmer)yan deçanên ku hebûn û di nava Gûtî, Mîtanî, qasît, lolo û hwd de bicih bû, di nava wan de jî bicih bû. Minaq, weke wan Babîliyan jî, baweriya wan pirr mazin bi Lipît Îştarê hebû.Parastgehên ku wan ji wê re dane çêkirin, pirr navdar bûn.Her wisa, ji bi Çanda Mardûk jî mirov karê bêne ser ziman. Li ser *Lipît Îştar û Mardûk* re, weke Gûtî ku bi *Şêwînî* re kir, weke ku Mîtaniya li ser *Sîn* û ankû hebedê re kir û hwd, bi wê çanda Yazdanî re têgihiştina yek-Yazdanî dana pêşxistin.Lê di vê dema hûriyan de ola Êzîdî jî weke ola bingihîn û ya yek-xwûdayî bi nirxên xwe yên ku di demê de hebûn re hebû. Laleş û ankû lalîs, di wê demê de bi navê "la-li-iš" û ankû "La-la-aš-ši" hebûya.Di dema Mediyaliyan de, ji pêşiyên wan Zarastren destpêkir û piştre Ahûra mazdar ji wê xatê de bi wê çandê û awayê hebûna xwe bimazinatiya xwe re da domandin. Mîtra di dema Mediya de ku piştre derket, ne weke bawermendê çanda Yazdanekî bû.Ew, awayê baweriya temenê wê li ser têgihiştinê bû.Wî, lêpirsînkirin bi têgihiştina pêşxist.Çend ku heta wê demê jî Çanda ku têde baweriyeke mazin li ga û conaga tê de hebû, wî kira ber lêpirsînê de.Hingî, di dema wî de, ji wî re ji wê baweriya bi carekê ku 40 hezar hasp were boraq kirin ne hindik bû. Li ser wê hingî, wî di temenê wê

boraqkirinê de bidest lêpirsînê kir. Di dema ku hêrîş li malên wan bûn û nexweşî ketina laşê wan de û ku haware xwe gihandin, hingî wî dît ku wa gayê bi haware wî ve ne hat.Hingî, wî çû û gayê xwe ser jê kir. Piştre bi wê ser jê kirinê re fahm kir ku li ser wî re ku ew nabîn in Yazdanek heya. Mîtra, bi vê yekê re, êdî dema nû di têgihiştin û dîroka têgihiştinê de dest pê kirin.Mediyaliyan, di wê demê de di aqilê xwe de û bi xwe re rewşeke ji wê li pêştir dijîn.Bi wê re bandûra wan maztir dibû. Di cih de bandûra xwe bi wê pêşketina xwe re li ser dora xwe didane çêkirin.Diyaqos, bi vê yekê û wê awayê pêşketibû û mazin bûbû. Wî, tiştekî dî jî giring di dît di jiyanê de.Ew jî, giringî dane kevneşopiyan bû di jiyanê de.Bi wê re xwezayiya jiyanê, ew lê dihizirî. Ew civaknasiya jiyanê ya ku mirov têde dijî û bi wê re wê dibîne re, wî di dît û di gotinên xwe de bal jî dikişanda ser wê.Hê ku ji piçûkatiya xwe ve heta ku dema balixbûna xwe Diyaqos, bi têgihiştinî li ser temenekî bi vî rengî pêşketina xwe ya kesene bi demê re da çêkirin.Ew, ne tenê kurkeyek bû û piştre bû key. Ew, zaneyek û aqilmendek jî bû. Wî hizrên xwe yên ku dihanîn ser ziman jî, bi wan re dikir ku rêya biaqil bide nîşandin. Di têgihiştina xwe de, li ser temenekî ku xelk wê çawa bijîn li ser wê sekinî ya ku wî di demê de xorttir kir jî ev bû. Bi hev re jiyîn, xeleke giring ya di têgihiştina wî de bû.Bi wê yekê re, wî di dema xwe de, piştî ku ew bû key, bêî ku demê bide winda kirin, wî êl û herêmên ku hebûn bi wan re têkilî danî û ew kişandina cem xwe.Ku em karibin bibêjin ku Mediya “konfederesyonek” bû ku ji kom û êl û herêmên cuda pêk hat jî mirov divê ku bi saya serê vê awayê têgihiştina wî ya ku li pêşiya dema xwe di rê de dimeşî, bi sayaserê wê bû.

Hin xalna ku mirov di temenê hizirkirina diyaqos de karê kifş bike ev bûn. Yek, li ser temenê jiyana û civaknasiya wê re li xwezayiya jiyanê hizirîn bû.Ya duyemin, ew bû ku bi hev ve kirina herêman û xelkên cuda û teybetmendî û xosletên wan yên cuda ku wê çawa karibin bi wê re xwe bidina jiyin û domandin li wê hizirin bû. Xela sêyemin ew bû ku di temenê aqiliyê de bû.Kirina aqil di temenê nêzîkatiyan de bû.

Diyaqos, li ser vê temenê di têkiliyekê de bû.Keyê demê yê Ûrartûyî jî, ew zanîna Diyaqos kifşkiribû û nedixwest ku wî hilde hemberê xwe.Wî jî, dizanî ku ew wê ti carî rast nebûba.Li herêmê jî, di wê demê de ku weke hêzeka mazin ya xort û ku dixwest ku hemû hêzên dervî xwe ku bike bin serweriya xwe de hêza Asûriya hebû. Wê hêzê jî, kiribû ku hêzên herêmê bi başî li hevdû bihizirin û têkiliyekê baş ji ku ew li cem hevdû cih bigirin dênin.Bi vê yekê, rewşek afirî bû.

Medî bixwe jî, hêzeka wan ya pirr xort hebû. Babîliyan jî ew didît. Lê bi tememî ew rêxistiya ku di nava wan hêzan de ku bi wan bi hev re bike hêzeke mazin ya pirr xort hê nebû. Gava pêşî wê diyaqos biavêşta.Diyaqos, wê gavê diavêjê jî.Hemû hêzên herêmî yên xwe dikina yek. Ji ber çemên Firat û Diclê heta ku digihişt ber bahre Hûrmûz, wê konfadarasyoneke mazin ya hêzî û çandî û civatî were ava kirin. Ti kom civatên herêmî û xelkî, ew derfeta wan

nebû ku xwe li dervî wê girtiban. Di wê demê de, ew şerên Asûriyan, ku di herêmê de deng vedabûn ên bi Babîliyan re wê piştre bi Mediyaliyan jî bibin.Diyaqos, weke keyê mazin yê ku wê çareserî ji van rewşan re û ji hemûyan re bidîtina bû.Ji xwe, bi wî çavî jî lê dihat nerîn. Ew yekî ku key bû.Lê yekî ku biaqilê xwe jî temem bû.Ji keyîtiya wî û navê wî yê bikeyîtiya wî re bêhtirî navê wî yê bizanebûna wî mazintirîn derketibû.

Di wê dema ku ew şêwirmend û zane hatibûbûna pey wî û ew biribûbûna nave civatê û piştre ew dabûn axiftin û piştre ew hatibû hilbijartin weke key jî, ev jî di wê demê de hatibûbûna axiftin.Li ser hemû rewşên li herêmê ku rû didina dihate axiftin.

Li Diyaqos, bi çavê weke yekî ku Hûrmûz ew hilbijartiya ji bo keyîtiyê û serketinan jî piştre navê wî dihat ser ziman.

**Di wê demê de jî, demeke dirêj wê zane û şêwirmend wê bi hev re axiftina xwe bidina domandin.Wê pirr tiştan bihizrî bênina ser ziman.Wê behsa herêmê û rewşên ku lê diqawimin jî bikin. Çi diqawimî, li wir li ber Diyaqos jî bahs tê kirin. Diyaqos, di dema ku axiftin tên kirin de jî, pirr bi awayekî heyîdar li yên ku diaxiftin dihisand. Gotinên ku ji devê wan derdiketin di serê xwe digirt.Wî, her gotina ku dihat ser ziman, di serê xwe digirt û di di serê xwe dibir û dihanî. Li ser jî dihizir.Dixwest ku ew bixwe jî, wateya xwe ya bixwe bidiyê de. Bi wê yekê jî, ew pirr dihizirî. Mirovên ku li dora wî bûn di wê demê de ên li civatê, ên ku pirr bizane bûn. Yên ku gotina wan di nava xelkê de jî pirr lê dihate hisandibûn.** Kî jî ba, ji gotina wan re ne digot na.Bi teybetî, ez vê gotinê jî bibêjim. Di nava Mediya de ku bîryareke şer jî ku hatiba dayin û ku bîryareke aşîtiyê jî bihata dayîn, ku biqasî key gotina wan giran bû û mazin bû, rêmildarên medî ên ku navê wan “megû” jî bûn hebûn. Ew, hêz û çîneke teybet ya bilind bûn di nava civata de. Gotina key jî car bi car dernedikete ser ya wan re. Her wisa ew mirovna mazin û bibandûr bûn. Di wê demê de, Ew jî bi awayekî yekdengî li cem Diyaqos bûn. Ku wan rast dît ku Diyaqos ku wê keyekî mazin, êdî ji wê ti xûf û gûman di nava xelkê jî ne dibûn. Êdî her mirovî karîbû ku ji bo wî û bi wî re biçûya mirinê jî.Bi vê rengê, gotina rêmildarên Medî mazin û di cih de bû û giran bû.

Diyaqos, weke keyekî êdî derketibû li li holê.ew, ji aliyê rêmildaran ve jî û ji aliyê bawermend û oldaran ve jî hatibû herê kirin.Şêwirmend, aqilmend û weziran ve jî hatibû herê kirin.Lê ji keyê nû jî pirr hêvî êdî hebûn.Wê wî, welat ji xatarî û telûkeyên ku li devê deriyê wê bûn ji wan xilas bikira. Wê welat, ne hiştiba ku ji wê rewşa wê ya aram derketiba. Keyê Medî Diyaqos, biaqilê xwe yê mazin kar bi rê ve dibirin. Di rewşan de, wê aqil û kiriniyê bi hev re çawa bide kirin û bike, wî dizanî. Bi vê yekê, ew xwediyê teybemendiyna keseyetiya xwe bû.

Piştî ku bavê wî çûbû ber dilovaniya xwe êdî çav ûbal hatibûbûna li ser wî.Êdî herkesekî li wî dinerî.Çavên xwe dibirina ser wî.

Di wê demê de di dema Civatê de, ku Diyaqos, keyîtiya wî hat herê kirin û piştre, êdî ew navê wî derketa li pêş. Li parastgahan navê wî hat ser ziman û behsa wî hat kirin. Ew, weke yekî ku hûrmûz hilbijartiya hat ser ziman.

Di wê demê de, li ber sînorên wan telûkeya ku hêza asûr çê dikir hebû. Hêza asûr bi ser hinek herêmên Babiliyan de çûbû bû û ewder kiribûbûna bin destê xwe de. Li wan deran jî pirr xûrixandin dabûn çêkirin. Lê Medî, hem hêza wan û hem jî mazinbûna wan ya di demê de gelekî ji ya babiliyan maztir bû. Mediyan, çavên hêzên ku berê xwe didana bi ser wan de ku herina bi ser wan de, didane tirsandin. Şerên ku berê Mediyaliyan kirina, gelek ji wan nav dane. Ne tenê di nava wan de, her wisa di nava xelkên din de jî ew navdarî hatibû bihîstin.

Di nava axa Mediya den, xelkên ku hebûn ên weke Bûsî, Sagartî, Arîzentî, moxî, partekî û hwd dijiyan.Her wisa Şakî û Xaldî jî hebûn.Şakiyan li ber gola Wirmê dijîn.Lê ev xelkên ku min behsa wan kir jî ji aliyên koka xwe ve digihiştina hevdû û yekbûn. Piştî ku Navê Diyaqos hatibû bihîstin ku ew bûya key, êdî wan jî ew herê kirin. Ji xwe di dema bavê wî de, navê wî bihîstibûn.Di dema bavê wî de jî bi wî re dijîn.Ew hevgirtina wan ya bi hev re hebûn.Lê bavê Diyaqos, ne kiribû û hewl nedabû ku wan bike nava hevde bi hev re.Diyaqos, xwest ku hemûyan bi hev re bike yek û hêzekê ji wan biafirêne.Bi wê yekê li ber hêrîşên Asûriyan bisekin in. Ji xwe Babilî, heta wê demê ji hêrîşên ku hatibûbûna ser serê wan, êdî weke ku ji kal ketibûn.Êdî hatibûbûna ber bi tememî têkçûnê.Wilo zêde êdî ti hêz ji di wan de nemabû. Lê babiliyan, xwe ji Mediyan û şûnhatiya wan dûr ne dihasiband.Wan, xwe bi wan re yek û ji kokekê di dît in.

Piştî ku ew hewldane Diyaqos, ya yekkirin û bi hev ve kirina herêman, wan jî xwe ji wê dûrnekiribû û bi wan re tevgeriya bûn. Ev nêzîkbûn û bi hev re bûna di serî de, weke destpêkekê bû.Lê Diyaqos, hê ya ku wê bikira ya di serê wî de ne tenê ew bû.Hê, weke ku tiştna din jî di serê wî de hebûn.Ew jî, wê êdî hin bi hin ku wî hanîn ser ziman û bikiran wiya di jiyanê de êdî wê bihatan dîtin.Lê piştî wê civata ku Diyaqos bi şêwirmend, aqilmend, zaneyên civat û serokên civatê ên din re ku kiribû, piştre êdî wî jî berpirsiyariyeke mazi êdî hildabû ser milên xwe.Ew, êdî key bû.Diyaqos, desthilatdariya Kurman û Gord ya ku di berdewwmiya hûrî û Gûtiyan de hebû ya li ber diclê ku Firatê ku hata wê demê ji dema Gûtiyan ku berdewem bû, ew jî di derbarê wê de xwediyê zanînê bû. Di wê demê de, Wê rêveberiya ku navenda wê herême botanê û ber çiyayê Cûdî bû, heta ku digihişt ber çiyayên Zagrosan bixwe jî, êdî serwerî, serdestî û desthildatdariya xwe demezrandibûn û ava kiribûn. Sefera Sanherîb ya ku hata ber Damasqê û her cihê ku ew têre çûya ku li dûv xwe kevilkirinek hiştiya jî, wê bê sedem ku êdî hin gavên ewlatiyê ên mazin ji bo tedbiriyên bên hildan. Sanherîb, hêza xwe dabû ber dersînorê welatê gord ku navenda wê ber diclê û çiyayê Cûdî bû û herême botanê bû.Lê li wir, zêde pêde neçûbû bû.Ji xwe, ew hêza wî jî wilo zêde ne mazin bû ku biketa şer de bi bohtiyan re.Ku bi

wan re ketiba şer de jî, wê ti baxtê wî neba.Ji ber vê yekê, wî jî aqilî kiribû û xwe zêde bi wir ve nedabûbûyê de.Li dersînorê wir mabû bû.Lê Mediya dike ta rojhilatê wê de jî, êdî li wir jî xwe di demezirend.

Diyaqos, ew rewş hemû dixwandin.Ji wî re ji wan herêman hemûyan jî agahî dihatin. Lê divê ku ez bibêjim ku hebûn û navê Diyaqos, ji bo ku ew rêveberî û desthilatdariyekê di bin destê xwe de heta berbahre hûrmûzê ava bike navê wî hatibû herê kirin.

Diyaqos, Piştî ku ew hatibû herê kirin, piştre ew weke demeke dirêj hizirî bû di cihê xwe de.Wî herêm hemû di aqilê xwe de buhurandibû.Wî hemî der û dever nas dikir. Diyaqos, piştî ku demeka dirêj dihizirê, paşê, ew biryereke giring didêt. Ew biryar jî ev bûya. Ku ew li herême kirma yanî kirmanşanê xwediyê serwerî û hêzeke mazin jî bû, wî tiştekî dî hizir dikir.Weke zanîna wî ya civatî û civaknasî her wisa zanîna wî ya leşkerî jî hebû. Wî hizir kir ku ew çawa bike wê li ber hêrîşên Asûriyan bi ser bikeve. Bi wê yekê, wî di wê demê de hêzeka mazin bi xwe re da ava kirin û berê xwe da bajarê mazin û navdar Aqbatanê. Li wir, êdî wê çi kiriba wê li wir kifş bikira.Bajarê Aqbatanê, bajarekî wê herêmê yê herî stretejîkî bû.Cihê wê bilind bû.Ku mirov lê disekinî, weke ku mirov li nêzî azmana bisekinê li mirov dihat.Ji dûr ve jî, weke cihekî ku ji azmana ne dûr dihat berçav.Ji wir jî ji her sê aliyên wê yê pêşiyên ve hemû der û tevger tên dîtin.Aliyê din yê çare min jî, dibû lat û ew lat jî dibûna avayekî parastina wê.

Diyaqos, hat wir û li wir wî xwest ku wir ji xwe re ji hêza xwe re bike navend.Li wir, piştî ku Diyaqos, hat wir, wî êdî Diyaqos, xwestibû ku wîr, parastirtir bike. Bi vê yekê, ji bilindahiya wê re, ew aliyê wê yên ku bilind bûn, wî xwest ku hê bilindtir bike. Wî li Aqbatanê heft hêtên bazneyî li dora wê bi dirêjahî û bilindahî da ava kirin. Baragahê bi wan hêtan wî ew der xwest ku bike baregaheke mazin. Hêtên wê bilind çêkirin.Hêtên wê yên ku di birîtî, sipî û reş hatibûbûna çêkirin.Hêtên navîn, wî weke ava zêr bi wan re kir bûn. Bi ava zêr wî hêtên navîn daşopandin. Diyaqos, bajarê Aqbatanê weke ku ew di serê xwe de dihizirî da çêkirin. Wilo çêkir ku wê di nava wan hêtan de ti carî bin nekeve. Ewder, êdî bi navenda wî ya leşkerî ya ku weke fermangah. Li wir, wî fermangaha xwe ava kir. Piştre ji wir, wî hêzên dîn ên li herêmê ku hebûn û ji wan bûn agahî ji wan re şand ku ew xwe bigihênina wir li cem wî. Ku wî agahî da şandin, piştre ji xwe êdî ne bi gelekî re û ku demeke dirêj bi ser ve neçûn, hemû rêveberî, xanadanî û herêmên din jî xwe gihandina wî û bi wî re bûn. Diyaqos, hevkariyeke mazin di nava wan de bi peymankir.

Diyaqos, ku wê li ser çi esasê û prensîb û xal û destûrê bijiya û bi rê ve biçûya hemû jî bi nivîskî da kifşkirin û herê kirin. Wî, destûr bi destûr da nivîsandin. Piştre wî ew binetarên ku dana nivîsandin jî danînina ber hemû serokên din. Wan jî ew herê kir. Jê re negot na. Diyaqos, li Aqbatanê, bi vê yekê bi binetareka nivîskî ku weke peymana nave hemû hêzên Medî ku li dora

wî levgihiştina li hevdû bû, bi wê temenê hevbere(konfederesyon)ye Mediya ya mazin avêt û Mediya li ser wê re desthilatdariya wê bidest avakirina wê kir.

Piştî ku li Aqbatanê Diyaqos, ev yek kir û yekbûnek di nava Mediya de li ser wê axê da çêkirin. Piştre wê agahî şanda ji babiliyan re jî ku ew wê çawa bi wî re tevbigerihin. Babiliyan, ji dil û can ew herê kirin. Jê re ne gotin na. Ew peymana ku Diyaqos bi navê di nava hêzên Medî da çêkirin û bi wan da herêkirin, babiliyan jî ew herê kirin û xwe weke aliyekî wê û aligirekî wê dîtin.Bi wê re, wan jî, hêzên xwe kirina navê yên Mediyaliyan de û bi wan re tevgeriyan.Bi wê re, êdî li herêmê di bin dest û desthilatdariya Mediya û Diyaqos de hêzeke mazin afirî. Piştî ku hêzên serdest ên Medî di nava xwe de ew yekbûn çêkirin, Piştre herêmên ku hêzên Asûriyan ketibûbûnê de jî ji wan alîkarî xwestin. Êdî piştî wê re ew herêm yek bi yek ji destê hêzên asûr tên derxistin û tevlî hêzên Medî tên kirin. Bi wê re jî, êdî hin bi hin di dema kin de hêza Asûr kêm dibê.Yek ji wan hêrêmên ku ketibûn bin destê Asûriyan de hin herêmên li dora Wirmê jî bûn. Piştî ku hêzên Medî ketina tevgerê de, êdî li pirraniya wan herêman Mediya êdî raperînên mazin bûn li Dijî hêzên Asûr. Di wê demê de hêzên Sanherîb, di dema ku dît ku li herêmên Mediyaliyan raperîn bûn, piştre ew nikarê wan bike bin destê xwe de, êdî wî hêzên xwe ji wan deveran vekişandin. Lê wî hêzên xwe yên ku vekişandin, li dora babiliyan û bi teybetî jî li dora bajarê wê yê bi navê Kiş dana hevdû. Li wir, wî hêrîşên pirr mazin û ku di wan de Babiliyan windahiyên pirr mazin dan kirin. Sanherîb, kurê wî Nadîn şûmî li ser serê babiliyan kiribû key.Hingî, ew bi berpirsiyar bû li wir.

Babil, li ber avê bû.Ava Diclê û Firatê ya pirr bilind ku li ser kiştên asûriyan ên şer jî diçûn û dihatin, di wê dema ku Medî ketina tevgerê de û li herêmên wan yên ku di bin destê hêzên asûr de bûn ku raperên bûn û piştre ku babil jî weke wan kete raperînê de, hêzên asûrî yên ku çûna bi ser babil de ne tenê hêzna bejehî bûn. ji aliyê pêşiya bajêr ve ku li çemê Firatê ku di ber kişê re diharikî û dihat û digihişt Nîppûr û ji wir jî digihişt ber Urukê û ji ber jî diçû û di ber Ur´ê ve diharikî, li ser wî çemî re kiştên asûriyan ên şer ketina dewrê de û çûna bi ser babiliyan de.Hingî, Lagaşê xwe xilas kiribû.Hêzên Medî lê bûn.Lagaş li ber çemê Diclê dima. Ava çemê diclê ku di ber lagaşê re diharikî li bajarê Ûr´ê bi ya firatê re nêzî hevdû dibû û tevlî hevdû jî dibû.Ji vir ve, Mediyaliyan hêzna xwe yên li ser avê re bi kiştan şandina ber babil û kiş´ê. Li wir, şerê Asûriyan ê bi Babiliyan re dane sekinandin û ew aliyê babiliyan hildana ewlatiyê.

Lê di wê dema ku Mediyaliyan bi vî rengî piştgirî da û şanda ji babiliyan re, di wê demê de Sanharîb jî bo ku kurê xwe di wir de bi tenê nehêlê, wî hêzeka mazin ya din şanda bi ser Kişê ve. Di dema ku Sanharîb, dît ku wa kiştên wan yên şer ku hatibûbûna ber Kiş´ê ku Mediyaliyan ew bi hêzên xwe yên ku li ser avê re ku şandibûn ku ew bêbandûr kirin êdî Sanherîb li rêyeka din geriya. Wî, hingî, rêya ku dîr, xwest ku ji aliyekî din ve hêrîşê bibe bi ser babiliyan de û

sazûmana wan ya bi alikariya Mediyaliyan xira bibe.Hingî, keyê Asûrî ferman da ku ji çem ku heta ku têna ber Babilê cog û rêyê avê bikolin. Di cih de gorî fermana wî ew hata kirin. Di demeke pirr kin de rêyê ku av di wan de bi ber bajêr de bi harikê ên dirêj û fireh hatina kolan. Di wan rêyên avê de av hat û li ber hêtên Babilê sekinî. Avê, li ber hêtan hariyeke wilo çêkir ku gelek tiştên û herêm kirina nava xwe de. Av hin bi hin di cihna buhurt û keta hundurê Bbailê de jî. Babilî, piştî ku av ji hêtan bihurî û ket hundurû de, êdî xwe di nava hariyê de dîtin. Êdî nikarîbûn ku zêde gava xwe biavêjin û tevger bikin.

Li ser wê rewşê, sazûmana Babiliyan hata ber xirabûn ku ew têk herin. Hemû dever bi hariyê bûn *taqn*. Her dever bû taqn. Ji taqna hariyê, sazûmana Babiliyan, piştre ku demek têve çû hata ber xirabûnê. Keyê Babilî, Ûmakîstar, di cih de çend nûçevan derxistin ku herin û rewşê ragihênina keyê Mazin ê Medî Diyaqos.

Di wê rewşê de jî, Êdî Sanherîb, wilo zan û bawer kir ku êdî Babil di nava taqna hariyê de maya û êdî nikarê zêde gava biavêje. Bi wê yekê, êdî ew di nava xwe de li rêyeka ku ew bikevina hundur de û di nava wê rewşê de ku ew xwe bi ser bixin lê geriyan.

Keyê Medî, piştî ku agahî gihişta wî, êdî wî hêzeka mazin şanda ber Babilê. Dema ku Hêzên Medî hatin, êdî Hêzên Asûrî, ew plana ku Sanherîb hizir dikir ku di wê rewşê bi hesanî herê û bikeve hundur de û bi serkeve vala derxist. Êdî hêze Sanherib ji wê re wêre nekir. Lê dema ku Hêzên Medî hatin, wan hêtekî mazin li pêşiya avê bikevinên mazin bi Babiliyan li pêşiya avê dane çêkirin. Piştre rêya avê ku ket hundur jî dane derve. Piştre êdî rewşa xwe bidest xistin û hin bi hin êdî bi serketin. Li wir, êdî ku rewş, bi vê rengê bi tevlîbûna Mediyaliyan çareser bû, piştre êdî hêzên Asûrî xwe bi şûn de vekişandin. Babil, êdî piştî ku hêzên Asûr xwe vekişandin, êdî azad bû. Her rê û dever êdî careka din li Babilê hatina rastkirin. Piştre Babil, dîsan serdestiya ava kir û bi Mediya re weke ku herdû welatek bin tevgeriya.

Asûr jî, piştre êdî dev ji şerê bi Mediyaliyan û Babiliyan re berda. Serwerî, serdestî, desthilatdariya wan herê kirin. Êdî asûr, weke berê ji xwe re derfet nedî ku seferan weke berê li herêmên dervî xwe bikin. Lê Asûr jî, piştre êdî rêya din hilbijart. Keyê wê, levkirineke ku wê êdî rêzê ji hevdû re bigirin bi Babil û Mediya re mohrkir. Piştre, êdî weke Mediya û Babil, asûr jî di herêmê de weke xwe bi aramî jiya. Di wê demê û bi teybetî di dema Sanherîb de her devera ku lê sefer hatibû kirin û hin deverên ku kiribûbûna bin serweriya xwe de jî xwe ji wan deveran vekişandin bişûnda. Sanherîb, heta ber Damasq hatibû ji wir jî xwe gihandibû Qûdûsê jî. Li wir jî, yên ku serdestiya wîherê nekiribûn gelek ji herêmê kiribûn der jî. Lê piştî wê rewşê re, êdî rewş û peymana wî ya ku bi Babil û Mediya re mohrkir û serdestiya wan herê kir û piştre, êdî li wan herêman jî asayîtî û aramî pêşket. Êdî wî hêzên xwe ji wan deveran jî vekişandin. Mediya jî serdestiya xwe ji ber diclê û firat û çiyayên Zagrosan heta ku digihişt Îlam´ê û ji wir jî heta ku digihişt ber bahre hûrmûz û

xazar û çiyayên Elbûrzê û hwd da herê kirin. Lê piştre Mediya, Heta ku digihişt ber dersînorê Lîdya û hwd jî mazin kir û hê jî pêde çû. Mediya, Piştre, ti kesekî êdî ne dikarî pêşiya wê bigirta. Piştre jî ji ber çemê *Heyls*(çemê sor) û heta Xûzîstanê dirêj û fireh kir. Asûr, weke welatekî li dersînorê Mediya ma. Mediya Ne dikarî ku bi ber aliyê Mediya de biçûya.

Diyaqos, di vê demê de bi vî rengî welatekî mazin ava kir. Lê ya ku Diyaqos ava kir, ne welatek bû, Bi gelek xelk û herêmên wê yên dirêj û fireh împaratoriyek bû ku wî ava kiribû. Diyaqos, di her gavên xwe de bi zane tevdigeriya. Li gorî wî û destûrên wî yên bi hev re jiyandinê wê ti kesek û hêz li ser ya din serdestiyê ava nekê û zilmê lê neke. Wê bi hev re bi dilî bijîn. Li gor wê jî, wî bi nivîskî xal û destûrên ku li gorî wan were jiyîn û gav bê avêtin jî jî nivîsand. Bi wê re wî temenê bi hev re jînbûnê afirand. Di nava wan xalên ku wî weke xaln destûrî ku wî yên ku li gorî wan bê jiyîn ku nivîsandibûn, ya sereke ew bû ”ku dema ku li hêzekêî û ankû li herêmekê hêrîşên ji dervê bûn, wê yên din di cih de herina alikariya wan” bû. Bi vê yekê û xalê, êdî hemû xelkên, yên ku bi Mediya re yekbûn û tevdigeriyan xwe di aramî û ewlatiyê de didîtin û dijîn.

Key Diyaqos, piştî ku bi vî rengî wî aramî di nava welêt û herêman de bi peymanî da afirandin û çêkir, piştre êdî li welêt, bi aramî bidest avakirina wê kir. Dewlemendiya Mediya, di dema Diyaqos de xwe di Aqbatanê de dabûbû li der. Li Aqbatanê, di dema ku hêtên wê hatibûbûna çêkirin, piştre ji bo ku ti kesek nikaribê bihêtan va ku karibin hilkişihin, ava zêr bi ser de dabûn rijandin. Bi wê re, hêtên Aqbatanê ku Diyaqos dabûbûn çêkirin, weke ku ji zêr bûn. Aqbatan, weke bajarekî pêşketî êdî pêşketibû. Weke bajarên din ên Mediya weke ku li Wirme, Kirmaşan, Şahrezor û hwd hebû, li wir jî pirtûkxaneyên mazin hebûn. Pirtûkxaneya Şahrêzor, ku behsa wê tê kirin, weke ku behsa cihaneka din were kirin tê kirin. Di bahsê de pirr mazin behsa wê tê kirin.

Lê li ti darî jî, weke ku li ber diclê li Botanê hebû li ti deverên din nebû. Yên ku li deverên hebûn jî li ber ya li wir ji xwe behsa wan jî ne dibû.Diyaqos, weke keyekî û yekî zane, navê wî derketibû. Wî di dema xwe û di qasra xwe pirr giringî dida zanebûnê. Li ser wê jî disekinî. Ji ber ku wî bixwe jî pirr dixwand. Ew bixwe jî, yekî ku bizane bû. Zaneyan xwe li dora wî digirt. Di dema wî de jî, li qasra wî di dema ku wî weke ku bajarê Aqbatanê ji nû de ava kir jî, hingî jî, wê bi awayekî ku pirr giringiyê didiyê de pirtûxanayeke mazin li wir jî ava kiribû. Li dora wî rêmildar, oldar û aqilmendên mazin ên ku nawserî xwe hebû. Wî, ji wan jî aqil û raman digirt. Li wan jî dihisand. Di nava xelkê de jî, ku kê çi bigota jî, wê gihiştiba guhê wî. Bi wê yekê, ew di nava xwe de jî xwediyê sazûmaneke pêşketî bû. Lê du tiştên ku heta wê demê bi sazî ne hatibûbûna ava kirin Diyaqos ava kiribûn. Yek di nava artişa xwe de hêzeke teybet ku tîr ji kevan ji ser hasp ku sûwar dikarê biavêje afirandibû. Li ber wê hêze wî jî ti hêz ne disekin in. Wê hêzê, di şerên ku wî kirin de jê re şerkevtin

bi awayekî bi ewla misoger dikir û dihanî. Bi wê yekê Diyaqos, karê ji xwe **felekê** re ne dihişt ku ka yan wê bibe û yan jî wê nebe. Hêze din jî ku ji zaneyan pêk dihat bû. Jê re dihat gotin ”Geştû” û di temenê karê saloxgeriyê de ku mirov karê wê şîrove bike bû. Wî komek ava kiribû ku hertimî di nava qasr û rêveberiyên herêman de diçû û dihat ava kiribû. Bi wê re jî, çi zanîn û agahdariya ku wan xwe digihandiyê de jî, dihanîn û didane Diyaqos. Diyaqos, bi wê re li ser axa wî ya ku ew li serê serdest bû ku çi bûna heya wî jê dibût. Bi wê re jî, wî xwe digihanda hemû der û dever û agahiyan. Heya wî, bi wê yekê ji hemû deverên dora wî çêdibû. Herêmên Asya ku heta ku digihişt ber Hîndiya Asya û Çînê û hwd, serdestiya Mediya hatibû herê kirin.Herêmên ku hêze Mediya lê nebû jî,wan jî piştre xwe gihandibûbûna Mediya û pêre tevdigeriyan. Bi wê yekê re, mirov karê bibêje ku Mediya, êdî ne tenê welatek bû. Diyaqos, ew kiribû Împaratoriyeke bêserûbin ya cihanî. Mediya, di dema Diyaqos de, wê wê mazinatiya xwe ya bêserûbin bide çêkirin. Bi wê yekê re, divê ku mirov bibêje ku diyaqos ne destpêkeke ji Mediya re. Lê Ew destpêkeka ji bûna împaratorîtiya Mediya re.

Mediya, di wê demê de jî Aqbatan bajarê wê yê sereke ê paytaxt bû. Bi wê rengê jî, piştre êdî pirr pêşket. Herêma Nosîcanê û ew rêyên wê yên çûn û hatina ku mirov di wan de diçû jî firehiyek dikira dilê mirov hingî xweş bûn. Aqbatan, piştre derkete pêşiya wan bi pêşveçûn, pêşketin û xweşbûna xwe re. Bû weke bajarekî weke ê Şahrêzorê.

Kurdên Yarsanî Şahrezor wilo xweşkiribûn, ku mirov diketiyê û têde dijî, weke ku mirov bikevê bihûştê û tê de bijî li mirov dihat. Bi wê yekê û rengê xweş û xweşik bû. Têde, yanî di Şahrêzor de, dibistanên perwerde ên hemdem hebûn. Pirtûkxaneya wê ya mazin ku ji sadsalan têde pirtûk, nivîsar û binetar lev gihiştibûbûna hevdû, ji wê temenê wê yê pêşketî re hîmîtî dikir.

Lê Piştî Mediya û mazinbûna wê ya di dema diyaqos de, êdî navê Aqbatanê pirr mazin derdikeve li pêş. Mirov, êdî ji her derê bi rojan dikevina rêyan de û diçin ku herin û Aqbatanê bibînin. Aqbatan, êdî navendeka şariştanî ya demê ya pêşketî bû.Diyaqos, piştre li wir qasra xwe mazin ava kir. Li wir wî, qasreka mazin ku bi nav û deng ava kir. Diyaqos, qasra xwe jî li cihê herî bilind ku dema ku mirov ji wir nerî wê hewirdora xwe pirr baş bibîne li wir ava kir. Bi wê yekê re, ew êdî weke serwerê dora xwe hemûyî bû. Ku ew li wê qasra xwe ya wilo bilind û ku her hewirdora diket ber çavan ku ji wir li derve dihat nerîn, ku ew lê di rûnişt, wî xwe êdî bi tememî weke keyê wê cihanî hîs dikir. Bi wê yekê re, wî xwe mazin kiribû. Cihê ku lê Aqbatan ava bû û qasra Key lê bû, cihekî ku dora wê hemû jî vekirî bû. Qasra key, tenê ew stûnên ku li ber devê wê li pêşiya wê hatibûbûna çêkirin bi kevirên ku weke *qursên gilover* hatibûbûna bilind kirin û stûr bûn û ku danîbûbûna serhevdû bilind dibû, ji wan ava dibû. Tenê stûnên pêşmalê ên qasrê li ser 18 kevirên stûr ên stûnê hatibûbûna ava kirin. Li ser wan jî ban hatibûbûn danîn. Li wan stûnan jî serdor bi sê û an jî çar rêzên stûr re hatibû çêkirin. Li binê stûnan jî ji ardê ku

mirov dikevê qasrê de li ser heft pêpelokan re pêpelok hatibûn çêkirin. Ew stûn jî li ser wê bilindahiyê hatibûbûn danîn. Hêtên qasrê yên ku hatibûbûna çêkirin jî, pirr stûr û qayîm hatibûbûna çêkirin. Wilo hatibûbûna çêkirin ku wê her cûreyên hêrîşan re jî karîba ku xwe biparasta. Lê aliyê pêşiya devê qasrê jî hemû bi bilindahiya wê re çiqas hêt hebû dihat naqşkirin. Li ser stûnan û hêtên nava stûnan dihat xamilandin.Li devê deriyê qasrê ku hinek ji stûnan zêdetir derdiket derve peykerên key hatibûbûna çêkirin. Ku hinekî din jî mirov dihat berkeviya bermalê jî, êdî ku li her aliyekî peykerê şêr hatibê danîn li herdû aliyên devê qasrê peykerên şêran hatibû danîn weke parastvan.

Li dora bajêr jî bi heman rengî hêtê mazin, bilind û stûr hatibû çêkirin. Hêt, nêzî dû metroyan jî xwediyê firehbûnê bûn. Bi wê firehbûnê re hêt bilind li ser qama deh mirovan re zêdetir jî hatibûbûna çêkirin û li ser hêt jî ku biqasî qama mirovekî bilind bû jî hêt li ser wî hêtê mazin, bilind, fireh û stûr hatibû çêkirin. Lê ew hêtê li ser hêtê mazin jî çavik bi çavik hatibû çêkirin. Weke çavikên kirmanan. Hêtên Aqbatanê ên ku li dora bajêr dizivirîn li heft cihan kevî lê hatibû çêkirin. Her keviya wê jî têde cihê parastinê hatibû çêkirin. Qasra key jî di navika wê de hatibû çêkirin. Ji her keviya ku hêtê dora bajêr jî rê dihat û digihişt qasrê. Bi wan rêyan re weke ku bajar di wê giloveriya xwe de hatibû beşkirin. Û bajar, hatibû şeş beşkirin. Di beşa şeşe min de jî ku li aliyê pêşî û berê qasrê dike deriyê mazin ê bajêr jî hatibûbû danîn. Piştî bavê wî re, di dawiya salên jiyan Diyaqos de sûretê wî li ser waraqayanku tenê serê wî bê tê çêkirin. Ew, di wêneyê xwe yê li ser waraqa de ku taca wî li ser serê wî ya û pora wî di ber de tê xwerê û riha wî dirêj û bi keviyî hatiya çêkirin. Diyaqos, di wê demê bi wê re bi sînor nema. Wî bajarê xweşik ku di serê xwe de bû, li jiyanê dabû çêkirin. Têde bazara kirîn û firotinê jî dabû ava kirin. Waraqayên kirîn û firotinê ku sûretê bavê xwe li ser haspê sûwar bû û tîra wî ya dirêj di destê wî de danî ser waraqayan. Wî bavê xwe di dema Şerê wî yê dawiyê ku Sarûkê duyem re kiribû dîtibû. Wî dîtibû ku bavê wî di şer de jî bê û wekî din ku ser hasp jî bê ku çawa li berçav disekinê. Wî ew dîmen li ser wan xîzkiribû. Bajarê Aqbatanê, weke bajarekî mazin ê cihanê bû. Yê ku ewder didît, piştre ku diçû kuderê, wî ewder jî didît. Aqbatan ji du aliyê xwe ve ji aliyê xwe ve jî digihişt avê. Bi wê yekê re jî, herêmeka ku teybet jî bû. Li dora wê jî pirr daristan hebûn. Devên ku ji avê êdî destpê dikirin ku ne av bûn, êdî hin bi hin li wanderan daristanan dest pê dikir. Haspna colî ku di nava daristanê bi keriyî mazin dibûn hebûn. Ku ew hasp diketina bazînê de ti tiştekî êdî ne dide pêşiya wan.Ti tiştî ne dikir ku bigihişta wan.Haspna bi aslê xwe manaq bûn.Yanê haspna torîn bûn. Diyaqos, ji wan haspên dora wir ku pirr torîn bûn dabûn girtin û dabûn ahlkirin (kedîkirin) û piştre jî kiribû bin sûwariyên xwe yên ku di ti şeran de ti kesekî ne dikarî ku wan zantbike û bigirê.

Aqbatan, bi vê rengê li gorî dilê Diyaqos bû.Wî, ewder pirr xweşik dabûbû çêkirin.Diyaqos, ji bo Aqbatanê baş û xweşik û mazin ava bikin, bi xalan xelkê xwe jî da karkirin. Bi wan, kar kir. Xelkê wî jî, bajarekî ku weke ku wî dixwest

ava kirin. Diyaqos, ji ber ku wî giringî dida xwandinê, wî beşên xwandinê dabûn ava kirin.Li cem wan cihên xwandinê jî parastgeha banû dabû ava kirin. Aqbataniyan, di jiyana xwe de, zêr û zîv jî pirr bihar dihanîn. Bazin, gardaniyên paşila jinê, xalakên bazinî ên li ser gozeke ling re ku dikirina ling de. Kemberên ku xas ji zîv dihatina çêkirin yên ku jinan li noqa xwe li ser cilên xwe re girêdidan, Guharên guh û hwd ku mirov karê hê gelek tiştên din di nava van tiştan de bêne ser ziman çê dikirin. Lê weke ku berê di nava kirmaşaniyan û botiyan de pirr li pêş bû, çêkirina marşan û mahfûran jî pirr zêde hebû. Ew jî, weke karekî jinên ciwan ên ku balixbûna dihat dîtin. Lê divê ku ez bibêjim di wê demê de li herême partiyan, ev karê hunerî ji ya ku em dizanîn û tênin ser ziman, pirr bêhtirî li pêş bû û pêşketibû bû. Partiyan, rêveberiyek û desthilatdariyak ava kirin.Waraqayên xwe yên kirîn û firotinê bixwe jî bi navê xwe jî dane çêkirin. Jiyana wan ya di xwe de ku bitêgihiştin û zanîn hebû.

Partiyan, di wê demê de ji qada hunerî de, weke ku demekê pêşavaniyek jî di van waran de kirin. Ji ber ku ew pêşketî bûn, êdî serî di gelek karan li wan hatiya xistin. Serî li zanîna wan hatiya xistin. Partiyan, bi karê dest û çêkirinê ê hunerî xwediyê çêkeriyekê afrîner bûn, ku mirov jê dima acêmayî. Xwûdê, pirr hij wan kiribû û hizrên çêkerî kiribûn serê wan de.

Aqbatanî, di wê demê de, di awayekî bi wî rengî de di pêşketinê de bûn. Diyaqos, bi Partiyan re mabûbû û ew dîtibûn. Di nava şêwirmendên wî de yên partî jî hebûn. Ji *desta kevir* û heta ku digihişt *Xorasanê*, di herêmeke mazin jî partî bi beleveleyî jiyan. Lê ku key dibakira wan, di cih de lev dibûna kom û dibûna yek jî. Şêwirmendê ku partî bû û navê wî Trajan bû û ji Kochanê bû. Heta ku ew jî û key jî li jiyanê sax ma, ew li cem wî ma. Part, navê xwe ji wê jev beleveletiya partiya digirt. Di Kurdî de wate gotina part bixwe jî ”piç” e. Yan qatek û an jî piçekî jê jî. Wekî din jî, wate ”cihê bilind” jî ji wê tê di Kurdî de.

Mirovên **partî**, baweriya wan, weke ya Şahrezoriya bû. Weke ya **Yarsaniyan** bûn. Bi salan û sadsalan bi wî zanîn û têgihiştina xwe di warê xwe de jiyan. Wan, nêzîkatiya biaqilî dikir. Bizane bûn. Gotina xwe bizane digotin. Di kevneşopiyên xwe de jî, wi´usa bûn. Bi kevneşopî dijîn. Di zimanê xwe de weke kurmancan pirr zû diaxiftin. Gotina wan, ji devê wan zû derdiket. Lê zaneyên wan gotina xwe hêdîka digotin da qana ku hem zanîna xwe mazin bidina nîşandin û hem jî baş bênina ser ziman ku were fahm kirin. Kevneşopiya partiyan, piştî van demên wan re jî, wê jê key derkevin. Wê weke kevneşopiya keyan bêt. Kevneşopiyeke torîn bû.

**Di wê demê de jî di dema diyaqos de, ew pêşketî û bi rêxistinî bûn. Rêveberiyeka wan ya herêmî jî hebû. Ji destpêkê heta ku dawiyê bi Mediya re man. Keyê Mazin Diyaqos, ji wan jî sûd girt. Di qasre xwe de ji wan jî şêwirmend bicih kirin. Bi wê yekê, wî weke ku li Aqbatanê hevgirtineka(sentez) têgihiştinî dabû çêkirin. Bi wê re Aqbatan mazin ava kir. Têde nirx bicih kir. Di dema çend di nava diyaqos û Sanherîb de, di**

**dema ku Diyaqos xwest ku Babil ji têkçûnê xilas biike, hingî, di serî de weke şêwirmendê xwe yê mazin bi Trajan dişêwirî. Ji ber ku ew yekî ku hem bizane bû û hem jî wî ew herêm hemû pirr baş weke kefemista destê xwe nas dikir û dizanî.**

Mediya di dema Diyaqos de wê mazinatiya xwe ya mazin dijî. Piştî wî re, kî tê, wê li ser wê mazinatiyê mazin bijî. Lê di serî de, divê ku em bibêjin ku yê ku bi aqilê ew pirr bizane û ew mazinatî çêkirî û Mediya gihandî asta împaratoriyê Diyaqos bixwe ye.

Li Aqbatanê, jiyana Diyaqos, pirr baş bi rê ve diçêt. Jiyana wî, li wir li qasre mazin bi rê ve diçêt. Rêmildarên Medî, wê mazintiya diyaqos û mazinbûna wî ya bi demê re bi hijkirina Hûrmûz ya li wî re tênin ser ziman. Aqbatan, berî hingî jî, weke bajarekî Mediya hebû. Lê Diyaqos, kifşkiribû ku ewdera ku Aqbatan lê ya, weke cihekî ku serweriya wê li ser hemû dora wê ya ye. Bi vî rengî, weke cihekî giring wî kifşkiribû. Ewder, wekî din jî herdû aliyên wê biav bûn. Aliyê wê yê bej jî ku hêzeke ne zêde mazin jî dikarî biparasta. Bi vê yekê, weke cihekî ewla jî bû ji bo paytaxtekî.

Li wir, Qasra wî, malbata wî jî li wir bû. Banûya *Sîtiya*, li wir dijî. Sîtiya, wateyeka wê jî jina mazin ya li ser seran jî bû. Weke gelek banûyên Medî, bi navê wê jî Agirgeh hatibû ava kirin. Bi navê wê jî parastgehek hatibû ava kirin.Li wir jiyana wî, pirr baş bû. Dora wî, ku çavên wan bi wî diket jê têr dibû. Wî, bi heyîn û hebûna xwe re çavê mirovê ku lê dinerî tişî dikir. Di dagirt. Piştî ku Key Diyaqos li wir welate demezrend û êdî ku saziyên xwe yên dewletî jî ku ava kiribûn piştre wî ji qasra xwe welat bi vê re bir. Li wir, welatê Mediya Heta ku digihişt ber Hîndiya û Çînê bixwe jî, weke herêmeke aram bû bû. Li herêmê, dema Mediya, di wê demê de Babîiliyan jî demeka xwe ya baş jiyan. Lê Asûrî, çend ku demekê bi wan re di aramiyê de jiyan jî, ji ber ku bi avabûna Mediya weke Împaratoriyê re ku serdestiya wan li herêmê kêm kiribû, êdî ew hinekî ne xweş bûbûn. Bi vê yekê, êdî ji dêla ku berê xwe bidina herêmên Mediya yên ku ew lê bihêz in., car bi car kiribûn ku li herême ku lê Ûrartû lê bihêz in li wir hinekî dî bandûra xwe bikin. Bi vê yekê re, berê xwe di demna dana wir jî. Lê Ûrartûyî, BI Mediya re, di destpêkê de hinekî pevçûnên wan çend ku hebûn jî, wilo zêde mirov nikarê bibêje ku nexweşî mazinbû di nava wan de. Ûrartûyî jî, ji nirxên Gûtî û Mîtaniyan Sûd girtibûn û xwe pêşxistibûn. Xwûdayê Hûriyan Şêwînî, di nava wan de bi bandûra xwe bicih bûbû. Hûrî pirr pêşketî na. Gotinên weke "*zanîn*", "*ziman*", "*jîr*"′, "*war*", "*mal*", "*aşîtî*" û hwd gotinên ku ji dema wan mana na.

Diyaqos, di qasre xwe de, giringî dide aqil û xwandinê. Wî di dema xwe de, zêde sefer li dar ne xistin. Wî tenê bandûra Asûriyan ya li herêmê şîkand. Dawî li demeka wan ya bi împaratorî hanî. Bi vê yekê re hin pevçûnên wî bi wan re bûn. Lê ew nebû xwediyê seferên mazin ku li herêmên dervî xwe bike. Herêmên dervî xwe wî, bi aqilê xwe nêzî xwe dikir in û dikirina bin bandûra xwe de. Bi wê re, wî di gelek kirinan de, ku hinek keyên din ba ji dêla wî, ku

wê bi artişekê bikira, Diyaqos bi aqilê xwe kir. Karê ku artişeke mazin bikira, wî biaqil da kirin. Ku mirov bi rastî dema wî lê dinerê, mirov karê bibêje ku wî hemû tiştê ku biheta kirin wî biaqil kir, mirov wê vê yekê pirr baş bibîne. Ji ber vê yekê navê wî li şûn wî weke ”keyê zane” ma.

Ew, ji aliyekî ve têgihiştibû ku aqil hêzeke wê ya mazin heya. Ew bûbû xwediyê aqil. Zaneyên li dora wî ên rêmildar, aqilmed û şêwirmendên wî, hertimî ya bihiş jê re dihanîn ser ziman û wî jî di ser xwe de digirt. Li Aqbatanê, jiyan di asayiya xwe de diharikî û diçû. Li wir, wî bi salan hem kir ku jiyan bi wê asayiya xwe bi herikê û herê û hem jî kir ku ewder pirr mazin were ava kirin. Wî, heta ku sax ma, hertimî hewlda ku Aqbatanê ava bike. Ew hêtên wê tên mazin ku pirr bi hêz û xort hatibûbûna çêkirin, bi salan bi çêkirina wê re karkirin bûbû. Ji dûr ve jî, weke kirmaneke mazin ya pirr bilind bû. Aqbatan, di wê herêmê de, yekî ku bazirganî û etartî dikir, ne biderfet ku rêya xwe bi wir nexistana. Bi wê yekê, çûn û hatineke mazin li wir hebû.

Lê Diyaqos, di dema xwe de, ji aliyê zanînê ve ewder xamilandibû. Gelek zanînên ku xwe digihandina wir hebûn.Li wir, pirtûkxaneya wî ya ku wî têde ava kiribû, bi nav û deng bû. Pirr jî behsa wê dihat kirin.Li dora Diyaqos, weke şêwirmendên wê trajan li wir hê pirr şêwirmend û aqilmendên wê yên mazin hebûn. Minaq, Tşxatra, Torîn hebûn. Rûxûşaq şêwirmendekî wî yê sereke ê mazin bû. Weke wan, gelek zaneyên li dora wî hebûn. Rûxûşaq, ne tenê weke şêwirmendekî bû. Her wisa wî, herêmeke mazin ku ne dûrî bahre hûrmûzê jî bû bi rê ve dibir. Lê li Aqbatanê, li wir ku lev digihiştina li hevdû, êdî bi hev re li ber Diyaqos disekin in û li gotina wî dihisand in. Diyaqos, divê ku mirov bibêje ku ew yekî ku wî dixwest ku di nava xelkên herêmê de bi hev rebûnekê çê bike. Çêe kir jî û Mediya li ser wê re ava kir. Wî dîroka Dîroka Gûtiyan û keyên wan hemûyan dizanî. Gûtî, kalkên wî bûn. Wî dema Gûtiyan ji dema keyê gûtî key Erîdûpîzîr û ku heta ku digihişt dema Tirgan, yek bi yek li dûv hevdû dîroka keyên Gûtî dizanî. Yên ku dihatina zanîn ji Key Erîdûpîzîr heta ku digihişt Tirîgan 21(bîstûyek) keyên ku hatibûbûn û buhurtibûbûn hebûn. Ji wê dema Gûtiyan, heta ku gihiştibû wê demê jî dem bi dem gelek xanadanên ku hatibûbûn û çûbû bûn hebûn. Ew dîroka wan, bi binetarên ku ji wan bûn û yên ku hatibûbûna nivîsandin, bi hezaran nivîsar di bin destê key diyaqos de hebûn.

Wî, dîroka keyan xwandibû. Bi vê yekê, êdî bûbû keyekî baş. Keyên berî xwe hemû xwandibûn. Hem kêmesiyên wan fahm kiribû û hem jî kirinên wan yên hatibûn ser ziman didîtin. Li ser wê re, êdî wî bizanekirina xwe re êdî keseyetiya xwe bi tememî bi jiyana keyîtiyê pêşxistibû û bi rê ve biribû.

Em divê ku vê jî bibêjin. Ji demên şaristaniyê heta ku hatibû demê, çend key û mazin hatibûbûn û çûbûn jiyana wan hatibû nivîsandin bi kirinên wan re. Mediyaliyan û pêşiyên wan jî, bi vê yekê re, ku hertimî li cem key weke şêwirmend disekin in, hin zaneyên ku tenê karê wan ew bû hebûn. Lê di dema

Diyaqos de, ev hinekî guharî bû. Wî bixwe, êdî ew dikir. Xwe li ser wan re bizane dikir.

Dîroka keyan li qasrê, li dûv hevdû, tê û tê heta wê demê li dûv hevdû ku navberê têde nebê. Bi wê yekê re, demek hebû. Babilî, Asûrî, Medî, Anşanî û hwd, dîrokeke wan ya teybet heya.

Keyên wan yê baş, hertimî bi başî tevgeriyana. Lê yê ku bi ne başî tevgeriyana, bi kirinên xwe yên xirab jî dîrok nivîsandina. Heta ku dem tê wê demê, bi vê yekê û awayê dîrokeke mazin ya pirr dihê jiyîn. Kevneşopiya keyitiyê ya ku hatî heta wê demê, hinekî jî bi Diyaqos re guharî di dema Keyên Gûtî Ibate, Ibranum û Hablûm de bû. Ew jî, keyna biaqil bûn. Lê di wê dema Gûtiyan de keyê wan ê bi navê Înîmabakeş bû. Wî di dema xwe de xanadaniyak ava kir û ber firatê Uruk, Mari, Gûdea û Lagaş kiribû navê wî sînorê xanadaniya xwe.

Îro( di wê demê de) Diyaqos, hê bêhtir kiribûn nava wî sînorê axa ku serweriya Mediya lê ava kiribû. Ya rastî ku ez divê ku bibêjim ku ev dîroka ku diyaqos li şûn xwe hiştî bi kalkên xwe re, ku ew newê fahm kirin, wê bi tememî baş newê fahm kirin ku ka Diyaqos di demeke kin de çawa ku Împaratoriyeke mazin ya bi vî rengî ava kir. Înîmabakeş jî, di dema xwe de, li qadeke mazin serweriya desthilatdariya xwe ava kir û piştre kiribû ku bajarekî din ava bike li ber ava firatê. Hinekî jî, Diyaqos ku ne bi tememî jî ba, weke ku wî ew kiribû. Aqbatanê, ne bajarekî ku wî ji temen dabûbû ava kirin. Li wir berî hingî, ew bajar hebû. Lê weke wê dema Diyaqos ku dijî. Wî ewder mazin kir û hêtên wê çêkirin û nava wan hêtan heta ku dibibêje xweş û sipahî kir.

Bi plan û sazûmaneke wilo xweşik wî bajar ava kir ku kêm zane karibin wê fahm bikin. Bajarê Aqbatanê, wî sazûmana bingeh têde çêkiribû. Cokên ku ava pîs diketa wan de û di bin ardê re diharikanda derve jî çêkiribûn. Nave bajêr jî, bi keviran hatibû xweşikkirin. Bi vê awayê, ez karim bêjim ku di temenê hemdemiyeke demî de ew sazûman wê çêkiribû li bajêr.

Key Diyaqos, di wê demê de, piştî ku êdî sazûmana herêmê di nava herêman de dabû çêkirin, piştre jî, bidest qayim kirina desthilatdariya Mediya ya li herêmê kiribû. Êdî Asûr jî, jê re ne xatere bû. Xelkê asûr jî, li herêmê bi xelkên din re di aşîtî û aramiyekê de dijî. Piştî wê serkevtina key Diyaqos ya li ber desthilatdariya Asûr, êdî piştre jî di demên keyên wê piştre de jî hin hewldanên mazinkirina serdestiyê bûbûn, lê bi ser neketibûbûn. Mediya, lê hin bi hin pêş diket û pêşde jî diçû. Du sedem hebûn ji bo êdî pêşneketina serdestiya Asûr li herêmê. Yek, ew bû ku êdî awayê rêveberiyê û têgihiştinê hê di wê de bi tememî ne buhurî bû dema aqil. Ya duyemin jî ew bû ku weke ku key Diyaqos kir, ne di temenê xelkîtiyê ku bi hev re bijîn sefer li herêman kirin û xwestin ku bikina bindestê xwe de.

Diyaqos, di wê demê de li Aqbatanê jiyana xwe bi başî û di xweşiyê de buhurand. Li welêt jî li herderî wî serdestî da ava kirin. Hin bi hin di wê demê de kurî wê firortîs jî mazin dibû û diyaqos jî ew tevlî nava karê desthilatdarî û

rêveberiyê dikir. Li welêt, di wê demê de, Firortîs, li ser serê hêzên artişî bû. Wî, aramiya welêt bi hêza ku di bin destê wî de bû bi wê diparast. Bavê wî key Diyaqos jî jê pirr xweş bû. Piştî ku Key diyaqos, rêveberî û desthildatdariya Babiliyan jî hilda ewlatiyê û êdî ku ew jî di herême xwe de careka din bi hêz jî bûn, piştre êdî li ser herême xwe serdestiya xwe û ewlatiya mazintir kirin. Lê piştre, piştî ku wê dema cenge di nava hêzên Asûr û yên key Diyaqos û Sanherîb û pê de, piştre hin bihin dîsan li herêmê Asûriyan xwest ku hêza li herêmê mazintir bikin. Hin herêmên Ûrartiyan jî di nav de çûna bi ser ser hine herêmên din de. Di wê demê de, Li ser serê welêt key Diyaqos, ji dêla ku ew herê serê hêza xwe ew fermanê dide kurê xwe Firortîs û wî dike serê artişê de dişêne wê herêmê ku ew aramiyê bide çêkirin. Di wê demê de jî kurê Sanherîb Esarhadon mazin bûbû û ew ketibû serê hezeke mazin de. Wî jî, dixwest ku xwe hem ji bavê xwe re û hem jî ji dora xwe bide berçav.Dayika wî **Naqiya**, ew pirr bizane mazin kiribû. Esarhadon, piştî ku tê ser taxt, li dijî Mediya li axa wan dike ku hin serferna bike.Xewn û xiyala Esarhadon, mazin bû. Wî li bakûrê welatê Mediya Sefer kir. Heta ku weke bavê xwe seferna li Dijî cihûyan jî dike. Kananê jî dike bin sehêta xwe de. Sefereke wî ya ku bi sernakeve jî li Misrê dibêt. Ew, stretejiyeka ku li wir(li misrê) bi seferê serbikeve û ji wî aliyê ve bi hêzeka mazin ya ku afirêne were bi ser Mediya de hebû. Lê Firortîs, di qada hûnera şer de xwe pirr pêşxistibû. Di cih de vê kifş dike. Çawa ku bavê Firortîs, zaneyekî civatê bû û weke fîlosofekî bû, ew jî di qada hûnera şer de wilo bûbû. Ew bixwe jî, jê re weke mamosteyekê bûbû.

De ne, divê ku ez bibêjim ku bavê Esarhadon Sanherîb, çend zaroyên wî yên dinm jî hebûn. Lê yê ku derketibû li pêş ku hem yê mazin bû û hem jî ji bo ku bibe key hatibû perwerde kirin ew bû. Di wê demê de, wî weke bavê xwe xwestibû ku careka din Babilê bike bin destê xwe de. De ne, Asûreke ku babil ne di bin destê wê de yî û an jî ku ne di nava axa wê de yî, wilo zêde wê nikaribê li herêmê bihêz ba û bi hêzên herêmê ên mazin ên weke Mediya re qama xwe bipîvanda.

Lê Babil, hingî di nava axa Mediya de bû. Mediya, di dema ku hingî Esarhadon xwe di labitêne û dike ku were bi ser babilê de, hingî di fermandariya kurkey Firortîs de hêzeke mazin ji Mediya tê pêşiya wî. Hingî, di dema ku ew digihijiyan hevdû, li diclê hin cengên wan bûbûn. Lê Firortîs bi ser dikeve. Lê Firortîs, di wê dema xwe ya pêşî de ku tê û bi hêze Asûr re tê berhevdû, nakevê şerekî mazin ku tê de pirr windahiyan bide. Wê na hildê berçav. Di wê demê hem hêlze asûr jî hê ne hindik bû û hem jî ku hêze wî şikeştinek xwariba, wê ancamên wî jî mazin bûban. Ew jî, wî dizanî û ew ne dihilda berçav.

Lê Firortîs, hêze wî serdestiya li herêmê dike. Serdestiya xwe jî mazin dike. Firortîs, hê ku di wê dema xwe de, hin bi hin xwe dide nîşandin. Ji aliyê başûrê Mediya ku li welatê Persan li wir bû, wir jî dike bin sehête xwe de. Piştre welatê Manene dike bin destê xwe de. Ew, herêmê hemûyî dike bin sehête

hêze xwe de. Lê Hêza asûr jî li herêmê êdî nikarê weke berê gava xwe biavêje. Sanherîb, di dema xwe de, wî pirr sefer kiribûn. Herêmeke ku heta ku digihişt Qûdûsê lê seferê dike. Gelek Cihûyên ku hem li herême dijîn û hem jî li herêmên din jî dijîn ji wê sefera wî nesîbe xwe digir in. Ji cihên ku lê dijîn tên *mişext* kirin. Di dema Kurê wî Esarhadon de, ku çendî wî dixwest ku weke bavê xwe bike jî, zêde jê re derfet nemabû ku wisa bikira. Lê di dema Key Diyaqos de ku ew ser serê artişê bû û di dema Kurê key Diyaqos Firortîs de jî, hem ji herême welatê Persan û hem jî ji ya aliyê manene kiribûn ku bikevina nava axa Mediya de. Bi wê yekê, dixwestin ku bikevinê de û li ser herêmên êdî weêe berê serdestiya çê bikin. Mediya, hêza wê, li herêmê bixwe re ahangek(balanse) dabû bû çêkirin.

Lê Împeratoriya Asûrî ji wê nexweş bû. Ji ber wê yekê, piştî ku desthilatdariya Mediya ava bû, piştre mirovên ku weke mirovên saloxgeriyê na şandina nava Mediyaliyan ku gotinan ku dubendiyê di nava wan de çê bikin. Lê Diyaqos, ew kifşkir û bi zaneyî ew mirov hemû kifşkirin û ew dane girtin ji nava xelkê û dane ceza kirin. Piştî ku Qasra asûr biwê re jî biser neket, piştre, mirovên ku bi pîsporî perwerdekirina bi leşkerî bi dîzîka şandina nava Mediya û Bedkujiyê li key Diyaqos bikin. Key Diyaqos, ew mirovên ku hatibûbûna şand ku lê bedkujiy(sûîqast)ê bikin jî kifşkirin û bêî ku bihêle ku xirabî çê bibe, ew bê bandûr kirin.Çi kirin, êdî wilo zêde nedikarîn ku zêde pêde herin. Mediya, pêşiya seferên ku li herêmê dibûn jî digirt.

Li vir, ez weke gotinekê jî bibêjim. Ku mirov bi pirsê ku wate dema key Diyaqos çûbû? Mirov wê bibêje ku di temenê têgihiştin û hiziratiyeke hemdem de avakirina welatê Mediya bû. Wî, welatê dema aqil pêşî damazrand. Ew avakirina wî, êdî bû mînaq, ji demên piştre jî. Ew bi wê re bi sînor nema. Sînorê welêt, mazin kirin. Pêşî wî, di nava hêzên Medî yên li herêmê de hevgirtin da çêkirin. Piştre, wî ew hevgirtin di nava xelkên herêmê de jî da çêkirin. Kurê wî Firortîs jî wate dema wî ew bû ku wî artişa hemdem ya ku bavê wî temenê wê avêtî û avakirî wî serdestî herêmên Mediya û yên li dora wê kir. Firortîs, herême Persan, tevlî Mediya kir. Piştre li ber bavê xwe ku ew jî serokê wan li wir amede bû, peymanek mohrkir. Li ser wê peymanê re, êdî hevgirtin bû.

Lê Firortîs, artişa ku bavê ava kir, di wê dema ku ew çû ser serê wê, wî ew bi sazûman û perwerde kir. Hemû leşkerên wî bi perwerde bûn. Ku heta wî demê di ti artişê de berî hingî ne bûbû, leşkerên Medî di şer de ceribandineke din pêş xistin. Ew jî ew bû ku li ser hasp ku dikarîn tîr bikavan biavêtan.

Key Diyaqos, di wê demê de li qasrê, weke keyê zane li ser taxtê xwe rûniştî bû. Ew bikarê welêt re di temenê aqil de pêre mijul dibû. Key Diyaqos, di destpêka xwe de jî û piştre jî serkêşî û serokatiya hizrî ji Mediya dikir û ew bi xwe re pêş xistibû bû.Kurê wî, piştî wî re ew jî di xate wî de dimeşî. Li ser wê rêya ku wî çêkiribû re dimeşî. Key Diyaqos, piştre jî di serê xwe de ku di ket hizran de pirr dihizirî. Wî demên xwe yên ku ew bi tenê dime û di dema ku

tiştek ji wî bihata pirsîn jî pirr dihizirî. Piştî ku dirêj hizirî êdî bersiva xwe di serê xwe de dide çêkirin û vedigot.

Lê ew bi tenê ne dima. Ku ew di dema ku diçi ku razihê jî, hingî xatûna wî li cem wî bû. Di dema ku ew li ser taxt jî bû, şêwirmend û rêmildarên wî li cem wî bûn. Mediyaliyan, pirr giringî dide hizir û gotinên rêmildaran.Ku key bixwe jî biryarek hildaba û gotiba ku ezê bikevina şer de, ku ser wê biryarê re gotina herê ya rêmildaran ya herênî neba, wê ew neketiban wî şerî de. Ku rêmildaran gotiba ku wê şerê ku bikevinê de wê ancama wê xirab bê. Êdî wilo dihat bawer kirin. Ew bawerî êdî di nava xelkê de di seriyan de çêdibû ku wê ew şer êdî baş nebê. Lê rêmildaran got ku bikevina wî şerî de wê ancama wê baş bibe, hingî jî, ku çendî ku vajî wê gotin biheta gotin jî, wê medî biketan wî şerî de.Ev jî, weke teybetmendiyeka wan ya ku bûya malê dîrokê bixwe jî bi wan re û bi navê wan re.

Ku mirov bi vir ve girêdayî gotinekê bi Key Diyaqos ve girêdayî bêne ser ziman, wê hinekî rastiyeka wî jî biwê gotine re were ser ziman. Key Diyaqos, yekî ku di nava rêmildaran de mazin bûbû û wî perwerdehiya wan jî hilda bû. Ji ber vê yekê jî, êdî di dema ku wî gotinek digot, ne tenê ew gotina dibû weke gotina key, her wisa dibû weke gotina rêmildarekî jî. Bi wê yekê re, êdî baweriya li gotina key Diyaqos ji ya keyekî zêdetir, maztir û qayimtir dibû. Bêhtirî di serê mirovan dima.

Mediya di vê demê de êdî heta ku hatibû û gihiştibû dema mazinbûna Firortîs, êdî bûbû hêzeka mazin. Li herêmê êdî ew hêzeke mazin bû. Diyaqos, li qasra xwe li Aqbatanê li ser taxtê xwe rûniştî bû. Wî gotina xwe digot. Gotina wî, ku wî çawa digot jî, weke wê dihat kirin. Li wir, êdî rewşeke nû ya giştî li herêmê jî rûdabû bû. Li herêmê Mediya, di aslê xwe de, bi serwerî, serdestî û mazinbûna xwe re demeke nû jî dabû bû dest pê kirin. Heta wê demê, ku ji dema Gûtiyan û Mîtaniya bê û ku ji dema Lolo û Qasîtiyan bê, bi xanadanî û desthilatdariya wê rêveberî û desthilatdariya Mediyan hatibû. Lê Mediya, bi têgihiştina Diyaqos re di temenekî nû de wî desthilatdarî ava kiribû. Ew di têgihiştina xwe de derketibû bû dervî awayê xanadaniyê. Wî ne li ser temenê xanadanî, lê li ser temenê têgihiştin û hizratiyê bitêgihiştinê li herêmê rêveberiya Mediya ava kiriya û li herêmê desthilatdariyeke nû ava kiriya. Key Diyaqos, di qada têgihiştin û zanîna hunere cengê de jî xwediyê têgihiştinake teybet bû.

Key Diyaqos, di wê demê de li qasra xwe li ser taxt rûniştî bû û li dora wî zanîn, aqilmend û şêwirmendên wî hebûn. Ew ji wan re diaxift û dihanî ser ziman. Li dora wî, mirovên zane hebûn. Kurê wî Firortîs, piştî ku bi fermana wî bûbû fermander li ser artişê êdî kurê wî hêze ku ketibû bin fermana wî de, dabû bû li dora xwe û çûbû bû li ser herêmên li dora xwe re. Bi teybetî, Herême xanadana Persan ya Anşanê ji wir car bi car hin hêzên ku hêzên Asûrî li ser axa Mediya dikirin hebûn. Ji bo ku pêşiyê li wan bigirê, êdî wî jî berê xwe dabû bû wir. Li wir, di dema ku ew çûbû wir li wir, wilo zêde ew rastî ti

dijberiyê ne hatibû. Wî, li wir, pêşî, hemû aşîrên Pers ên li herêmê ku ne bi hevdû re jî bûn, hanîn cem hevdû û di nava wan de rêveberiya wan ava kir û bi peymanî bi Mediya ve girêda. Piştî ku Firortîs ev kir, piştre wî ji wir berê xwe da herême Mannenê bixwe jî. Ew jî, herêmeke ku ji wir hêrîş li axa Mediya dibû. Ji wan haliyên ve ku dibûn başûrê Mediya jî, Mediya dixwest ku hildê ewlekeriyê. Dixwest ku hêrîşên ku ji wan aliyan tên ser Mediya û li axa dibûn, pêşî li wan bigirta. Firortîs, ev yek di wê dema ku wî sefer li wan herêman kiribû û bi vî rengî ew herêm hinekî jî rast kiribûn ûhem yekbûn di nava wan de çêkiribû û hem jî ew rêveberiya wan ya ku ava kiribû ku bi Mediya ve girêdabû bû, êdî weke ku rewş guharî bû. Hêzên Asûrî, di wê demê de ne dikarîn ku wilo zêde herina bi ser wan herêman de jî. Li aliyê rojevayê Mediya, li wir hin hêzên Asûr ên bi hêz jî hebûn. Li wir, Mediya dixwest ku ewlatiya wir bigirê. Lê heta ku wê ewlatiya başûr û bakûrê xwe negirta, wê nekarîba ku li wir jî yanî li rojevayê xwe jî di ti seferna bi ser biketina.

Firortîs, tiştekî dîn jî kiribû. Ew jî, bi peymanî bi hêzên herêmê ên ku bi wan re dibûna yek re dabûbû herê kirin. Ew jî di dema ku wî rêveberî û xanadana Persan ava kir û tifaq di nava wan de ava kir, piştre peymana ku di nava wan û desthilatdariya Mediya de dabû bû ava kirin jî di wê de dabûbû nivîsandin û herê kirin ku herîşek li Mediya bûba, ew jî wê bi Mediya bi yekîtî li dijî wê hêrîşê bisekiniyan. Lê bi heman rengê û awayê ku herîş li herême Persan bû jî wê hêzên Mediya di cih de bi wan ve biçûyan. Ev peymana ku di nava wan de hatibû mohrkirin, ku zêde demeke dirêj bi ser ve neçûbû bû, ji aliyê qasra Asûriyan ve jî hatibû bihîstin. Li ser wê jî, êdî ew demeke dirêj bi hêzên xwe re neçûna bi ser wir de jî. Di wê dema ku ew neçûna bi ser wir de û ku êdî piştî wê peymanê re Persiyan jî dawî li dane bacê li Asûr hanî, êdî ew jî di herême wan de xweş û dewlemendî hin bi hin pêşket. Ji herêmên din ên Mediya bi ber wir ve êdî çûn û hatin zêdetir bû. Zaneyên wan diçûna bi ser hevdû de.

Rêveberiya herêmî ya Pers, piştî ku di demeka kin de ancam bi vê yekê ji wê bi hebûna xwe ya bi Mediya girt, êdî ew jî bi çardestan lê xwedî derket. Êdî hin bi hin pêşket. Ew rêveberiya ku Firortîs ava kiribû. Yê ku Firortîs hanîbû ser serê Anşaniyan jî bi nav jê re Kutur-Nahhunte bû. Bi koka xwe ve jî Firortîs, Ev mirov yekî ku ji Mediya didît bû. Ew jî, yekî ku bizane bû û li Mediya jî pirr baş dinerî. Wî jî, rastiya Mediya fahm kiribû û key Diyaqos nas dikir. Bi wê yekê, Qasra mazin ya key Diyaqos ya li Aqbatanê jî li wir bibaşî dinerî. Li ser wê bibaşî nerînê re êdî hanîbû ser serê wê herêmê. Lê di nava Persiyan de jî, yekbûn nebû. Yê ku li dijî wî rabû û xwest ku ew bibe key li ser serê Anşaniyan *Hanşûnek* bû. Ev mirov jî, ji malbateka mazin dihat. Wî, li şûn xwe dinerî û digot ku ”ez yê mazinê vir im”. Wî, li wir, kir bi serê xwe tevbigerihê. Piştre bi serê xwe rêveberiya kir ku ava bike û ava jî kir. Weke salekê jî ew weke rêveberî hat nasîn. Lê piştre Mediya, Piştgirî dabû bû Kutur-nahhunte û ew bûbû serek li ser serê herêmê. Malbate kutur-Nahunte, ji ber ku

dîrokeke wan ya pirr kevn jî hebû. Berî wî, kalkê wî bi dehsalan rêveberî Meşandibû li herêmê û rêveberiya nav dabû bû. Li herêmê, wî di dema xwe de rêveberiyeke ku ji gelek herêman hevgirtî ava kiribû. Bavê wî bixwe jî bi heman avayê desthilatdarî kiribû. Wekî din jî koka malbatê digihişt keyên Susa´yê jî ku wan bi sadsalan desthilatdarî li herêmê bi Mediyaliyan rekiribûn. Piştî şerê Asûriyan ê bi Naîriyan re ku sale 1128´an de ku kiribû û di wir de naîriyan li herêmê têkçûnek xwaribû û bi wê re jî ku asûriyan gelek kiribûbûna bin destê xwe de, ji wê demê û pê de, êdî hin bi hin herêm weke ku ji kal ketibû û êdî ne dikarî ku rabê ser piyên xwe. Di wî şerê de jî 34 keyên Medî hatibûbûna dilgirtin. Keyê Sûsayî jî di wê demê de di nava wan de bû. Piştî wî şerê re êdî dem bi dem asûrî li herêmê demeke xwe ya din ya nû bi serdestî jîn kirin. Dem heta ku hatibû wê demê, bi vî rengî êdî meşî bû bû. Yê ku ew desthilatdarî û serdestiya Asûriyan ya ku bi sadsalan didoma şîkand jî bûbû bû Key Diyaqos. Keyê Persî jî dîroka xwe dizanî û wî dizanî ku di wê demê de kalkên wî yên wê demê jî hatibûbûna dilgirtin. Ew, ji malbateka bi vî rengî dihat. Kutur-Nahunte jî û malbate wî jî xwe ji şûnpêya ku key Diyaqos xwe jê dihasiband dûr ne didî. Dibêt ku ew dûr nedîtin, ji ber ku ew bi sadsalan bi hevre jînbûna wan, ji wê dihat. Mediya, di wê demê de rêveberiya xwe ku ava kiribû, ew li ser wê herêmê jî serwer kiribû. Gûtî, ji ber çiyayê Cûdî bi ber wir ve bûbû bûn xwediyê çûyinekê. Heta ku piştre li Zagrosan û dora wê hemûyî jî serdest dibin, ew pêde diçin. Gûtiyan, serdestî, li herêmê mazin kiribûn. Desthilatdariya Gûtiyan, ne di temenê xanadaniyê de bû. Ji ber vê yekê jî Key Diyaqos, ew nêzîkatiya wan ji xwe re minaq û esas girtibû û li ser wê re meşî bû. Wî jî, ne di temenê xanadaniyê nêzîkatî kiribû. Ew yekî ku bi zane bû û li ser wê zanebûna xwe re wî desthilatdariya xwe ava kiribû.

Key Diyaqops, bi vê rengê, wî împaratoriyeka weke ya dema Gûtiyan jî ava kiribû. Di dema Gûtiyan de, Gûtiyan, ew herêmê kiribûbûna bin desthilatdariya xwe de. Lê navenda Gûtiyan ber diclê ku wan jê re digot Garza-baqart bû. Key Diyaqos, di dema xwe de Mediya li ser temenekî bi vîrengî ava kir û mazin kir. Mediya, piştî têkçûna Naîriyan re, êdî li ser herêmên xwe Mediyan ew desthilatdariya xwe giştî ku winda kiribûn, êdî weke ku careka din bidest xistibûn. Lê divê ku ez bibêjim ku Mediya, di wan deman de jî hebû. Lê weke welatekî herêmî dijiya. Lê di dema key Diyaqos de gihişt rastiya xwe ya herêmkî.

Bi rengî, divê ku mirov bibêje ku key Diyaqos, demeke nû dabûbû dest pê kirin. Ew dema ku wî dabû bû dest pê kirin, wî bi zanebûn ku di derbarê mejûya xwe berê de bûbû xwediyê zanîn û têgihiştin û li ser wê re ku dema xwe li gorî rastiya wê şîrove kiribû û bi wê re fahm kiribû û li ser wê re mazin bûbû û desthilatdariya Mediya ava kiribû.

Mediya, di wê demê de di serî de bi serkevtina xwe re naqşaya ramyarî ya herêmê bi carekê da guharandin. Li herêmê, heta hingî Medî, Babilî ku weke xelkê herêmê ên herî kevn jî bûn, lê li ser herêmên xwe bixwe jî, ne xwediyê

desthilatdariyeke ku weke ku wan dixwest bûn. Bi wan re jî, Anşanî jî hebûn. Ew jî, weke Mediyaliyan rastî ne başiyan hatibûn û yekbûna nava herêmên wan winda bûbû. Mediya, hêzên li herêmê ku hebûn lê ne serdestbûn serdest kirin û bi wê re demeka nû da meşandin.Ku mirov dîroka herêmê baş û qanc fahm nekê, mirov wê bi tememî û başî wê demê û dîroka wê ya ku hebû baş û qanc fahm nekê.

Diyaqos, bi vê rengê li herêmê bi desthilatdariya Mediya re, demeke nû dabû dest pê kirin. Ew dema nû, piştre ku Mediya êdî bixûrûha jî, wê ew têgihiştina wê bidoma û hebûna xwe bi têgihiştinî serdest bida domandin. Li herêmê welatê Mediya, weke welatê dema ku têde aqil pêş diket bû. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku Mediya, ancama hevgirtin(sentez)ên hizrî ên Mediya ku wan pêşxistibûn ên biaqil bû. Li ser wan re Mediya bi têgihiştin pêşket. Yanî bi gotineke din jî, mirov karê bibêje ku li gorî demê xwe ji nû ve afirandin û ragihandin bû.

Medî, piştî hanîna ser desthilatdatiyê a diyakos re wê desthilatdariyek xort ava bikin. Her wisa, wê Urartû û ankû xaldî jî wê di nava wan de di bin desthilatdariya Mediya de xwe bijîn. Her wisa li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku çanda ku urtatûyî bi wê dijîn, çanda herêmê ya kevnera ye. Yazdanên wan ên ku ku ew bi wan bawer dikin em rastî navê wan di dema hûriyan de jî tên. Minaq, navê Yazdanê şêwînî û ankû sîwînî ku weke Yazdanê rojê jî, tê bi navkirin, em rastî navê wê di demên berê ên hûriyan de jî tên. Gotina şêwînî û ankû sîwînî, di Kurdî de tê wateya jiyana di şewê de di bin rohniya heyvê de jî. Di demên berê Kurdên ku bi sawalgeriyê ve eleqeder dibûn û ankû koçerî dikirin, wê êvaran sawalên li derve bihişta. Ev dema ku sawal dihiştin jî, dema ku şev bi rohniya heyvê pirr rohni dibû û dunya germ û xweş bû, di wê de dibû. Di wê demê de ji derve hiştina sawalan li derve dihat gotin ´**hiştina li şêwînê**´ Bi wê re jî, heta roja me jî gotina ´jiyana şêwînî´ û ankû ´jiyana li şêwînê´ ji vê rewşa sawalgeriyê re dihê bikarhanîn.

Her wisa navê ”şîwînî´ di vê çerçoveyê de dihê xwediyê rastiyeka jiyanê ya bi ´jiyana şêwînê´ re ye. Bi wê re jî ku ”tuşpa” jî ku weke navê hewserê vê Yazdanê bi navê şîwînî´ dihê hanîn ser ziman, di zimanê Kurdî de tê wate ya ”dişibihê”, ”sibeha ku piştî wê jiyana şêwînê re tê”, ”´hatina(ji şêwîna êvarê gihiştina) li sibehê”, ”dusba” û hwd bi xwe re bi wate dike. Di vê çerçoveyê de ji navê şîwînî û heta ya ´tuspa´, wê dewrûdayîmiyeka ji şerê bi ber rojê ve bi xwe re werêne ser ziman. Şîwnî, çawa ku tê wateya wê ”jiyana şêwînî a di bin tava heyvê” de, wê bi wê re ´tuşpa´ were wê wateya wê sibeha piştî wê re pêşî tê yê bê. Bi gotineke din, di Kurdî de wate distênê ku ´gihiştina li sibehê´ bi xwe re bi wateyî dihêne ser ziman. Dewrûdayîmiya di nava şev û rojê de bi wê re dihê ser ziman.

Dema ku sawal li şêwînê dihat hiştin jî, wê hingî sawal bihata xwêdan û avdan.Bi wê re jî, dayikên Kurd, wê stilên xwe bikiran destê xwe de ê wê

biçûyan dohtina sawalan li devera ku li wê sawal li şêwînê hatî hiştin û hatiya maxaltin. Jiyana şêwînê, hertimî demeka jiyana mirovan a di demsale hewînê de ku pirr geş bû bû Jiyana di wê demê de pirr geş bû. Ti kesek, zêde di wê demê de di hundûrê malê de ne dima. Derdiketina li derve.

Ev rewş, wê di dema Mediyan de jî zêdetirî derkeve li pêş. Medî, wê bi hatina ser taxt a diyakos re demeke nû li herêmê bide diyarkirin. Her wisa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Medî, desthilatdariya wan bi diyakos re wê di destpêkê de di cih de hêrîşên kîmeran û îskîtan ên li herêmê jî bide sekinandin. Wê di asta împaratoriyekê de desthilatdariyekê ava bike. Piştî diyako û kurê wî firortîs, wê dema zêr a desthilatdariya Mediya di dema Qiyakser de were û bijî.

Medî, wê di wê de di vê dema wê ya duyemin a vejînbûna wê de wê zêdetîrî aşîrên Kurd ên qasîtan, kimrî ku newiyên Kurdên loloyan in û her wisa manî û sîsiyî wê di temen de weyne ´ku mazin bileyizin. Desthilatdariya Mediya, wê gelek kevneşopiyên Gûtiyan ku bi qasît û lolo û newiyên wan hata wê demê hatina domandin û her wisa yên hûrî û Mîtanniyan ku heta wê demê dihên jiyîn bi aşîr û xanadanên Kurd re wê wan xort bike. Wê demek nû li herêmê bidina jiyan kirin. Di vê çerçoveyê de dema Mediya, di aslê xwe de wê weke demek giring a hevgirtin(´sentez´) jî bê li ser hemû pêşveçûnên dema gûtî, lolo, qasît, hûrî û Mîtanniyan re. Medî, ku berî vê demê û piştî wê re jî di nav de wê wê serdemek ku ne bin dused salî re ya wê bi wê re bijî. Her wisa dema Mediya, wê di vê çerçoveyê de giring a ku mirov wê fahm bike. Fahmkirina wê, wê di derbarê pêvajoyên hemdem ên bi aqil û civatî de jî, wê gelek hizir, têgihiştin û rastiyan bide fahmkirin.

Weke ku çawa bandûra Mîtra di dema Mîtanniyan de zêde ya, wê bi heman rengî di dema Mediya de jî bandûra Zerdeşt û hzrên wî pirr zêde wê hebe. Ji wê bandûra Zerdeşt a afrîner a ku mirov dikarê ji civatên Mediya re bibêjê ku civatên Avêstayî jî.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hebûna xelkên Mediya, mirov dema ku li wan dinerê, berî vê dema ku desthilatdariya ava dibê jî, wê hebe. Çawa ku wê ji i hezaran salan qasîtî li dora zagorasan bi jiyana û xanadana Gûtiyan bi hebûna xwe li ber çiyayê cûdî û mezra-bota ku wê heta wê demê jî hebûna xwe bide domandin, bi heman rengî, berî vê demê bi sedsalan bi xanadanî Mediya hebûna xwe jiya ya û daya domandin heta wê demê. Mirov nikarê bibêjê, ku piştî ku medî di wê demê de serdest bûn û piştre ew êdî bûn û di dîrokê de hebûna xwe derxistina li dika dîrokê û dana domandin. Ji ber ku berî wê jî bi xanadanî jiyaneka wan ya bi aşîrî û serdest wê hebe. Heta ku nîşanakên wê, bi qasî ku mirov ji binetera nivîskî a ku ji dema Mîtanniya a bi navê «nûzî» ku hinek agahiyan ji dema Mediya dide me, em di wê de rastî navê ´med´ û ankû bi rengê ´medha´ tên Her wisa, navê med bi rengê ´medha´ nivîsandin, mirov di çerçoveya morfolojî û fonolojiya zimanê Kurdî de ku ji wê demê û heta vê demê ku li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de di

çerçoveyeka bi ahengî de xwe dide diyarkirin. Her wisa, pirr piştî vê dema bi du-hezaran piştre di dema Feqiyê Teyran de biqasî ku mirov ji helbestên wî fahm dike, gotina «med» bi rengê «medha» ew jî di helbestên xwe de dihêne ser ziman. Ev jî, weke nîşaneke wê ya ku li ser ziman re bi wê rengê heta vê demê jî ew bi vê rengê hatiya bikarhanîn.

Lê li vir, em carek din vegerihin dema Mediya, her wisa di dewama wê de divê ku mirov wê werêne ser ziman ku Medî, wê di çerçoveyekê de bi hizrên xwe yên bi demê re wê pirr zêde derkevina li pêş. Di çerçoveya hizrî a bi felsefkî a ku Zerdeşt dihênê ser ziman de, dema ku mirov li ser wê dihizirê, her wisa mirov rastî rengekî pêşketinê têt. Rengê ku Zerdeşt dihêne ser ziman ku di wê de zanebûna weke hişmendiya nava aqil ku derketiye li pêş û mirov li ser wê re dihizirin. Matamatik, astronomî, fîzîk û her wisa gaometrî, di vê demê de bi awayna xwe yên pêşketî ku hena mirov di van deman de kifş dike. Torînên medî ku weke ´kawa´ jî dihên bi navkirin, wê bi aqil re pirr zêde mijul bibin. Her wisa, çerm weke rûpel bikardihênin û li ser wê dinivîsênin. Nivîsandina Avêsta Zerdeşt a li ser çerm, nîşaneke vê rastiyê re ku divê ku mirov wê bin xat bike û werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku berî zayîna Îsa li dora 823 û 810´an de di dema ku şer û pevçûn li gelek deveran di nava hêzên medî û asûrî de didomiyan, hingî Mediyayiyan «**Sagbuti**» weke navend bikardihanî. Hinek jî dibêjin ku weke ´paytaxt´ di vê demê de bikarhanîna. Piştî ku ev navenda wan di ancama şer û pevçûnên bi asûriyan re ku dikeve destê asûriyan de, wê êdî navendên xwe bigûharênin. Di wê demê de desthilatdariya med, bi aşîrên din ên Kurd ên li herêmê re peymanên leşkerî çê dikin û hêzên dikina yek. Di ancama wê de wê hin bi hin serkevtina xwe li herêmê çê bikin. Di vê demê de gelek aşîrên Kurd di bin destê rêveberiya asûrî a ku di wê demê de key sargonê duyem li ser serê wê bû. Key Sargonê duyem, wê komkujiyên mazin werêne serê aşîrên medî ên Kurd. Di wê demê de hêzên medî ku bi wan re dikevina şer de, wê derbeyê mazin jî bixwûn. Lê tevî wê jî, wê karibin, xwe xwe li ser lingan bigrin. Di ancama gelek berdêlên mazin û derbeyên mazin de wê aşîrên medî bi hevdû re yekbûnekê çê bikin û wê biserkevin.

Keyê Medî diyako, piştî tê ser taxt dirûnihê, wê êdî pêvajoyek nû bide destpêkirin. Di wê demê de hê jî li herêmê hêrîşên îskîtiyan hena. Îstîkî, di wê demê de zêdetirî hêrîşî herêmên Mediya dikin. Di vê çerçoveyê de Medî, ji wê re li çareseyekê digerihin. Diyako, wê bi xaldiyan re jî lev bike. Her wisa, bi wê re wê wan jî hilde li rexê xwe. Di wê demê de aşîr û xandana qasîtî ên Kurd, di wê demê de bi Mediya re di nava yekbûnê de na. Di aslê xwe de, yekbûna ku diyako da çêkirin di dema xwe de wê bandûrê li giştiya herêmê bike. Keyê medî êdî pêvajoyek nû dabûbûn destpêkirin. Keyê asûr, rewşê hin bi hin fahm dikin. Dibînin ku êdî medî bûna hêzek mazin. Babilî jî li rex Mediya na. Di dema qasîtiyan de jî babilî û qasîtî bi hevdû re tevdigeriyan. Her wisa berî wan jî, wê gûtiyî û babilî bihevdû re tevbigerihin. Di vê dema nû a

Mediya de jî ev wisa bû. Mediya dixwest ku ew ax û warê xwe cardin bidest bixe û biparêzê. Babilî jî dixwest ku babil cardin, azad bibê.

Diyako, wê aşîrên Kurd ên dema Mîtanniyan û li ser axa wan hena jî, wê bike yek li cem xwe. Her wisa, qasîtî jî û sîsî jî, wê li cem wan bin. Heta ku Persên demê jî, bo parastina xwe û xwe xilaskirina ji destê desthiatdariya asûr û hêrîşên wê, ew jî li rex Mediya ye. Her wisa, di vê çerçoveyê de mirov dikarê bibêje ku wê yekbûnek herêmî di bin bane Mediya û desthilatdariya wê bigihijê li hevdû.

Her herêmê de qasîtiyan, hertimî pişta xwe dana çiyayan, Di her demê de jî, çiyayên herî bi asteng û zor kîjan bûn, ew li wê bûn. Bi teybetî li dora zagrosan, şariştaniyek bi hezaran salan wê heta wê demê bi destê qasîtiyan were avakirin. Ji demên sûmeriyan û heta demên Gûtiyan û piştre jî heta demên hûrî û Mîtanniyan, di wê çerçoveyê de karîna ku hebûna xwe bidina domandin. Di vê çerçoveyê de di dema Mediya de jî, wê dîsa weyna qasîtiyan û xanadana wan û zanebûna wan li pêş bê. Her wisa, pêşveçûnên dema hûrî û Mîtanniyan û zanebûna wan, bi ancamên wan re wê di dema Mediya de bi zanebûna qasîtiyan û hwd re bigihijê hevdû û wê temenekî hemdem, giştî û mazin li herêmê bi desthilatdariya Mediya re werênê li holê.

Destpêk, hertimî giring e. Di vê demê de ya giring ew bû ku Diyako, ew gava pêşî avêtibû. Medî, ji nû ve bi rêxistin kiribû û derxistibû dika dîrokê. Yekbûna ku di nava aşîrên medî, qasîtî û hûriyî û Mîtanniyî de ku wî bi Mediya re çêkir, wê giring bê. Piştre jî, wê bi wê re sînorên Mîtannîiyan, bi aşîrên wan re bide diyarkirin û parastin. Di wê demê de du astengiyên giring li pêşiya diyako hebûn. Yek, bindestiya asûr bû. Ya din jî, hêrîşên îstiyan bûn. Van herdû rewşan, rewşa wan dikir zorê de. Lê Piştî yekbûna ku çêkir jî, wê êdî karibê bi ser wan ve werê. Her wisa, di vê demê de keyê asûr, hêza diyako zanibû, bo vê yekê gelek saloxgerî û mirovên ku bihizra ku ´sûîqastê li wî bikin, wê bên şandin li devera ku diyako lê ye. Lê diyako wan kifş dike. Di vê demê de wê diyakos, ji rojhilatê wê herê bi ber rojava ve. Wê herêmê ser axa Mîtanniyan. Li wir, dixwezê ku di biin parastina xanadana Kurdên wir de bimênê. Asûrî, vê rewşê kifş dikin û wê progapangayan li ser vê rewşê bikin. Wê bibêjin ku «wan diyako girtiya û sûrgûnî wêderê kiriya. Bi wê re jî, bo ku temenê wê propagandayê baş biparêzên, wê hemû rêyên herêmê jî heta ji wan tê wê bigrin. Bi wê re jî, wê hewl bidin ku yekbûna di nava aşîrên medî de xira bikin. Di vê çerçoveyê de gelek aşîr, wê jiv ê rewşê bawer jî bikin û heta ku tê gotin ku wê xwe ji yekbûna medî vekişênin. Lê Diyako, li wir, li paytaxta Mîtanniyan, wê artişek mazin ava bike û ji wir herêmên weke herêmên ´hamayê´ û dora wê hemûyan jî di nav de wê bikina bin destê xwe de. Di vê rewşê de asûr, heta ku bi rewşê dihisihê, wê artişa medî a nû ku diyako avakirî, wê herêmên destilatdariya Mîtanniyan, pirraniyan wan bike bin kontrola xwe de.

Key diyako, bi vê pêngav(´hamleya´) xwe ya ku kir re destpêka xwe ya ku wî dabûbû destpêkirin, hildabû ewlekeriyê. Bi wê re medî, wê li hewirdorê, bina xwediyê hêz û desthilatdariyê. Ya ku maya, navenda asûr maya. Diyako bi kontrolkirina hewirdorê re bi aşîr û xanadanên medî re wê qada gavavêtinê a artişa asûr jî tang bike. Bi wê re jî, piştî key diyako, hewirdor hilda ewlayê, wê êdî hêza xwe ya ku di dest de ya, wê bidest birêxistin kirina wê ya li gorî stretejiya di serê xwe de a ku bi wê dixwezê ku navenda asûr a nînowa ku bixê. Key diyakos, wê bi vê rengî rewşa asûr li nînowa bike rewşa xanadaneke piçûk de. Di vê çerçoveyê de wê li pirraniya Mesopotamiya jor û jêr wê kontrola xwe bi desthilatdariya medî çê bike. Piştî key diyakos, wê kûrê wî Feraur, wê di zanebûna wî de tevbigerihê. Wê weke wî bibe keyek li ser serê Mediya. Piştî key diyakos, wê key feraur, wê pirr zêde li ser sekinandina hêrîşên îskîtiyan li herêmê, wê mijul bibê. Bi vê re wê feraur, wê karibê destkevtiyên ku bavê wî bi desthilatdariya Mediya biparêzê. Bi wê re jî, wê hêrîşên asûriyan jî heta astekê bide sekinandin. Bi wê re jî wê kûrê wî Qiyakser wê hê di temenekî piçûk de wê bi zanîn û hûnera xwe balê bikişênê li ser xwe. Hê ku çavên bavê wî ji dunyê tarî nebûna û li jiyanê ku dijîn, wê ev ciwan seferê li ninowa bike û bi tememî bixe û wê bi derbeyên mazin ku li wan dixe wê pêşiya hêrîşên îskîtiyan wê bigrê.

Berî wî xanadana asûr, bi misre kevn re jî di têkiliyê de ya li hemberê Mediya. Lê ti rewşê nekarî ku pêşiya bilindbûna Mediya bigirê. Diyakos, hê di dema xwe de aşîrên Kurd ên weke manî, qasît, sîsiyan û aşîrên din ên mazin re yekbûnek mazin li herêmê çêkiribû. Ya ku temenê serkevtina wî bû, wê ev bê.

Medî wê di wê demê de pirr zêde pêş bikevin. Sînorên Mediya ji rojhilat ve digihişt buhara û jê di bûhûrt. Ji rojava ve digihişt çemî sor(´heyls´ê). Ji başûr ve jî heta bahre hûrmez bû. Ji bakûr ve digihişt heta hazarê û bi wê re herêmên kafkasya di bin desthilatdariya wê de bûn.

Desthilatdariya med, wê dema xwe ya zêr pêşî di dema diyako de bijî, piştre jî wê dema xwe ya zêr a pirr mazin a dirêj jî wê di dema Qiyakser de bijî. Qiyakser berê xwe dabûbû anatolia jî. Gelek sefer wê di bin serokfermandariya wezirê wî yê serek û pêşî ê mazin Harpagos de li herêmê bibin. Armanca van seferan ew bû ku herêmê di bin kontrolê de bigrê ku karibê pêşiya hêrîşên îskîtan ên li herêmê bigirê. Di wê demê de îskîtî, diketina nava sînorê welatê Lîdya de. Lîdya desthilatdariyek demî a li anatolia bû. Li Anatolia Lîdyayî, wê piştî împaratoriya hîtîtan re li herêmê wê rêveberiyên herêmkî ên weke yên Frigyayî, Fenîkî, lonî, kîmerî, qariyayî û hwd hebûn. Şariştaniya qariyayiyan, li ber bahra sipî bû, û wê bi bilindbûna avê re wê di bin avê de bimênê. Lê di destana homeros de ku behsa wan dihê kirin Troyayî wê ji wan bin. ..

Lidya, wê li herêmê bi awayekî bi xelkên herêmê re wê li ser koka wan desthilatdariyek giştî anatolia û bi awayekî nîv-konfederelî wê ava bike. Herî zêde wê lîdya wê di dema key aliyêt duyem de wê demek xwe ya zêrîn wê bijî.

Wê aramiyê di nava welatê xwe de li anatolia di nava xelkan de bide rûnandin. Şerê ku key aliyêt duyem û keyê medî Qiyakser li ber keviya çemê sor(´hayls´)ê kir û pênc salan ku domiya, wê bi aşîtiyek di nava wan de wê bi ancam bibê. Her wisa di wê demê de bûyarek xwezayî a weke ya rojgirtinê wê rû bide û hem Mediyayî û hem jî Lîdyayî wê vê rewşê weke hêrsa Yazdanên wan a li wan şîrove bikin û wê piştî wê re dawî li şerkirina bihevdû re bênin. Piştre peymana aşîtiyê di nava key Aliyêtê duyem û keyê medî key Qiyakser de wê bê çêkirin û mohrkirin. Di ancama wê de jî, wê keça key aliyêtê duyem aryanîz wê bi kûrê keyê medî Astiyag re were zewicandin. Piştî wê re wê, aramî di nava Mediya û lîdya de bibe. Wê ji sînorê lîdya hêrîş li welatê Mediya nebin. Ev rewşa aramiya di nava Mediya û lîdya de wê piştî mirina key aliyêtê duyem, wê ji holê rabê. Kûrê key aliyêtê duyem Krasûs ku tê ser taxt, wê hewl bide gelek herêmên desthilatdariya Mediya bike bin destê xwe de. Dema ku tê ser taxt, wê di cih de têkiliyê bi misra kevn re dênê û wê ji wan alikariyê bixwezê di gelek waran de. Ev rewşa key krasûs, wê piştre zêde ne domê. Di nava desthilatdariya Mediya de şerê desthilatdariyê ê bi hevdû re destpêkiriya. Key qiyakser, dema ku diçe ser dilovaniya xwe wê kûrê wî Astiyag wê were li şûna wî. Lê wezirê Qiyakser Harpagos, hê dijî û ji keyekî zêdetirî bandûr û qadrê wî li ser aşîr û êlên Kurd û ên ne Kurd heya. Di demaQiyakser de wê babilî di bin desthilatdariya key Nabopolas de wê bi Mediya re di nava têkilî û hevpaymaniyê de bin. Wê ev herdû key bi hevdû re dawiyê li desthilatdariya asûran werênin û wê piştre li herêmê hêrîşên kîmeran bidina sekinandin û wê bi wê re jî desthilatdariyek împaratorî a li herêmê ava bikin.

Piştî Qiyakser re wê kûrê wî Astiyag were li şûna wî. Lê Harpagos ku weke wezirê serek a, di wê demê de dema ku key Qiyakser hê di saxîtiya xwe de ku xewnekê dibînê û di ancama wê de ji Harpagos dixwezê ku ew zaroya keça wî ya ku rêmildarên medî digot ku wê dawiyê li desthilatdariya tûxmê te werênê ku dibêjiyê de bikuja û ew naujê, wê diyakser weke tola wê kure Harpagos bikujê. Piştî wê re Harpagos, wê di dema kûrê diyakser Astiyag de wê bi kîros re lev bike û wê bixwezê ku dawiyê li desthialtdariya med werênê. Piştre jî, wê key Astiyag were kuştin. Artişa kîros wê bikeve paytaxta Mediya Akbatanê de. Li hemberî vê rewşê aşîr û êlên Kurd ên medî dema ku dikin bi hêzên xwe re herina bi ser hêzên kîros de wê Harpagos wan bide sekinandin. Di vê çerçoveyê de wê, êdî kîros, dawiyê li desthilatdariya med werênê. Bi wê re jî, Kîros, wê dawiyê li paymana aşîtiyê a dinava Mediya û lîdya de jî werênê. Wê seferna leşkerî li herêmên anatolia bike. Keyê Lîdya ê demê, di vê demê de dixwezê ku kîros bide kuştin bo ku serkevtinê bidest bixe. Lê çi dike jî, bisernakevê. Piştre, dike ku alikariyê ji misre kevn bistênê. Lê ew jî, ji wî re nabê alikar û ew jî, tê kuştin. Piştî ku kîros ji seferê divegerihê, di qasra xwe de wê ji aliyê zêdegan û torînên medî ve ew li ser taxt were kuştin.

Çend ku navende Mediya û paytaxta wê hatiya rûxandin jî, lê hêza Mediya heya. Têkneçûya. Li herêmê êl û aşîrên Kurd ên medî, herêm bi herêm

birêxistinkirî na û herêmên xwe diparêzên. Ya ku kîros nekeriya ku bike destê xwe de ev e. Kîros bixwe jî, li gorî vegotinan, ew zaroyê keça qiyakser ku rêmildarên medî gotibûn ku wê dawiyê li desthilatdariya med werênê ye. Yanî, ew bixwe jî ji malbatek medî ye. Lê Kîros, piştre rastiya wî di nava xelkê de tê zanîn û ew çendî ku hêzek mazin di destê xwe de çê dike û çendî ku tevkujî û komkujiyan dike jî, wê nikaribê wê serdest û desthilatdariya ku ew hizir dike ku ava bike. Aşîr û êlên medî, xwe nêzî wî nakin. Piştî ku Kîros hat kuştin, wê yekî ku ji aliyê aşîrên medî û babil û farisan ve jî were herê kirin, wê bê hanîn li ser taxt. Di wê demêê de ku ew bixwe jî berpirsiyarê babilê ya Dariûsê yekem, wê bê hanîn li qasrê û bê dayîn rûnandin li ser taxt. Li gorî ku tê zanîn û vegotin jî Darîûsê yekem bixwe jî medî bû. Di bin desthilatdariya wî de wê ji nû ve desthilatdariyek were avakirin. Ew jî, desthilatdariya aqamanîşiyan a ku serokên aşîr û êlên Kurd jî, wê piştgiriyê bidinê de. Tevî ku ev desthilatdarî weke desthilatdariyek hevbeş dihê avakirin jî, wê dilê Mediyan rehet nekê. Bo vê yekê ya ku wê oldarên medî, wê zêde herê nekin. Wê piştî desthilatdariya Mediyan di bin serkêşiya oldarên medî de wê raperên civatî li hemberî wê desthilatdariyê werina kirin. Lê ji ber ku torînên medî ne li cem wê na, wê bi sernekevin. Raperîna herî mazin a di serkêşiya oldarên medî de ku dibê wê di serkêşiya oldarek medî ê bi navê ”çûsîma-komata” de bê. Ev raperîn, wê bixwûnê were tafisandin. Lê piştî wê re jî, wê gelek aşîrên medî xwe bi alikariya xwe ve ji desthiatdariya nû a aqamanîşiyan bidina vekişandin. Bo vê yekê ya ku wê ev desthilatdarî, wisa zêde pêşnekevê û mazin nebê. Piştre jî, wê ev desthilatdarî, derbeya mazin, ji artişên îskenderê mekedonî ku Kurd weke ”îskenderê zûrqerneyn” bi nav dikin, wê bixwê. Di wê demê de jî zêde aşîrên Kurd ên medî ên demê bi hêzên xwe re tevlî wê pevçûnê nabin. Alikariyê jî nadin. Heta ku dema ku artişa îskender tê, wê ew xwe li dora çiyayên zagrosan bicivînên û artişê îskender nikarê herê bi ser wan de. Çendî ku diçê, wê derbeyê bixwê.

Artişa îskender, wê li Kurdistanê bi hêrîş û seferên wê yên dikê re wê bê destpêka demekê. Bo vê yekê ya ku di nava Kurdan de gotina ”zûrqerneyn” li pêşiya navê îskender dihê bikarhanîn. Gotina ”Zûrqerneyn” di Kurdî de wateya wê, ”qernê ku mirov ji wê îbretê bigrê” ye. Her wisa di vê çerçoveyê dimejiyê Kurdan de cih girtiya. Her wisa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ev pêvajoya ku îskender di wê de seferê li Kurdistanê dike, wê talanak mazin li Kurdistanê bê kirin. Her wisa, wê weke ku di nava Kurdan de heta roja me jî tê gotin ”wê kevir li ser kevir nehêlin.” Ev gotin, bo wê demê, di mejiyê Kurdan de maya. Her dema ku wê demê bibîr dikin jî, wê biaxîneke ku dikişênin re wê bahsê bikin. Ji ber ku di wê demê de gelek tiştên xirab hatibûbûna serê civata wan. Komkujiyên mazin jiyan kiribûn. Di her demê de Kurdan, bi xwe sipartina li çiyayan xwe ji komkujiyan rizgarkiribûn. Di wê demê de jî wisa bûbû. Bi xwe sipartina li zagrosan û hwd re wê xwe ji komkujiyên wê bên serê wan, wê rizgar bikin.

Lê wê ev rewş zêde nedomê. Piştre di demek kin de ku 33 salî ya Îskender tê kuştin. Piştî wî, wê li şûna wî yekî bi navê ”Selefkus” werê û rûnihê. Ev jî wê demekê Mediya (´Kurdistanê´), babil û Persiya di bin destê xwe de bigrê. Piştre êl û aşîrên Kurd wê di sale 220´an de di bin serokatiya serokekî Kurd ê bi navê ”melon” de li hevdû bicivin û wê herêmê ji bin zilm û destê wan xilas bikin. Hêzên Melon, wê heta ber Diclê û Firatê wê werin. **Melon**, wê hêzên îskender ji herêmê bide avêtin. Lê piştre ne bi gelekî re wê hêzên roma, bidest hêrîşên xwe yên li herêmê bikin. Bi wê re wê **Melon**, xwe di nava şer û pevçûnên nû de bibînê. Mêranî û têrçaviya Melon weke serokekî Kurd, wê di nava xelkê de werê nasîn. Piştî desthilatdariya Mediya û xûrîxîna wê, wê pêvajoyek nû destpê bike. Xanadanên Kurd ên ku di konfedeliya Mediya hebûn, wê piştre bi ´rêxistinên weke kurkeyî´ wê xwe birêxistin bikin. Li gelek herêmên Kurdistanê, wê piştre kurkeyiyîtên nû wê derkevina li holê. Di vê çerçoveyê de wê pêvajoyekê destpê bike.

Lê li vir, tiştekî pirr giring heya ku divê ku mirov bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman. Ew jî ew a ku ev xanadan û ankû kurkeyiyên Kurd, wê di rojên giran de wê herina alikariya hevdû. Wê hevdû bi tenê nehêlin. Her wisa, di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman ku wê yekbûneka xezayî ya civatî wê serdest bê. Çend ku bi rêveberî û desthilatdarî, di rengê xanadan û ankû kerkeyiya de xwe birêxstin kirin hebû jî, wê di vê çerçoveyê de bi rêgez û zagoneke civatî wê bi hevdû re tevbigerihin. Di aslê xwe de ev rewşa ku em bi dema kurkeyê Kurd Melon re dibînin, ew a ku di vê wê demê de têgîna civatî bi awayekî serdestî wê hebe. Ya ku wê di temenê pêşketina wî de bê, wê ew bê. Her wisa, dema ku ew dixwezê ku Kurdistanê û ankû Mesopotamiya rizgar bike ji bin metingeriya hêzên îskender wê, hemû êl û aşîrên Kurd bi mazinên xwe ve wê bibazin cem wî û wê di bin serokatiya wî de wê bigihijina li hevdû. Ya ku wê di temenê serkevtinên kurkeyê Kurd Melon de bê wê ev bê. Wê ji başûr, rojhilat ber bi bakûr û rojava ve werê. Wê ber Diclê û Firatê jî bike bin desthilatdariya xwe de. Wê desthilatdariyek giştî weke ya medan, wê bixwezê ku ava bike. Melon, mirovekî xwedan bû. Zanebû. Di derbarê dîrokê de xwediyê zanebûnê bû. Her wisa dema Mediya û piştre hemû raparînên aşîrên Kurd ên medî ku bûna û biserneketina wan jî, wê dizanî. Gelek mazin û zaneyên civatê digotin ku ev serkevtina melon, wê serkevtina wan jî. Her wisa serkevtina kurkey Melon, weke ancama wê tekoşîna civatî jî dihat dîtin.

Di dema xwe de**kurkey melon**, wê hema bêja hemû herêman bike bindestê xwe de. Ew bixwe jî, mirovekî wisa bû ku dema ku artişa wî diket şer de wî, xwe ji wan şera bi şûn ve nedihişt. Herttimî, ew di refê pêş de di şer û pevçûnê de bû. Zanîn û hûneriya wî ya şer, bala herkesekî dikişand û ji herkesekê li dora wî re dibû mînaq,

**Kurkeyê Kurd Melon**, herêmê rizgar dike. Her wisa, êdî ew di xwe de biêmin a ku wan war û diyarê xwe paqij kiriya ji dagirkeran. Li ber diclê li aliyê wê yê rojhilat dikeve şerna mazin de. Di hemûyan de jî biser dikeve. Lê

di dawiya dawî de dema ku ew bawer dike ku ti kesekî ku ew bi wan şer bikin nemana û ew bi artişa xwe re di aliyê rojhiatê çemê diclê ve ku di seferê de ya, rastî hêrîşek pirr mazin tê û ew jî di nav de wê gelek çengewarên wî, wê werina qatil kirin. Çendî ku qatilkirina kurkey melon, wê bandûrek mazin ne baş li hemû artişa wî bike jî, wê lê wê pêşiya serkevtinên piştre ên wê negirê. Piştre, artişa wî, di pêşengên serleşkerên xwe de wê bikevina pay hildana tola kurkey melon de. Wê di vê çerçoveyê de wê hemû herêmê bigerihin û hêrîşkaran zant bikin û bikujin. Piştî Kurkey Melon re çendî ku ew nabînê jî, wê demek serdestiyê li welêt destpê bike. Her wisa, piştî paqij kirina artişa Îskender ji herêmê, wê êdî demek aramî û azadiyê li welêt destpê bike. Jiyan, wê dîsa were sêra berê. Her wisa, wê hêzên ewlekeriyê li her deverê bin. Aramî û azadiya ku bi sefer û serkevtinên serok û kurkeyê Kurd Melon re li welatê wî destpêkiribûn, wê piştre bi hêrîşên artişa roma re wê xira bibê. Di vê çerçoveyê de di sale li dora 145´an berî zayîna Îsa de, wê gelek herêmên Kurdistanê rastî hêrîşên artişa roma werin. Heta ku wê herêma Reha(´edess´) û emîdê´ jî bikina bin kontrola xwe de. Bi gotineke din, wê ev herêm werina metingerkirin. Berteka mîrgeh û kurkeyiyên Kurd, wê ji vê rewşa hatina artişên roma li herêmê re pirr hişk bê. Piştî kurkeyê medî(´Kurd´) Melon, bi nêzî 70 ´ salî re wê li dora Amîde kurkeyê Kurd Argu wê derkeve. Ev kurkeyê Kurd, wê amîde ji xwe re bike navend û wê hemû mîrgeh û kurkeyiyên Kurd di bin destê xwe li hevdû bicivênê û wê artişek pirr mazin a xort wê ava bike. Kurkey Argu wê li dora 145-129´an de de wê, bikeve tekoşîna derxistina artişa roma ji herêmê. Wê herêmê paqij bike. Bi alikariya pirraniya êl û aşîrên Kurd ên li herêmê wê vê yekê karibê bike.

Kurkeyê Kurd Argu, wê serkeve û wê desthilatdarî û welatekî azad ava bike ku wê ser 400 salî re wê bijî. Heta 244´an piştî zayîna îsa wê ev welatê Kurd wê bijî. Ji keyên vê welatê Kurd re ´**Abgar**´ dihat gotin. Wê di sale 179 û 212´an a piştî zayîna îsa de wê ´Abgarê nehemîn´ li gorî ku tê gotin, dema ku ola mesihiyê di pejirênê. Hingî jî, wê êdî pêvajoyek nû li welêt destpê bike. Ev pijartina wî, wê bê sedemê têkçûna welêt jî. Di aslê xwe de ev pêvajoya herêkirina´**Abgarê nehemîn**´ a ola mesihiyê, wê berî herêkirina ola mesihiyê a roma bê.Di vê çerçoveyê de komên civatî ên weke partî û hwd ku ev rengê baweriyê bijartina, wê li herêmê êdî baweriya xwe zêdetir bijîn. Bi wê re jî, divê ku mirov navê asûr û ermeniyan jî werêne ser ziman. Êdî ew jî, wê li Amîde û deverên din ên welêt wê dêr û parastgehên xwe çê bikin.

Ev gava ku Abgarê hnehemîn ku weke yê welêt avêtiya, wê ancamên mazin ên dîrokî bixwe re werênê.Herwisa, bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku wê li Kurdistanê, di vê çerçoveyê de pêvajoyek din bi xiristiyaniyetê re destpê bike. Bi wê re jî li Kurdistanê, wê xirîstiyan derkevina li holê. D aslê xwe de ya ku bandûrê li roma ya rojhilat dike ku ola mesihiyê bipejirênê jî wê ev rastî bê. Bi pêvajoya herêkirina ola mesîhiyê re keyê Kurd Abgarê nehemîn, pêvajoyek nû li herêmê giştî dabûbû destpêkirin. Dibêt ku wî

jî, hizir ne dikir ku wê ev gava wî wilqasî bi xwe re bandûrê werêne. Abgarî, bi desthilatdarî, wê di xate Mîtrayê de bijîn. Bawermendên Zerdeştitiyê jî hebûn li herêmê. Lê bandûra Mîtratiyê, heta wê demê jî wê zêdetirî hebe. Di vê çerçoveyê de piştî Abgarê neheîmin û hanîna wî ya li ser ziman a mesihiyê, wê bi xwe regelek nîqaşên li ser Mîtratiyê jî bi xwe re werênê. Her wisa, kîjan rengê baweriyê bandûrê li ya din dikê, wê di vê çerçoveyê de nîqaşên mazin bibin. Pêşveçûnên ku dibin, wê piştre, li ser wan gelek nîqaş bên kirin. Yên ku wê rastiya Mîtratiyê bixwezê ku di nava ola mesihiyê de fahm bike, wê derkevin. Bi wê re jî, oldarên Mîtrayî ku ji xwe re ”metran” digotin, wê piştre ev nav di nava wê rengê mesîhiya li Kurdistanê de li keşeyên mesihiyê jî werê kirin. Metrantî, saziyeka olî a olzanî(´teolojikî´) a Mîtratiyê ya oldaran a bilind bû. Ankû oldarên ku ji baweriya Mîtra, ji wan re ´metran´ tê gotin. Di vê çerçoveyê de ku heta roja me, wê ji keşeyên mesihiyê re bê gotin ”metra”, wê di temenê wê de ev rastî hebe. Heta roja me jî, keşeyên ku di payabilind de bûna di mesihiyê de di rengê mesihiya ku li Kurdistanê pêşketiye de weke ku heta roja me li herêma botanê û heta ku dihê û digihijê herêma Amîdê, wê hinekî jî di ancama vê de bê. Di aslê xwe de jî, ji ber vê bi navkirin û rastiyan a ku wê piştre hinek keşeyên mesihiyê derkevin û wê neraziya xwe li hemberî wê saziya metrantiyê wê bidina nîşandin.

Lê li vir, di dewama wê de ez divê ku vê yekê jî bibêjim ku Abgarê nehemîn´, bi wê gavavêtina xwe re gelek komên ku bi baweriya xwe cuda na, hildana li rex xwe. Her wisa, di nava koman de asûrî û ermenî jî hena. Ev jî, wê di di destê Abgarê nehemîn de wê hêzek civatî bide civandin. Herkesek jî, vê rastiyê dibînê. Ev hêza civatî ku Abgarê nehemîn ku di destê xwe afirand bi vê gava xwe, wê çavê key û wezirên romaya rojhilat jî vekin. Piştre jî, wê ew jî, di nava xwe de hewl bidin ku wê pêşbixin. Wê êdî hêrîşî mesihiyan nekin ku dema ku dikevina nava sînorê wan de ev rewş, wê piştre wê heta wê kongira li **Nîkomedîa´yê** ku çê dikin û di wê de ku roma dibê duqat. Roma rojhilat û ya rojava derdikeve li holê. Roma rojhilat, bo ku xwe biparêzê û weke berê karibê xwe bi hêzî li ser lingan bigrê, wê piştre mesihiyê herê bike. Di vê çerçoveyê de wê pêvajoyek nû destpê bike. Zane û şêwirmendên romaya rojhilat, wê şîroveyan li mesihiya li Kurdistanê li ser Mîtratiyê re pêşbixin. Bi wa şîroveyan re wê bixwezin ku ji meesihiyan re bibêjin ku ew ne mesihiya rast e. Mesihiya rast em in û em wê diparêzên. Di vê çerçoveyê de wê, ew şîrove û propangandayên wan piştre hin bi hin wê bandûra xwe jî bidina nîşandin. Di wê dem û pêvajoya ji dema derketina mesihiyê û heta wê dema ku roma rojhilat wê weke olek fermî ji xwe re herê dike de ew nîqaşên ku li ser mesihiyê û Mîtratiyê ku hatina kirin, wê di vê çerçoveyê de ji vê rastiya hanîna ser ziman a ´herê kirina Abgarê nehemîn´ a mesihiyê ye. **Abgarê nehemîn**, wê pêşî, nûqta û xalên hevbeş ên weke hevdû ên di nava rengê baweriya Mîtratiyê û mesihiyê de kifş bike û werêne ser ziman.

Di aslê xwe de ev têgînên Mîtratiyê wê di wê demê de bi wan rastiya mesihiyê werina fahm bikin. Her wisa pîrozkirina sersalê û hwd, wê pêşî weke kevneşopiyeka Mîtratiyê bê ku li Kurdistanê di nava Kurdan de dihat pîroz kirin bê. Ev kevneşopî, wê bi Zerdeştiyê re li herêmê belav bibê. Her wisa, ji herêma Kurdan heta herêmên Persan û bi wê re jî heta Asya dûr, wê ev kevneşopî werê zanîn û piştre pîrozkirin.

Bandûra Mîtratiyê, wê li ser mesihiyên demê pirr zêde hebe. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de Abgarê nehemîn, rastiyên hevbeş ên di nava van herdû baweriyan de hanî ser ziman. Piştî wî re wê gelek zaneyên baweriya mesihiyê wê werin û ji bawermendên Mîtratiyê û Zerdeştiyê wê xwe perwerde bikin. Piştre, dema ku di heman demê de Manî derket û baweriya xwe hanî ser ziman, wê bi heman rengî nêzîkatî li baweriya wî jî werê kirin. Manî, derketina wî, wê rastê vê dema Abgarê nehemîn were. Manî bixwe wê li dora 216´an de wê were dunyê. Di hundûrê vê demê de ew baweriyên li Kurdistanê û rengê pêşketina wan kifş dike. Bi wê re jî, êdî hizrên xwe dihêne ser ziman. Manî, di vê demê de wê weke wê rengê baweriyê ê li Kurdistanê ku heya, wê zaneyî, filosofî û pêxemberiya wê bike.

Manî, piştî ku derket û hizrên xwe hanîn li ser ziman, wê di çerçoveya wan hizran de wê bike ku hevgirtinekê çê bike. Wê mesihiyê jî hewl bide ku di nava rengê baweriya xwe de fahm bike. Bi wê re jî temenê pêşketina Manî pêşî li ser hizrên Zerdeşt û Avêsta û pişta Mîtra ye. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku Zaneyên ku di roja me de weke avakerê mesihiyê dihên zanîn ên weke Agustinus, wê bi salan di nava bawermendên Manî de bimênê û wê xwe perwerde bike. Pirtûka xwe ya bi navê ”welatê xwûdê”, wê peyxamê ji wan hizrên Manî, Zerdeşt û Mîtra bigrê û binivîsêne.

Di vê demê de nîqaşên di nava baweriya Mîtraîsmê û mesihiyê de ku hena, wê di vê çerçoveyê de bin. Her wisa, piştre, wê gelek bawermendên mesihiyê derkevin û Mîtratiyê red bikin, bo wan gotinên ku bi wan tê gotin ku bandûra Mîtratiyê li ser mesihiyê heya ji holê ra bikin. Wê bi teybetî, di vê xalê de dijberiyê bikin. Lê divê ku mirov vê yekê jî, werênê ser ziman ku piştre jî heta serdema navîn jî, wê ev nîqaşên bi bandûra Mîtratiyê ku li ser mesihiyê dihên kirin wê werina domandin. Lê ku mirov li reng û awayê pêşketina mesihiyê dinerê jî, mirov divê ku vê yekê jî bi wê re bibêje ku wê bandûra Mîtra û çanda Mîtra û rengê baweriya wî, pirr zêde li ser wê xwe bide nîşandin. Di gelek şêwa û rengan de dema ku mirov li mesihiyê dinerê, dema ku mirov li rengê nivîsandina dîroka Mesîh îsa dinerê, wê ji gelek aliyan ve Mîtra werênê bîra me. Gelek qalibên vegotinê, wê di mesihiyê de ji Mîtratiyê werina deynkirin. Her wisa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku rengên vegotinê ên weke jinûve bivejnbûna mesîh, di şikeftê de bûyîna wî ji dayikê, pîrozkirina sersalê û hwd, bi gelek rengên din ên jiyan, vegotin û rengê pêşketinê re wê mesihî ji Mîtratiyê deyn bikin.

Mîtrayî, çanda wê bi baweriya wê re weke ku di bin perdeyeka sernûxûmandinê de hatibê hiştin li wê hatiya. Her wisa, divê çerçoveyê de rastiya çanda Mîtratiyê hertimî, weke ku ji berçav dûr hatiya hiştin. Çanda Mîtratiyê, wê nêzî demeke ne bin hezar û pêncsad salî re serdemekê bi serdestî bijî. Di hundurê vê pêvajoyê de wê çand, bawerî û felsefeya Mîtratiyê li herêmê belav bibe. Her wisa, Mîtrayî, dema ku tê dema piştî zayîna Îsa, wê êdî weke ku hin bi hin di nava wê de bi awayn bişavtinê wê bê hiştin. Pergale olzaniyê a Mîtrayiyê, pêşketî ye. Bi têgihiştin û felsefe bûya. Di serdemên felsefeyê ên serdema kevnera de çand, bawerî û felsefeya Mîtra wê ji her aliyê ve kifşkar bê. Di aslê xwe de serdema Mîtra, mirov dikarê weke serdemek ku di wê de felsefe pêş dikeve werêne ser ziman bi serekeyî zanist û filosofên weke Zerdeşt û Manî, di wê çerçoveya pêşketina wê felsefeyê de werênina ser ziman. Çîrok, dîrok û vegotina Mîtra û jiyana wî ku di nava baweriya Yazdaniyê de heta roja me, bi hinek aliyên wê re dihê jiyîn jî, dema ku mirov li wê dinerê, her wisa mirov bi wê pêşketina wê ya felsefî re wê kifş dike.Çîrok û vegotina Mîtra û ga û ankû ´gûrandina ga´, wê di vê çerçoveyê de temenê destpêka pêvajoyekê li serdema felsefeyê bê. Li vir, Mîtra êdî vaca xwe û ankû mantiqê xwe derdixe li pêş.

Çanda divê ku bi awayê wê yê hizrî û felsefî re mirov kûr li wê bihizirê û bi hemû hûrgilên wê re werêne ser ziman. Wê gelek rastiyên dîrokî ên sernûxûmandî jî bi xwe re werêne li holê û bidê diyarkirin.

Serdema Mîtra, di aslê xwe de ji aliyekî din ve jî giring e. Ew jî ji aliyê civata Kurd ve ku mirov divê ku wê hilde li dest e. Ew jî, ew a ku Mîtra zane, bawermendekî ola Yazdan û bûya pêxemberê wê. Wisa jî hatiya herê kirin. Serdema ku di wê de Mîtra, derket û serdest bû jî, wê serdem û dema Mîtanniyan bê. Bi wê re jî, di aslê xwe de bi Mîtra re wê, hertimî giyanek û zanînek û şiqekî Mîtanniyî wê bi civatiyî jî xwe bide jiyandin. Zerdeşt, ew alî kifşkiriya û li ser wê aliyê re tenê hizrên xwe yê ´Avêstayî´ hanîna ser ziman. Lê ew aliyên Mîtra, weke xwe hiştina. Di vê çerçoveyê de dem dema ku tê serdema ku di wê de Manî derdikeve, wê di wê de çanda Mîtra hê jî bijî. Di aslê xwe de Manî mirov û zane û filosofê wê demê û xatê ye. Manî, dibînê ku Zerdeşt, bawermend û aqilmendekî wê demê ye. Şîrove û nivîsên Mîtra dema ku mirov li wan dinerê, bi minaqên dema Mîtra re dihên ser ziman. Her wisa di vê çerçoveyê de ew wê demê di çerçoveya xat û têgîna Yazdanî de dihênê ser ziman. Manî, teybetiya wî ew a ku ew dixwezê ku hemû rengên bawerî ku derketina bi bawerî û hizir û felsefeya xwe re bigihênê hevdû. Di vê çerçoveyê de Manî, dike ku demekê bide destpêkirin û dide destpêkirin jî. Lê di aslê xwe de ya ku li gorî wê têgîn, mazinahî û felsefeyê ku were jînkirin û serdestkirin, wê zêde nebê.

Manî, ti rengên baweriyî red nakê. Her wisa, Abgarê nehemîn jî, di vê çerçoveyê de nêzîkî mesihiyê jî dibê. Di vê çerçoveyê de wê dihênê ser ziman û dixwezê ku ew xwe bijî û pêşbixe. Wê yekê dike jî. Di vê çerçoveyê de di

aslê xwe de ku hizrên Abgarê nehemîn ku di welatê wî de serkevtî ba, wê serdemek nûjen di wê xate pêşketina Mîtra de ku Zerdeşt jî hatiya, wê biheta jînkirin. Ya ku di aslê xwe de Manî fahmkiriya û dike ku werênê ser ziman jî, wê ev bê. Manî, di vê çerçoveyê de zaneyekî dema xwe ku heta roja me jî, li gorî rastiya xwe ya mazin ku baş ne hatiya fahmkirin e. Her wisa Manî, rastiyek dîrokî ya civatî ye. Manî, di xwe de hevgirtineke wê xate Yazdanî ye. Wî hemû rengên pêşketina wê xatê baş dîtin, fahmkirina û dike ku wan şîrove bike. Şîroveyên wî di vê çerçoveyê de li ser wê xatê de na. Manî, li vir, weyna wî bi demî û serdemî giring û dîrokî ye. Em divê ku vê jî weke rastiyekê werênina ser ziman ku Manî, zaneyên dema xwe bi bandûr kirina û ên piştî dema xwe jî ku tên, wê bandûrê li wan bike. Her wisa, bandûra Manî û felsefeya wî, bi çandî wê pirr mazin bê. Manî ola wî, piştî wî re wê ser **sêsed** salî re wê bijî. Di hundurê wê demê de ew hizrên ku wî hanîna ser ziman, wê bi baweriya wî re werina xistin li jiyanê.

Di wê demê de ola mesihiyê derdikeve li pêş. Di aslê xwe de ya ku wê ola mesihiyê bike weke olek fermî, wê pêşî gava dîrokî a Abgarê nehemîn û piştre gava keyê romaya rojhilat constanipol e. Abgarê nehemîn weke serokê welatê xwe, wê bixwezê ku hemû baweriyên di welatê xwe bibînê û werêne ser ziman. Temenê wê yê hevgirtinê û her wisa hevdû fahmkirinê di têgîna Mîtra û piştre ya Zerdeşt de jî heya. Ew jî, ji wê xatê tê. Di vê çerçoveyê de Abgar nehemîn, gavek dîrokî diavêjê. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de Abgarê nehemîn, bi çerçoveya baweriya welatê xwe ve girêdayî ye. Ew, di wê çerçoveyê de wê dihênê ser ziman. Bi wê re dike ku ew were fahm kirin. Her wisa, li vir, di çerçoveya hanîna Mesih a ser ziman de pirr balkêş a, ku şêwayê hanîna li ser ziman a Mîtra dihê bikarhanîn. MInaq, gotina «wê mesihê rabê û cardin were dunyê.» Her wisa bo Mîtra jî dihê gotin ku «ew wê were dunyê û wê bi ne başiyê şer tebikoşê û biserkeve û piştre wê bo xatirê wî 40 salî li dunyê aramî û aşîtî wê hebe.» Dema ku ew rengê aramî û aşîtiya ku tê gotinn ku wê Mîtra werênê ku tê şîrove kirin, dihê gotin ku «wê meh û gûr bi hevdû re biçêrê, lê wê yek zirerê nedê ya din.» Di vê çerçoveyê de dihê hanîn li ser ziman. Bi wî re dihê gotin ku «Mîtra li ser taxtê xwe çûya azmana û li rex Yazdanê mazin disekinê heta roja ku werê dunyê.» Bo Mesih jî, dihê gotin ku ew bilindî azmana bûya û li rex xwûdayê xwe rûniştiya.» Di vê çerçoveyê de ev rengê vegotinê ê Mîtrayî, wê piştre di olên din ên ku piştre tên de jî wê bicih bibê. Di vê çerçoveyê de bandûra Mîtrayiyê, bênîqaş e.

Bawermendên Manî, bo wê hî heman şîroveyê bi heman rengî dikin. Ew jî dibêjin ku «laşê Manî li dunyê dema ku mîr, wê giyane wî biazadî her azmana û li rex ya Yazdanê mazin bisekinê.» Di vê çerçoveyê de ya ku mirov kifş dike, ev rengê şîroveyê Mîtra çendî ku bi mesih re hatiya hanîn li ser ziman, bi wê re jî hewl hatiya dayîn ku bi îslamê re jî ew li gorî wê şîroveya Manî a li ser giyanê re ku ew were pêşxistin. Di vê çerçoveyê de cihûtî jî, hatiya xistin li şûna ola êzdayî de.

Di vê çerçoveyê de rengên pêşxistinê, wê rengna bi awayê bişavtinî bin. Di vê çerçoveyê de wê li şûna xate olên yek-xwûdayî ya Yazdanî wê xate olê yek-xwûdayî ya semewî wê were pêşxistin. Abgarê nehemîn, di aslê xwe de weke ku vê rastiyê dibînê. Di vê çerçoveyê de bi rengê xate Yazdaniyê re şîroveya xwe pêş dixe. Li ser wê re nêzîkatiyê li baweriyên din dike. Bi heman rengî, bi awayekî zanebûnî nêzîk dibê. Di dema wî de Manî derdikeve û hizrên xwe dihêne ser ziman. Kevneşopiya welatê Argu ku demezrendiya, kevneşopiyek bi sedsalan e. Ev kevneşopî, ne bi carekê di gûharê û ne jî dikarê xwe li şûn bihêlê. Ya ku mirov dibînê, ku di farqê de bê û ankû ne di farqê de bê Abgarê nehemîn, weke ku dixwezê pêvajoyek xwe nûkirinê a li gorî demê bi xwe re werênê. Abgarî, li gorî kevneşopiya yek-xwûdayî a Mîtrayiyê dijîn. Di Kurdî de gotina «Abgar», tê wateya **«ewê kal» û ankû «ew kal».** Di nava civata Kurd de ´kal» weke çîneka serdest hena û di her demê de jî serdestî civatê bûna û heta ez divê ku bibêjim wan civat bi rê ve biriya.Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di nava baweriya Yazdaniyê û bi teybetî ya Mîtrayiyê de jî ´kal´ weke beşek û ankû çîneka serdest ku xwediyê ´mertebeyek olî´ heya. Dema ku behsa beşên hiyererşîkî ên ola êzdayiyê jî dihê kirin, ´pîr´ û ankû ´kal´, weke beşek teybet, ku piştî ya ´şêx´, ´faqîr´, ´kaval´ û hwd re têt. Bi gotineke din, pîroziyek jî di nava baweriya Mîtrayiyê de jî di çerçoveya civatîtiyê de li kal´an dihê kirin.´Kal´, weke serdestê civatê û rêvebirên wê, hertimî li pêş in û ankû derketina li pêş. Ti kesek heta roja me jî, di nava civata Kurd de gotina ´kal´an li ardê nahêlê. Ku kal bibêjin herina mirinê, wê çina mirinê. Li vir, gotina ´kal´ di Kurdî de pirr kevn e. Heta serdemên sûmeriyan jî diçêt. Di dema Sûmeriyan de jî, gotina ´kal´ weke navekî Yazdanî hatiya bikarhanîn. Di Kurdî de ´abgar´, taqabûlî gotina "kal" dibê. Weke ku tê zanîn jî, heta roja me, gotina kal, wateya xwe parastiya û di wate "mirovên pîr" de ye. Mirovên pîr, weke mirovna ku ew dayimî bi zane na têna ziman. Ev rengê vegotinê, heta roja me jî, di nava Kurdan de bi kevneşopî hebûna xwe parastiya û maya.Abgar, li gorî ku bi mîtolojikî jî tê vegotin mirovekî kal ku Enkî şandiya. Lê weke bawermendekî jî tê nîşandin. Ji keyan re û ji yên serdest re, bi aqil abgar, ji aliyê Enkî ve hatiya şandin ku şarîştaniyê bi wan pêş bixe. Tefsîrkirina wî, di şeklê masî de tê nîşandin. Kar û barê wî û berpirsiyarî wî, ew a ku ew a kevneşopî, çand û şarîştaniyê bide mirovan e. Bi vê yekê, weke zaneyekî tê tefsîrkirin. Abgar, aqilmend û şêwirmendê keyan a û yê ku rêya şarîştaniyê di nava mirovan de bide nîşandin a jî. Bi vê re divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku di nava ola ezdayiyê de heta roja me jî ´kal´ û ankû ´pîr´, weke mirovekî ku xwediyê ´mertebeyek olî´ û ankû weke kesekî pêşengê ê olî ku ji civatê re dide nîşandin e. Di vê çerçoveyê de nêzîkatiyên nû ên kevneşopiyê dide **nîşandin**.

Di aslê xwe de pêvajoya xwenûkirinê a Abgarê nehemîn û derketina Manî, wê di çerçoveya pêşxistina pêvajoyek nû de bê. Her wisa, dem jî di vê çerçoveyê de xwe nûkirinekê dixwezê. Ya ku di vê çerçoveyê weke lêgerînekê

ku mirov divê ku werênê ser ziman wê ev bê. Manî, di vê çerçoveyê de bi hzirên xwe re temenekî baş dihêne ser ziman. Lê Manî, pirsgirêkên desthilatdariyê ku derdikevina li pêşiya wî, bo ku wan derbas bike, wê ji herêmê herê demekê. Piştî ku divegerihê herêmê jî, wê dîsa rastî wan pirsgirêkan werê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku dema ku Manî ji herêmê diçê rêveberiyek herêmî û rewşek heya. Lê dema ku ew divegerihê rewşek din ya cuda heya. Abgarê nehemîn, desthilatdariya wî, di bin pêlên hêrîşan de ye. ji nava welêt jî, komên weke partî´ bi wî re di nakokiyê de na û dihêne bi ser wî de. Ev, pêlên hêrîşan wê desthilatdariya wî, bênina bertûnekirinê. Bi wê re jî li rojhilatê welêt ê Kurdistanê, wê kurkeyê Kurd keyuş, wê derkeve li pêş. Ew, wê pirraniya êl û aşîrên herêmê di bin desthilatdariya xwe de bicivênê û wê hêzekê di destê xwe de çê bike ku bi wê karibê di nava welêt de aramiyê çê bike û dervî welêt jî hêrîşên ku tên bisekinê nê. Vê yekê heta deverekê pêk jî tênê. Di wê demê de li rojhilatê welêt, wê bi Persan re jî, li ser esasê baweriya Zerdeştitiyê lev bike. Her wisa, di wê demê de hinekî berî vê demê de wê desthilatdariya Sasaniya ji nû ve li herêmê werê pêşxistin. Bi alikariya desthilatdariya Kurd, wê Sasanî jî derkevina dika dîrokê. Sasanî hêza Kurd û Persan di xwe de dicivînê. Bi wê armanca ku pêşiya pêlên hêrîşên roma û hêrîşên ku ji herêmên tên ser herêmê ku bigrê wê bi hevkariya Kurd Persan wê desthilatdariya Sasaniyan bi hevdû re li ser têgîna Zerdeştîtiyê were pêşxistin.

Piştî Abgarê nehemîn mir, wê mirgeh û kurkeyêyên Kurd bi serê xwe tevbigerihin. Wê hêzên pêşbixin ku karibin herêmên xwe û ankû xanadanên xwe biparêzên. Desthilatdariya Sasaniyan ku di pêşengiya Erdişêrê yekem de hatî avakirin, wê piştre pêşbikeve û wê bê hêzek mazin li herêmê. Wê ev desthilatdarî, karibê pêşiya hêrîşên roma ên lli herêmê bide sekinandin. Ev desthilatdarî, bi alikariya mirgeh û kurkeyiyên Kurd, wê hêza yekane bê ku ew karibê pêşiya pêlên hêrîşên roma bigrin. Her wisa, wê hêrîşên roma ên ku serboriyên weke ên ku hanîna serê ´Zenûba´, wê nehêlin ku cardin werina pêşxistin. Palmîra rastî hêrîşên Roma tê û tê tarûmar kirin. Palmîra, wê di wê demê de piştî wê rewşa biêş a Zenûba re wê bikeve bin destê desthilatdariya Sasanî de.

**Ew destpêka ku Abgarê nehemîn ku** di mejiyê xwe de li wêdigeriya**,** wê bihizrênZerdeşt **re bi Sasanî re were pêşxistin.**Ya ku keyê Kurd key Abgarê nehemîn xewn kiribû, wê bi hizrên Zerdeşt re pêşbikeve. Sasanî, wê li herêmê weke hêzek mazin ya herêmî pêş bikeve. Her wisa, bi aikariya xelkên herêmê pêş dikeve. Lê ev desthilatdarî karibê, pêşiya hêrîşên roma ên li herêmê jî bigrê.

Rewşa Sasanî û pêşketina wê, wê giring bê ku mirov wê fahm bike. Her wisa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Sasanî, wê weke desthilatdariyek konfederelî bê. Wê sereke Kurd û Pers wê pêşbixin. Wê wê xelkên din ên herêmê jî bi hêzên xwe tevlî wê bibin. Sasanî, piştî ku wisa zû

pêşket û û mazin bû û pê de, wê zû jî ji rê derkeve. Rewşa Manî û serboriya Manî, wê têkiliyên Kurd û Persan pirr zêde bi bandûr bike. Her wisa, ji ber vê yekê ku rêveberiya Sasanî, wê demekê destûrê bide Manî û demekê nehêlê ku ew xwe aligirên wî xwe werênina ser ziman. Piştî Manî û qatilkirina wî bi awayekî hovane, wê di vê çerçoveyê de rewş derkeve li holê. Bi xanadanî wê gelek kurkeyiyên Kurd wê di nava wê avakirina desthilatdariya Sasanî werin. Kurkeyê Kurd Keyûş, weke keyekî wê xwediyê hêza mazin bê. Di destpêkê de wê, alikariyê bihêza xwe bidiyê de. Lê piştre rewşa Manî û hinek nêzîkatiyên din ên ku ji keyên Sasanî pêş dikevin ku key Keyuş li wan dinerê, êdî ji desthilatdariya Sasanî sar dibê. Xwe dide alikî. Naxwezê ku zêde nêzîk bibê. Lê hêza keyuş, di wê demê de rojhilatê Kurdistana roja me, ku heta gelek herêmên lolîstanê û ber zagrosan û ber Diclê û Firatê wê karibê li wan hêza xwe mazin bike. Bi awayekî wê pirraniya êl û aşîrên Kurd ên mazin hilde rex xwe û wê û wê bi wê hêza xwe ya mazin wê li Kurdistanê wê desthilatdariyê ava bike. Rêveberiya Sasanî, dema ku li serdestî û pêşketina desthilatdariya Keyê Kurd key keyuş dinerê, êdî ditirsihê.Wê bixwezê ku pêşiya wî bigrê. Di vê çerçoveyê de keyê Kurd key Keyuş, wê axa Abgariyan hemûyî cardin bike bin desthilatdariya xwe de. Rêveberiyên xanadanî ên Kurd ên ku Abgîrî li ser lingan digirtin bi hêza xwe re wê alikariya xwe bidina key Keyuş jî. Bi wê alikarî û hêzê wê key keyuş heta ber Diclê û Firatê û herêmên li dora wê bike, bin dest û desthilatdariya xwe de.

Divê demê de ji aliyê hizrî ve jî dema ku mirov li wê dhizirê, mirov dibînê ku demeke felsefeyê ya pêşketî û bizanistî destpêkiriya. Her wisa lêgerînên di nava hizir û zanebûnê de ên bi aqil wê di vê çerçoveyê de bibin. Pergale aqil, felsefe û baweriyê ya Mîtra û piştre hizrên Zerdeşt, wê weke pergalek civatî ya rûniştî a li herêmê bê. Bo vê yekê, wê ev bale herkesekî bikişênê li ser xwe. Ola Mîtra û ankû xate olî ya yek-xwûdayî ya Yazdaniyê, heta wê demê jî xwe biserdestî wê bide jiyankirin. Di aslê xwe de wê piştre li herêmê tekoşîna serdestiya li pergalê wê destpê bike. Her wisa, di vê çerçoveyê de ev pergale hizrî, weke pergalek giştî ya civatî, wê bi desthilatdarî wê hebe. Di wê demê de hê mesihî ne xwediyê ti rêveberiyên fermî na. Her wisa, roma wan li kû dibînê qatil dike. Gelek ji wan, wê werina Kurdistanê û xwe li wê herêmê bigrin. Herêmên ku mesihî qasta wan dikin û diçina wan, herêmên rojavayê Kurdistana roja me ên ji ber firatê û heta helebê na. Bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ev herêmên Kurdistanê, wê herêmna navendî ji pêşketina Mîtra û oldarên wî re jî. Her wisa çiyayî Kurda li rojava ku heya, wê parastvaniyek baş ji herêmê re bike di wê demê de. Mîtra, di dema xwe de li wî çiyayî maya. Piştre jî, oldarên wî li wir mana û hertimî hatina wir. Ev herêm bûya weke herêmek ku navend ku ji ber firatê ku karibê bandûrê li herêmên anatolia jî bike. Ola Mîtra, wê ji vir, bi herikê gelek herêmên din ên anatolia jî. Dema ku artişên roma û hwd, tên herêmê, wê pêşî rastî van baweriyên herêmê a ku Mîtrayiyê pêşxistina wê werina. Heta ku li gorî hinek

vegotinna, tê gotin ku wê romî jî wê hin bi hin piştre baweriya xwe bi Mîtrayiyan werênin. Li herêma Mesopotamiya û anatolia û heta ku digihijê Asya dûr, wê di qadeke mazin de girseyên mazin ên ku baweriya xwe bi Mîtrayiyê dihênin wê hebin.Herwisa,piştre derkevina Zerdeşt jî, wê vê bandûrê zêdetir bike li herêmê. Wê piştî Mediya û desthilatdariya wê re li herêmê, civatên Avêstayî wê derkevina li holê ku ev xate baweriya Yazdanî ji Mîtra û heta Zerdeşt ku heya di nava wan de bicihbûyî û pêşketî heya.

Rastiya ola Mîtra, heta roja me jî, li gorî rastiya wê bibaşî ne hatiya fahmkirin. Dema ku rastiya wê li gorî rastiya wê were fahmkirin, wê hingî ew rengê pêşketina wê ya li herêmê jî wê were dîtin. Mîtrayî weke olekê wê li herêmê xwediyê serdestiyek bi hezaran salan bê. Her wisa di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastiya wê ya ku li jiyanê heya werênê ser ziman.

Pergale olzaniyî a Mîtraîsmê, wê bi demê re rûnihê. Dîrokeka wê yadirêj a bihezaran salan ku heta ku tê vê dema Abgarê nehemîn, wê hebe. Abgarê nehemîn, di mejiyê xwe de li gorî oldarên Mîtrayî û weke ku ew jî dibêjin, wê xilaskerekî nû wê were ser rûyê ardê.” Hinek bawermendên Mîtrayî, ji van gotinên ku bi wan tê gotin ku ”wê Mîtra bixwe jî piştî sê hezar salan wê were ser rûyê ardê” peyxam digirin û heta ku dibêjin ku ”dibê ku ev Mîtra jî bê ku hatiya ser rûyê ardê.” Di vêçerçoveyê de wê hinek gotin werina gotin. Ya ku bale Abgarê nehemîn, dihêne ser Mesih îsa û hatina wî ya li dunyê jî, wê ev bê. Mîtrayî, wê bi hizra xwe ya ku bi wê bawer dikin ku wê Mîtra cardin were ser rûyê ardê û ew rewşa nebî Îsa ku pêş dikevê, wê bixwezin ku têkiliyekê bi hevdû re bi wan dênin. Mîtrayî bawer dikin ku wê piştre Mîtra cardin were ser rûyê ardê û wê bi xirabî û nebaşiyê têbikoşê û wê biserkeve. Piştre jî, wê dunya bo xatirê wî 40 salî di nava aramiyek mazin biafirê. Li gorî ku ew tefsîr dikin, wê dunya bê kûrçikek ji bihûştê.

Piştre qatilkirina Mesih, ji aliyê roma ve jî,w şîroveyna cuda di nava Mîtrayiyan de were pêşxistin. Wê bi demê re şîroveyên wisa werina pêşxistin û gotin ku ”mesih ne miriya, ew dema ku leşkerên romê hat ku wî bigrin û bikujin, wê Yazdan wî hilde azmana li rex xwe.” Di vê çerçoveyê de hizrên Mîtrayî pêş dixin wê hebin. Her wisa, di vê çerçoveyê de rewşa Mesih îsa, weke rewşeka ku bi tememî hê wan baş fahm nekiriya dimênê. Ew jî, dixwezin ku fahm bikin ku ew Mîtra ya ku cardin hatiya dunyê û ankû ne ew a, ku dixwezin ku fahm bikin.

Mîtrayî, di zanîna xwe de pirr zêde li pêşî dema xwe na. Ew, stêrzanî jî di nava wan de pirr zêde pêşketî ye. Ji ber ku ew bawer dikin ku wê nîşanakên hatina Mîtra li dunyê wê ji stêran bigrin. Bo vê yekê, di wê zanîna stêrzaniyê de pirr kûr û dûr çûna di xwe de.

Bi vê re, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hinek helbestên ku di wê de Mîtrayî, Mîtra û mesih îsa bi hevdû re didin axiftin jî wê binivîsênin. Her wisa, ev helbestên ku ji wan deman û heta roja me jî di nava bawermendên êzdayî de hena û tên ser ziman, weke ku ew dibêjin ew ji demên destpêka

hatina îsa na.” Yanî bi gotineke din, dixwezin ku bibêjin ku hê dema ku nebi îsa li jiyanê dijî, di wê demê de dema ku di rê de diçê, Mîtra derdikeve ber wî û îsa bi wî re dikeve axiftinê û pirsên xwe yên di serê xwe de ji wî dike. Di helbestekê de weke ku tê gotin ku serê peykelê Mîtra ku ji kevir hatiya çêkirin, ew bidest axiftinê dike bi nebî îsa re. ..

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku Keyê Kurd Melon ku artişên Îskender ji Kurdistanê derxist û bi wê re weke serokekî Kurd bû malê dîrokê û keyê Kurd ê piştre key Argu ku artişek mazin ava kir û Kurdistan ji hêrîşên artişên roma parast û piştre welatek û desthilatdariyek nû avakir ku piştî wî re nêzî çarsed(´400`) salî wê bi serdestî ew welat û desthilatdariya wê xwe bide domandin, wê di vê çerçoveyê de beşek dîroka civata Kurd û Kurdistanê û xelkên din ên Kurdistanê wê bi xwe re werêne ser ziman. Lê piştî desthilatdariya Mediya ku bi hizrên Zerdeşt pêşketiye wê piştî wê re rewşek nû derkeve li holê. Serdemên ku di wê de Îskenderê Mekedonî hêrîşî Kurdistanê dike de wê herêmên Kurdistanê bixûrixênê. Her wisa, wê pirtûkxaneyên medan û civata wan, werina tarûmar kirin û şawitandin. Piştre, dema ku Îskender, artişên wî ji Kurdistanê hat derxistin, wê ji nû ve weke ku hizrên Zerdeştitiyê û Mîtratiyê û hwd werina kifşkirin. Kevneşopiya olî, rûniştiya bi civatî. Çendî ku hêrîş dihên kirin, wê bi wê kevneşopiyê, hertimî jiyandin û hanîna ser ziman bibê. Her wisa, di destpêka Sasaniyan de Ardişêrê yekem, wê bikeve lêgerîna berhevkirina hemû nivîsên Avêsta ku hatina windakirin. Mîtrayî jî û Yazdanî jî, di wê demê de zêde li Mîtra baş ne dinerin. Ber ku bawer dikirin ku ew ji rêya baweriya Yazdanê mazin derketiye ye. Bo vê yekê, wê di wê demê de jî çendî ku di dema Mediya de hizrên Zerdeşt di demek dirêj de dihên ser ziman jî, wê dîsa ew hanîna li ser ziman û serdestbûna hizrên wî, negihijê asta yên Mîtra bixwe jî. Mîtra, weke pîroziya herî mazin wê bê dîtin. Her wisa, wê yê ku li ser sofraya Yazdanê mazin rûniştiya û bi wî re xwariya û vexwariya, dihê hanîn li ser ziman. Lê dîsa, wê Zerdeşt, bizêdeyî di jiyanê de hebe. Manî, wê weke yê ku rastiya Zerdeşt û Mîtra ku di xate yek-xwûdayî ya Yazdaniyê de fahm dike bê. Bi wê yekê re wê, bike ku hizrên xwe werêne ser ziman. Desthiilatdariya Abgar, wê bi kevneşopiya Mîtra ve girêdayî bê.Keyên wê, wê di **şopa Mîtrayiyê** de bin. Her wisa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Piştre keyê Kurd key Abgarê nehemîn, wê her wisa di vê çerçoveyê de bike ku pêvajoyekê bide pêşxistin. Li herêmê, hêrîşên artişên roma ku dibin, wê li herêmên sînor bibin. Bajar û bajarokên li herêmên sînor ên weke Palmîra û hwd, wê rastî hêrîşên artişên roma ên hov werin. Artişên roma, anatolia bindest kirina. Gelek herêmên wê bûna xwediyê pişgir û aligir. Ji wan herêman dixwezin ku werina herêmên berDiclê û Firatê.

Lê çend ku dikin jî, wê nikaribin serkevtine mayînda li herêmê bidest bixin. Bi hêrîşên ku li herêman dikin û dixûrixênin û pê de, wê ti rastiya wan zêde li Kurdistanê pêşnekevê. Bi demê re çanda Mîtra a ku bi hezaran salan li herêmê

bi têgîn û baweriya Yazdaniyê re ku li herêmê serdest a, wê bandûra wê zêde hebe. Em divê ku vê yekê jî, bi teybetî werênina ser ziman ku Çanda Mîtra, wê ji gelek aliyan ve bandûra wê hebe. Li Asya dûr, bandûra hizrên Mîtra ûû pergale wî ya hizrî û felsefî bi rengê baweriya wî re wê xwe bide diyarkirin. Her wisa, em dikarin rengê pêşketina Mîtra, bi sê xalan bi teybetî û giştî werênina ser ziman. Rengê pêşketina Bûda û ankû bûdismê ku li Asya dûr heya, wê bandûra hizrên Mîtra û pergale wî pirr zêde hebe. Bi wê re bi xala din ay duyemin re jî, mirov dikarê li ser Zerdeşt re behsa Mîtra û rengê pêşketina wî ya li rojhilat û Mesopotamiya bike. Di vê çerçoveyê de ev rengê pêşketinê, wê xwe piştre bi gelek rengên pêşketinê re bidê diyarkirin. Weke xale sêyemin û a dawî jî, mirov dikarê bi pêvajoya Manî re wê werênê ser ziman ku li gorî serdemek nû ya aqil, felsefe û zanistê ku dike ku xwe birêxistin bike, mirov dikarê werêne ser ziman. Manî, teybetiya wî ew a ku ev dîroka pêşketî, bi hizir û zanebûna wî re ji hemû aliyên wê ve derdixistiya têgihiştin. Bi wê re jî hemû xatên pêşketinê ku çanda Mîtra û felsefeya wî ji xwe re kiriya navend û pêş dikeve, wê rêya wan di felsefeya Manî re bibûhûrê. Her wisa, Bi serekeyî Manî, wê Zerdeştitiyê ji xwe re bike temenê û ji hizrên xwe re bikê hîm. Lê bi wê re di çerçoveya pêşketina dîrokiya wê ve jî wê Mîtra û çanda wî bi têgîna Yazdaniyê re hebe. Her wisa, rengê pêşketina Bûda ku Asya dûr pêş dikeve, wê Manî bi hizrên xwe ji wê jî sûdwergirê. Manî, bi vê yekê, dixwezê ku çerçoveya pergale hizrî û felsefî a Yazdaniyê li gorî asta zanîna dema xwe werênê li laş. Di vê çerçoveyê de hemû pêşveçûnên hizrî ên ku ji xwe re ev têgîna Yazdaniyê ku Mîtra bê û ankû Zerdeşt bê ku ji xwe re kiriya navend, wa derdixe têgihiştinê. Li ser wê re jî, hizrên xwe yên felsefî û baweriyî dihênê ser ziman.

Pergale hizrî a Manî, ji gelek aliyên wê yên ku divê ku mirov wê hilde li dest, her wisa hê ne hatiya hildan li dest. Nêzîkatiya Abgarê nehemîn jî, mirov wê di vê çerçoveya nêzîkatiya Manî a dema wî de mirov wê karibê fahm bike û werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de rastiya Abgarê nehemîn, dema ku mirov lêdikolê, mirov ji rastiyek Maniyî dûr nikarê wê fahm bike û hilde li dest. Di vê çerçoveyê de bi rengekê pêşketinê xwe dide diyarkirin.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov hinekî li ser têgîna Zerdeşt a ku tê gotin ku Sasanî ji xwe re weke têgînek bawerî û olî a ´fermî´ û bijartiya jî, mirov divê ku hinekî li ser wê bisekinê. Li vir, di çerçoveya pêşketina Sasaniyan de mirov dikarê li ser wê bisekinê û werêne ser ziman. Di aslê xwe de ya ku mirov di serî de werêne ser ziman, ew a ku desthilatdariya Sasanî û keyên wê yên demê, ji kirin û rastiya wan, mirov fahm dike ku wan bi kûrehî û başî ew têgînên Zerdeşt jî baş dernexistina li têgihiştinê. Di çerçoveyek desthilatdarî de ew, nêzîkî wê dibin. Her wisa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku Sasanî, piştre rewşa Manî û qatilkirina wî, wê bo wan û rewşa wan û asta fahmkirina wan û desthilatdariya Sasaniyan a Zerdeştiyê û hizrên wî yên Avêsta, wê vegotinbar bê. Manî, di dema Keyê Sasanî Şapûrê yekem ve tê

herêkkirin û Manî di dema wî de destûrê distênê ku hizrên xwe li welêt belav bike. Ev destûr dayîmna key Şapûrê yekem mirov, li gorî hinek dîrokzanen ku dihênina ser ziman, dibêjin ku bo ku ji bandûra Manî sûd wergirê û hêza mazin bike ye. Di vê çerçoveyê de weke sedem, ev dihê ser ziman bi navê Şapûrê yekem re. Manî û bawermendên wî, wê di vê demê de derfetekê bibînin ku li hemû herêmên desthilatdariya Sasaniyan ku hizrên xwe werênina ser ziman. Lê piştre di dema Behremê yekem de wê, ev yek bigûharê. Key bahremê yekem, wê ji Manî bixwezê ku ew di nava xelkê de wî pîroz bike û derxe li pêş. Manî ev yek, herê nekir. Piştre jî, wê Manî girt û avêt zindanê. Bi rojan li wî êşkence da kirin. Lê Manî, xwestekên Bahremê yekem herê nekir. Piştre jî, Bahremê yekem Manî da kuştin û Serê wî bi devê deriyê bajêr ve kir bo ku bandûra xwe bide diyarkirin. Lê ew bandûra wî dixwest, bidest nexist. Di dema bahremê yekem de wê Zerdeştiyên desthilatdariya Sasanî jî li ser vê rewşê bina duqat. Di aslê xwe de mirov, dikarê vê rewşê weke destpêka berjêr çûyina Sasanî jî werêne ser ziman. Sasanî, wê di dema Ardişêrê yekem û piştre di dema Şapûrê yekem de demna xwe yên baş ên desthilatdarî derbas bike. Wekî din, wê demên piştre û ji teybetî di dema bahremê yekem û pê de, ev pêvajoya berjêr çûyina Sasanî wê bi leztir bibe. Ev rewşa Manî, wê têkiliyên Kurd û Persan ji hevdû cuda bike. Êl û aşîrên Kurd, wê xwe û piştgiriya xwe hin bi hin ji desthilatdariya Sasanî vekişênin. Ahîmînî jîwê weke eşkanyan, wê nexweşiyên wan li ser kirinên desthilatdariya wê biafirin.Êşkanî, bi êlî wê xwediyê heyînek baş mazin bin. Heta ku di sale 53´an ku artişên roma pêngavekê ji aliyê xwe ve didina destpêkirin û dikevina Kurdistanê de. Hingî li herêma herranê a Rehayê wê bi artişa desthilatdariya Kurd a Abgîrî di pêşengiya **Abgarê duyem** de wê çina pêşiya artişa roma û wê li vir bi wê re bikevina şerekî pirr mazin de. Wê Artişa roma li wir, bi tememî tûna bikin û têkçûnek dîrokî bi wê bidina jiyan kirin.Ahîmînî, wê weke civateke ku li gorî nirxên Zerdeştiyê jî dijîn bin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku çend ku di vê demê bi vî rengî bi hevdû re tevgerîn hebe, wê li herêmê hinek pirsgirêkên din jî wê hebin. Minaq, xanadana Kurd a Medî, wêdi sale li dora 90 û 80´yî de wê desthilatdariya xwe ji nû ve xort bikin. Wê di bin wê desthilatdariyê de hinek êlên Kurd ên weke Gorî jî wê bi Mediyan re tevbigerihin. Wê welatek bi navê ”gortaç” wê ava bikin. Ev welatê Mediya di vê demê de wê demek dirêj li ser lingan bimênê. Di sale 2´min a berî zayîna îsa de ku keyê vê welat û desthilatdariya Kurd a Mediya êbi navê key Artavas ku bi bidestê partiyan tê kuştin, wê ev hem bê derbeyek li welat û desthilatdariya demî a Mediya û hem jî wê bê temenê hêrîşên din ên li herêmên Kurdan. Xanadana med, wê di vê demê de jî xwe bide domandin. Partî, piştî vê rewşê, wê bihizirin ku hêza xanadana Mediya kêmbûya û wê herina bi ser wan de ku ew li herêmê hem wan bikina bin kontrola xwe de û hem jî ew weke hêzekê mazin bimênin. Lê medî vê yekê herê nakin û dikevina ppêvajoya berxwedanê de. Heta piştî zayîna îsa li dora sale 51´ê, wê ev rewşa

Mediya wê bidomê. Lê Piştre piştî zayîna îsa li dora sale 51´ê de wê aşîrên Kurd cardin li hevdû bicivin û wê di bin serokatiya Volaq û ankû ”**volag**” de wê, li hevdû bicivîn û wê cardin li herêmê serdest bibin. Wê hemû hêrîşên ku tên bi ser wan de wê, bidina sekinandin. Hingî ev serok û **keyê Kurd Volaq**, wê li ser axa Mediya wê welatê xwe ji nû ve ava bike. Ev desthilatdariya nû a xort ku Volaq ava kir, wê heta salên li dora 80´yî piştî zayîna Îsa, wê bi xortayiya xwe re bijî û bimênê. Ev destilatdariya Volaq, wê dem bi dem rastî hêrîşên derve û hundûr jî werê. Di wê demê de hêrîşên romayiyan li Kurdistanê zêdebûna. Heta dema derketina Sasaniyan jî, wê rewşa Mîtra û Zerdeşt a olî di vê çerçoveyê de wê xwe bide domandin. Her wisa, weke mirovna ku ji zilma roma direvin mesihî wê werina Kurdistanê û wê li wan were xwedî derketin. Wê mesihî, xwe nêzî Mîtratiyan hîs bikin. Di nava Mîtrayiyan û Zerdeştiyan de wê, wê xwe perwerde bikin. Ev rewş, piştî derketina Sasaniyan û ji aliyê romaya rojhilat ve heta wê dema herêkirina mesihiyê weke ´olek fermî´, wê êdî wê bigûharê. Ev herdû hêzên ku li dijî hevdû disekin in, wê baweriyên xwe jî li dijî hevdû bikina pozisyonekê de. Di vê çerçoveyê de hêrîşên roma ên di bin maskeya ola mesihiyê de ên li Kurdistanê û herêmên din ên Sasanî, wê bi heman rengî bersivê ji Sasaniyan jî û rêveberiyên din ên herêmê bibînê. Sasanî jî, wê di bin maskeya Zerdeştiyê de wê şerê xwe yê li dijÎroma bide domandin. Ev rewş, wê bi xwe re rewşeke weke ya ku ´Zerdeştî û mesihî bi hevdû re şer dikin´, wê rewşekê bênê li holê û bide diyarkirin. Piştre nîqaşên ji hevdû cudakirinê wê destpê bikin. Her wisa, piştre heta ´serdema navîn´, nîqaşên di çerçoveya ´li ser Mîtratiyê û bi wê re li ser Zerdeştiyê re ku bi mesihiyê re dihên kirin, wê bibin. Heta sale sedsale 5´min a piştî zayîna îsa, wê rewşa Kurd û desthilatdariyan ya bi hevdû re wê bi hemû pirsgirêkên xwe re wê bidomê. Sasaniyan jî û Kurdan jî, bo ku bi hevdû re karibin bidina domandin û wan hêrîşên roma bidina sekinandin, bo wê jî weke ku mihtacê hevdû bûn. Di sedsale 5´min û heta dawiya wê, weke ku hêrîşên roma jî kêm dibin li herêmên Kurdan û ên Sasaniyan. Ev jî, wê bi xwe re rehetiyekê werênê. Di vê rewşê de li ser kevneşopiya xanadana med, wê aşîrên Kurd ên gorî, li hevdû bicivin di serokatiya keyê gorî key **Gavataz** de û wê welat û desthilatdariya Kurd ku navende wê kirmaşan a wê ava bikin. Ev desthilatdariya Kurd, wê başûr û rojhilatê Kurdistana roja me bike nava xwe û heta ku wê herêmên weke Ermenîstana roja me jî, bike nava sînorê xwe de. Lê di vê demê de gelek herêmên Kurd, ji destê Kurdan jî hatina derxistin û ji aliyê xanadana Sasanî ve ji Kurdan hatiya vala kirin. Piştî vê demê, wê êdî di nava Kurdan de li Kurdistanê wê pêvajoyek nû destpê bike.

Li vir, ya ku mirov di serî de kifş dike, dem bi dem çendî ku rastî hêrîşan werina û di ancama wan hêrîşan de desthilatdariya wan zayif bikeve û heta ku bikeve bindest de jî, wê hertimî li welatên xwe li ser axa xwe weke hêzek serdest hebûna bi kevneşopî domandin. Di vê çerçoveyê de bi ol û bawerî û kevneşopiyên xwe re, jiyana xwe dana domandin. Di vê demê de jî, dem bi

dem rastî pêvajoyên hêrîşê ên xûrixandinêtên. Lê ew pêvajoyên xûrixandinê bi ji nûve avakirina desthilatdariyên nû re bi xanadanên Kurd re wê di zikhevdû de bi dîrokê re bimeşê. Heta vê demê de jî, ya ku mirov kifş dike, di xate yek-xwûdayiya Yazdanî de ku xate baweriya civatî di nava civata Kurd de xwe domandiya. Pêvajoyên bi baweriya Mîtra û piştre ên bi baweriya Zerdeşt re wê bidom in. Di vê çerçoveyê de ev baweriyên Kurdistanî, wê ji aliyê xelkên din ên herêmê ên weke faris û hwc ve jî, wê werinê herêkirin.Desthilatdariya Sasaniyan, di vê çerçoveyê de pêvajoyek li ser rengê baweriya Zerdeştitiyê pêşxist û bi wê re, rêveberiya Sasanî pêşxist. Lê wekî din jî, dema ku mirov li nava jiyana civata Kurdistanê dinerê, ya ku mirov dibînê, ew a ku bi baweriya xwe re hertimî bi **kevneşopiyên** xwe re **jiyane**. Ev rewş, heta dema derketina Manî û bawermendên wî jî, wê wisa bê. Pirr giringa ku mirov di vê çerçoveyê de bi demên bûhûrî û ên ku tên bi hevdû re li ser Manî û bawermendên wî, bihizirê û wan bi dîrokê re fahm bike.

Her wisa ev rewş jî, wê weke rewşek giring bê. Li herêmê, êdî wê xanadan, mîrgeh û kurkeyiyên Kurd,li herêman wê derkevina li pêş.Hêzên wan ên ku hena jî, wê bidest parastina herêmên xwe bikin. Ev jî, wê bê temen û sedema kêmbûna bandûra desthilatdariya Sasaniyan. Lê bi demê re, wê bandûra Maniyiyan jî zêdetir bibe. Heta ku wê bên wê astê ku êdî karibin ku bikevina berhevdû de bi desthilatdariya navendî a Sasaniyan re. Piştî Manî re rewşa Hûrem, wê li vir nîşaneke vê rastiyê bê. Hûrem, wê weke bawermendekî Manî û xate Yazdanî, wê weke pêşengekî mazin bi demê re derkeve li pêş li rex Mezdek. Manîvan û ankû Mezdekî, di dema xwe de heta ku wê karibin herina qasra Sasaniyan û keyê Sasanî Kewê dilbigrin û desthilatdariyê bikina destê xwe de. ..

Têgîna Manî, ku piştî wî re dihê hanîn ser ziman, bi ancamên wê ên pêşketinê re pirr zêde li pêş e. Dema ku em li gorî asta demê şîrove bikin, em divê ku asta Bawermendên Manî, li ser asta demê re werênina ser ziman. Bawermendên Manî, di dema xwe de bi têgîna civaknasi, li pêş in.Herwisa li hemberî desthilatdariya Sasaniyan, di nava xelkê de behsa ”xizaniya girseyên gel” û ”dewlemendiya key û çend mirovên li dora wî” dihênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de di çerçoveya têgînek civatî a çînî de gotinên xwe dibêjin û hizrên xwe dihênina ser ziman.

Rewşa Manî, weke ku me li jor hanî ser ziman wê rewşek giring bê ku divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê.Ji ber ku Manî, mirovekî ku biaqilê xwe yê ku dihêne ser ziman, wê temenê aqiê demê ê ku pêş dikeve. Felsefe û zanista dema nû a ku ew diwê de dijî, wê biafirênê. Nîqaşên li serî Manî ên weke ”têkiliya di nava giyanê û laş de ku ew dike bi mirovên li dora xwe re, wê rengekî din ê aqil bê ku ew dihênê ser ziman bê. Her wisa, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku Manî, wê bi aqil û zanebûna xwe re filosofiya demê bike û bi wê re rengê ol û oldariya demê ku bi wê aqilê felsefeyê ê demê re pêş dikeve û ku wê çawa bê, wê dike ku werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê

de bi serdema Manî û zanebûna wî re ku mirov li wî dihizirê, mirov rastî rewşek giring tê. Li vir, em dûbare divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku bo ku mirov Manî û dema wî baş fahm bike, divê ku mirov di xate Yazdaniyê de di dewama Mîtra û Zerdeşt de wî hilde li dest. Heta ku divê ku mirov li rex Mîtra û Zerdeşt, divê ku Bûda jî, bicih bike.

Pêvajoyên civatî ên ku di wê demê de dihên û dijîn, wê di vê çerçoveyê de xwediyê pêşketinê bikin. Her wisa, beşên civata Kurd ku bi rengên baweriya xwe jî ji hevdû cuda na, ên weke êzdayî, Zerdeştî, yarsanî û ankû ´yeresanî´ û hwd, wê di vê çerçoveyê de rengê xwe bidina diyarkirin. Manî, van rastiyên civatî jî baş dixwênê. Bi wê re jî, wê hizrên xwe biafirênê. Hizrên Manî, wê di çerçoveya hizrên zane, aqilmend û filosofên weke Mîtra, Zerdeşt û hwd ku hatina û çûna, wê weke hevgirtineka wan bê. Di vê çerçoveyê de pêvajoyên desthilatdariya Abgirî û ankû ´abgar´, ku ji salên 165 û hwd, ku berî zayîna îsa destpêkirin, wê heta vê dema Manî wê bi çanda Mîtrayiyê, rengên pêşketinên wê ên bi demê re wê bidina pêşxistin. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li demê dihizirê, mirov dibînê ku serdemek nû destpêkiriya. Manî, zane, oldar û filosofê wê demê ye. Manî wê bandûra wî li ser pirraniya filosofên ku li herêmê derkevina ên piştî wî re wê hebe. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî vê yekê werênê ser ziman û bibêjê.

Piştî Manî re wê ola wî ya ku wî pêşxistî, wê ser sêsed(´300´) salî re wê piştî wî re bijî. Her wisa di hûndûrê vê demê de wê ola Manî, li herêmê serdest bibê. Berî wî dema ku Zerdeşt derket û hizrên xwe hanîn li ser ziman, wê heta serdema Manî, wê serdemek ne bin heştsed(800´) salî re wê bi hizrên wî Avêstayî re bijî. Di hundurê vê demê de wê civatên Avêstayî wê biafirin. Desthilatdariya Abgarî, çendî ku zêdeyî bi aliyê Mîtrayiya wê re li pêş jî bê, divê ku em wê jî di çerçoveya vê pêşketina pêvajoya Zerdeştiyê de werênina ser ziman. Li herêmên rojavayê Kurdistana roja me pêşketina wê, wê sedema zêde serdetbûna navê Mîtra ê di wê de bê. Ji xwe, ya di temenê serdestiya hizrên Zerdeşt ku di dema Sasaniyan de jî wê ew jî bê. Pêvajoyên Manî û ola wî, wî piştî wî re bi Mezdek, hûrem û babek re wê xwe bidina domandin. Her wisa, ev hersê keseyet jî, wê ji civata Kurd bin û Kurd bin.

Manî, piştî wî, wê pêvajoyek nû a civatî destpê bike. Manî, di aslê xwe de vê rastiyê dibînê.Di vê çerçoveyê de ola wî, wê bêola rastiya civatiya nû a demê re wê derdikeve li pêş. Em dema ku li hizrên Manî bihizirin, divê ku em di dewama Melekê tawis, Mîtra û Zerdeşt û hwd de wî, di xate yek-xwûdayî ya Yazdaniyê de wî werênina ser ziman. Wê bi hebûna xwe re û bi pêvajoya xwe re wê, rastiya vê pêvajoya pêşketina xate yek-xwûdayî ya Yazdaniyê bê. Divê çerçoveyê de hizrên Manî, rastiyeka hizrî û felsefî û olî ya herêmê ye. Biqasî ku mirov ji ´abgariyiyên Mîtrayî´fahm dike, ew dixwezin ku bi pêşketina xwe re serdemek nû bidina destpêkirin. Di vê çerçoveyê de di mejiyê xwe de di legerînekê de na. Lê yê ku vê rastiyê baş fahmbike û pêvajoyekê di çerçoveya xwenûkirinekê de li herêmê bi felsefî ku wê bide destpêkirin wê Manî bê. Di

vê çerçoveyê de rastiya Manî, weke rastiyek hizrî a demî xwe dide diyarkirin. Piştî Manî re hete sedsale 6´min û hinekî ji wê zêdetir jî, wê bawermendên Manî, wê karibin bi baweriya xwe bijîn.

Piştî Manî. pêvajoyên ku dihên û dijîn, wê pêvajoyên civatî û bawerî ên weke ku bi Mezdek û hûrem re dihê û dijî ye. Mezdek, bi tekoşîna xwe ya li gorî hizrên Manî re derdikeve li pêş. Mezdek, wê bi şîroveyên Manî û her wisa ji hizrên Manî pêşxistina şîroveyên xwe re wê derkeve li pêş. Şîroveyên ku Mezdek pêş dixe, wê di çerçoveya têgîna çînî a civatî de bin. Wê cudahiya di nava xizan û dewlemend, bilind û nizm, serdest û bindest de werêne ser ziman. Hizrên ku Mezdek, di vê çerçoveyê de hanîna ser ziman, wê bina sedema ku bo Mezdek werê gotin ku ”mezdek, civaknasê pêşî ya di dîrokê de.´ Mezdek, di rastiyê de jî dema ku mirov li şîroveyên ku bi navê wî dihên ser ziman ku mirov li wan dinerê, her wisa di vê çerçoveyê de wê wê bi têgîneka civaknasî wê were hanîn li ser ziman. Li vir, di aslê xwe de ev afrîneriya mezdek a bi aqilê wî re wê aliyekî Manî jî bixwe re werêne ser ziman. Ew jî, ew a ku Manî, di vê çerçoveyê de li têkiliyên di nava mirovan de li wan hiziriya. Manî, hizra ´wekhevî û haqaniyetê bi têgîna dadiyê re haniya ser ziman. Ji vê aliyê ve divê ku mirov mafê Manî bidiyê de ku ew xwediyê têgîneka felsefî a ku wekheviyê di têkiliyên nava mirov de pêşniyar dike û dihênê ser ziman. Aliyê ku bi wê Manî di dema xwe de derdikeve li pêş jî, wê ev bê. Di vê çerçoveyê de Manî bi kevneşopiya berê ve girêdayî ye. Di mejiyê xwe de û di şîroveyên ku pêş dixe, wê bi serboriyên leheng û keyên berê werênê ser ziman. Wê jiyana keseyetîn pîroz ên weke Mîtra û Zerdeşt werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de Manî, wê xwediyê têgîneka felsefî a bi dîrokê re bê. Li ser têkiliya giyan-laş û her wisa ji wan cuda aqil bisekinê. Ev rengê ku ew li ser wê disekinê, rengê hizirkirina Zerdeşt jî ye.

Manî, di vê çerçoveyê de wê serdemek giring bide diyarkirin. Bi Manî û hizrên wî re wê serdemek bi bûhûrê. Heta dema derketina Îslamiyetê wê pêvajoya serdestiya Manîtiyê û bi wê re ya Zerdeştiya û Mîtratiyê wê bidomê. Her wisa di vê çerçoveyê de divê ku ev serdema Manîtiyê, wê weke serdemek giring bê. Di vê demê de pêvajoya piştî ya Manî re hatina Îslemiyetê, wê rewşa li Kurdistanê jî bide gûharandin. Heta ku wê rewşa Mîtratiyê û Zerdeştitiyê wê weke bê xwedî bimênin wê li wan werê. Di vê çerçoveyê de wê tenê weke şûnpêyeka wan nîqaşên ku ji destpêka derketina mesihiyê û bi vir ve ku bûna, wê bimênê. Bi demê re di nava civata Kurd de ev rewş, wê bê temenê pirr tengezeriyên mazin jî. Her wisa li Kurdistanê di nava civata Kurd de bi Mîtratiyê re bi hezaran salan kevneşopiyek civatî û bawerî di xate Yazdaniyê de heya. Piştî hatina îslamiyetê, wê di van waran de tengezeriyên mazin biafirin. Kurd, wê bi xwe girêdana li kevneşopiyên xwe re wê hewl bidin ku wê tengezeriyê ji nava xwe bidina derbas kirin. Lê wê, ev jî têrê nekê ku ew tengezerî û hêsta wê ji nava wan derbas bibê.

Hatina îslamê, wê bê destpêkek li herêmê giştî jî.Îslam, ji weke zêdetir weke desthilatdariyek împaratorî bi têgîn û rengê pêşketina olê re pêşket. Di demek pirr kin de îslam li herêmê araban û ankû li ´nîv-garava araban´, wê serdest bibê. Bi wê re jî, wê bi rengê ´li darxistina seferan´ û ankû weke ku di nava îslamê de jî dihê hanîn li ser ziman bi ´fetihkirinê´ re wê êdî bidest hêrîş û bindestkirina hêrêmên din ên rojhilat û hwd bike. Li herêmê zêdeyî, rêveberiyên ku li berxwe didin, wê li Kurdistanê bin. Gelek sedemên wê hene. Di serî de sedema pêşî ew a ku li Kurdistanê û heta ku digihişt herêmên farisan, wê têgînên weke yên Zerdeştîtiyê û Manîtiyê û hwd wê pêş bikevin. Çendî ku hinekî Mîtrayî jî hebin jî, lê Mîtrayî bi zêdeyî li bakûrê Kurdistanê û rojavayê Kurdistana roja me ku heya, wê li wê hebin. Cihê ku li wê Mîtra derketiye rojavayê Kurdistana me ye. Di dema Mîtanniyan de wê di vê çerçoveyê de di wê demê de wê derkevê. Li rojavayê Kurdistanê, ji ber ´çiyayê Kurda´ û heta ku digihişt ber çemê firatê û diclê, wê di wê qadê de Mîtrayî serdest bibe. Piştre, wê hin bi hin bi bandûra wê re li herêmên din ên Asya jî belav bibê.

Mîtrayî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê pêvajoyek giring li herêmê bidina destpêkirin. Ji aliyê pêşketina wan ya olî û bawerî ve Mîtrayî, wê di çerçoveya pêvajoyek yek-xwûdayî ya Yazdanî de wê pêş bikeve. Lê li vir, divê ku mirov vê hûrgilê jî binxîz bike û werênê ser ziman ku wê di wê demê de li herêmên Kurdistanê û ankû Mesopotamiya wê, baweriyên pirr-Yazdanî wê hebin. Ev pêvajoyên pirr-Yazdanî û yek-Yazdanî wê di zikhevdû de li herêmê bi rê ve biçin. Di dema Mîtra û piştî wî de jî, wê biheman rengî di vê çerçoveyê de bibê. Di aslê xwe de ev rewşa pirr Yazdanî, wê rengekî pêşketinê jî di nava rengê pêşketina baweriya yek-Yazdaniyê de biafirênê. Olên yek-Yazdanî, wê bi demê re bina olên yek-Yazdanî ên pirrxwûdayî jî. Di vê çerçoveyê de wê rengekê pêşketinê bi xwe re biafirênin û werênina ser ziman. Her wisa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku wê di vê çerçoveyêde di nava olzaniya yek-Yazdaniyan de ew hiyererşiya ku pêş dikeve, wê di vê çerçoveyê de bike ku wê pirr-Yazdaniyê bi têgîna yek-Yazdaniyê ku şîrove bike û bi cih bike. Di vê çerçoveyê de wê ev, di dema Mîtra de jî û pişt wî jî wê bibê.

Piştî Mîtra re çendî ku di dewama wî de heya Zerdeşt, dema ku mirov li hizrên wî yên ku di Avêsta de hanîna li ser ziman ku mirov li wan dinerê, her wisa mirov dibînê ku wê ew, di vê çerçoveyê de bi hiyererşiyekê re werênê ser ziman. Di nava xwe de têgîna yek-Yazdaniyê de wê di vê çerçoveyê de wê ev rewş xwe bi hizrên Zerdeşt re re jî bide diyarkirin. Zerdeşt, di vê çerçoveyê de wê têgînên felsefikî werênê li holê. Ew, keseyetiyên ku dihênê ser ziman, bi têgînên felsefî bi wate dike û dihênê ser ziman. Piştî wî re Manî jî, wê weke wî bike. Manî, wê li ser xate Zerdeşt hizrên xwe werênê ser ziman. Di vê çerçoveyê de Manî, wê ola xwe ya ku diafirênê û dihênê ser ziman, wê di vê çerçoveyê de bi awayekî hemdem wê pêş bixe. BI felsefeyê pêş dixe. Di vê

çerçoveyê de şîroveyên Manî, wê şîroveyên olî ên felsefî ên dema pêşketina aqilê felsefeyê bin. Piştre ku Îslam hat, wê ji van hizrên Manî, pirr zêde sûdwergirê. Çendî ku weke ku ji wan cuda û di rengekî din hatiya hî, wê ji wan pirr zêde bigrê. Rengê pêşketina ola Manî, wê ji gelek aliyan ve ku li herêmê pêşketiye, wê bandûrê li îslamê bike. Lê yên ku îslamê pêş dixin, li şûna ku li gorî hizrên olî binerin û nêzîk bibin, wê di çerçoveya serdestî û desthilatdariyê de wê nêzîk bibin û wê di cih de bidest seferên ´fetih´kirinê bikin li herêmê. Di destpêka serdestbûna îslamê, seferên wê yên ku li herêmên rojhilatê Kurdistanê û her wisa herêmên din ên bakûrê Kurdistanê ku dike, wê rastî û nîşaneke vê bin.

Hemû deverên herêmê dihên fetih´ kirin. Bawermendên ji ola Yazdan û ankû girseyên ku bi baweriya Yazdanî, mezdekî û maniyî na, wê weke ku dihê hanîn li serê Kurdên mezdekî û babekî wê komkujiyên mazin werênina serê wan. Berxwedana Babek a li hemberî xalifeyê Abasî, di vê çerçoveyê de bûya malê dîrokê. Ev rewş, wê li herêmê piştre zêdetir bibê. Li herêmê, aşîrên Kurd, wê bi demê re wê bi darê zorê bên misilman kirin. Heta sedsale 6´min û heta sedsale 7´min, wê bi vî rengî pêvajoyek bûhûrîner, wê bibe. Lê Kurdên yazsan, Yazdan û hwd, komên weke wan ên civata Kurd, ji baweriya xwe nevegeriyan. Bi wê re wê artişên îslamê, wê li herêmên Kurdistanê ên weke şahrîzor, Pavê, bokan, kirmaşan û hwd, wê komkujiyên mazin werênina serê wan. Kurd, wê piştî ku îslemiyet di nava wan de pêş dikeve û pê de, wê hin bi hin bi zanebûn û bandûra xwe de bidest kifşkariya xwe ya di nava îslamê de jî bikin. Sedema wê ya ku Kurd, di demeke zû de di nava îslemê de dibina hêzek nû ya herêmê yek zanebûna wan a, ya duyemin jiyana wan ya civatî a rûniştî û ku li pêşiya ya xelkên din ên li herêmê ya û her wisa sedema din ya sêyemin jî, ew a ku îslemê ew nirxên olî ên ku esas girtina, berî îslamê di nava civata Kurd de serdest bûn û bi wan bawerî dihanîn û wisa jiyana xwe didomandin. Ev hersê rewş, wê bina temen ku Kurd karibin, di demek kin de rewşa nû a bi îslamê re derxistina têgihiştinê û fahm bikin. Piştî wê re jî, êdî wê hin bi hin bidest avakirina desthilatdariyên xwe yên di nava îslamê de ên îslamî jî bikin. Piştî serdetbûna îslamê li Kurdistanê wê mîrgeh û xanadanên Kurd ên weke Sadakiyan wê derkevina li holê. Ev jî, wê xanadan, mîrgeh û desthilatdariyên Kurd ên misilman bin.

**Sadakiyan** ankû jî **Sadakiya**, bi navê Sadaqiya, ku dema wê 770 - 827 ya û di wê demê de hatiya jînkirin. Mîrgaheke Kurdan ya ku di dema xwe de, bandûra wê pirr mazin bûya. Navende Rojhilatê Kurdistanê ûrmiya bûya. navê vê mîrgaha Kurdan, ji navê mîrê wê sadaqê kurê Alî tê. Harûn Reşîd ku weke xalîfe jî, navê wî heya, bi wan re tevgeriya ya û alîkarî ji Sadaqiyan girtiya. Bi destê wan, kiriiya ku kontrola xwe li ser herêmên din dêne. Xalifê harûn raşîd jî, Kurdek bûya. Herêmên weke **Salmas û Tibrizê** jî, û hê gelek herêmên din, bi destê sadaqiyan hatina bindest kirin û ketina bin destê hêza xalifetiyê de. Ew

Artîşa Sadaqiyan ku wan şand ku wan deran bike bin destê wan de, di bin fermandariya Khazîm de bûya.

Li gor hin belgeyna jî Sadaq bixwe bi navê "**Zardîq**" hatiya nasîn. Û tê gotin ku ew yekî ku fermandar û bizane bûya. Wî, di bin destê xwe de, artişeke mazin ava kiriya û bi wê, li herêmê dewletek ava kiriya û mazin bûya. Lê li gor hin belgeyna jî, tê gotin Zardîq, kurê Sadaq bûya ku piştî wî re hatiya û ew artîşa mazin ava kiriya û ew dewlet ava kiriya bi wê. Hemû axênku Îro li ser Ermenîstan ava û heta ku digihijê herêmên Qafqasya hemûyan dike bin destê xwe de. Zardîq, di nava salên 824-827 de hatiya. Ji vê dîrokê jî, mirov bi giranî karê fahm bike ku Zardîq, kurê Sadaq bûya.Tê gotin ku tenê li herême Mûsilê, Yunisê Azdî yê kurê Seydî hebûya. Piştre, Zardîq, artîşak şandiya ser wî û musil bi xwe ve girêdaya bi têk birina wî re. Ev şerê di navbera artişa Zardîq û Yunis azdiyê kurê Seydî jî di sale 827 de dibê.

Ev xanadanên Kurdan, wê desthilatdariyên herêmî ava bikin. Berî van demên derketina îslamê ku heta demên îslamê li Kurdistanê bi desthilatdarî hebûna xanadana û desthilatdariyên Kavûşeken,merdpetekan, andcawasî û heşaniyan ku weke ´ayşaniyan´ jî tên binavkirin, bi desthilatdarî li Kurdistanê wê hebin. Ev xanadanên Kurd ku xwediyê desthilatdarna mazin ên herêmî bûn, wê di nava berxwedaneke mazin de bin. Wê desthilatdariyên wan werina rûxandin, di ancama hêrîşên ku li herêmên wan dibin ve de.

Ev desthilatdariyên Kurd, wê piştî wan re Kurdistan û civata Kurd bikeve rewşek pirr xirab de. Wê hêrîşên pirr hov li civata Kurd werina kirin. Lê Kurd, wê karibin xwe zû li hevdû bidina li hevdû. Wê piştî hatina îslamê, wê gelek aşîrên wan, îslamê herê bikin û wê piştre desthilatdariyên nû bi wê re ava bikin. Ev Her wisa desthilatdariya sadakiyan, yek ji wan e. Bi wê demê re wê li dûv hevdû wê mirgehên Kurd ên demî wê biafirin. Lê ev pêvajoya ji destpêka derketina îslamê û heta li dora salên 750 û hwd wê bi xwûn derbas bibê. Kurdên mezdekî, yarsan û êzîdî, weke ku bi rewşa babek û piştî wî re di dema **Mîr caferê Dasnî** û hwd de ku tê dîtin û hwd, wê berxwedanên mazin ên dîrokî wê bidina nîşandin. Bi wê re jî, divê ku mirov behsa Bavê mislimê Xorasanî bike. Ew jî, xwediyê xanadanek, desthilatdariyek û artişek pirr mazin bû. Ew jî, heta dema ew bi nemerdî tê qatil kirin jî, wê berxwedana wî bidomê. Xalifê abadî mutasim, agahiyê dişênê ji wî re û wî dewetî qasra xwe dike û ji wî re dibêje ku ´em li hevdû werina û aşîtiyê di nava xwe de çê bikin. Ew jî dibêje bile. Lê dema ku ew dirûnihina ser xwarinê, çend mirovên xalife wê bi xayinî hêrîşî wî bikin û wî qatil bikin. Piştî wê re jî, wê xalife artişên xwe bişênê bi ser xelkê wî de û wê komkujiyên mazin werênina serê wan. Wê herêmên wan ji mirovan paqij bikin û ji naqşeyê bibin.

Li vir, ev rewşa babek, bavê muslimê Xorasanî, mîr caferê dasnî û hwd, bi xwe re rastiyekê dide diyarkirin. Di her demê de bo ku derbe li civata Kurd werê xistin û berxwedana wan were şikandin, pêşî serokên wan armanc hatina girtin û ew hatina qatilkirin. Piştre jî, çûna bi ser civatê de. Berê wan di dema

Sasaniyan de heman rewş, wê bi Mezdek re jî were dîtin. Berî wî, di hemû deman de ev rewş wisa xwe dide diyarkirin. Di dema Berxwedana babek, mîr caferê dasnî û hwd, ku tê dîtin, pêşî serok hatina armanc girtin. Di nava berxwedanê de jî, hertimî serok armanc girtina. Mirov vê yekê, di her demê de rastî wê tê. Lê tevî wê jî berxwedana civatî wê karibê bi hebûna civatê re xwe bide domandin.

Rewş civata Kurd, heta ku dem tê sedsale 9´min û hwd, wê cardin bigûharê. Wê Kurd, êdî weke ku bi demê re tê dîtin, wê desthilatdariyên mazin ên herêmê ên weke yên Şadadiyan û merwaniyan û piştre ên weke yên Eyûbiyan û hwd ava bikin.

Ev salên destpêkê, wê weke salna giring bin. Her wisa, bi wê re wê bi demê re pêşveçûnên nû ên bi aqil re derkevin. Li vir, divê ku mirov di destpêkê de werênê ser ziman ku Piştî derketina îslamê re wê civata Kurd, di nava xwe de bê pirr-qatî. Beşek ji civatê wê bê misilman. Beşek, wê di nava wê misilmantiyê de bi mezhebî wê bê şiî. Her wisa, bi wê re, wê Kurdên ku di baweriya xwe ya berê de israr dikin jî, wê derkevin. Di vê çerçoveyê de Kurdên êzdayî, yarsanî, şebekî, feyliyî û hwd, wê derkevina li holê. Ev jî, komna civatî ên civata Kurd, bi rengê baweriya xwe ya berê ya bi hezaran dijîn bin. Bi wê re Kurdên elewî, wê derkevina li holê. Lê di aslê xwe de Kurdên elewî jî, bi rengê nirxiya xwe re wê ne dûrî Kurdên êzîdî, yarsanî û hwd bin. Di vê çerçoveyê de wê di nava rengê baweriya îslamê de wê bikin ku bi wan nirxên xwe bijîn.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku sedemek pirr giring ew a ku di nava Kurdan de wê Kurd, zêdeyî li dora kevneşopiyên xwe bijîn. Du sedemên vê hebûn. Yek, bi jiyana wan civatî û dîroka wan ya kevn re ye. Sedema din ya duyemin jî, ew qatbûna ku piştre di demên dawî de li ser rengên baweriyan û hwd re ku di nava civatê de xwe dide diyarkirin. Ev rewşa qatbûna di nava civatê de a li ser rengê baaweriyan re wê dem bi dem bê astangiya herî mazinku bi civatî bi hevdû re tevgerîn jî bibê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî bi wê re werêne ser ziman.

Her wisa, piştî serdetbûna serdema îslamê, di wê de desthilatdarî û rêveberiyên pêşî ên civata Kurd, wê hin bi hin rengên xwe bidina diyarkirin. Desthilatdariya mazin a destpêkê ya şadadiyan a, ku wê li ser qadeke mazin a ku heta ku digihijê herêmêm Qefkasya jî, wê serdest bibê. Ji başûr û rojhilatê Kurdistanê û hinek beşên bakûrê Kurdistanê jî di nav de wê ku heta ku digihişt, herêmên Qefkasya wê, di nava sînorê wê de bin. Ev desthilatdariya Kurd, wê piştre di dewama wê de gelek hêrîşên mazin li wê bibin. Her wisa, ew hovitiya ku bi seferên îslamê re di destpêkê de dibû, wê piştre di dewama wê de hêrîşên din ên xadar wê li civata Kurd bibin. Komên hov, ên weke şahîn-şah û kurê wî sancar, Timurleng, Hulago û hwd, ku di hovîtî û xadariyê de sînor nasnekin, wê hêrîşên mazin li Kurdistanê û civata Kurd bikin. Lê ev hêrîş jî, çendî ku zirer û ziyenek mazin didina civata Kurd jî, wê nikaribin

civatê ji xate wê ya pêşketinê derxin. Di sedsale 8´min de wê Kurdên kekoyîdî, eyerîdî, û rawadî, wê li herêmê xanadaniyên mazin bikin û wê bi aşîrên Kurdên din re bo hêzên xwe yên parastinê mazintir bikin, wê peymanan çê bikin. Kurdên eyerîdî ku navende wê ûrmiyeya wê welatekî xwe yê herêmî ava bikin. Di rex wê de ku navende wê kirmaşan a, wê Kurdên kekoyîdî, wê welatekî ava bikin. Heta dawiya sedsalê wê bi hêz xwe li ser lingan bigrin. Lê dema ku hêrîşên Selçûqiyan li herêmê destpê dikin, wê êdî ew hêzên xwe bikina yek. Di dawiya sedsalê de ku ser 55 salan re divê hikimdar ser serê Kurdên vê herêmê, wê dayika anazê bû. Ji wê re ´banû anazê jî tê gotin. Ku mirov hinekî bi ber şûn ve herê û bixwezê ku bigihijê dapîr û bapîrênşadadî û Merwaniyan, mirov wê li pişt wan bigihijê Şadadiyan, piştî Şadadiyan bigihijê Şahkoyiyan, ku di sadsalê 873´an de jiyan jî. Şahkakiyên ku em behsa wan dikin di aslê xwe de, Hicwênî (´hacevend´ jî dihat gotin) bûn. Di dema desthilatdariya Sasaniyan de, bi welatî jiyan. Kurê Şahko Sahfa, wî ji bavê xwe zêdetir kir. Sahfa welatekî azad ava kir. Piştî re ku ji malbata wî ya, Hijayê kurê Çako tê. Piştre jî, Hadjayê kurê Rebîdê Ûrmiyî tê. Hadjayê kurê rebîdê Ûrmiyî, di dema wî de, dewleta Kurd ya Kakoyîdiyan ava bû.Berî wan, bi nêzî dusadsalî Kurdên Sadaqî, bi welatî ku Ûrmiya cih û warê wan bû, piştre û ku ji wan re bû navend weke paytaxt ji wan re, wan serwerî û serdestî lê kirin û meşandin. Welatê Kakoyîdan, welatekî hemdem bû. Heta ku *waraqayên xwe yên kirîn û firotinê* jî çêkirin. Kakoyîdiyan, Berî hingî jî gotin û navê *Kurdîstanê* bikardihanî. Hiciwêniyan jî, weke wan wereqe bikardihanî. Salçûqiyan, di dema ku hêrîşî Kurdistaniyan kirin, hingî hiskirin û bihîstin ku navê wir *Kurdistan* e. Piştre, ku çîqasî hêrîş kirin û nikaribûna wan, êdî ev gotin ji devê wan derketibû,"ev Kurdîstanî, çî şarvanna mazin in." Salçûqiyan, gotin û navê Kurdistanê ji Kurdên Kakoyîdî û eyerîdiyan bihîstin û hiskirin. Kakoyîdî, dema xwe weke dema nû ya Mediyayiyan dihasiband. De ne, Mediyayiyan jî waraqayên xwe yên kirîn û firotinê çêkiribûn. Welatê Kakoyîdiyan, hemû salên xwe yên dawiyê dibin hêrîşên Şalçûqiyan ên hov de buhurand. Kakoyîdiyan, ji bo ku di hêrîşan de têk neçin bi Kurdên Ayarîdî û hazbanî re ketina nava hevkariyê de. Di wê demê de Banûya Ayarîdî Banû Annazê, weke jineke Kurd ya key û mazinek ku welatek bi rê ve dibir, li ser serê Ayarîdiyan û herêmê serok bû**.** Di bin dest û desthilatdariya wê jina Kurd de artişeka kamil ya pirr xort û ku heta wê demê jî di ti şeran de têkçûn nexwariya hebû.

LI herêmê di vê demê de wê ev xanadanên Kurd bi aşîrên xwe re derkevina li pêş. Wê li herêmê serdest bibin. Lê wê hêrîşên li derve jî li herêmê zêde bibin. Bi vê re jî, Kurdên eyerîdî, kekeyîdî û hazbanî wê li hevdû rûnihin û wê bi hevdû re hinek stretejiyan bi hevdû re kifş bikin. Bi wê re, wan jî kifşkiribû ku heta ku bi hevdû re xwe nekirina weke hêzek mazin wê nikaribin, serkevtinê li hemberî hêrîşên ku ji dervê tên bidest bixin. Bi vê yekê re Eyerîdî û kekeyîdî, wê li herêmê xwe serdestiya xwe xort bikin û wê herêmên

Qefkasya û ên Ermenîstana roja me, ku di nav de wê heta bi wan deran wê seferna li darbixin bo ku temenê xwe li herêmê xort bikin. Ev seferên wan, wê ancamê bide û wê rê û pêşiya gelek hêrîşên ku wê li wan û desthilatdariyan wan bibin, wê bigrin. Kurdên Hazbanî jî, wê berê xwe bidina bi başûrê Kurdistanê roja me û heta Musilê di asta pêşî de wê bikina bin kontrola xwe de. Ev, wê li herêmê, êdî wan bike weke hêzek mazin ya herêmî. Serokê demê ê hazbaniyan Mihemedê kûrê bilal, wê serkevtinên mazin di vê seferê de bidest bixê. Ev rewş, wê pêşiya hêrîşên xalife Mutedibileh jî li herêmê bigrê. Xalife, wê bixwezê ku bi wan re levkirinê bike. Ber ku Kurdan, di demek kin de ji Musilê jî derbas bûn û hetibûbûna ber sînorê baxdadê. Berî hingî ne bi demek zêde Kurdên derysemî di serokatiya brehîmê deysemî de tevger û serhildaneke mazin li herêmê dabûbûna destpêkirin. Di wê demê de Kurdan windahiyên mazin jî dabûbûn. Lê têkçûneke mazin nexwaribûn. Sefera Mihemedê kûrê Bilel, weke ku bi hawaara wan ve çûbû bû. Birehimê deysem, wê piştre wê serkevtina xwe bi wê seferê e denezênê. Di cih de wê hikimeta xwe di 906´an de li herêmê ava bike. Bi vê yekê, weke ku desthilatdariyek deysemî ku weke hikimeta ´rawadiyan´ jî dihat binavkirn, wê ava bikin. Ev rewş hemû wê bi hevdû re serkevtinek dîrokî wê ji Kurdên herêmê re werênê. Bi wê re beşek mazin ya Qefkasya jî di nav de wê desthilatdariyek li herêmê ava bikin. Ev jina Kurd a hikimdar dayika Anazî, wê hemû hêzên herêmê bike yek. Wê desthilatdariyekê mazin ava bike. Piştre jî, ev desthilatdarî, wê demekê jî ew li ser ser wê bê û bi gotina wê, wê ew bi rêve herê. Lê piştre, ne bi gelekî re wê Mihemedê kûrê şadadî, wê were ser wê desthilatdariyê û ev wê bê destpêkek mazin jî li herêmê. Ev hikimdarê Kurd mihemedê kûrê şadadî, wê desthilatdariyek mazin ava bike û hemû xanadan, mîrgeh û rêveberiyên demî hemûyan di bin wê de bigihênê hevdû. Ev jî, wê bi demî re bê destpêka pêvajoya avakirina welatê Kurd ê mazin ´welatê şadadî´. Welatê şadadî, wê weke welatek û heta ku di asta împaratoriyekê de wê li herêmê serdest bibê. Serdema Şadadiyan, wê mihemedê Kûrê şadadî re destpê bike, her wisa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ev serdem, wê weke serdemek mazin ya dîrokî ye. Mihemedê kurê Şadadî, wê rêveberiyekê ji nû ve li herêmê bi serdestî ava nekê. Çend ku Îro, weke avakerê welat û desthilatdariya şadadiyan jî tê zanîn, em nikarin bi tememî vê yekê bibêjin. Ji ber ku wî, weke kûrmîrekî Kurd, kevneşopî dewr girtiya ji destê bav û li dewsa wî rûniştiya û piştre jî, li gorî demê ji nû ve bi rêxistin kiriya û bandûra wê û hêza wê maztir kiriya. Herêmên ku di bin desthilatdariya bavê wî û kalkên wî de bûn û ku berê wan jî ew herêm dibin destê wan de bûna, herêmên azerbeycana roja me jî, û hinek herêmên dîn ku heta ku digihişt Osetya roja me jî di nav de bi wê desthilatdariyê ve girêdayîna. Mihemedê Kurdê Şadadî, wê cudahiyekê bike û ji bo ku baştir bibe rêveberî, wê li herêma Divînê, wê hêzekê bide afirandin û bicih kirin. Bi wê hêzê jî, armanca wî ew bû ku parastina herêmên xwe xorttir bikin. Ji ber ku di vê demê de jî, hin bi hin hinek hêrîşên pirr dijwar bi ser wan

de diçûn. Hin komên Şerçûqî, di wê demê de, berê xwe dane wê herêmê û piştî bi Eyîrîdî û kekoyîdiyan re ketina şer de, lê bi ser neketina. Lê ew hêrîş, çend ku bi ser neketibûbin jî, wa fahm kiriya ku wê hêrîşên din jî werina bi ser herêmên wan de ji komên ku hin bi hin diherikin û tên herêmê ên selçûqiyan û hwd. Di wê demê de, divê ku em bibêjin ku wê pêşî bavê wî ku tê gotin ku Alparslan bûya Melîk Şah wê hêrîşên wî yên mazin wê li wê herêmê bibin. Bi wan hêrîşên wî re wê herêm pirr xwûnê winda bike. Xadarên weke Alparslan, wê bixwe di dema xwe de hêrîşên wî yên mazin bibin, Alparslan, wî gelek dever kevil kirina û ji dîrokê birina. Lê tevî wê jî, nikariya ku li herêmê xwe bigrin. Piştî wî re kurê wî Melîk Şah, wê hêrîşên wî yên mazin wê li herêmê bibin. Dema ku behsa kirinên Melîk Şah dihê kirin, Îro jî Kurd bi îbretekê bahsê jê dikin. Melîk Şah, dema ku tê gotin û behsa wî tê kirin gotineke weke navê wî di nava Kurdan de derketiye li pêş ku bi teybetî li herêma botanê tê gotin. Tê gotin ku wî, "herêmên ku wî hêrîşî wan dikir, wê pêşî wan bi hêza wan bişikêne û piştre hemûyî bide beragir. Her wisa, di gelek cihên xwandinê ku em dikarin weke medresa û ankû dibistanan bi nav bikin, tê gotin ku "wî, hemû nivîsar û pirtûk derxistin hûndur û li hewşê dida danîn li hevdû û piştre dide ber agir". Ku behsa wê agirî dihat kirin jî, dihat gotin ku ”ew egir li ber arsê xwûdê disekinî."

Şadadî, wê demekê bi mihemedê kûrê şadadî re bidina destpêkirin. Ev dema nû, wê destpêkek nû jî bê li Kurdistanê û giştiya wê û heta ku ew bi wê re destpêk mazina li giştiya herêmê jî. Mihemedê kurê Şadadî wê 21 salê wê li desthilatdariyê bimêne û wê ew li herêmê wê desthilatdariyê birê ve bibe û piştre wê kurê wî Eliyê Askerî wê were û ew wê şadadî bi rê ve bibê., Wê ew, were û bibê şah li ser serê wê desthilatdariya bavê xwe. Bavê wî ji sale 950´ê heta 971´ê li ser bê şah û ankû hikimdar li desthiatdariyê. Piştî bavê xwe re Eliyê askerî, wê ji sale 971´ê û pê vewê were li dewsa bavê xwe. Li gorî ku bi devkî tê gotin, hê ku bavê wî li jiyanê dijî û lê ku nikariya ku rêveberiyê bi rê ve bibe, Aliyê Askerîku bi wê zanîn û huneriya xwe ku ketiye çavde, ew derketiye li pêş û piştre hin bi hin bûya şah li şûna wî. Lê piştre, ku ne bi demek dîrêj re aliyê askerî ku bavê wî çû ber dilovaniya xwe, wê êdî ew bi tememî weke şah û ankû hikimdar derkeve li pêş û bibe desthilatdar.

Desthilatdariya Şadadiyan, ez nikarim bi hesanî tenê weke rêveberiyeka ku hatî û avabûyî bênima ser ziman. Hê ku di dema Eyîrîdî û kekoyîdiyan wereqe û ankû pereyên kîrîn û firotinê di dema wan de di nava wan de hebûna. Kekoyîdiyan, desthilatdariyek ava kir ku di welatên roja me de çi hebûya, weke wezeretan û hwd, di wê de bicih kirina û bi wate kirina. Pere jî, bi navê xwe pêşî di wê demê derxistibû bûn. Lê ew piştre, serdestiya ku Mihemedê kurê Şadadî ku avakirî herê dikin û bi wê re dijîn. Di pereyên di dema desthilatdariya Mihemedê kurê şadadî û kurên wî eliyê Askerî û Mazrûban jî, hebûna. Lê piştî Mazrûban, kurê Mezrûban ku navê wî fadl bûya. wî tiştekî nû kir û desthilatdarî hemû kir yek û ji destekî xwest ku bi rê ve bibe. Wî, wereqe

û ankû pere bi navê xwe di dema xwe de dan derxistin. Fadl, piştî bavê xwe di 986´an de tê ser taxt û dibê şah. Dema wî, weke demek zêr ya serdema şadadiyan jî bi dema aliyê Askerî re dihê hanîn li ser ziman. Serdestiya wî jî, pirr hêzî li herêmê mazin e. Ez dikarim, wê mazinahî û desthilatdariya wî bitijbihênima desthilatdariya şahê Merwanî ê pêşî Badê kurê dostik û bîraziyê wî Eliyê merwan. Wî jî, di dema xwe de, weke Fadl kir û desthilatdarî ji nû ve ava kir û wereqeyên pereyî jî bi navê xwe derxist. Dema şadadiyan, weke serdemeka giring a ku divê ku mirov di vê çerçoveyê de li herêmê bi giringiya wê re werênê ser ziman. Şahê şadadî Fadl, wê di dema xwe de gelek pêşveçûnên mazin bide çêkirin li herêmê. Serdestiya xwe li giştiya Kurdistanê hinek herêmên Qefkasya û hin herêmên farisan ên Îrane demê jî dide çêkirin.

Fadl, biqasî ku em ji kirinên wî fahm dike, em dibînin ku wî giringî daye awadanî, çêkirina qasran û pêşxistina bajarvaniyê. Di dema xwe de Fadl, giringiyê dide ava kirin kirman, qasr, avahî û xaniyên mazin û **pirên kevan**î yên mazin. Di dema xwe de wî ev mazin çê kirina. Herwisa, herêmên ku di bin destê rêveberiya Şadadiyan de na, rojhilatê Kurdistanê û herêmên farisan ên bi wê re girêdayîna, li wan jî wan çê dike. Her wisa, li herêmên divînê û hwd jî, ku li gelek herêmên li dora wê jî dide wê avahî, qasr û kirmanan bide çêkirin. Ev, weke aliyekî wî yê giring ku di dema wî de derdikeve li pêş e. Piştî wî re Bavê-Fa'tê Musa ku tê ser taxt,di wê dema şahîtiya xwe ya kin de, wê di dewama wî de gelek tiştan bide çêkirin. Piştî Bavê-Fa'tê Musa, ku navê kalkê xwe bixwe jî li xwe dike ûweke ´aliyê Askeriyê duyem jî tê bi navkirin û di 1034´an de wê were ser taxt û wê şahtiyê bike. Bandûra wî û zanebûna wî, ku behsa wî dihê kirin, tê gotin ku wî, herêmeka mazin daye berxwe. Teybetmendiya dema Eliyê Askeriyê duyemin ku di sale 1034´an de tê ser taxt, ew a ku wê rêveberiyê ji rojhilat û başûrê Kurdistanê û her wisa ji herêmên qafqasya bi ber bakûrê Kurdistanê ve dide û herêmên ku rêveberiya Merwaniyan ku li ser ava bûya ve dide herîkandin. Bi wê re jî, di wê demê de, ew têkiliya wî, bi desthilatdariya Merwaniyan re pirr xort a û wî bi wan re levkirin bê û peyman bê, ku çi pêwîst bê, wî daye çê kirin û bi wê re yekbûnek jî bi giştî daye çê kirin. Ji xwe, ew bixwe jî, bikokî û malbatî ji hevdû bûna. Çavê Eliyê Askerî(gotina´askerî´ gotina Kurdiya û weke ku tê dîtin, navê şahekî Kurd ê şadadî ya.) di dema wî de, li wê ya ku ew hêrîşên salçûqiyan jî ku li herêmê zêdebûna bide sekinandin. Bi wê firehkirina bereyê a Eliyê Askerî re hizra wî ew a, ku heya ku ew a ku wê karibê, wan hêrîşan bide sekinandin. Piştre ew bi ber bakûrê Kurdistanê ve hatina wî, wê rêveberiya Bizansan ku li anatolîa jî bide tirsandin. Li herêmê, bi wan têkilî û peymanên ku li herêmê Eliyê Askerî dide çê kirin re ew di temenê têgihiştineka împaratorî de dike û dixwezê, ku hêz û desthilatdariyeke mazin derxe li holê ku karibê hêrîşan bide sekinandin. Bi hêrîşên ku bûna, gelek herêmên li hazarê û qafqasya ên di bin desthilatdariya şadadiyan de na, şadadiyan di ancama wan hêrîşan de ji dest windakirina û serwerî û serdestiya wan, li wanderan hin bi

hin ji dest diçê. Her herêmên ku serdestiya wan ji dest diçûn, wê aşîrên Kurd û aşîrên faris jî, wê ji herêmê bar bikin. Hinek ji wan aşîrên Kurd ên bar dikin, tên bi ber bakûrê Kurdistanê ve û hin ji wan bi ber rojhilatê Kurdistanê ve diçin û hin ji wan jî diçina herêmên farisan ên îranê. ..

Di sale 1049´an de ku bû şahê şadadî **Bavê Asvarê Şavur kurê Fadl** yekem, wê ew mohra xwe li hemû serkevtiyên bidest hatina bixe. Wî, ev herêm ku desthilatdariya şadadiyan li wan serdest a hemûyan cardin li wan serdestiya xwe damezrand. Piştî wî, kurê xwe bi navê Bavê Nasrê Iskander şand divînê û li wir kir û hikimdariya li wir kir destê wî de û ji wî xwest ku hemû herêmê bike bin sehêta xwe de. **Bavê Asvarê Şavur kurê Fadl yekem**, Stretejiyeka wisa pêşxist ku wî bi wê li hemû herêman di dema xwe de serdestiya xwe damazrad. Heta ku digihişt herêmên ber bahre hûrmûzê, wî li ser hemûyan jî, xwe serwer û serdest kir. Komên salçûqiyan, di wê demê de wî, weke ku hêrîşên wan û ên hazaran û hinek komên din ên weke yên tataran û hwd jî da sekinandin. Bi wê rengî, wî weke ku di dema Mihemedê kurê Şadadî de ku wî kir û ku çawa wî desthilatdarî weke ku ji nû ve ava kir, wî jî, her wisa weke ku ji nû ve desthilatdarî ji nû ve demezrand. Bandûra wî, pêşketina wî û pêşveçûna dema wî, weke demeka zêr, wê bandûrê bikê. Her wisa wî bandûra xwe li hemû herêmên li hewîrdorê û cihanê îslemiyetê jî bike. Piştî wî re di sale 1067´an, wê**Fadlê duyem yê kurê Şavur yekem**, wê were ser taxt. Lê dema wî, zêde nakişînê. Wê piştî wî, di sale 1073´an de wê Aşodê kurê Şavur yekem, wê were û li ser taxt. Lê dema van herdû şahên Şadadî, wê li ser pêşketina dema **Bavê Asvarê Şavur yekem yê kurê Fadl yekem bê**. Lê di dema wan de wê, dîsa hêrîşên salçûqiyan zêdetir bûna. Di dema Fadlê duyem yê kurê Şavur yekem de wê, şerê malazgirê ku di navbara wan û Romeo diyojên´ê bizansî de dibê. Di wê demê de, ev herêmên bakûrê Kurdistanê, di bin destê desthilatdariya Merwaniyan de bûna û şahê wê demê ê li ser serê desthilatdariya merwaniyan jî wê Nizāmê Dawlê Nasr bê. Di wê demê de, di dema ku artişa bîzansan, ku daye piştî komên tirkmenan ku wan ji anatolîa derxe, li Malezgîrê rastî artişa vê desthilatdariya Kurd tê. Hingî, artişa merwaniyan, wê hêzeka mazin ya şadadiyan were wir û wê alî merwaniyan bike.

Di aslê xwe de, wê **Fadlê sêyem yê kurê Fadlê duyem**, di sale 1073´an de were ser taxt. Bi wê re jî, wê dem gelek pêşveçûnên nû ên demî re wê pêşve herê. Lê di dema Fadlê sêyem yê kûrê Fadlê duyem de wê, hin bi hin şadadî, êdî wê cihê mazinatiya desthilatdariyêji rêveberiya merwaniyan a li bakûrê Kurdistanê re bihêlin. Çend ku behsa merwaniyan tê kirin ûku dawiya wan di salên 1077´ an û hwd tê dayin nîşandin jî, em nikarin bibêjin ku ev ji bo wan rast e. Lê em dikarin bêjin ku wê ji wan re weke dawîlê hatina demekê û destpêkirina demeka nû ye. Weke ku çawa ku desthilatdariya Şadadiyan bi desthilatdariya Fadl û ankû fazlûm´ê pêncemin ku di sale 1161´ û de ku li ser taxt rûniştiya û ku çawa ku weke şahê dawî behsa wî tê kirin û tê gotin ku ew

´Fazlûmê pêncem, şahê dawî ê şadadiyan a´ jî, em nikarin vê yekê bi vî rengî bibêjin û herê bikin. Wê Şadadî, heta wê demê û serdema piştî wê, wê bandûra wan ji wan herêmên qafqasê li cihna ku ji dest çûna kêm bibê. Demna, ku bandûra wan zêde dibe û demna jî kêm dibe. Ji ber vê yekê, em divê ku vê yekê jî bibêjin ku em divê hem bo Şadadiyan û hem bo Merwaniyan dikarin bêjin ku wê piştre jî hebûna xwe ya desthilatdarî wê bidine domandin. Di dema Melîk şah de tê gotin ku hêrîşên ku lê dibin, wê desthilatdariya Şadadiyan bêne ber têkçûnê. Melîk Şah, wê bi dehan herêman vê desthilatdariya Kurd bi xelkên wê re ji dîrokê bibe û kevil bike. Lê wê piştî wî re jî şadadî, karibin ku wê desthilatdariya xwe bidina domandin. Herî zêde, wê didema Salahadinê Eyûbî de xwe, di levgirtinekê û xortbûnekê de bibîne. Salahadînê Eyûbî, wê bi navê xwe re desthilatdariyek mazin a Kurdistanî derxê li holê bi navê ´eyûbiyan´. Navê Merwaniyan, wê ne bi têkçûnê lê bi pêşketina eyûbiyan re wê di nava navê wan wê de wê weke ku wê xwe xawr bike û wê êdî cihê xwe ji yê desthilatdariya eyûbûiyan bide hiştin. Heman rewşê, mirov dikarê bo şadadiyan û piştre dema merwaniyan jî werênê ser ziman.

Di nava wê konfedereliya civatî a şadadiyan de wê aşîrên Kurd bi êlî ên weke Tewrêz, Marêgeh, Dînewarî, Hasnawiyan, Kakweyiyan, Anezî, Zexeriyan, Ardêlêniyan, Feylûyanî, Goriyanî, Mûkriyanî, Dasnî, Babekî, Mezdî, Zend û ankû zendwaniyanî û hwd wê hebin. Lê bi wê re divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ji bilî van aşîrên Kurd, wê bi dehan aşîrên din jî wê hebin ku di nava wê de cihê xwe girtibibin. Bi wê re jî, bi dehan aşîrên Kurd ên yarsanî, êzdayî û hwd jî, wê hebin di nava wê desthilatdariyê de. Li vir, em divê ku balê bikişênina li ser tiştekî giring. Ew jî, ew a ku ne tenê aşîrên Kurd ên misilman, her wisa, aşîrên Kurd ên weke êzdayî û yarsanî û hwd ku bi rengê baweriya xwe cuda na jî, wê di nava wê konfedeliya desthilatdarî wê hebin û wê bi rastiya xwe re wê karibin bijîn.

Li herêmê, bi civata Kurd re di vê çerçoveyê de wê pêvajoyek nû destpê bike. Lê teybetiyên vê demê pêvajoya nû hena û cuda na. Ev jî, wê bi xwe re, di nava civata civata Kurd de jî pirsgirêkên nû derxe li holê. Her wisa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku civata Kurd, wê di nava wê de beşên cuda derkevina li holê. Heta dema derketina îslamê, wê li ser xate Yazdaniyê û baweriya wê, ku çendî di nava xwe de bi rengên têgînî û hwd, di şêwa û rengê ´mezhebitiyê´ û hwd de cudahî hebin jî, wê karibin bi hevdû re tevbigerihin û bi hevdû re bin. Bawerî, hertimî di xizmeta civatê û pêşketina wê de bûya. Di vê çerçoveyê de pirsgirêkiya civatî û ya baweriyê bi hevdû re rûnadeya. Ji demên Yazdaniyêû heta dema Mîtra û piştre heta dema Zerdeşt, di vê çerçoveyê de wê di xatekê de pêşketina civatî û desthilatdarî xwe bide diyarkirin. Lê piştî derketina îslamê, wê ev rewş, di nava civata Kurd de bigûharê. Piştî derketina îslamê û pê de, gelek komên civatî ên civata Kurd ên ku ji baweriya xwe ya Yazdanî naxwezin ku vegerihin, wê derkevina li holê. Ev kom jî, wê komên weke yarsanî, êzdayî û hwd bin. Piştre di vê çerçoveyê

de komên şebekî, feylî û hwd jî di vê ku mirov werêne ser ziman. Elewîtî, çendî ku piştre bi şêwayekî li ser hizrên Alî re dike ku rengekî olî bi xwe re şîrove bike û pê bixe û bi wê bijî jî wê derkeve li holê. Lê hertimî, di vê çerçoveyê de bi şîrove wê bi wê şîroveya xwe re elewîtî, wê ji nirxên xate Yazdaniyê sûd wergirê û nirxên xwe werênê ser ziman. Rengê têgînî, têgihiştinî û felsefî, di vê çerçoveyê de bi hilm û rengê pêşketin û aqilê pêşketina xate Yazdaniyê ye. Di vê çerçoveyê de Elewîtî, wê weke rengekî din ê teybet ê baweriyê xwe bide diyarkirin.

Di aslê xwe de şiîtî bixwe jî, di vê çerçoveyê de wê di ancama lêgerînên civatên Yazdanî de wê, derkeve li pêş bi rengê pêşketina xwe re. Di vê çerçoveyê de şariştaniyên di xate Yazdaniyê de dikin û dixwezin ku xwe bi wê pêşketinê re xwe biparêzên. Di aslê xwe de ola îslamê bi şêwayê wê ku bûya weke têgînek bîrdozîkî a desthildariyê re li hemberî têgîna xelkî ya xelkên herêmê ketiye pozisyonekê de. Di vê çerçoveyê de piştî ku baweriy ket rika jiyana civatî a şariştanî ku pêş dikeve de, êdî pirsgirêk û tengezeriyên jiyanî ên jiyana şariştaniyê wê bi xwe re destpê bikin. Di vê çerçoveyê de em, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman levnekirina xate jiyan a şariştanî û her wisa ya baweriyê, wê di temenê wan pirsgirêkên jiyanî ên pêşketina wê de jî bin. Xelkên herêmê vê yekê dibînin. Her wisa, bi vê yekê jî, li herêmê ”pirsgirêka baweriyê” a bi jiyana re wê hin bi hin xwe bide diyarkirin. Ev jî, wê xate pêşketina jiyana civatê, hin bi hin bike nava tengezeriyan de.

Di aslê xwe de dema berî dema îslamê, ew dema Manî û baweriya wî ku heta dema derketina îslamê dijî, wê weke demeka ku di wê de li çareseriyê jî dihê gerîn bo pêşketina jiyana civatên Yazdanî û ankû Avêstayî. Di vê çerçoveyê de çareserî, di çerçoveya jiyanek, civatî, felsefî û şariştanî de wê bi pêşketina Manî û baweriya wî re werê dîtin. Di vê çerçoveyê de wê ew, baweriyê bike xizmeta pêşketina jiyana civatê de. Gelek şîroveyên ku di xwe de nepeniyê û ankû bi ´şêwayekî´ tasawûfî´ pêş dikevin wê hebin. Manî, di dema xwe de wê van jî ji xwe re bike weke mijarekê û wê bixwezê ku wan fahm bike. Manî, ji ber ku dixwezê ku dibînê ku jiyan bi wê re dibê weke ´pirsgirêkekê´. Her wisa, di vê çerçoveyê de Manî, wê bike ku wê nepeniyê û ankû wê ´tasawûfiya´ ku pêş dikeve û an jî ku pêşketiye, fahm bike. Bi vê yekê, ew wê ji aliyekî din ve şîroveyên xwe yên tasawûfî pêş bixe û wê bike û bixwezê ku bi wan ew werina fahmkirin. Di vê çerçoveyê de ´nepeniya Manî´ û ankû ´tasawûfiya Manî´, wê di vê çerçoveyê de weke nepenî û ankû tasawûfiyeke vegotinbar bê. Manî, li vir, dil û aqil bi hevdû re derdixe li pêş. Hîskirin û fahmkirina bidil, li ser wê serî di wastênê. Di vê çerçoveyê de aqilê mirov û weyna aqilê mirov, li ser wê dihizirê.

Ev rewş, wê piştî Manî re wê bandûra xwe li îslamê jî bikin. Lê ew tasawûfiya Manî ya ku bi vî rengî li ser gotinîn felsefî û dîrokî re ku wî dihanî ser ziman, wê ne li gorî rastiya wan werina ser ziman. Ev jî, wê bi xwe re bi demê re temenê fahmkirineke ne rast bê.

Manî, hem di dema wî de û hem jî di demên berî wî de astaronomî û hwd, pirr zêde li ser wan mijulbûn dibê. Bi vê yekê re, hewldana fahmkirina fezeyê û gerdûnê, weke têgîneka felefîkî a vê baweriyê wê hertimî aliyê wê yê felsefî jî bi xwe re pêş bixe. Wê hertimî, weke aliyekî ku wê baweriyê û jiyanê û her wisa fahmkirinê bi hevdû re dihawîrê û bi hevdû re rengekî zanebûnê dihênê li holê û dide diyarkirin. Têgîna gerdûnî a serdemên berê a xate Yazdaniyê, wê hertimî aliyekî wê yê ku wê bi felsefê jî dike bê.

Em li vir, vê yek jî, werênina ser ziman ku ev reng û şêwayê bi zanebûna gerdûnê û fezeyê re mijulbûn û ankû pêşxistina astronomiyê, wê weke kevneşopiyekê jî xwe bi demê re û bi pêşketinên bi demê re wê xwe bide diyarkirin. Piştî derketina îslamê, hin bi hin zaneyên li Kurdistanê ku id nava civata Kurd de derdikevin, wê bi aqil û felsefeya xwe ku diafirênin û dihênina ser ziman re wê, têgîneka gerdûnî û astronomî ya pêşketî jî bi xwe re werênina ser ziman. Di aslê xwe de ya ku wê di dema Îslamê de jî van têgînan bi felsefî hûr û kûr werênina ser ziman jî, wê ev zane bin. Di destpêka derketina îslamê de wê keseyetiyên weke cabanê Kurdî, Zozan sahabê, Bavê meymûn, Zaryab, Qaranî, Bavê raxî hemedemî û hwd, wê derkevin. Di vê demê de zanyarên Kurd, ên ku derdikevin, bi hizrên xwe re wê li ser astronomiyê jî pirr mijul bibin. Ev kevneşopiya berê ya civatî a bi hizrîna li gerûdûnê û astronomiyê, wê di dema wan de jî xwe bide diyarkirin. Her wisa, di dewama wan de di demên ku tên ên piştî derketina îslamê de wê zanyarên Kurd ên weke bavê henifê dînwerî, semedê babekî, hewqalê nisêbînî, mewşîlê Kurd û hwd wê derkevin. Weke van di wan deman de wê gelek zanistên demî wê derkevin. Hewqalê Nisêbînî ku bi navê tê wateya "kalê nisêbînî" li nisêbînê hatiye dinayê. Dîrokzan û astronomvanekî Kurd e. Li ser fîzîkê û astronomiyê dihizirê û li ser van beşên zanistê, wê pirtûk jî binivîsênê.

Di dema xwe de weke perwerdevanekî jî nav daye. Li ser ´metafîzîka xwezayê´ hinek hizrên wî yên ku hatina ser ziman hena. Ewbi aqilê felsefeyê dihizirê û dike ku bide fahmkirin ku aqilê li jiyanê serdest e. Di nava civata Kurd li herêmên li dora nisêbînê, heta roja me jî, hin vegotinna ku bi navê wî re tên vegotina û di wan de dihê hanîn ser ziman ku ”aqil, xwûdê daya mirov ku mirov bi wê jiyana xwe biadilênê û şaşiyan nekê.” Ji van gotinên bi vî rengî ên ku bi navê wî re tê ser ziman, mirov fahm dike ku ew giringiyê de pêşxistina aqil û bi aqilbûnê.Nevê yê rastî "Evdil qasimê Mihemedê kûrê eliyê Nasîbînî" ye. Wî di sala 977'an de pirtûkek bi navê **"Rûyê Erdê"** dinivîsênê.

Teybetiya zanyarên Kurdistanî, ew a ku di vê çerçoveyê de wê hertimî xwe werênê ser ziman. Ku di kîjan warê de hizrên xwe wrêninaser ziman, wê di nava wê de cih bidina hizrên li ser gerdûn û astronomiyê jî. Bi dehan zanyarên demê ên ku derketina û hizrên xwe hanîna ser ziman, dema ku mirov li nivîs û hizrên wan dinerê, di vê çerçoveyê de mirov kifş dike. Piştre jî, ji xwe, wê hizrên bi awayê lêkolîna ´metafîzîkê´ û hwd wê werênina hanîn li ser ziman. Ev jî, şêwayekî nû ê felsefî û kirina felsefeyê ye. Bi wê re jî, mirov kifş dike

ku li ser ardnîgariyê û hebûna tiştên di jiyanê de dijîn, wê lêkolîn werina kirin. Bi wê re, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê her tiştên ku di jiyanê de hena, dijîn û bi heyînin, wê bina mijara fahmkirinê ên felsefeyê. Hizrên felsefî ên serdewama kevnera ku li ser giyan û laş û têkilî û hebûna wan cuda bi cuda ku hatina ser ziman, wê hinekî jî werina kûrtir kirin. Bi vê yekê re, wê têgênên weke yên pêwîstîniyê û ankû ´determinismê´ û hwd, wê pêş bikevin. Di vê çerçoveyê wê de ev mijarên felsefeyê ên dema nû bin. Serdemên pştî serdemên kevnera re ku tên, wê bi teybetî li ser fêrkirina van rastî û rewşan di jiyanê de pirr bisekin in. Aqil, wê bi demê re derkeve li pêş. Hewldana fahmkirina aqil û zanebûnê bixwe, wê derkeve li pêş. Fahmkirina hertiştî di jiyanê de wê weke mijareka hizrî û têgînî ya felsefeyê bê. Mirov dikarê hertiştê di jiyanê de fahm bike û ankû nikarê fahm bike, wê li ser vê nîqaş werina meşandin. Zerdeşt, di dema xwe de li ser rastiya aqil, sekinî ya û haniya ser zimann ku ´aqil, dervî giyanê û laş, weke rastiyeka sêyemin a di jiyanê de ku pêşketiye´ ye. Di vê çerçoveyê de wî li rex giyan û laş, aqil hilde li dest. Bi wê re bizanebûna giyanê û hwd, li ser wê hatiya sekin in. Giyan, dikarê fêr bibê û ankû na. Zanebûn, bi laş re ya? Bi vî rengî, wê li ser wê were sekin in. Dema ku mirov dimirê, zanebûna ku mirov fêrbûya di mejiyê xwe de winda dibe û ankû na, wê ev weke xal û nûqteyeka navendiya vê nîqaşa bi zanebûnê a laş û giyanê re ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku Manî, di vê çerçoveyê de gelek serekên nîqaşan dide kifşkirin. Bi wê re jî, gelek nîqaşan di dema xwe de bi mirovên li dora xwe re dike. Li ser keseyetiyê disekinê. Mirov, xwediyê keseyetiyek çawa ya, li ser wê disekinê. Her wisa, di vê çerçoveyê de rasttteqîniyên ku keseyetiyê di afirênin, wê li ser wan bisekinê. Ev mijarên ku Manî li ser wan disekinê. Berê Zerdeşt û berî wî jî Mîtra bi hin şêwayna li ser wan sekinî ye. Her wisa, ev mijar, bi rengna hatina rojava wan di nava hizrên wan de.

Li vir, hewldana fahmkirina zanebûnê dervî giyanê, wê zanebûnê bi serê xwe weke rastiyeka ku di jiyanê de pêş dikeve wê bide diyarkirin. Bi wê re jî, em dibînin ku di dema Zerdeşt û piştî wî bawermendên wî û her wisa di dema Manî û bawermendên wî jî, wê li ser heyîn û sînorê aqil bisekin in. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de di serdemeka kevnera de wê ev mijara aqil, wê biserê xwe weke mijareke hizrî ya felsefî bê. Her wisa, Em dema ku piştî Zerdeşt re ku tê, li nîqaşên Bûda ên bi hizrên wê re ku li wan dinerin, em dibînin ku bûda, wê vê mijarê bi têgîneka gerdûnî weke zanistên dema xwe wê hilde li dest û wê hewl bide ku fahm bike. Mirov, çawa dikarê xwe bigihênê zanebûnê? Aqil çî ya? Û ankû rastiya aqil û bi wê re aqilê rast çi ya û çawa mirov dikarê xwe bigihêniyê de wê li ser wê bisekin in. Rastiya aqil, ku hebûna wê dihilde li dest, wê bi wê re ´aqilê rast´ ku têgîna navaroka aqil bi xwe re dihênê ser ziman, wê di vê çerçoveyê de li ser wê bê sekin in. Her wisa, Zerdeşt, li ser navaroka aqil sekinî ya û ´Ahrîman´ aliyê ne baş´ haniya ser

ziman û beremberî wê di çerçoveya dualiteyekê de wê Ahûra-mazda werênê ser ziman ku ´aqilê baş´ bi xwe re dihênê ser ziman. Di vê çerçoveyê de ji hevdû derxistina baş û ne başiyê jî wê bi hişmendî, pêş bikeve. Bi wê re jî, bi demê re wê ev rewş were û pêş bikeve. Manî, di dema wî de wê gavekê bi ser wê re biavêjin. Wê hinekî din bi astek bilindtir wê bê xwestin ku werê hanîn li ser ziman. Her wisa, ev têgînên weke ´ahûra-mazda´, ´ahrîman´, ´zerwan´, û hwd, wê bina gotinna têgînî wê hewl bê dayîn fahm bikin. Hewldana bi fahmkirina ´gihiştina rastteqîniya Yazdan´, wê xwe bi wan re bide diyarkirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê êdî demeka ku di wê de bi vî rengî aqilê felsefî ku pêş dikeve wê were û pêş bikeve. Em divê ku vê yekê jî, bi wê re werênina ser ziman ku serdema aqil ku dike ku hertiştî bi aqilê xwe fahm bike û xwe bigihênê fahma tiştê, wê di vê çerçoveyê de bi demê re derkeve li pêş. Lê miirov bi demê re kêmmayîna xwe jî dibînê. Bo vê yekê, li ser wê re nîqaşên ku mirov dikarê biaqilê xwe bigihênê hertiştî û ankû na, wê derkevina li pêş. Di vê çerçoveyê de aqil bixwe jî, wê were xistin berlêpirsînê de. ´Gûmankirina ji fahmkirinê´, wê di vê çerçoveyê de mirov weke ku bi Manî re dibê, wê di nava têgîna metafîzîkê de kûr û dûr bibê. Her wisa li vir, bi şêwayekî rastî, wê Metafîzîk, hertimî ya li pêşiya mirov a ku nayê zanîn bê. Di vê çerçoveyê de jî, bi aqil û ankû bi hizirkirinê xwe, êdî bike ku xwe bigihênê wê.

Em li vir, divê ku vê yekê jî di dewama wê de werênina ser ziman ku mijara aqil, di vê çerçoveyê de çendî ku li demê serdest dibê, wê bi xwe re weke têgînekê di vê çerçoveyê de hizrkirinê di nava xwe de pêş bixe. Li vir, aqil û metafîzîk, wê bi hevdû re di vê çerçoveyê de bi wê çerçoveya xwe ya aqilî a bi fahmkirinê re wê xwe bide diyarkirin. Li vir, li ser gotina metafîzîkê re em divê ku werênina ser ziman ku Ew nepenî û ankû tasawûfiya Manî, wê hinekî di vê çerçoveyê de li ser hebûna aqil re gotina metafîzîkê wê baştir wê bide diyarkirin û fahmkirin. Piştî Manî re dema ku dem tê dema derketina Misilmanetiyê, di aslê xwe de ya ku wê ji hevdû cudabê wê ev bê. Ew tasawûfiya ku îslamê pêşî esas girt, wê piştre, ji xate aqil û rastiya metafîzîkî xwe derxe. Metafîzîk, herttimî gotina ´gûmanê´ li pêşiya wê li ser ya ku nayê zanîn e. Bo vê yekê, hertimî mereq kirina pêşiya xwe û ankû ya ku nayê zanîn, wê di vê çerçoveyê de wê bi armanca fahmkirina wê re wê berê lêgerîn û lêkolîna bi aqilê mirov re bi fahmkirina mirov re bide biser wê ve.

Di vê çerçoveyê de mirov ku hinekî bi şûn ve herê, mirov wê kifş bike ku di demên berê ên gûtî û qasîtiyan de û heta ku di dema hûrî û Mîtanniyan de jî, tê bawerkirin ku ”dunya weke tepsiyekê rast a û mirov li ser wê dijî.” Di vê çerçoveyê de dema ku mirov dihizirê, mirov dibînê ku mirov, mejiyê xwe li ser fahmkirina rengê hebûna dunyê wastandiya. Di vê çerçoveyê de stêr û dunyayên li azmanaku hena û ankû ku tên dîtin, dike ku wan fahm bike. Mirov, heta serdema me ya sedsale 21´ê, berî ku bi hebûna xwe herê fezeyê, wê pêşî bi aqilê xwe di van deman de wê herê. Îro, mirov dibînê ku têgîna

´gerdûnê´ wê di nava hizrên Kurdistanê û mesopotamîkî de wê weke têgîneka kifşkar ya di temenê pêşketina wan de jî bê. Li vir, metafîzîka bi têgîna gerdûnê re wê aqilê mirov dem bi dem bi wê re bi pêş de bibê. Her wisa, di vê çerçoveyê de di aslê xwe de têgîna gerdûnê aqilê metafîzîkê ê ku hertimî dike ku kifş bike û her wisa kifşkirinên wê re wê hertimî kifş bike. Di vê çerçoveyê de pergalên hizrî û bawerî, ên xate Yazdaniyê, di vê çerçoveyê de têgînên weke stêrzanî, azmûngeriya ku bi wê re bi aqilê mirov re pêş dikeve, wê kifşkar bê. Em li div, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku têgîna gerdûnî ku wê wê dîmenekî fezeyê bi xwe re bihawênê û w mejiyê mirov bi hişmendiya mirov re derxe dervî hebûna dunyê, her wisa di vê çerçoveyê de wê li azmanan bi stêr û dunyên din û hizirkirina li jiyanên li wan dunyên din û ankû li deverên din ên fezeyê û hwd re wê xwe werêne ser ziman. Ev wê, di temenê lêgerîn û lêkolînên mirov ên heta çûyina ser heyvê de jî bin. Îro, pêşketina aqilê mirov û ankû ´bi aqil afirandin´ û hwd, wê derkeve asteka bilind a di jiyanê de. Hebûna civatê, di vê çerçoveyê de bi zanistên wê yên civaknasî û hwd re dema ku mirov li ser wan dihizirê, ew mirov bi aqilê mirov re di nava metafîzîkekê de dibin. Her wisa, ev rastiya ku mirov wê bi aqilê xwe hertimî bi wê di nava lêgerîn û hewldana fahmkirinê de bê. Li vir, dema ku em bi xate pêşketina civatê re dikin ku fahmkirin û ji demên berê werina heta roja me, mirov di vê çerçoveyê de digihijê aqilê civatê û ê pêşketinên wê. Serdestiya aqilê mirov, wê bi wê re hin bi hin derkeve li pêş. Pêvajoyên demên bûhûrî ên jiyanê civatê ku me li jor jî hinekî bi dîroka wê re hanî ser ziman, di vê çerçoveyê de aqilekî dide me. Her wisa, di serî de bi demê re ku dem bi dem çi rengê aqil serdest bûya û piştre çawa pêşketiye û di dewama wê de çi cûra pêşveçûnan xwe daya li der û hwd, bi wê re mirov fahm bike. Bi kortsasî, di vê çerçoveyê de li ser aqil re weke ku me li jor li ser xate pêşketina civatê re hanî ser ziman ku mirov dike ku li ser aqil re ji demên berê hilde li dest û werênê ser ziman, mirov di vê çerçoveyê de rastî awayekî pêşketinê bi wê re tê.

**Dîroka Hizrê** ya Kurdan, ji gelek aliyên xwe ve pêdivî pê heya ku were ser ziman. Ji dema Sumeriyan ve hate ku dem tê dema Gûtî û Mîtanî, Hûrî û Naîriyan û ji wir jî hate ku tê dema Mediya, xwediyê xateka pêşketinê ye. Dema neolitikê, demeke ku hizir bi pergal bidest pêşketinê dike ye. Di vê demê de hizir hin bi hin bipergal dibe. Mirov bidest naskirin jiyanê dikin. Bicihbûn bi pêş dikeve. Kombûn di nav mirovan de dibe. Bi bûna koman re hin bi hin bingihê xelkîtiyî tê avêtin. Serek û parastvan tê dîin û naskirin. Hêzbûn wan re çêdibe. Ev yek, di rastiyê weke destpêka şaristaniyê ji tê dîtin. Mikarê wilo ji şîrove bike. Hîmê şaristaniyê ta dema sumeriyan her weha bi vê yekê diafirê. Parastgah û serektiya koman an ji bi navê ku piştre tê ser ziman ´hozên´ ku diafirin, hin bi hin pêşketin derdikeve. Weke saziyekê bi pêşdikevin. Ev yek dibe bingihê pêşketinê hizir ji. Naskirin, destpêka bûna hizire. Naskirin, bi xwe re hîmê kifşkirinê ji ye. Kifşkirina jiyanê û kifşkirina

tiştên ku di jiyanê de bêne bi karhanîn, pir girînge û di wan pêşvajoyan de li gor pêşketine şaristantiyê diafirin.Navende wan pêşketinan, ber Diclê û Firatê ye. Jiyan, her weha li wanderan pêşî hîmê xwe bi vê yekê diafirinê. Li ser vê afirandinê hin bi hin êdî şaristanti bi pêşdikeve. Şaristanitî ku pêş dikeve, êdî jiyana mirov di pêşketina xwe dikeve demek nû ya pêşketina xwe de. Ji vir û pê ve, êdî dîrokê şaristaniyê bidest dike.

Di dema şaristaniyê de, tiştên ku di dema şaristaniyê de lazimin û pêdivî pê heya têne kifşkirin. Têne çlkirin. Li gor jiyanê ev yek dibe. Lê hizir mazin di vê demê bi pêş dikeve. Hevirdore naskirin û serwerbûna wê, di vê demê mazin bi pêşdikeve. Bi vê yekê re pêşketin mazin dibe.Xelkîti ji êdî mazin bi pêdikeve. Di dema şaristaniyê de xelkîti, bi hizir ji dibe û afirandina xwe mazin dibe. Hizir çêdibe. Bi çêbûna hizir re anîna ser zima ji dibe. Hizir her weha diafirê. Lê bi hizre pêşî ku diafirê, hizre olê tirh dide. Hizre olê, dageriyên dema neolitikê biwate dike. Wan dii jiyanê bi nirx dike. Bi vê yekê re dager mazin diafirin.Hîmê hizir û hizirkiirn û naskirinê bi vê yekê çêdibe. Ku mirov dibêje şaristan, pêşî navê sumer tê bîre mirov. Ji ber ku wan şaristaniyê herî pêşî li naqabîne diclê û fîratê de afirandin. Çandin û cohtkirin, pêşî li vanderan bû. Şaristanî bi wan derket û pêşket. Têgihiştin, pêşî li vanderan bû. Bivê yekê re dîroka sumeriyan pêşket. Bi wê têgihiştinê pêşket û pêşxist. Di dema sumeriyan de gund û bajarên şaristaniyê afirin.Piştre dewlet ji bajaran afirîn.Piştre ji hêzên mazin yên serwer yên mazin weke împaratoriyan afirîn. Sumeriyan, di dema xwe de pêşvaniya vê yekê kir. Şaristaniya sumeriyan pêşketinên mazin derxistina hole.Hizre olî pêşxistin. Dema ku mirov bahsa hizre wan ya olî bike, divêt ku mirov ji bêr neke û bi pêvajoyan bêne ser ziman.Dema pêşî dema ku mirov ji aliyê teheriya hizrî ve bêne ser ziman dema metafîzîkê bû. Di wê demê de dager afirin û ji bo hebûne wan li berxwe dan çêbû. Demeke dirêj bi vê yekê ev bû.Li ser wan hizir bûn bû û naskirin bi hizirbûnê re bû. Wê demê, sazbûn û bicihbûn bi hizre wê re bicih kir. Di vê demê de têgihiştina guharandinê hê ne serdest bû.Piştre ku demeke dirêj bi ser ve diçê, êdî bi çêbûn hizire re êdî hin bi hin hizre guharandinê dibe.Jiyan diriyekê de diharikê û diçê. Mirov bi jiyanê ve girêdayî ye. Her weha têgihiştin hin bi hin bi pêşdikeve. Êdî dema nû ya dî dest pê dike. Dema diyelektikî dest pê dike. Ev dem, ku mirov li dema sûmeran dimeyîzenê, mirov dibîne ku hizre wê hin bi hin dibe.Di dema şaristaniyê de ev têgihiştin hin bi hin bi pêş dikeve. Hizre miretê, vê yekê xurt dike.Di dema şaristaniyê de pişt dema sumeriyan re di dema naîriyan de ev têgihiştin, di olê de ji bicih dibe. Bi dema sumeriyan re pêşketin dest pê dike. Piştî dema sumeriyan, êdî pêşketin di hizir de bi hinek gavê maztir her weha hebûne xwe berdewam dike. Sumerî, hizre metafizikê mazin bi pêş dixiin. Lê yên ku wê hizre mazin di xwe de bi kevne şopî dikin ji naîri ne. Berî wan, ekedî û babilî ji vê yekê dikin. Ev yek dibe bingihê pêşketinên piştre. Hammurabi, xwest ku wê hizre bi paraze. Ji ber vê yekê zagona (destûr) xwe ya pêşî derxiste hole. Zagona wî, bi ya

koladariyê. Ji ber ku ew pir bi xwûdayê xwe vve bû. Ew xwedê yê wî yê dema sumeriyan bû. Nêzîkatiyê ku wî pêşxist ya wê demê bû. Li gor vê yekê, mirov divêt ku bêje ku wî bi bawer ev yek kir. Wî bawer dikir ku dema xwede yê wî nayê guharandin. Bi vê yekê re, ew û demê wî, dayimî ye. Mayînda ye. Ev hizre wî, wî kir keyê wê demê. Wî bi vê yekê keyitiya xwe haya haya ku wê bimene didît. Wî di wir de rastteqîni didît. Xwe bi wê ve girêda. Li ser wî jîn bû û xwest ku bide jînkirin. Ku mirov ji wê demê tê dema naîriyan, mirov bi naîriyan de nêzîkatiya pir pêşketî û bi hizir dibîne. Mirov bi wan re Nêzkîkatiyeke wilo dibîne, ku mirov bêje mihteşeme. Ew vê nêzîkatiyê bi xwe re mazin bi pêş dixisin. Lê nêzîkatiyeke ku guharandinê ji di cewherê wê de bicih dikin. Bi vê yekê ji, bi hizirkirina li ser demê re dikin. Hizikirina wan ya li ser demê, hizre wan ya pêş û paş bi hev ve girêdide. Bi vê yekê re ev diyelektikê ku Hegel bi pêşxisti û weke bavê wê tê nîşandin, mirov bi wan re dibîne. Ew hizrê wê diyelektikê di dema wan de bi vê yekê re mirov karê bêje ku hîmê xwe bidest avêtinê dike.

Ew li gor wê jîn ji dibin. Li gor wê jînbûnê, pêşketina wan ji bipêşdikeve. Hizre wan bi pêşdikeve. Ku mirov dîrokê hizrê e Kurdan şîrove bike, divêt ku mriov ya hemdem û nûjen ji vir pêve bêne ser ziman.Emê di vir de nikaribin ku wê hemûkî li ser pêşketin û demên xwe bênin ser ziman. Ji ber ku pir mazin û kur û dirêje. Lê emê di vir de têne bi sereke hinekî bênine ser ziman. Emê hewl bidin ku di derbarê deman de bi kurtasî bênine ser ziman. Diroke hizir, naqşa bêşketinê ye. Ji ber vê yekê, werê fahmkirin û têgihiştin, pir girînge.Dirokê hizir ya Kurdan, mijareke ku herî kêm li ser lêkolin hatina kirin. Lêkolinên ku li ser hatina kirin ji, ne temem têr in.Pirr kêm in. Dîroke hizir ku werê ser ziman. bi xwe re wê hîmê pêşketinê afirêne.Ji ber vê yekê em hêvî dikin ev nivîs bibe mijara hin niqaş û nivên pir cidî û bilêkolin. Ev yek, ji herkeskî hêhtir pêdiviya Kurdan pê heye.Dema ku mirov dirokê hizir ne nivîsêne û bi gişti baş fahm neke û tê negihê, mirov wê nikaribe di nav xwe de ji, serweriyeke baş bi xwe re ji xwe re bike. Ev yek ji ber vê yekê ji girînge. Hê ji gelek aliyan ve girînge. Li dîrokê hizir û pêketine wê, li Kurdistanê, ku mirov lê dimeyîzenê, mirov pir pêşketineke mazin dibîne. Dîrokeke ku hizir ya pêşketi pir mazin û dirêj heya. Dema ku li ser dîrokê di hizirê, her weha mirov vê yekê pir baş û qanc dibîne. Hizre Kurdan, di pêşketine xwe de pir afirandiya. Di serî de dema ku mirov bidest anîna hizre wan ya ku pêşketi bênine ser ziman bikin, em pêşî xosletekê wan yê pir mazin û li ber çavan bênine ser ziman. Ew xoslet ji hertimî li azadî û aştiye nav xwe xwedi derketine. Li ser vê yekê sekinandina. Vê yekê, hertimî, di nav xwe de bûya sedema ku girîngiye bidine jiyana xwe ya asayî û bi pêşve herin.Ev yek, di gelek deman de bûya sedema raxna kirina ji li wan.Her weha hinek raxna li wan hatina kirin.Gotine ku wan pir girîngî daya civaknasiya di nav xwe de, lê girîngî zêde wilo ne dana rêzaniya di nav xwe de. Bi vê yekê re ji, hertimî li ser serê wan, hêzne ku serwer rû dana. Dema ku mirov li diroke hizrê ya wan

dimeyîzenê, mirov dibîne ku ji dema neolitikê ve pêşketineke wan ya ji hîm heya.Di dema neolitikê de xosletên ku pêşketine, di demên piştre de, bi wan re dibine hîmê hizir û pêşketine hizir. Ev yek,pir li ber çavan bûya.Di wê demê de, ´koçertî´ bi pêş dikeve. Koçertî, rewşeke ku divêt ku pir mazin werê fahmkiirine.Bingiheê hizrê ye. Koçertî, dema ku tê ser ziman, weke rewşeke pênebertiyê tê ser ziman.Lê di rastiya xwe de ev yek ne rasta. Di rastiyê de, koçertî, hebûne pergalakê ya.Pergaleke şariştanî a jiyana civatî û jiyana bi xwezayê re ye. Hîmê koçertiyê, li ser ´şivantiyê´ û ´nêçîrvantiyê´ ava ye. Ev herdû bêje têde weke nirxne ne. Dema ku mirov li jiyana wê dimeyîzenê, mirov vê yekê pir baş û qanc fahm dike.Iro ji, li dore botanê, serhadê û reha ya hîmê vê jiyanê ku ne weke demên xwe yên berê ji bê heya.Koçertî her weha dema ku werê ser ziman, divêt ku weke pergaleke xelkê werê ser ziman.Pêşketine koçertiyê, destpêka pêşketine pergala xelkîtiyê ye. Bi vê yekê re mirov karê bêne ser ziman.Mirov karê bêje ku destpêka pêşketine têgihiştinê ji ya.Mirov ji nû ve hevirdore xwe nasdikin û êdî bidest bi kar anîne hevirdore xwe dikin.Bi naskirinê re hevirdor tê bi kar anîn.Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ev destpêk, destpêkeke ku pir mazina.Ziman, weke filozefên wê dema û pêşketinê derdikevine hole. Ew yên hevirdore nasdikirin, çêrandine dikin û di xwezeyê de yên ku karin xwe ji xatarayan bi parezin in.Bi vê yekê re, ew, yên ku zane ne. Bi vê yekê hin bi hin li Kurdistan pêşketin çêdibe.Jiyan li ser hîmê çandin, nêçîrkirin û jiyana her weha ya şivantiyê ava dike.Jiyan ku rûniştiya. Ev jî, rengekî pêşketî ê jiyana bi aqil, bi xwe re dide diyarkirin. Ev pêşketin, pêşketineke pir girînge. Dema destpêka şaristaniyan ji, ev pêşketin dide dest pê kirin. Bi bicihbûnê re, êdî jiyan bicihbûne bi pêşdikeve. Zagon û nirxên wê bi pêş dikeve. Rist û sinc derdikeve û bi pêş dikeve.Hizir tirhên xwe yên pêşî biradike û şîn dike. Di van pêşketinan û hin pêşketinên din yên weke van, dibine hîmê pêşketinê şaristaniyan di demê de.Şaristanî û pêşketina wan, demeke nû ya.Êdî ev dema koçertiyê bi xosletên xwe re li şûn ve dimene.Lê xosletên wê yên bi hev re bûne di dema şaristaniyê de bi pêş diekevin û dibine hîmê pêşketina şaristaniyan. Bi vê yekê re pêşketinê dikeve demeke nû de. Hizir bi demeke nû ve bi pêşdikeve. Dema şaristaniyan, weke ku tê zanîn, ji dema sumeriyan, dema herî pêşketî tê dest pê kirin. Ev dem, demeke mazina û pêşketiye. Ev dem, demeke ku mirov karê hizir bi kar bêne û bi hizir serweriya xwe avabikê ye. Her weha ev dem, demeke ku pir girînge. Di wê demê de, li Kurdistanê pir pêşketin derdikevine hole.Li keviya Diclê û Firatê, pêşketineke mazin derdikeve hole. Di hizirên wê demê de, dageriyên demên pêş, dibine hizir û bi pêş dikevin. Ew dager bidest xwe bi mirovan re anîne ser ziman dikin.Weke dageriyên hizir û filozofên dema xwe ji mirov ku karê şîrove bike nav derdikevine hola.Destpêka hizre şaristaniyê mîtolojî ye. Bi vê yekê re, êdî tê fahmkirin ku em bahsa çi dikin. Navê ´xwûda´ derdikeve hole.`Enlîl, Enkî, tiamat, Înanna, Anu, Marduk, bi rêzê,di dewama wan de wê hê gelek navên din derdikevin. Ev hemû di demên xwe de yan navên keyana û ankû ji navên

serekeyên olî ne. Her yek, ku tê ser ziman, bi navê welat-bajarakî re tê ser ziman.Ev ji, vê yekê radixe berçavan.Ev nav û hê gelek navên weha yên wê demê, çend ku navên mîtolojî ku ji bin, mirov dihizir de û di pêşketine hizir de weyne divêt ku binçav neke.Li dore wan navan li hevdû kombûn û hizirkirin û nivîsandin, vê yekê radixe ber çavan. Bi wan re şaristanî û hizre wê û ha herî girîng ji têgihiştine wê mazin bi pêş dikeve.Çend ku ew têne têgihiştin, bi wan re şaristanî ji bi znistî bi pêşdikeve. Gilgameş û hizire wî û bajarê wî Uruk û navê Utnapiştim, xateke pêşketinê li Kurdistanê radixe berçavan. Ew li ber dicle li keviye wê jîn dibin.Pişt wan re ji, pirr zanist derdikevin.Lê her derketin ji, ji pêşketinê şaristaniyê û hizre wê ne dûre. Piştî dema sumeriyan re, dema ekediyan û babiliyan, Asuriyan û Naîriyan û ta ku mirov tê dema Medan, di xatekê de pêşketin hebûne xwe berdewam dike. Dema Medan demeke ku nû ya.Weke dageriyên hinek ji van dem û şaristaniyan, di dema ekediyan de Sargon û neviyê wî Naramsin û di dema babiliyan de hammurabbi û di dema asuriyan de Asurbanîbal yên herî navdar bûn û yên ku mohra xwe li dîrokê xistina. Edî mirovên ku hziir çêdikin û derdikevin, navê xwe li dîrokê dixin.Di dema medan de keyê wan yê bi navê Dayakos pir bi zane bû. Heredot, di dîroke xwe de bahsa wî dike û li ser navê wî her weha dibêje.`wî got ezê xwe diman civaknasiyê û pêşketinê û bi vê yek xwe ji keyitiyê vekişand bi pşûn ve´.Ev gotin bi serê xwe hebûne pêşketinekê û asta wê radixe berçavan. Ev mirov, mirovên ku navê li dîrokê hiştine.Piştre Zerdeşt tê. Ew hizre mazin têne ser ziman. Zerduşt, bi hizir jiyanê têne ser ziman. Haya wê demê, bi hizirkirinê tişte ku dihata ser ziman, yên bûbûn. Lê ji wê demê pêve, êdî ne tenê ew tê ser ziman. Pêre, êdî bi qasî ku jiyan çawa ya, wilqasî ji êdî divêt ku li gor rastiyê divêt ku çawa bibe tê ser ziman.yanî li ser pêşarojê hizirkiirin çêdibe û hizir tê ser ziman. Zerduşt, hizire vê yekê têne ser ziman. Zerdeşt di olê de hizre yek-Yazdaniyê bi felsefe dike. Divêt ku mirov bi vê yekê re wî pir baş fahm bike. Ev dem, her weha demeke nû ya dî ya, êdî. Pişt vê demê re, êdî demên ku derdikevin, di pêşketinê hizir de, her weha bi pêşdikevin. Pişt vê demê re, gelek zanistên ku iro em navê wan nizanin ji derdikevin.Lê gelek ji wan yên ku em navê wan zanin ji hene. Demên piştî zayinê ev yek li ber çavana. Manî, di piştî zayîne di dema sadsala duyemîn de derdikeve. Manî bi hizre xwe re demeke nû bihizir diafirêne. Hizre wî, ku Îro zêde hê bi gişti nehatibê fahm kirin ji, em zanin ku wî di dema xwe de hhizre li Kurdistanê bigişti belav kiriya.Hizre wî tê naskirin. Piştî wî re gelek zanistên derdikevin. Piştre Ebû Henîfe Dînewerî, Şihabedînê Suhrewerdî, Bawe Tahirê Uryan, Evdilsemedê Babek û hewd hê gelek zanistên mazin yên ku hizre wan li Kurdistanê bi xwe re demên nû têne derdikevin. Ta dema Elî Herîrî ev dem, pir pêşketinan her mazin çêdike. Ji dema Elî Herîrî û pêde, demeke nû ya nûjen dest pê dike. Ta dema Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran ev dem pir pêşketinên civakî û hizirî di xwe de diafirêne. Ji dema Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran û wan ta dema Ehmedê Xanî, di wê dema kin de pirr pêşketinên hizrî û civakî derdikevin. Ev

hersê zanistên mazin, di dema xwe de bi xwe re demeke mazin ya nû di afirênin. Pişt wan re ew dema ku bi wan re dest pê kirî, di wê şûpê de pirr zanist derdikevin. Mele Mahmûdê Bazîdî û yên weke wî mazin ku di hizirin li gor dema xwe derdikevin. Ev zimên mazin bi pêş didixin. Pêş wan re her weha pêşketin û hizir û hizirvan derdikevin. Mirovên weke Nalî, Seîdê Nûrsî û hwd, gelek zanistên din derdikevin. Hemû ji hzire xwe mazin tênine ser ziman. Mirovên weke Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, hizre felsefe ya hemdem mazin bi pêş dixin. Pişt wan re hizre wan bi pêş dikeve. Gelek hizir û zanist derdikevin û wê hizre bi pêş dixin.

D demên piştî Manî de weke ku me di paragrafa li ser vê de jî hanî ser ziman, wê zaneyên mazin derkevin. Bi wan re wê gelek ji wan hizrên xwe li ser mijarên civatî û zanistî wê werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de ev demên ku tên û dûbûhûrin, wê wisa demna ku bi aqil pêşkevin bin. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Aqilê mirov, di vê çerçoveyê de wê pirr zêde li ser wê pêşveçûnên civatî wê werênina hanîn li ser ziman.

***Dawî lê hanîna destpêka Manî, destpêkirina pêvajoyên îslamê û bi wê re pêvajoyên xate baweriya êzdayî bi pêvajoyên aqil ên li Kurdistanê.***

Ku mirov ji kîjan aliyê ve binerê mirov rastî bandûr û heyîna têgîna Manî ya di pêvajo û serdemên nû de tê. Her wisa, pêvajoyên piştre ên ku îslamê ku tên, wê li ser wan jî ev bandûr wê hebe. Her wisa divê ku mirov di dewama wê de jî bibêje ku pêvajoyên piştre ên aqil, di vê çerçoveyê de giring in ku mirov wan fahm bike.

Manî, dema ku mirov behsa wî bike, divê ku mirov tenê bi bandûra wî û hizrên wî yên ku bûna hîm ji pêşketinên piştre re bi tenê neyênê ser ziman. Her wisa, bi rengê pêşketina wî, aqilê wî û her wisa baweriya wî re ku piştre xwe dide domandin di nava êzdayiyê de re jî wî werênê ser ziman. Li vir, ser demên piştre ên xate Yazdaniyê ku piştî hatina îslamê re wê rastî pêvajoyên hêrîşan ên çawa werin, dema ku mirov civatên êzdayî û hwd lêkolîn bike, mirov wê biawayekî vekirî wê bibînê. Xate Yazdaniyê, wê bi hizrên Mîtrayî, Zerdeştî Maniyî û hwd re wê piştre xwe bide domandin. Ev hersê zanyar û filosof, wê piştî xwe re bi hizrên xwe yên ku dihênina ser ziman û bi baweriya xwe ya ku pêş dixin re wê bandûra wan di demên piştî wan de jî zêdetirî hebe. Li vir, giringa ku mirov divê ku werênê ser ziman ku Ev zanyar û filosof, di dema xwe de her yekê bi hizrênx we yên ku dihênina ser ziman re wê pergalên xwe yên hizrî werênina ser ziman. Pêvajoyna aqil û zanebûnê jî wê bi wê re bidina pêşxistin û bidina domandin. Di vê çerçoveyê de pêşveçûnên olî ên pirr piştre ên weke mesîhî û îslamê û hwd, wê li ser wan ancamên wan yên biaqil û bawerî ku pêşdikevina re wê xwe pêş bixin.

Li vir, divê ku mirov werênê ser ziman ku ev hersê zanyar û filosof ên weke Mîtra, Zerdeşt û Manî, wê destpêkên serdemên aqil ên felsefeyê jî bin. Bi wê re rengên civatî ên di dema aqil de ku çawa dibê ku hebe, wê di derbarê de jî pêşveçûnna bi aqilê xwe re bi jiyana mirov re bidina çêkirin. Bo vê yekê, wê hersê, wê giringiya wan, wê hertimî ku werina ser ziman jî û newina ser ziman jî, wê xwe bide hîskirin. Her wisa, ji dema Mîtra û heta Zerdeşt, û ankû ji dema Mîtra a Mîtannî heta dema Zerdeşt a Mediya, wê pêvajoyên pêşveçûnê ên aqil xwe bidiina diyarkirin. Lê bi wê re Zerdeşt, bi hizrên xwe yên Avêstayî re wê pêvajoyek civatî ya ku bi tememî divê ku bi aqil bijî, wê temenê wê biafirênê. Hizrên Zerdeşt, di vê warê de giring in. Ji dema Zerdeşt û heta dema Manî, di vê çerçoveyê de wê pêşveçûnna demî ên dirêj bibin. Manî, wê di dema xwe de hem xwe werênê ser ziman û hem jî van pêşveçûnên berî xwe wê bi xwe re hevgirtin(´sentez´) bike. Manî, wê di vê çerçoveyê de hem felsefeyê bike, hem baweriya xwe li gorî demê werênê ser ziman û hem jî wê ola xwe li gorî dema felsefeyê ya aqil û zanista wê, bi wê re pêşbixe. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de ola Manî, ya zanebûnê ye.

Manî, ji dema wî û heta dema derketina îslamê, wê ser sêsed salî re wê bawermendên wî bijîn. Wê ola wî bidina domandin. Piştre jî dema derketina îslamê, wê xwe bidina domandin. Lê misilman, wê di destpêkê de bidest seferên leşkerî ên li herêmên Mesopotamiya bikin. Herêmên Zerdeştiyan, Mîtrayiyan ku piştî desthilatdariya Abgar hê jî dijin û ên Manî, wê rastî hêrîşên mazin werin.

Ku mirov pêvajoyên xate yek-xwûdayiya Yazdanî ku baş fahm nekê, mirov wê pêvajoyên berî wê jî bi başî fahm nekê. Her wisa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi awayekî baş li ser xate pêşketina pêvajoyên Yazdaniyê bisekinê. Manî, bi ol û baweriya xwe re wê weke xeleka dawî a vê pêvajoya giştî a serdestiya ola yek-xwûdayî ya Yazdaniyê bê. Piştî Manî û serdestîa ola wî re, dema ku serdestiya ola îslamê destpêkir, wê ev ol weke olek semewî, wê dawiyê li pêvajoyek giştî a ola yek-xwûdayî ya Yazdaniyê werênê. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li vê dema pêşketina vê ola ola semewî dinerê, her wisa, bi wê re mirov bi destpêka wê re wê pêvajoya ola Manî jî di vê çerçoveyê de dibînê.

Rastiya ola Manî, di vê çerçoveyê de ji aliyê serdema xate yek-xwûdayî ya Yazdanî, hevgirtin (´sentez´)a têgînî a bi hizrên Manî û her wisa ola wî re divê ku mirov li wê bihizirê. Pêvajoyên seferên hêrîşî ên piştî derketina îslamê ku herêmê mesepotamiya dike, di vê çerçoveyê de wê dawiyê li demeke baweriyî ya bi ola Manî re werênê. Lê baweriya yek-xwûdayî ya Yazdanî, wê bi beşên civata Kurd ên baweriya xwe didina domandin ên weke êzdayî, yarsanî û hwd re bide domandin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku li Asya dûr, bi pêşketinên weke yên li ser hizrên Bûda re ku bûna bi sedsalan, wê ew jî ji aliyekî ve wê weke pêvajoyna vê xate yek-xwûdayî ya

Yazdaniyê bin. Ji wê, temenê xwe girtina û pêşketina. Piştî wê re jî, wê xwe bidina domandin.

Ji sê aliyan ve mirov dikarê werênê ser ziman ku wê hewldanên dawî li dema yek-xwûdayî ya Yazdanî dihên hanîn mirov dibînê. Yek, di vê çerçoveyê de bi seferên hêrîşî ên li herêmê na. Ya duyemin jî, wê bi ola mesihiyê re ku berî îslamê destpê pê bike ku weke li ser Mîtravaniyê, Zerdeştitiyê û piştre Manîvaniyê re dike bi rêbazê bişavtinê a ku bûhûrandina nirxên ol û baweriyên yek-xwûdayî ya Yazdanî li pêşketina van olên semewî ên ku hin bi hin pêş dikevin û serdest dibin. Ji aliyê din ve jî, wê pêvajoyên hêrîşê li wê pêşbikevin. Piştî derketina Îslamê re, wê li Kurdistanê di nava civata Kurd de di xate yek-xwûdayî ya Yazdanî de wê pêşveçûnên nû rûbidin. Her wisa, divê ku mirov werênê ser ziman ku wê, piştre zane û filosofên xate ola yek-xwûdayî ya Yazdaniyê ên weke Sultan sahaq ku bawermend û weke nebî û pêxemberê wê ya wê derkeve. Her wisa, di xate di xate yek-xwûdayî ya Yazdaniyê de wê bi ola êzdayî re bi heman rengî şêx Adî wê derkeve. Berî wan di çerçoveya bawerî û ola Manî de wê Zäd Hürmüzd derkeve. Ev hersø zane û filosof, wê weyn û rolek mazin di pêşketin û parastina têgîna yek-xwûdayî ya Yazdaniyê de wê bileyizin. Di aslê xwe de felsefeya van keseyetan, wê giring bê. Şêx Adî, wê weke pêşeng û nebiyê ola êzdayiyê derkeve li holê. Hizrên ku ew dihênê ser ziman, wê hebûna civatîtiya Yazdaniyê û her wisa bawerî û ola wê ji tûnabûnê xilas bibe. Piştre jî, weke ku çawa piştî Manî re di şopa wî de wê zane, bawermend û fîlosofên weke Zäd Hürmüzd û hwd, wê derkevin, biheman rengî wê di şopa şêx Adî de li ser xate baweriya êzdayiyê wê bawermend û zaneyên weke şêx Faxrê Adiyanî, celawa û hwd wê derkevin. **Şêx Fexrê Adiyan**, fîlozof û zanayekî bi eslê xwe Kurd ê êzidiyan e ku di sedsala 11'an de jiya ye. Piştî Şêx Adî jiya ye. Li gorî vê jî, Şêx Adî bixwe jî di sedsala 10'an de jiya ye. Şêx Faxrê Adiyanî, ji wî ku weke ku çawa ji gelek alim û mazinên Kurd helbest mana, ji wî jî, gelek helbestên ku bi destanî tên gotin mana roje mana. Şêx Faxrê Adiyanî, li ser dîrokê, felsefê û astronomî û fizîkî hizrên xwe hanîna ser ziman. Di derbarê van beşên zanînê bi hinek beşên din re jî nivîsandiya û haniya ser ziman. Şêx Faxrê Adiyanî, Şêxekî Êzîdî bû. Di dema xwe de xwedî dergeh bû. Heta ku hatiya kifşkirin ku ew di dema xwe de weke "şêxê şêxan" hatiya dîtin û naskirin û herê kirin. Bandûra wî, li ser dema wî pirr mazin bûya. Şêx Faxrê Adiyanî, piştî Şêx Adî re hat û di dema xwe de, hewlda ku Şêx Adî pirr baş bi mirovan bide fahm kirin. Yanî, biqasî ku tê dîtin û bawerkirin, Şêx Faxrê Adiyanî, Şêx Adî piştî wî re jî, di nava xelkê Kurdistanê de pirr baştir daye fahm kirin. Di wê dema ku pirr hêrîş li Êzîdîtiyê hebûn, di xate Şêx Adî de meşî û hemû hêrîşên li ola Êzîdîtiyê dan rawastiandin. Bi vê rengê, bandûra Şêx Faxrê Adiyanî, pirr bi giring heya ku wî ola êzîdîtiyê bi têgihiştin û baweriya civata wê û dîroka wê re pirr baş hanî ser ziman. Şêx Fexrê Adiyanî, fîlozof û xasê ola Êzdiyatiyê ye. Şêx Fexrê Adiyanî e ku di sedsala 11.min de weke yazdeyan jiyaye û yek ji yê mezintirîn

zanayên ola êzidiyan e û gelek ji tekstên ola êzidiyan ji aliyê wî ve hatine nivîsandin.

Şêx Adî û şêx Faxrê Adiya wê, pêvajoyek nû bi hizrên xwe re bi civata êzdayî re bidina destpêkirin. Di aslê xwe de mirov dikarê bibêje ku wê Şêx Adî û şêx faxrê adiya, wê di w dema ku pir hêrîş li Kurdên êzdayî bûna û weke ku di dema Kurdên êzîdî ên dasniyan û û hwd re ku komkujiyên mazin jiyana û piştî wan komkujiyan re bêdengiyek afiriya, wê di demek wisa de derkevina li holê. Ev rewşa derketina şêx Adî û şêx faxrê adiya, wê Kurdên êzîdî ên bakûr, başûr û bi teybetî ên rojavayê Kurdistanê bike tevgerê de. Li herêmên bakûrê Kurdistanê ên weke çolemergê ku şêx Adî bixwe jî ji wir a, wê Kurdên bi hêzek mazin re derkevina li holê. Ji xwe, gelek aşîrên Kurdên êzdayî li herêmê bi hêzek mazin li herêmê xwe bi serdestî dijiyan. Li herêmên rojava ên berêfiratê û li herêmên bakûrê ji çolemergê û heta herêma botanê û hwd, gelek aşîrên Kurdên êzdayî li wir dijîn. Herêm û gûndên weke ên bacinê û hwd, Kurdên êzdayî hebûn. Li herêmên li dora **Êlihê** û hwd, li herêmên weke sasonê û hwd, aşîrên Kurdên êzîdî bi serdestî dijîn. Derketina şêx Adî, weke hêviyeka wan ya bi ber pêşarojê ve jî bê.

Piştî Şêx Adî re wê şêx faxrê adiya, wê bandûra wî pirr zêde hebe. Wî, hizrên şêx Adî, di nava civata êzdayî de da rûnandin. Li dora hizrên wî civat li hevdû da li hev û komkirin. Şêx Faxrê Adiya weke zane, filosof û bawermendê xate êzdayî ku piştî şêx Adî re hatiya û di wê çerçoveyê de hizrên xwe dihênê ser ziman e. Navê «şêx axrê Adiya» bixwe jî, dema ku mirov li wê dihizirê, wateya ku dide me, ew a ku «şêxê ku zaroyê adiya ya» dide me. Mirovê ku di ´şopa adiya de dimeşê´, ´yê ku zaro(´faxrê´)yê adiya´ ´yê li şûna wî ya´, ´yê piştî wî weke ku ji malbata wî ya û li cihê wî rûniştiya´ û hwd, bi vî rengî gelek wate bi navê «şêx faxrê adiya» re mirov dikarê fahm bike û werênê ser ziman.

Civata êzîdî, her wisa divê ku mirov di vê çerçoveyê de werênê ser ziman ku wê piştre xwe bi dîrokê re bi nû ve birêxistinkirinê re wê bide domandin. Wê bidest nivîsandina dîroka xwe ji nû ve bike. Reng û bergên êzdayî wê wê li gorî wan were jiyandin.

Ev derketina Kurdên êzdayî û ji nûve xwe bicivatî derxistina li dika dîrokê bi hizrên şêx Adî û hwd re, wê destpêka pêvajoyekê bi navê ola êzîdî jî bê. Di heman demê de wê Kurdên yarsanî jî, li ser heman xate Yazdaniyê xwe bi hizrên siltan sahaq re birêxistin bikin û werênina ser ziman. Weke ku çawa ku şêx Adî bi navê «qawla»na hizrên xwe dihênê ser ziman û bi wî rengê navê nivîsarên pîroz ên êzdayî dihên ser ziman, wê sultan sahaq jî wê bi pirtûka xwe ya «serancamê» re wê werênê ser ziman. Her wisa bi rengên felsefî ên weke **«ez rastîtî» û ankû «enel-haq»** û hwd re wê xwe di wê şopê de werênina ser ziman. Ez rastîtî´, ku li ser esas û hîmê ku felsefeya xwe ya baweriyê ku xwe bi civatiya xwe re birastî dibînê û dihênê ser ziman e. Hizrên pirtûka serancamê, wê weke hizirna pîroz ên civata yarsanî ku di şopa Yazdaniyê de

dimeşin in. Di vê çerçoveyê de wê kom bi kom, komên civatî ên ji civata Kurd li Kurdistanê xwe ji nû ve birêxistin bikin. Bi heman rengî, wê piştre Kurdên şebekî û feyliyî jî wê xwe birêxistin bikin. Kurdên elewî, li ser navê Alî re xwe birêxistin kirin. Bi rêya şêxên xwe wê xwe birêvebibin. Lê Kurdên elewî jî, wê bi heman rengî bi şêwayekî din li ser wan nirxên pîroz ên êzdayî re wê xwe birêxistin bikin û felsefeya xwe werênina ser ziman.

Şêx Adî, wê bixwezê ku hizrên xwe re ji nûve xate êzdayî bivejênê. Nirxên dema berê ên Mîtra, Zerdeşt û Manî, wê hinek ji wan bi şêwayna, dinava hizrên wî de werina ser ziman. Her wisa, serboriya Mîtra a bi ga û gûrandina wê re, wê di wê demê de jî di nava ola êzdayî de bijî. Serboriya Mîtra a bi ga re û ankû ´gûrandina ga´, wê weke ´peymaneke bi Yazdanê mazin´ re bê. Mîtra, di vê çerçoveyê de ew serboriya ga, di dema xwe de da jînkirin û biwate kirin. Wî gayê xwe gûrand û goştê ga, çêkir û sofra danî û li ser wê rûnişt. Her wisa, piştre hanî ser ziman ku kî ji wê sofreyê bixwe, wê bidil peymaniya xwe bi Yazdanê mazin re girêbide. Mîtrayiyan, dema ku di parastgehên xwe de Mîtra tefsîr dikirin, weke ku li ser wê sofrayê Mîtra bi Yazdanê mazin re rûniştî tefsîr dikin û dihênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de ku li dora wê sofrayê Mîtra û çend bawermendên wî bi Yazdanê mazin re rûniştî dihênina ser ziman. Rewşa ga, di vê çerçoveyê de weke rewşek giring e. Berê jî di baweriya Yazdanî de ga, pîroziyek lê hatiya baxşt kirin. Dihat gotin ku li ser herdû stirhên ga, dunya û jiyan di ahengekê de disekinê. Mîtra jî di dema xwe de bi wê bawer kiriya. Lê Mîtra, piştre bi vaca serê xwe kifşkiriya ku Yazdanek li ser ga re jî heya ku hertiştî kifş dike û piştre ga digûrênê û dike temenê peyman û girêdane bi wî ve.

Di nava êzdayiyan de ew peyman hatiya parastin. Dema ku êzdayî di ´cejna cemayê´ de gayekî digirin û piştre ku ga ji destê wan difilitê û piştre ciwan dîsa wî gayî digirin û piştre digûrênin û wê sofraya xwarinê tê danîn û herkesek bi wê têgîna wê peymana bi Yazdanê mazin re li ser wê sofrayê dirûnihê û wê xwarinê dixwê. Li ser wê sofrayê rûniştin, weke rûniştina li ser sofraya Yazdanê mazin jî bi wê tê bi wate kirin. Bi wê re weke ku Mîtra kir, li ser wê sofrayê rûniştin û ji wê xwarina wê sofrayê xwarin, wê weke bûyîna bawermendekî êzdayî û di şopa êzdayî de dimeşê, wê bi wê xwarinê re peymane xwe bi Yazdanê mazin re çê bike. Di vê çerçoveyê de rengekî bawerî û felsefeya wê, di vê rewşa gûrandina ga û sofraya wê de heya. Ew, weke ´sofraya Yazdan´ jî dihê bi navkirin.

Ev rewş hemû, wê ne tenê di nava civata êzdayî de biwate bin. Bi wan re bi civatên yarsanî ku ew jî weke beşek ji civatên êzdayî na, wê di nava wan de jî biwate bin. Siltan Sahaq, bi hizrên xwe yên ku di serancamê de hanîna ser ziman re wê, rêxistiniya civata yarsanî pêşbixe. Di dema Sultan Sahaq de bawermendên civata yarsan ên weke ´Babê serhengê dewdanî´ û hwd wê derkevin. Weyn û rola wan di pêşxistin û parastina hebûna civatê de wê giring bê. **Baba Serhengê Dewdanî** ku di sale935 tê dunyê û di sale 1007 de diçê ber

dilovaniya xwe, weke helbestvan û ji pîrekî yarsaniyan bê. Navê wî ´Baba Serheng kurê Îbrahîmê Dewdanî´ bû. Peyva ´Baba´ li cem yarsaniyan, hevwateya peyva pîr û ankû kal de ye. Bo vê yekê, pîrên wan, hertimî wê gotina ´baba´ li pêşiya wan werê danîn. Û ankû, wê tenê ji wan re bê gotin ´baba´. Ew li Hawramanê li devera çiyayê Şahoyî li jêriya bajarê Sineyê ji dayik bûye û laşê wî li gundê Tewêleyê hatiye veşartin. Wî bi goranî helbest nivîsandina. Helbestên wî, di şêwayê qawlên´ êzdayiyan de heta roja me jî, di nava yarsaniyan de dihê parastin û ser ziman. Di aslê xwe de weyna ku şêx faxrê adiya ku piştî şêx adiya leyist, wê di dema sultan sahaq de wê ´babê serhengê dewdanî bileyizê. Weyna wî bigiringî divê ku mirov li ser wê bisekinê û werênê ser ziman. Hinek çarîn/dubeytiyên wî, di "defterî dewrey Baba Serheng dewdanê"yî de hatine parastin. Ew jî, di dîwanên Kurdên yarsanî de dihên ser ziman.

Yarsanî jî mîna û ankû weke êzîdiyan di salê de sê rojan rojiye digrin. ´Rociyan yarsantiye´ di meha 12an de destpê dike. Dibên sedema van sê rojan rojî dorpêçîkirina Siltan Sahaq û sê derwêşên wî di newaleke bi navê Marre-Nû de ye. Gore qinyata yarsanan Siltan Sahaq û hevrêyên wî, di wan sê rojan de tî û birçî mabûne, piştre ji destên dijwaran filitîne. Ji vê yeke oldariyên ehlên dînê yarsan hersal bîraninê li vê gernasiya Siltan Sahaq û hevrêyên wî bi bîr dihênin. Yarsanî li pey rojiyê cejnekê ya ku ew jî 5 rojan domdike pîroz bi pîroz kirina wê re. Yarsanî, weke civateka di vê çerçoveyê de ku ew jî, weke ya êzdayî wê xwe ji nû ve li gorî demê birêxistin bike. Her wisa, ji destpêka îslamê û heta wê demê jî, hertimî ev beşa civata Kurd rastî hêrîşên xadar hatiya û di dîrokê de gelek komkujiyên mazin hatina serê wê ji ber sedema baweriya wê.

Rewşa Kurdên êzîdî, wê di vê çerçoveyê de xwe bide domandin. Her wisa, herêmên wan wê hertimî rastî hêrîşê werin. Desthilatdariya Abasiyan ku li herêmê pêş dikeve û serdest dibê û pê de, wê bidest hêrîşan li Kurdên êzdayî bike. Berxwedana Kurdên Dasnî, berxwedana Kurdên babekî û hwd, wê çend ji wan berxwedanên Kurdên bi baweriya Yazdanî a ku bûya malê dîrokê bê. Piştî di aslê xwe de ev rewşên weke ku bi sultan sahaq, Şêx Adî, şêx faxrê adiya, baba srhengê dewdanî û hwd, wê derketina wan, rastî demên desthilatdariya şadadiyan û merwaniyan werê. Di van deman de bi van rêveberî û desthilatdariyên Kurd re wê pêşiya hêrîşênli Kurdên êzdayî, yarsanî, şebekî, feylî û hwd jî were girtin. Kurdên şebekî û ku weke aşîrna ji Kurdên şebekî na Kurdên kakeyî û hwd jî, wê ji herêmên kirmaşan, hewraman û şaahrîzor bin. Di demên sultan sahaq de hinek aşîrên wan li dora mihabadê, sînê, ûrmiyê bokanê û hwd dijîn. Her wisa heta ku digihişt ber zagrosan, wê li herêmê belavbûyî bin.

Dema Şadadiyan, wê demek desthilatdarî a bi welatî a dirêj bê. Lê hin bi hin, ji dawiya sedsale 12´min û pê de wê li herêmên wan desthilatdariya wan bi serdestî û serwerî wê kêm bibê. Piştî wê kêmbûna serdestî û serweriya wan,

wê li şûna wan xanadan û desthilatdariyên nû derkevina li holê. Desthilatdariya Ardalaniyan ku heta sedsale 18´min wê bidomê, wê piştî wan re li herêmê wê ava bibê. **Mîrgeha Erdelanê** ku di sale 1169´an de bi desthilatdarî li ser axa desthilatdariya şadadiyan derketiye li pêş, wê piştre gelek aşîrên kakeyî û şebekî piştre goçî başûrê Kurdistanê li nava desthilatdariya wan bikin. Bi teybetî ku navenda wê pêşÎrojhilatê Kurdistanê bû, mîrnişîneke Kurdan bû ku piştî dewletên Kurd ên wekeşadadî û Merwaniyan re ava bû. Mîrgeha Erdelanê, destpêka wê ji 1169 tê dest pê kirin û heta sale 1867´an tê. Ev welatê Kurdan bi desthilatdarî, piştî welatê şadadî, Merwanî û Eyûbiyan re wê bê desthilatdariyek Kurd a ku wê ew bi serdestî û serweriya Eyûbiyan li başûr rojavayê Kurdistanê û bakûrê ava dibe re wê Erdelanî jî, ku ji koka xwe ve digihine hevdû. Merwaniyan, paytaxta wan mayafarqîn bû û weke navendek wan ya mazin û dîrok amîde bê. Bi wê re wê li bakûrê Kurdistanê bidesthilatdarî derkevina li holê, lê wê rojhilatê Kurdistanê û başûrê Kurdistanê jî hemûkî bikina qada serwerî û serdestiya xwe.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman ku ji ber Kurd bi aşîrî û xanadanî li herêmê xwe hertimî bi serdestî û serweriya xwe re hebûna, wê êdî di cih de ku valahiya desthilatdariyê derdikevê li holê dikarin dagirin. Rewşa Ardaleniyan a piştî şadadiyan û merwaniyan li herêmê jî, mirov dikarê bi vê re werênê ser ziman. Dema ku Ardalanî derdikevina li holê, wê aşîrên herêmê hemû jî piştgirî û alikariyê bidina wan. Ber ku hemû aşîr û êlên Kurd ên herêmê dibînin ku dema ku bêhêz bin û ne bi tifaq bin, wê hertimî rastî hêrîşan werin. Demên hêrîşên dasniyan, babekiyan û hwd, wê fêr û cerbna mazin di van waran de bidina wan.

Ev dema civata Kurd, divê ku mirov werênê ser ziman ku wê di wê de gelek zaneyên Kurd ku wê civata xwe biparêzên û wê pêşengiyek rast ji wê re bikin wê derkevin. Şêx adî, sultan sahaq, şêx faxrê adiya, baba Serhengê dewdanî, wê çend ji wan zaneyan bin. Zaneyên dervî wê ên bi ola îslamê re jî derkevin, wê di vê demê de zêde bibin, Şêx Avdilkarê geylanî, Dibînê Qudat, Faxrê Nîsa ku bi navê ”şehre Dîneweriyê” jî tê nasîn, Bahadînê kûrê şadad, Abulîzê Cizîrî, Amîda, Amerê Suhrewerdî, Aliyê Êsir, Azreqê fariqî, diyadînê êsir, Mibarekê mistewfî, Avdilfaracê cewzî, Nîzamê gncewî û hwd wê derkevin. Weke van di dema xwe de wê gelek zane û filosofên Kurd ên din jî wê hebin. Filosofên weke Avdilfaracê cewzî, Amîdî, Bavê heniê dinwerî û hwd ku tên, wê têgîna bijîşkiyê bi aqilê wê re pêşbixin. Pirtûkên ku dinivîsênin, wê li ser dermankirin û başkirinê bin. Aliyê êsir, bahadinê şadadî, azraqê fariqî û hwd, wê çend ji wan dîrokzanên Kurd ên wê demê bin. Bi pirtûkên xwe yên ku dinivîsênin, wê dîroka civatê û ya herêmê bi baweriya wê ya demê û ya berî demê re wê werênina ser ziman. Filosofên demê ên ku di nava baweriya îslamê de pêş dikevin, wê rewşeka wan ya teybet hebe. Rewşa filosofê Kurd ê rojhilatî Dibînê Qudat, vê di vê rewşê de di derbarê fahmkirina

Kurdan ya wê demê a îslamê de jî wê têgîn û aqilekî baş bide me. Her wisa, Dibînê Qudat, wê di sopa xalacê-mansur û hwd de bimeşê. Dawiya wî jî, wê weke ya xalac-mansur lê werê.

**Dibînê Qudat** fîlozofên Kurdan yê Felsefeya Îslamê, navekî navdar û ji Hemedanê ye.Dibînê Qudat, navnasê wî ye, navê wî yê berastîn Evdilla ye. Evdillayê kurê Mihemedê Elî ye. Ew Kurdekî Hemedanî ya û di 1098'an de li Hemedanê hatiye dinyê. Ji ber ku di fiqiha Îslamê de pêşketî bûye û hê di bîst û du saliya xwe de di 1120'an de dest bi nivîsandina xwe kiriya. Dibînê Qudat, birastî jî xwediyê hişekî mazin bûya. Lewra digel ku wê demê ewqas zanyarên mezin û jêhatî yê Hemedanê bû. BIqasî ku mirov ji jiyana wî fahm dike, zanebûna wî ya dermankirin û başkirinê jî hebûya. Li hemedanê, navî di dema wî de bi vî rengî derdikeve li pêş. Dibînê Qudat, ji ber hizir û ramanên xwe ciwanî hat kuştin. Wî jî weka Xellac felsefeya Wehdetul wucûdê di parast û ji ber van ramanên xwe ji alî desthilatdariya ya demê ve bi xedarî hate kuştin. Feqîtiya xwe, ji dest seydayên mezin ên weka Omer Xeyam, Ehmedê Xezalî û Şêx Mihemedê Hemayî ku zanîn û filosofna demê ên başbûn derbas kir. Di avakirina felsefeya xwe de ji du navên mezin bandor girt: Xellacê Mensûr û Mihemedê Xezalî. Di felsefeya wî de tenê rêgezên Îslamî tuneye, di heman demê de ji felsefeya dema antîkî ya berê a Mîtra, Zerdeşt û Manî jî bandor girtiye û bi vî rengî felsefeya wan jî xistiye nava felsefeya îslamê. Wekî ku me li jor jî hanî ziman wî jî weka Xellac di felsefeya xwe de wehdetul wucûdê biparêzê. Serqisê ev gotin ya wî ye “ Ew ê ku hûn wî xwedê dizanin, ew Mihemed e. Ew ê ku hûn wî Mihemed dizanin ew Xwedê ye.” Ev gotin dibe ku di halê sekrê de hatibe gotin. Lewra aliyê wî yê tesewûfî gelek mezin bû. Lê dîsa jî, ji vê gotina wî nayê fehmkirin ku Mihemed û xweda yek in an Mihemed xweda ye. Bi vê gotinê armanca wî yekîtiya afirîner û yên afirî ye. Jixwe wehdetul wucûd jî li ser vê yekê ava bûye.

Di demê de dema ku mirov di vê çerçoveyê de dihizirê, mirov dibînê ku lêkolînkirina hizir û felsefeyê li pêş e. Her wisa, desthilatdariya şadadiyan, di dema xwe de derfeteka mazin didina zaneyan ku werina wir û bijîn. Her wisa, dîrokzanê Kurd ê bi navê bahadînê şadadî, wê heta dawiya jiyana xwe li qasra şadadiyan bimênê û wê hizrên xwe werênê ser ziman. Wî gelek pirtûk nivîsandin û li wir, li şûn xwe hiştin. Bandûra pirtûkên Bahadînê şadadî û pişrtûkên wî wê li ser zaneyên demê zêde hebe. Li vir, divê ku em vê yekê jî werênina ser ziman ku bandûra pirtûkên Bahadînê Şadadî wê li ser Dibînê Qudat jî wê hebe.

Li bakûrê Kurdistanê ê roja me ku hin bi hin desthilatdariyek mazin ya demî avakiriya welatê Merwanî û desthilatdariya wê, wê xwediyê gelek zaneyên demê bê. Êlî Herîrî, weke ku çawa ku li qasra şadadiyan bû, wê ew jî li rojavayê Kurdistane roja me bijî û wê li ser axa merwaniyan di bin desthilatdariya wan de hizrên xwe werênê ser ziman. Piştre, di şopa Êlî Herîrî de wê zaneyên Kurd, filozof û dîrokzan ên weke Aliyê Êsir û hwd wê werin.

Bi teybetî di sedsale 11´min de wê li Kurdistanê di vê demê de gelek zane û filosofên Kurd derkevin. Li herêmê di wê demê de wê zaneyên demê wê Cîzîra bota ji xwe re bikina navend. Weke Azraqê Farqînî, Abulîzê cizîrî, Zeynedînê çolemergî û hwd, wê derkevin û ew zane û filosofên weke wan, wê li herêma cizîra bota bisekinin û weke ku heta roja me, bi alûzê cizîrî re dihê hanîn li ser ziman, wê li wir perwerdekirinê jî bikin. Bi wê re, divê ku mirov bi Aliyê êsir re jî werênê ser ziman ku ew wê li cizîra bota bimênin.

Di demê de zane û filosofên u derdikevina li holê, wê civatê bi nirxên wê re weke ku ji nû ve şîrove bikin û werênina ser ziman. Di vê demê de biqasî ku mirov ji rewşa Aliyê êsir ku weke dîrokzanekî demê ê navdar û mazin a, mirov fahm bike ku pêwîstî bi wê dibînin ku ew dîrokê ji nûve li gorî zanebûna demê werênina ser ziman. Aliyê Êsir, dîrokzanekî ku bi zanebûna xwe re pirr mazin bûya. Malbata wî, bi derfetên ku di destê wan de na, wê gelek zane û filosofan ji nava xwe de derxin.Herwisa li dûv Aliyê Êsir, birayê wî yê piçûk Diyadînê êsir,wê di şopa birayê xwe Aliyê êsir de wê fîlosofiyeka civatî bike. Ew jî, weke dîrokzanekî û her wisa fîlosofekî civatê divê ku mirov wî werênê ser ziman. Aliyê êsir, wê di malbate xwe de ne mirovê pêşî ê xwanda û zane bê. Wê bîrayê wî yê mazin Mecdedînê êsir ku weke birayê mazin a bo Aliyê êsir û Diyandînê êsir, wê dîrokzanek bê. Di dema wî de Aliyê êsir, wê weke wî ew jî bê dîrokzanekî xort. Lê Birayê wan ê piçûk Diyadînê êsir, wê li beşên din ên aqil bihizirê. Her wisa, di beşên felsefeyê ên civatî û zanebûna xwezayê e wê xwe pêşbixe û derxe li pêş. Ew wê weke filosofekî zanebûna xwezayê wê navê xwe bide diyarkirin. Li gorî ku tê vegotin di derbarî wî de wê li ser fîzîk û atronomiyê, xabatna mazin **bike**. Bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku Aliyê êsir hinek hizrên wî yên li ser metafizîk û mantigê hena. Di vê çerçoveyê de ew li ser navaroka êqil dihizirê. Di vê çerçoveyê de ew giringiyê dide wê ku mirov di navaroka êqil re bihizirê bi wê re pêde herê û werênê ser ziman. Li gorî wî, «rengê pêşketina navaroka aqil, wê derveyiya wê û bi wê re awayê wê bi şeklê wê re bide nîşandin û diyarkirin. Di vê çerçoveyê de ew giringiyê dide **navarokê**. Aliyê êsir, ku di dema wî de dijî Eliyê herîrî jî, wê di vê çerçoveyê de xwediyê rengekî pêşketina aqil bê. Em dizanin ku Aliyê Herîrî, di wê demê de xwediyê dergeh a û li herêma çolemergê, ew dergeha wî bi serdestî heya. Di vê çerçoveyê de Eliyê Herîrî, li van herêmên rojava ên rojavayê Kurdistanê jî, di dema xwe de geriya ye. Her wisa, wî gelek nivîsarên ku bûna yên perwerdekirinê li Cizîra bota nivîsandina. Piştî serdema Merwaniyan ku wê hin bi hin li herêmê bihêz dibin û dibina xwedî desthilatdar û serdest dibin xanadana eyûbiyan, wê li herêmê serdest bibê. Di dema eyûbiyan de filosofê Kurd Aliyê êsir, bi zanebûn û dîrokzaniya xwe re pêşengiyek mazin kiriya. Di vê çerçoveyê de dîrokzaniya wî di demê de wê nav bide.

Li vir, divê ku mirov di dewama wê de jî werênê ser ziman ku zaneyên Kurd ên demê, wê li ser dîrokê, felsefeye û felsefeye pirr zêde serê biwastênin.

Her wisa, em dema ku li aqilê wan ên ku hanîna li ser ziman ku mirov li wê dinerê, mirov dibînê ku di awayekî hemdem de aqilê xwe hanîna ser ziman. Zanin, di zixmeta civatê de hatiya bikarhanîn. Di vê demê de ku weke navendekê ya cizîra bota, mirov dibînê ku pirraniya zaneyên ku Kurd wê xwe li wir bigrin. Bi wê re jî, wê zaneyên xwe li wir pêşbixin. Mirov dikarê vê yekê jî werênê ser ziman ku wê zaneyên Kurd û ên herêmê wê li herêma botanê ku di wê de rojavayê Kurdistanê jî di nava wê de ya, wê werina wir û li wir zanebûna xwe bihevdû re bipîvîn. Her wisa, di vê çerçoveyê de rewşekê mirov bi wan dibînê.

Em dema ku behsa zane û filosofên vê demê bikin, divê ku em cihekî berfireh ji Abûlîzê Cizîrî re vqatênê. Ev zane û filosofê Kurd, wê di dema xwe de rengekî zanebûnê ku zane û filosofên demê bi wê re ne hevnasin, wê werênê ser ziman. Mirov dikarê, wê di çerçoveya dema wî de weke ´kifşkarekî´ û ankû afrînêrekî ji werênê ser ziman. Rewşa Abûlîzê Cizîrî, wê di derbarê asta zanebûna demê de wê aqilekî baş jî bide me. Bo vê yekê divê ku mirov hinekî li ser wî bisekinê.

**Abûlîzê Cizîrî** di sale 1153an de li Cizîrê wê werê dunyê. Abûlîzê Cizîrî weke dahêner, matematîkzan, stêrnas, endazyar û fîzîknasê Kurd e. Bingeha zanista robot û Sîbernetîkê avêtiye. Ew, bi pirtûka xwe ya bi navê "*Kitêba li ser Zanîna Hiyelên Endazyaranî*" navdar e. Wî ew pirtûk di sala 1206'an de nivîsiye û di wê de, digel nîgaran, behsa çêkirina 50 amûrên mekanîkî dike. Dîroka bûn û mirina wî, zêde ne zelal e, lê bi gumanî, di navbera salên 1136an û 1208'an de jiya ya.Abûlîzê cizîrî li taxa Tora Cizîrê ji dayik bûye. Ew demekê li Amedê jiya ya û bi xebatên xwe yên zanistî bandûreke mezin li ser zanista robotê kiriya û bingeha zanista robotê û sîbernetîkê,wî avêtiya. Navê wî yê rastteqîn bi kurtasî Îsmaîl e. Ew ji endazyarên dema xwe bûye ku pirtûkên wî gelek tên xwandin. Nîşaneka vê jî, pirtûkên wî ku bi gelek kopiyên wan li gelek kitêbxaneyên cîhanê cih girtina. Abûlîzê cizîrî, ev pirtûkên wî ên bi navê *"Pirtûka ku di endezyariyê de ji feyde girtina tevgerên mekanîk*" û "Pirtûka li ser Zanîna Hîleyên Endazyaranî", li gorî tê vegotin wî bi fermana mîrê Amedê nivîsandina. Cizîrî di pirtûka xwe ya ku ew di wê de behsa çêkirina 50 amûran dike û ku hemî jî ji dahînanên wî bi xwe na. Pirtûka wî ji şeş beşan pêk tê. Di beşa pêşîn de deh tafsîrên cûda yên di derbarê çêkirina saetên avê de hena. Di beşa duyem de derbarê çêkirina hin firaxan de tefsîrên cûda hena. Di beşa sêyem de ji bo çêkirina misîn û amûrên destmêjê, deh tefsîrên cûda hena. Di beşa çarem de di derbarê çêkirina hewzên avê û çêkirina otomatên muzîkê de deh tefsîr hena. Di beşa pêncem de pênc tefsîrên di derbarê amûrên ku ava çal û kahniyênku ne gelekî kûr in de hena. Di beşa şeşem de pênc tefsîrên derbarê şiklên ku naşibin hev û agahiyên çêkirina wan hena. Bi kurtasî di pirtûka wî de agahiyên di derbarê saeta avê, aman û avhilavêjên xwekar û otomatîk, amûrên avdana ji robar û cokan û jenîna

xwekar û otomatîk a bilûrê de hena. Abûlîzê Cizîrî wekî bavê robotan jî tê nasîn, ji ber ku wÎrobotê herî pêşîn ji bo jenîn ankû lêdana bilûrê çêkiriye.

Abûlîzê cizîrî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku wê, aqilekî mazin dênê li holê. Her wisa, di vê çerçoveyê de têgîna fîzîkê û teoriya fîzîkê a kirinî û ankû piretikî de wê xwediyê zanîneka ku mirov matmayî dihêlê bê. Berî Abûlîzê Cizîrî ku hê di sedsale 8´miin de ya, bavê henîfê dinwerî, weke zane û fîlosofekî Kurd, wê di derbarê zanebûna dermankirin û başkirinê de wê pirtûkên xwe binivîsênê. Her wisa, di vê çerçoveyê de bi tendûrîstiya xwezayî re wê zanebûneka mazin biafirênê. Pirtûkên wî, wê piştî wî, pirr zêde ji wan sûd were wergertin. Zanyariya vê demê, wê xwe bide diyarkirin. Di vê demê de ew zanyariya ku pêşketiye wê, di vê çerçoveyê de di çerçoveya hebûna civatî de xwe bide diyarkirin.Li vir, ez divê ku vê yekê jî werêniman ser ziman ku zaneyên demê, wê bi wêjeyiya civatî jî pirr zêde li pêş bin. Vegotinên civatî wê werênina nivîsandin. Her wisa, jiyana civatê wê werê nivîsandin. Pirtûkên bavê tahirê uryanî ku ew di sedsale 11´min de dijî, wê vê rastiyê bi xwe re werênina ser ziman. Bo fahmkirina wê asta têgîna wêjeyî a civatî ku pêşketiye divê ku mirov li vir hinekî li ser bavê tahirê uryanî û têgihiştina wî bisekinê. Ev zane û filosofê Kurd, wê beşa zanebûna xwe de asteke civatî werênê ser ziman. Dema ku em behsa dîroka hizir û bikin bi vê demê re wê bavê tahirê Uryanî di cih de werê bîra me û wê bandûra wî xwe ji gelek awayan ve bide diyarkirin. Helbestên wî yên ku evînê dihênina ser ziman, wê di nava civatê de weke aqilê civatê mayînda bimênin. Tiştekî din jî, li vir xwe dide diyarkirin. Her wisa, pirraniya zaneyên Kurd ên demê, dema ku mirov li ser wan dihizirê, mirov dibînê ku wê ew ji aliyekî ve evînê werênina ser ziman. Ev teybetiya zane û filosofên Kurd, wê piştre jî xwe bi wan re bide diyarkirin. Zane, alim û filosofên Kurd ên ku piştre tên ên weke seydayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ahmedê xanî û hwd de jî wê xwe bi wan re bide diyarkirin. Di vê çerçoveyê de ya ku mirov dibînê, ew evînê bi pîroziyekê û têgînekê dihênina ser ziman. Her wisa Bavê Tahirê Uryanî jî bi vî rengî bi pîrozî haniya ser ziman.

Bawê tahirê Uryanî, zanistekî Kurd yê ku di biaslê xwe ji rojhilatê Kurdistanê ye. Li ser serdema ku ew lê jîn bûya, hata naheke ji, hê ji, vegotin hene. Ku mirov li nava xelkê di gerihe, mirov dibîne ku li ser wê zanebûn û zimanê wî yê xwe pir vegotin hene. Kurdiyeke wî ya pir xweş ku mirov ji ye Êlî Herîrî kêm neyêne ser ziman heya. Bi vê yekê re, hêjaya ku mirov li ser bisekinê û bêne ser ziman. bawê tahirê uryanî, mirovekî bi bawer bû. Di ser jiyana xwe de, wî, pir mazin baweriyeke mazin da nişandin. Li jiyanê, pir mazin hizirî û anî ser ziman.

Li ser wî û zanista wî ye di serî wî de, ku mirov li ser dihizrê, mirov pir pêşketin û têgihiştineke mazin dibîne. Navê wî tenê li rojhilatê Kurdistanê ma. Li bakûr û bi teybetî ji, li başûrê Kurdistanê ji hata bihîstin. Di civatên mîr û mazinan de di civatên mirovên navserî xwe de, pir bahsa wî û zanebûna wî

hata kirin. Li Cizîre bota, ku bahsa wî dihata kirin, ne kêmî Feqiyê Teyran û seydeyê mazin Meleyê Cizîrî bahs dihata kirin. Pir bi rêz ji bahsa wî dihata kirin. Wî, mirovê mazin, di jiyana xwe de, di nav xelkê de, hizreke mazina anî ser ziman, Nêzîkatiyên xwe yên ku dana nîşandin, li ser hevirdore wî pir bandûr kir. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew zanistekî mazin yê xelkê bû. Baweriya xelkê lê hebû. Wî, jiyaneke bi derwêşî buhurand. hevirdore xwe ji, li xwe, bi wê yekê da bawerkirin. Hizrên ku wî anîna ser ziman, pişt wî re, zanistên ku hatin bandûr li wan kir. Bi qasî ku mirov ji vegotinên ku li ser wî têne vegotin ji wan fahm dike, ew hinekî piştî Bawê Henîfê Dînwerî re jîn bûya. Wî, hizreke mazin aniya ser ziman. Mirov vê yekê, her weha dibîne û fahm dike. Ku mirov li ser bawê Tahîrê uryanî bi hizirê, divêt ku mirov wî bi dema wî re baş û qanc fahm bike û bêne ser ziman. Pêşketin û têgihiştine dema wî çi bû? Ev pirs, pirseke ku mirov bi pirsê û bersive wê ji bi zanî bidê ye. Bersive vê pirsê li gor me pir girîng e. Ku mirov vê pirsê rast û di cihê xwe de bi pirsê û bersiveke bizanî bide, hingî, wê mirov bigihêne hinek rastiyê dîrokî yên dema ji bi wî re. Ev yek, her weha pir girîng e, ku mirov li ser bisekinê û fahm bike. Wî, bi hizir û têgihiştinê xwe, sînorê xwe û yê dema xwe derbas kir. Divêt ku mirov vê yekê ji, bêne ser ziman. Zanistên dema yên Kurd û yên ne Kurd, bandûra wî li wan bûya. Zanistên ku bi aslê xwe fars bûn û weke ku di nav Kurdan de ji mazin bûne Ferdewsî ji, mirov wê bandûra wî li ser wî dibîne. Ji wê ji wirde, mirov dibîne ku li têgihiştine bawê tahirê ûryanî xwedî derketin ji heya. Mirov vê yekê ji, her weha dibîne. Ku mirov "Şehnema" ferdewsî dixwêne, mirov vê yekê, her weha pir mazin dibîne. Ferdewsî, dema ku pirtûka xwe ye ku dibêjin ku wî nivîsandiya, ye bi navê "Şehnemê" de, ku bahsa Rûstemê Zal dike, dibêje ku ew Kurd bûn. Vê yekê rast têne ser ziman. Di vir de, divêt ku mirov bêje ku vê rastiyê bandûra xwe li wêje Persan ji kiriya.

Lê ku mirov bahsa bawê Tahir bike, divêt ku mirov hinekî bi teybetî bêne ser ziman. Ji aliyê wêje ve, divêt ku mirov wateyeke mazinbidiyê de. Lê di vir de, dema ku mirov li ser bawê Tahir bisekinê, divêt ku mirov çend gotinan bi dema wî re ji bi wê re bêje. Ev yek ji li gor me, pir girîng e, ku mirov bêne ser ziman. Lê di vir de, dema ku mirov li ser Bawê Tahir bisekinê, bi dema wî re û bi wî re, mirov divêt ku li ser zimanê wî ji bikekinê. Kurdiyeke wî ye ku mirov karê bêje ku pir pêşketiye û ji ya dema me Îro, ne kêm pêşketîtira hebû. Divêt ku mirov, vê yekê her weha di serî de kifş bike. Ev yek, li gor me, divêt ku mirov pir zelal û bi teybet bêne ser ziman. Ji zimanî wî yê pêşketî, mirov fahm dike ku ew di dema xwe de, xwediyê pêşketineke ku pir mazin e. Divêt ku mirov vê yekê her weha pir mazin û bi bal bêne ser ziman. De ne, di wê heyemê de, di civatên Kurdan de, ziman, pir girîngiyeke wê hebû. Divêt ku mirov vê yekê baş û gîrîng bêne ser ziman. Di civatan de, dema ku yek di axift ji, pêşî li zimanê wî yê ku pê diaxift lê dihata meyîzend. Dema ku li zimanê wî dihata meyîzendin, du tişt di wê meyîzendinê de lê dihata lêgerîn. Yek, pêşî, lê

diata lêgerîn ku ka ew mirovê ku diaxivê çendî bizane û weke ku di nav xelkê de gotin " di cih de" diaxivê. Ye din ji, her weha "ma gelo di dema axiftinê de, karê gotinên xwe lev bêne?". Nûqte duyemîn, her weha weke pirsekê ye. Ev pirs, li ser zimên bû. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku pir li ser zimên baldariyeke mazin ye ku di nav civatan de li mirov çêdibû hebû. Mirov divêt ku uvê yekê ji her weha bi teybet bêne ser ziman. Ku mirov li zimanê bawê tahir ji, dimeyîzenê, bi devê herêmî yî ku pê diaxift ji, bi vê yekê, mirov karê bêje ku pir pêşketî bû. Zimanê Kurdî, ji dema sumeriyan ye duyemîn ve li ser hîmê bêje û hevokên pêşketin û têgihiştinê, pêşketine xwe çêdike û deman jîn dike. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku demeke mazin pêşketî bû, ew dem.Bawê tahîr, bi axiftina têgihiştine xwe ye di serê xwe ye ku anî ser ziman de, têgihiştineke hemdemî di Kurdiya dema xwe de da çêkirin. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybetî û baldarî bêne ser ziman. Têgihiştine wî ya ku wî anî ser ziman, hê ji, di roje me de, baş û qanc ne hatiya fahm kirin. Divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bi teybet bêne ser ziman. Ji aliyê têgihiştine wî ye felsefî û wêjeyî ve, divêt ku mirov pir li ser bisekinê. Her hevoke wî ye ku wî anî ser ziman, têde, têgihiştineke demê ye ku wê daya der û aniya ser ziman heya. Divêt ku mirov, vê yekê ji, her weha bi teybet bêne ser ziman. Di vê demê de, bixûsûsî ji, divêt ku mirov li ser aliyê wî yê felsefê bi baldarî bisekinê. Ev yek ji, girîng e. Nêzîkatiya wî ya felsefîk çi û çawa bû? Wî hizreke felsefê ye çawa anî ser ziman û danî hole? Ev pirsê ku di serî de, ku mirov bi pirsê ne. Felsefe bawê tahir, bi vê yekê ve girêdayî, mirov karê gotinê pêve gotinekê bêne ser ziman. Wî, bi têgihiştineke zimên li têgihiştine jiyana hizirkir. Bi vê yekê, ew, dema ku mirov li ser dihizirê, mirov wê dibîne. Mirov, divêt ku fahm bike, ku felsefê wî, hîmê wê, li ser têgihiştinê ava ye. Divêt ku mirov vê yekê, di serî de bêne serî ziman. Wî jiyan, bi têgihiştin di dît. Wî, fahmkirinak di jiyanê de, di dît.

Li ser hizirkirina li ser dema jiyanê û li ser têgihiştin û fahmkirina wê dihizirê û van gotinan û gotinên xwe yên li dûv van re têne ser ziman. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku ew di hizirkirin û têgihiştine xwe de, bi vê yekê re, di têgihiştine xwe de, rastiyeke jiyanê kifş dike. Bi vê yekê, ew li ser têne ser ziman. Hizirkirin, xosletê mirov yê li jiyanê yê ku herî mazin a ku mirov bidest xistiya. Ew, xwediyê têgihiştineke ku vê yekê, bi mirov bide têgihiştin e. Ew hizir, dike, dema ku gotinên xwe weha bêne ser ziman, wê bi wan gotinên wî re wê ev yek were têgihiştin. Ew bixwe ji, di vê têgihiştinê de ye. Divêt ku mirov vê yekê ji, baş û qanc pêre kifş bike û bêne ser ziman. Ku mirov, li gotin û axiftinên wî li ser dihizrê, mirov bi hesanî fahm dike ku wî perwerdeyeke baş hildaya. Pir xwandiya. Di nava xwandin û zanebûna bi xwandinê xwe re çûya û kûr ji çûya. Mirov, vê yekê ji, pêre kifş dike. Di derbarê demên berî dema xwe de, xwedî zanebûna. Mirov, vê yekê ji, her weha kifş dike û fahm dike. Lê ku mirov li ser wî û anînêyên wî yên li ser zimên di hizirê, mirov, tiştekî din ji kifş dike. Ew ji her weha anîna têgihiştine wî ya li ser ziman e.

Wî, di anîna xwe ye li ser ziman de, hertimî, weke ku hewldaya ku awayekî zanistî li gotinên xwe bike û bêne ser ziman. Mirov, ku li ser wî dihizirê, vê yekê biteybetî kifş dike. Bi vê yekê ve girêdayî, mirov karê bêne ser ziman, ku wî xwestiya ku zanebûneke bêne ser ziman. Di serê xwe de, ew pir mazin e. Bi wê mazinbûna di serê xwe de, wî hewldaya ku bêne ser ziman. Dema ku aniya ser ziman ji, weke ku di serê xwe de li bêje û hevokan gerehaya ku ka wê çawa bêhtir bi zanebûn bêne ser ziman. Mirov, vê yekê bitêgihiştin pêre dibîne. Gotinên ku ew bi awayê kutêne ser ziman di civatan de, di serê mirovên ku lê dihisênin de dide rûniştandin. Ev yek ji, bixwe ji, ji têgihiştinekê bixwe têt. Divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman.

Di vir de, pirranî, li ser êşandina mejî bi xwandinê di sekinê. Ji vê yekê, mirov fahm dike ku wî pir girîngî daya xwandin û zanbûnê. Weke ku xwestiya ku vê yekê, bi mirovên li dore xwe ji, bide fahm kirin ji, Her weha mirov, vê yekê pêre di gotinên wî yên ku hata dema me hatina ji wan fahm dike. Wî, pirr girîngî daya xwandinê. Pirr girîngî daya "ilm" û "îrfan"ê. Mirov, vê yekê, ji gotinên wî yên bi têgihiştin fahm bike. Wî, ji wan gotinên wî yên bizane, mirov fahm dike ku wî dema xwe pir mazin bi bandûr kiriya. Zanistekî weke wî, ne mumkun e, ku ji aliyê mîr û mirovên ku li dore mîr yên navserî xwe ve ji, bi rêz newê pêşwazi kirin. Mirov karê bêje ku wî rêz standiya. Ji xwe, ku mirov li ser xosletên demê dihizirê, mirov wê yekê bizweze bitêgihiştine karê bêje. Xosletên demê, yên ku hebûn, li ser asteke bilind bûn. Lê di qasra mîr de ji, pir mazin pêşketi bûn. Li qasrê, pir li wan dihata meyîzendin. Kî baş û qanc zanibû biaxivê, wê li ber mîr axiftibana. Ku derwêş ji bana, wê di nav civat mîr de, ku çi kêrhatiyên wî hebûn, wê dabana nîşandin.

Mirovên her weha ku bizane ne, aqilê xwe hertimî li civatan tênine ser ziman. Li wan tê hisandin. Di nav xelkê de ji, pir mazin bahsa wan tê kirin. Her kirineke wan ya ku bikin ji, li gor zanebûna demê wateyeke ku di baweriyê de ji bihatana ser ziman dihata ser ziman. Ev yek, ji aliyê mirovên zane, yên ku di nav xelkê de bûn, dihata kirin. Ji bo bawê Tahir ji, di nav xelkê de gotin hene. Gotinên ku di derbarê wî de, dihatina ser ziman hebûn. Di nav zanistên Kurdan de, yê ku herî zêde bi gotinên di nav xelkê de derketibû pêş Bahlûl Bizane bû. Ev yek, bûya sedema bûna zimanekî wêjeyî yê di nav xelkê de ji. Di nav xelkê de, rehet û li gotina xwe bi bawer anîna ser ziman, vê yekê maztir di serê mirovan de bi rêz dide rûnandin. Mirov ji gotinên Bawê tahir, fahm dike ku wî pir ji xwe bi bawer û zimanekî ku mirov bêje ku bitêgihiştine wêjeyiya aniya ser ziman. Bi gotin, her weha ew mazin bû. Bi têgihiştin bû. Dema ku dianî ser ziman ji, bi zimanekî xweştêgihiştin dianî ser ziman. Bi anîna xwe ye li ser ziman ji, her weha pir mazin anî ser ziman. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku zimanekî Bawê tahir yê ku di nav xelkê de hatiya pejirandin yê wêjeyî ji afiriya û heya. Ev yek ji, divêt ku mirov bi teybetî bêne ser ziman. Zimanê wî yê wêjeyî, li gor têgihiştin û hebûna pêşketin û têgihiştine hizir ye demê di wî de rûniştiya. Divêt ku mirov vê yekê ji, her

weha bi teybet bêne ser ziman. Li cem zimanê wî yê felsefê, yê wêjeyî ji heya. Di gotina xwe de pir mazin helbestwerî ye. Divêt ku mirov vê yekê ji, her weha bi teybet bêne ser ziman.

Bawê Tahir, bi vê yekê, mirov karê bêje ku bandûra wî li ser dema wî heya. Li ser zanistên dema wî heya. Wî hizreke mazin di xwe de d nav xelkê de aniya ser ziman. Divêt ku mirov vê yekê car bi car kifş bike û bêne ser ziman. Zimanê wî yê ku bi hizir û têgihiştinê afiriya, ku were têgihiştin, wê ji gelek aliyan ve ji, wê me rohnî bike. Lê di vir de, divêt ku mirov bi vê yekê ve girîdayî balê bikişêne ser xaleke din yê ku pir girîng e. Ku zimanê Bawê Tahir were têgihiştin, wê di qada felsefe zimên û zimên bixwe de ji, wê me biagahî bike. Zimanê wî, her weha ji ber vê yekê ji bi vî aliyî ve ji, divêt ku were lêkolînkirin û têgihiştin. Ev yek ji, pir girîng e. Ziman, Kurdî, hinek xiosletên wê yên wê dema û yên vê demê ne wek hevdû ne. Ku mirov li ser dema Bawê tahir bisekinê mirov wê pêşketineke zimên ji her weha kifş bike. Ji aliyê zimên ve, Bawê Tahîr ji û Êlî Herîrî ji, weke du zimanzanan in. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybetî bêne ser ziman. Xosletê wê demê yên zimênhê baş ne hatina fahm kirin. Xosletên wê demê yên zimên, di qada pêşketinê de xwe didine nîşandin. Her bêje ku di wê demê de di zimên de bê kifşkirin, wê ew bêje di qada felsefê û têgihiştinê wê ye demê de ji wê biwate bê. Divêt ku mirov vê yekê ji, her weha pir baş û qanc bêne ser ziman. Ji demên piştî dema Medan ve, rojhilatê Kurdistanê, di qada zimên de, hinek pêvajoyên ku Îro ji, hê ji, divêt ku werine fahmkirin buhurand. Mirovên weke bawê tahir ji, di navende wê pêşketinê de cih û war digir in. Divêt ku mirov vê yekê di serî de bibîne.

Bi vê yekê re, bi bawê tahir re, li ser dema wî ji sekinandin ji pir girîng e. Dema wî, xwediyê çi pêşketinê bû. Kurd, di wê demê de bi serê xwe bûn. Di herêmên xwe de bi serê xwe bûn. Serweriya wan ye li herêmên wan hebû. Bi wê yekê, mirov divêt ku pêşketinên wê demê bêne ser ziman. Ku mirov, bi vê yekê bêne ser ziman, hingî, wê hinek rastiyên ku pêşketine ji, wê xwe zelal û hê baştir bidine ber çavên mirov. Divêt ku mirovvê yekê ji her weha pir mazin bêne ser ziman. Rojhilatê Kurdistanê, weke bakûr û başûrê Kurdistanê ji, hata sadsala 15. min ji bi serê xwe bû. Pêşketinên xwe, bi xwe kifş dikir. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybet car bi car bêne ser ziman. Mirov, bi vê yekê ji ku li wê demê û pêşketin û têgihiştine wê dihizirê, mirov ji zimanê Bawê Tahir ji fahm dike ku pir mazin xwediyê pêşketineke mazin e. Mirov, karê zimanê bawê tahir, ji wê demê re weke neynikeke ku li wê demê bigirê bêne ser ziman.

Li ser awayê zimanê wî, mirov karê di vir de hinekî din ji bêne ser ziman. Ziamnê wî, pir bizane bû. Di nav xelkê de weke "baw" dihata navkirin. Êdî piştre, li pêşiye navê gotina baw bicih bûya. Wî, dema ku dianî ser ziman, bi awayekî helbestwarî(helbestgerî) ji dianî ser ziman. Ji ber ku ji wan gotinên wî yên ku weke beytên helbestan dihatina ser ziman, hizrê wî dihata ser ziman û

fêrkirin, êdî wilo têne bi wî awayê lê ne dihata ser ziman.Li ser vê awayê zimanê wî yê helbestgerî, heya roje me ji, hê ji, vegotin li herêmên Kurdistanê têne ser ziman. Her mirovê ku li wan gotinên wî dihisênin, ne tenê weke gotinne helbestî lê dihisênin. Ev yek ji, di dema ku qasîde gotinê de, car bi car bûya. Ji kîjn aliyî mirov li gotinên wî meyîzenê, mirov wê têgihiştineke felsefe wî bibîne. Weke ku gotinên bi du boyutan hatina ser ziman. Yek, bi nêzîkatiyeke wêjeyî helbestgerî û ye din ji, bi nêzîkatiyeke hizrî ye felsefî ku bi û navê wî di civatên Kurdan yên her şev dihata ser ziman. Bi vê yekê re, miorov karê bêje ku weke car bi car di derbarê gotinên wî de biryar dayîn ji hem di civatan e û hem ji di nav xelkê de zor bûya. Bi kîjen aliyê ve bênine ser ziman, ew hinekî ji wan re zor bûya. Lê weke ku seydayan dikir, car bi car, bi herdû aliyan ve ji dihata ser ziman. Mirovên ku dianîn ser ziman hebûn. Ev yek, hata roj me ji berdewam dike. Bandûra bawê tahir biqasî li Kurdan û çand û pêşketine wan bûya, wilqasî ji di demên piştre de, li Persan ji bûya. Ji ber vê yekê, wan ji di demê de, li gor xwe hinek gotinên wî yên ku bi navê "pehlewîkan" anîna ser ziman hena.

Rastiya bavê tahirê uryanî, di vê çerçoveyê de wê bi aqil û asta pêşketina demê re wî têgihiştinekê bide me. Her wisa, di vê çerçoveyê de wî aqilê xwe pêşxistiya. Di wê demê de di vê çerçoveyê de weke ku me hinekî li jor bi zane û filosofê Kurd Abûlîzê Cizîrî re hanî ser ziman, wê aqilekî mazin werênina ser ziman. Di aslê xwe de êdî li gorî rengê pêşketina demê, di nava civatê de aqil û pêşketina aqil dibê.

Li vir, em ku ji kîjan aliyê ve dinerîn, di vê çerçoveyê de em dibînin zane û filosofên ku bi aqile felsefeyê re ku dihizirin hena. Şêwayê hizirkirina wan, wê di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku wê temenê wê li ser serdemên berî ên bûhûrî bin. Dîrokzanên demê ên weke **Aliyê Êsir, Ezreqê ferqînî** û hwd, wê di van waran de hizrekê bi mejûya civata berê re jî di çerçoveya rengê aqilê demê de wê werênina ser ziman. Ya ku wê hinekî jî civatê li ser temenê wê bide rûnandin ev dîrokzaniya wan e. Nirxên civatê ên dema berî îslamê ku hena, di dema îslamê de wê ew biwate bikin û werênina ser ziman. Destanên weke ên ´rûstemê zal´ û hwd wê binivîsênin ji demên bûhûrî û wê dênina ber civatê. Ji xwe, rengê nivîsandîna vê demê, li ser vegotinan û her wisa bi wê re bi awayekî ku bi felsefeyê dihê kirin e. Ew jî, vê yekê bi awayekî baş dikin.

Li vir, em vê yekê dibînin ku civata Kurd û zaneyên wê ên demê, wê ji gelek aliyan ve wê têgînekê bi dîrokzanî û civatî û civaknasiya wê re dênina li holê. Her wisa, li vir, em dema ku di çerçoveya civata Kurd de werênina ser ziman, weke ku me hinekî li jor hanî ser ziman, divê ku em behsa zane û fîlosofên beşên civatê ên weke yên Kurdên êzdayî, yarsanî, şebekî û Kurdên ku bûna misilman re werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê gelek beşên civakê wê li ser koka xwe ya civatî wê biafirin.

Em dema ku hinekî bi demê re diçin, em di sedsale 12´min de dibînin ku zanyarên Kurd ên weke ´bavê Fida ku bixwe jî newiyê necmedînê eyûbî ku bavê salahadînê eyûbî bû. Bavê fida, di dema destpêka pêşketina xanadana eyûbiyan de wê derkeve li pêş. Heta ku wê erkna jî ji desthilatdariya eyûbiyan bike. Weke serok û ´emîrê hamayê´ jî erk standiya. Lê di aslê xwe de bi zanebûna xwe fîlosofekî bi dîrokzanî, astronomî, fîzîk û ardnîgarvaniya xwe dihat nasîn. Heta ku bi zanebûn û hûnere xwe ya leşkerî jî pîr zêd baş bûya. Bo vê yekê, bi zanebûna xwe ya leşkerî jî derketiye li pêş. Heta ku di wê demê de wê demekê walîtiya şamê jî bike.**Filosofê KurdBavê fida, ji Aliyê Êsir, weke ku tê zanîn zanebûn girtiya.** Di dema xwe de pirtûka xwe ya bi navê ”Muhtasaru Tarih il-Beşer”ê dinivîsênê. Ev pirtûka wî, weke pirtûkeka dîrokî ku di di rengê dewama pirtûka dîrokzanê Kurd aliyê êsir a bi navê **”El-Kamil fit Tarih”**de ye. Aliyê êsîr, weke dîrokzanekê Kurd, wê di dema xwe de li gorî ku em Îro dizanin herî kêm ser sê pirtûkên giring re wê pirtûkan binivîsênê li şûn xwe bihêlê. Lê ev yên ku heta dema me ku em dizanin in. Dibêt ku ji wê zêdetirî jî berhemên wî hebin.Pirtûka wî ya bi navê ”rêzîna bajaran(´Takvim ül Buldan´) a, ku ev pirtûk, weke pirtûke ku têgîn û zanîna ardnîgariyê di wê de dihênê ser ziman e. Li ser rûyê ardê, çiya, bahr, çem û golên ku hena, bigotinî xîz dike. Heta ku naqşayên ku di pirtûka xwe de dixîzênê, bi cetwel wan dixîzênê. Bi wê re di dewama wê de bavê fida, berhema wî ya sêyemin ku bi navê ”**kûnaş**”´a, wê li ser têgîn û zanîna tendûrîstiyê bê.

Bavê fida, wê di gelek waran de xwediyê zanebûnê bê. Her wisa divê ku mirov vê yekê jî bi wê re werênê ser ziman ku bavê fida, wê zanebûnekê fîzîkê jî bi wî re pirr zêde li pêş bê. Bavê fida, biqasî ku mirov fahm dike, wî pirtûkên Şemsedinê Şehrezorî jî baş xwandina û bandûra zanebûna şahrezorî li ser wî çêbûya. Şemsedinê şahrezorî, zane û filosofekî temam bû. Li ser felsefeya metafizîkê, manttiqê, fîzkî û astronomiyê wê gelek pirtûkan di dema xwe de binivîsênê. Di vê çerçoveyê de ev fîlosofê Kurd, wê weke zaneyekî ku mohra xwe li demê xistibê wê bimênê. Piştî wê re zane û fîlosofên ku Kurd bin û ji herêmên din jî bin, wê bandûra wî li ser wan bibê. **Şemsedînê Şehrezûrî** ku di sale 1240 dijî, wê di warê metafizîk, dîrok, bijîşkiyê de fîlozofekî Kurd ê wê demê bê.Ew li ser felsefeya Şîhabedîn Suhrewerdî xebitiye û fikrê *Îşraqîtiyê* berdewam kiriye. Şemsedînê Şehrezûrî yan jî *Şemsedîn Mihemedê kûrê Mehmûdê Şehrezûrî* di sala 1250î de li Başûrê Kurdistanê li bakurê Şehrîzorê hatiye dinyayê. Wî li ser metafizîk, dîrok û felsefe ya mantiqê gelek pirtûk nivîsandiya. Lê tenê pênc pirtûkên wî gihane roja me. Gelek fîlozof di bin bandora wî de mane. Tê texmînkirin ku Şehmsedîn şehrezorî ji sala 1288an çend sal şûnda çûya ber dilovaniya xwe.

Şemsedînê şahrezorî, li ser aqil, metafîzîk û mantiqê û fîzîk û astronomiyê wê pirr zêde binivîsênê. Her wisa, demên berî xwe jî baş bi nivîskî wê hanîna ser ziman. Di vê çerçoveyê de carna ku di nava zaneyên Kurd ên piştre de ku behsa vî fîlosofê Kurd dihat kirin, dihat gotin ku ”ew pirtûkxaneyek bû, wê

pirtûkxaneyek jî hanî ser ziman.” Ev gotin hem bo zanebûna wî ku bi wê werênina ser ziman û hem jî bo ku wê zanebûna ku wî haniya ser ziman, dihat hanîn li ser ziman. Felsefeya mantiqê û ya metafîzîkê, wê bi awayekî felsefî ku li gorî ast û pîvana dema wî ya, wî daya rûnandin. Di vê çerçoveyê de wî, serdemek di aqil û pêşketina aqil de bi dema xwe re daya destpêkirin.

Bavê fida jî, yek ji wan zane û fîlosofê ku wî baş xwandiya û ji wî zanebûn girtiya ya.Pirtûka bavê fida ya li ser dîrokê ku dem bi dem ji dema ´adam û hawa ve dihênê ser ziman, di vê çerçoveyê de bi zanebûn û felsefeyê re wê ji wî û zanebûna aliyê êsir sûdwergirê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi ser vê gotinê ve bike ku zane û fîlosofê Kurd Birehîmê Xilatî ku di zanîna tendûrîstî û kîmyayê de gavek dîrokî ya madin diavêjê û pêşketinên di dema xwe de dide çêkirin, wê ji felsefeya şemsedinê şahrezorî sûdwergirê. **Îbrahîm Xilatî** ankû **Îbrahîmê kurê Evdillahê Xilatî** di sala 1242'an de li bajarê Bedlîsê hatiye dinyayê, Kîmyager û bijîşkekî Kurd bû, Ji bajare xelatê ya û li Îran û Misirê maya Ji qeza Xelatê bûye. Bi zanebûna xwe ya tendûrîstiyê pirr zêde di nava xelkê de hat naskirin. Îbrahîmê Xilatî di sala 1322'an de çûya ber dilovaniya xwe. Ji vê jî mirov fahm dike ku şemsedinê şahrezorî, li ser van xalan jî zanebûn afirandiya û haniya ser ziman. Têgîna metafîzîkî, mantiq, fîzîkê, astronomiyê, tendûrîstî û kimyageriyê wê di demê de pêşbikeve û li ser van zaneyên Kurd hizrên xwe bi rêxistinî werênina ser ziman. Zaneyên weke şemsedinê şehrezorî ku di van waran de hizrên xwe dihênê ser ziman û zaneyên Kurd ên weke Abûlîzê Cizîrî ku hizrên xwe di warê fîzîk û astronomiyê de dihênê ser ziman, wê serdemek li herêmê bidina destpêkirin. Berî şemsedinî şahrezorî, zaneyên Kurd ên weke Bavê henifê dinwerî li ser têgîna tendurîstiyê û dermankirinê wê hizrê xwe werênê ser ziman. Hinek hizrên wî li ser mantiq û metafîzîkê jî hena. Di vê çerçoveyê de heta ku dem tê dema şemsedinê şehrezorî, wê di vê warê de gavne maztir di warê zanebûn û aqilê felsefeyê ê ku di van waran de dihê ser ziman de wê werê avêtin. Ev dema dîroka civata Kurd, giringa ku mirov wê fahm bike. Her wisa, di vê demê de pêşveçûnên bi aqil ku rû didin, wê ji gelek aliyan ve bandûra wan li pêşveçûnên piştre ên dinava civata Kurd û li herêmê ku dibin de wê hebin. Lê ji aliyekî din ve jî, divê ku mirov vê yekê jî, werênê ser ziman ku di nava civatê de pergalek perwerdekirinê pêşketiye û bi wê re xwandavan, zane û ilosofên civatî wê zêde bin. Di vê demê de wê, civata Kurd, pêvajoyek xwe ya giring a bi zanebûnê wê pêşbixe. Li vir, di dewama wê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku weke ku me li jor jî hanî ser ziman, biderketketina zaneyên beşên civata Kurd ên weke yên civatên êzdayî, yarsanî û hwd, wê di vê demê de êdî bidina xwe û wê derkevin. Yanî, piştî wan pêvajoyên hêrîş û komkujiyên ku weke ku di dema dasniyan û babekiyan û hwd de ku dijîn û hwd, ku piştre bêdengiyek diafirê, wê bi wan pêşketinên li ser aqil re wê ew jî ji xwe were avêtin.

Li bakûrê Kurdistanê, divê demê de li dora herêma botanê, wê gelek navendên piçûk ên ku ji wan dem bi dem gelek zane û fîlosof derkevin wê bibin. Lê herêma botanê, ber Diclê û Firatê, wê weke navendeka ku ew zanebûna wan zaneyên civatê ku li wê dicivê bê. Minaq, herêma xelatê, wê di roja me de girêdayî Bedlîsê ya, wê weke birehîmê Xelatî, wê zaneyna din jî wê derkevin. Xelat, di vê demê de weke navendeka ku li wê lêkolînên astronomiyê dihên kirin a jî. Minaq, di dema birehimê Xelatî ku weke kîmyagerekî Kurd a û bi lêkolîn û bijîşkiya xwe re nav daya, wê fîlosofên Kurd ên weke Fexredînê Xelatî û bi wî re ku di heman demê de li wir a Nesiredînê Tûsî, wê hebin. Ev herdû fîlosofên Kurd, wê lêkolînên xwe li ser astronomiyê wê bikin. **Fexredînê xelatî** yek ji fîlosofekî ê ji xelata Bedlîsê ya ku di sedsala 12'an de jiya ye. Fexredînê Xelatî astronomê Kurd bû û gelekî xebat kiriya li ser astronomiyê. Tava ku ji kullekan dertê li gorî wan seat tespît kiriye. Di sala 1260'an de rasatxaneyekê ji bo astronomiyê ava dike bi Nesîredînê Tûsî re û bi wî re bi salan li wir di wê **rasatxaneyê**de xabatê dikê. Ji wir, rewş û tevgerên li azmana ên stêr, roj, heyv û demên şev û rojê dike ku fahm bike.

Ev serdema civata Kurd, mirov dibînê ku di wê de perwerdekirin û dibistanên perwerde kirinê zêdetirî derdikevina li pêş. Her wisa, herêm bi herêm, ev rewş pêşketiye. Di vê warê de navê Cizîra bota hertimî li pêş bûya. Zaneyên mazin li wir, perwerde digirtin û didan. Di vê çerçoveyê de herkesekê ku bi zanebûnê ve mijul dibû jî, hertimî dikirin û dixwestin ku xwe bigihênina wir. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku gelek zaneyên Kurd, wê li herêmê bigerihin û wê perwerde kirinê jî bikin. Îro çendî ku em zêde ne xwediyê agahiyê na di derbarê jiyana wî de ´Îsayê Kurd´, weke zane û fîlosofekî Kurd ku çûya gelek deveran û li wan perwerde ya ye. Di vê çerçoveyê de bi vî rengî navî wê derketiye. Îsayê Kurd, li gorî ku mirov dizanê li dora salên 1195´an dijî. Li gorî hinek vegotina jî Îsayê Kurd, weke fîlosofekî wê di sale 1267an de wê berdilovaniya xwe. Di dawiya dawî de ev fîlosofê Kurd wê li Lazkiyê demeka jiyana xwe maya û li wir perwerde daya. Piştre li gorî ku di nava xelkê de bi jiyana wî re tê gotin ku ”wî zanî ku ew dema wî ya goçî axîretê bike hatiya, bo vê yekê, dixwezê ku were cizîra bota ku ew ji wê ya, li wir li warê dêûbavê xwe care dawî bibînê û piştre herê goça xwe ya dawî.” Ev rewşa vî, zaneyê Kurd, tiştekî bi têgihiştinî dide me. Ew jî ew a ku zaneyên Kurd ên demê di gelek waran de di serê xwe de xwanda na û bizane na û li ser wê re êdî mirovan perwerde dikin.

Herêma botanê ku di wê demê rojavayê Kurdistan roja me jî, ber firatê û heta ber diclê ku di nava sînorê wê de duhê hanîn ser ziman, wê weke welatekî û diyarekî Kurd ê xwediyê jiyan û kevneşopiyeka bi hezaran salan bê. Di vê çerçoveyê de ev herêm hertimî, bi serê xwe bi vî rengî bi azadî pêşketiye. Herêma botanê, hertimî, wê bi zanebûna xwe ya ku heya re wê navê wê derkeve li Pêş, di dema Şadadiyan de jî, wê şah û hikimdarên Kurd, wê

zaroyên xwe bişênina wir ku ew bên perwerde kirin. Ev kevneşopî, wê weke kevneşopiyeka dana xwandê a zaroyên Kurd jî bê. Her wisa, di wê demê de her zaneyê demê ê Kurd û herêmî, di jiyana xwe de wê carekê jî bê, wê xwe bigihênê wê herêma botanê ji wê zanebûna wê hinekî hilde.

Piştî desthilatdariya Şadadiyan, wê li herêmê pêvajoyek nû bi Kurdên merwanî re di dewama wan de bi desthilatdarî destpê bike. Di vê demê de li başûr û rojhilatê Kurdistan roja me jî, wê desthilatdariyên Kurd ên weke desthilatdariya Ardalaniyan wê derkeve li holê. Lê herêm bi herêm, wê xanadanên Kurd, wê li ser rewşên xwe yên herêmî, êlî û aşîrî re wê birxistin bikin. Wê hêzên xwe yên parastinê pêşbixin. Rewşa Kurdên eyerîdî, kekoyîdî û li Erdebîlê rewşa dergeha Kurd ku seyfedinê Erdebîlî ku şêxekî Kurd li ser serê wê rûnîtşya wê di vê warê de zanîneke baş bide me. Kurdên Eyerîdî û kekoyîdî, wê bi wê kevneşopiya xwe ya xanadanî û welatî ku ji berê ve hebûya wê di wê demê de jî karibin ew xwe li ser lingan bigrin. Di wê demê de wê herêmên xwe û jiyana xwe biparêzên. Di wê demê de piştî dema şadadiyan ku dema Merwaniyan pêşket û pê de, wê ew xanadanên Kurd, wê bi wê re di ahengekê de wê tevbigerihin. Desthilatdariya Merwaniyan li dora 983´an û hwd, wê demek xwe ya zêrîn wê êdî bijî. Piştî wê re jî, heta dawiya sedsale 11´ min, wê bihêzî û desthilatdarî li herêmê hebûna xwe biparêzê. Di vê demê de jî herêma botanê, weke herêmek biserê xwe wê di nava wê desthilatdariyê de bi desthilatdariya xwe ya ku navende wê cizîra bota ya, wê hebe. Di vê demê de jî, wê Kurd, herêm bi herêm, dîsa li herêmên xwe serdest bibin. Lê hêrîşên li herêmê ên weke yên bi destê tataran, salçûqiyan û hwd, wê bidomê. Li hemberî vê, wê piştre xanadana eyûbiyan ku navenda wê Reha ya, wê derkeve li pêş. Wê hemû rêveberî, mîrgeh, xanadan û aşîrên Kurd ên demê wê di bin desthilatdariya xwe de bide li hevdû. Armanc ji vê, ew a ku weke dema şadadiyan û hwd, ku desthilatdariyek xort avabikin û bi wê ku karibin, pêşiya hêrîşên hov ên li herêmê bigrin. Vê di vê hizra xwe de wê eyûbî, bi ser jî kevin. Wê pêşiya hêrîşên li herêmê bigrin. Di nava rengê desthilatdariya Eyûbiyan de wê herêmên desthilatdariya şadadiyan, wê ew jî bi mirgeh, xanadan û rêveberiyên herêmî ên weke yên ardalaniyan, eyerîdî û kekoyîdiyan û hwd re wê xort bikin. Ev rewş, wê li herêmê rewşa civata Kurd xort bike. Di wê demê de ji xwe, zanebûnek mazin jî di nava civatê de pêşketiye. Ev zanebûn jî, wê ji wan re weke rênîşan wê êdî xwe bide diyarkirin. Em dema ku bi teybetî li vê serdema sedsalên 11´min û 12´miin dinerin, em dibînin ku wê gelek zane û filosofên civatî ên civata Kurd li herêmê ku bandûra li herêmê giştî heya, wê derkevin. Ev jî, wê herêmê ji aliyê zanebûniyê ve bike weke navendekê.

Ev dema piştî ya merwaniyan dema desthilatdariya eyûbiyan, em di wê de dibînin ku wê zaneyên civatê ku pirtûkên perwerdeyê dinivîsênin, wê derkevin. Di vê çerçoveyê de zane û filosofên Kurd ên di wan serdemên Eyûbiyan de ku derkevin ên weke kûrê kesîr, Ahmedê Kurdî, Kûrê Cizîrî, şêx

tahirê Kurdiyê xelatî, tecûdînê Kurdî, Teymiyê herranî, Ûm mihemedê Kurdî û hwd, wê çend ji van zane û filosofên Kurd bin ku pirtûkên perwerde kirinê li dûv hevdû dinivîsênin. Her yekê ji wan wê bi dehan pirtûkan li ser zanebûnê, felsefeyê û metafîzîk û mantigê wê binivîsênin. Lê di vê demê de divê ku mirov vê jî werênê ser ziman ku wê, rengê baweriya olî û şîroveyê wê, wê zêdetir bê di rengê nivîsandina van nivîskar û fîlosofên Kurd ên vê demê de.

Van filosofên Kurd ên vê demê ku di sedsale 12´min û 13´min de tên dunyê wê her yekê ji wan gelek berheman binivîsênin. Di aslê xwe de mirov dikarê bibêje ku wê astekê bi zanebûna xwe re dênina li holê. Her wisa, Pirtûka Teymiyê Heranî, wê gotinên weke ´şariatê´ şîroveyê bikin ku wan fahm bikin. Her wisa, di vê çerçoveyê de divê ku nêzîkatiya civatî seerdest bibe û ankû ya têgînî a birdozîkî a olî serdest bibe, wê şîrove li ser wê werina pêşxistin û aqil werê meşandin. Wê hewlbê dayîn ku ya rast kîjan a ku ew were fahmkirin. Di vê çerçoveyê de heta ku dem tê sedsale 15´min, wê êdî weke ku serdemek nûvebûnê û ankş ´ronasansê´ wê li Kurdistanê bi aqilê zane û filosofên Kurd wê destpê bike. Gelek filosofên Kurd ên ´dahêner´ ên weke **Mehmûdê Kurdî** wê derkeve. Wê bi naqşkirin û şîrovekirina bi naqşkirinê re wê ew zanebûna xwe û dahêneriya xwe dênê li holê. Bi wê re şîrovevanên civatî ên weke **Axayê bêdarî** ku bi helbestên ku dinivîsênin re wê, têgînek hemdem ya demî a pirr xort werênina ser ziman. Rewşa zaneyên Kurd ên weke Mehmûdê Kurdî û Axayê bêdarî û hwd, wê tiştekî bi xwe re bide nîşandin. Her wisa ew jî, ew a ku serdemek nû ya di wê de nûjenî derdikeve li pêş, bi têgînên weke estetismê û hwd re derdikeve li pêş. Di vê demê de zaneyên Kurd ên weke Seydayê Goranî, Emtullah, Seyda mensûrê girgêşî û hwd, weke zaneyna ku di şêwayê tasawûfê de li ser rastiya olê re dikin bi wê fahmkirinê pêşbixin bin. Mirov dikarê wan weke zanyerên olî jî werênê ser ziman. Bandûra dergehîtiyê û şêxîtiyê, di vê rengê pêşketina zaneyên Kurd de kifşkar e.

Zane û filosofên Kurd, ên ku piştî wan re tên ên weke seydayê hisênê bateyî, sedeyê Cizîrî Nefî, Seyda Taha, Yusûfê Kurdî, Feqiyê Teyran Ahmedê xanê û hwd wê derkevina li pêş. Weke wan, di vê demê de wê gelek zane û filosofên Kurd, wê derkevina li pêş. Di aslê xwe de, di vê demê de weke ku civat ji nû ve xwe biadilênê bi zanebûna ku tê ser ziman re wê, rewşek derkeve li holê. Seydayê Cizîrî, wê ser 43 berheman re binivîsênê. Bi heman rengî zane û filosofên Kurd ku tên, wê binivîsênê.

Bi teybetî, di sedsale 15´an de wê sê û ankû çar filosofên Kurd ên weke Elî herîrî, seydayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ahmedê Xanî wê derkevina li pêş. Jiyana van filosofên Kurd, wê ji gelek aliyan ve gelek tiştan di çerçoveya jiyana civatî de ji mirov re bibêjin. Di aslê xwe de wê rengê pêşketina civata Kurd, wê bide me. Berî wan dema ku mirov hinekî bi şûn ve diçê, rewşa jiyana Êlî Herîrî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov hinekî li ser wê **bisekinê**.

Elî Herîrî bi aslê xwe ji Semzinanê ye. Ew, di 1009 an ji 1010 wan de hatiye dinyê. Dîroke hatina wî ya dinyê, her weha du hizir têne ser ziman. Li

herême ku lê bûye, di dema wî de bandûreke mazin ya wî bû ye. Ji ber ku ew bandûra wî, bi xwe re pir pêşketinan ji têne. Di wê demê de, li Kurdistanê, Merwanî serdest bûn. Merwaniyan dewleteke ku hema bêja hebûne Kurdistanê hemû xistibû nava xwe de avakiribûn. Bi vê yekê re, di dema xwe de, wan pir pêşketin ji dana çêkirin. Merwanî, di dema Aliyê Merwan (jê re Abu Ali bin Merwan ji tê gotin) de, dema xwe ya zêr jîn dike. Di wê demê de mazin bi pêş dikeve.

Elî Herîrî û malbata wî, di dema xwe de li herême xwe bihêz bûn. Ew, di nav malbatê de, ji biçûkatî bidest xwendinê dike û haya ku mezin dibe ji, xwendina baş û qanc dihilde. Bi vê yekê re êdî hin bi hin mazin dibe. Di wê dema wî de, pir pêşketin hena. Hin êrîşên li ser serê Merwaniyan wan ji kal dikin. Di wê demê de, Merwanî ji li ber wan êrîşan li xwe didin. Merwanî, bi pişgiriya bavê Mîr Zengî bi ser dikevin. Bi seyeserê wî, Merwanî dise serdestiye xwe xurt dikin. Li herêmên xwe.

Elî Herîrî ji, di wê demê de li cem rêveberiye Merwaniyan e. Di wê demê de, Şam jî di bin dest wan de ye. Şam, heya dema rêveberiya Kurdistanê ya Eyûbiyan û piştre ji di bin destê wan de dimîne. Di wê demê de, dema ku Elî Herîrî li cem merwaniyan bû li herêmên ku karibû herê li hemûkan digerihê. Di wê dema xwe de, demeke dîçê Şamê û li Şamê ji dimene. Bi gelek zanistên ku li wir in re dirûnihe û dide û distene. Piştre ku demeke li wir dimene, êdî piştre careke dî divegerihê û tê Cizîra Botan. Li wir jî demeke dimene. Dest bi pirtûka xwe ya bi navê *Maqametê* dike û temem dike. Piştre ku ew pirtûka xwe bidawi dike, pir di nav aliman de tê nasîn. Mirovên ku bahsa wî dikin û navê wî ji diyaran dibine diyaran hene. Ew ji bo vê yekê Şemzînanê û Cizîra Botan weke navend ji xwe re dibine. Piştre ku ew her weha mazin tê nas kirin, êdî ew bixwe, dike ku herê Hewlêr û Bexdayê. Di wê heyeme de, ev herdû der, weke du navendan bûn. Bexda, navê wê mazin hebû. Hewlêr ji, ji ber ku navendeke dîrokî bû, navê wê hebû. Elî Herîrî, piştî ku ji Şamê di vegerihê Cizîra Botan, êdî demeke li wir ji dimene û piştre dikeve rê de û berê xwe dide bi ber Hewlêr de. Li wir demekê dimene. Li wir bi pir zanistên demê re yên mazin dirûnihê û diaxivê. Ew axiftinên wî hertimî bala mirovan dikişêne ser xwe. Axaftinên wî ji aliyê gel ve gelek tên hezkirin. Elî Herîrî, ku demekê li Hewlêr ji dimene, êdî dike ku xwe bigihêne Bexda yê. Piştre xwe digihêne Bexdayê. Li wir, navende Xalifetiyê hebû. Ji ber vê yekê ji, pir alim û zanistên Îslamê ji li wir dicivîn. Ew jî di dema xwe de ku weke zanistekî tê naskirin, êdî weke zanistekî Îslamê jî tê naskirin. Bi vê yekê jî, navê wî mezin dibe. Wî xwest ku bi axiftinê nêzîkatiya vacê di Îslamê de bide rûnandin. Li ser vê yekê re bi pir zanistên dema xwe re ji dikeve niqaşên mazin de. Li Bexdayê, li navende Xalife jî dikeve wan niqaşan de. Bi vê yekê re, tê gotin ku hin raxne jî li ser vê yekê lê têne girtin. Lê ew ji ya xwe nayê xwe re di wê heyeme de.

Elî Herîrî bi vî awayî, weke demeke li Baxdayê dimene. Piştre, ku demeke dimene li wir, êdî piştre careke dî divegerihê Cizîra Botan û li ser demeke

jiyana xwe ya dirêj li wir di buhurêne. Di wê dema jiyana xwe ya dirêj de ji, li gelek deverên Kurdistan di gerihê û li civata gelek mîran dirûnihê. Bi vê yekê re hizrên wê li her derî belav dibin. Hizrên Elî Herîrî ne tenê di nav Kurdan de, li herêmê bigiştî belav dibin. Ew weke zanistvanekî herêmî mezin dibe. Rêveberên mezin têne ber wî û jê aqil digirin. Elî Herîrî li ser temenekî 60 (şêst) salî re diçê ser dilovaniya xwe. Biqasî ku tê gotin, di 1077 wan de diçê ser dilovaniya xwe.

Di dewama wî de piştî wî re Êlî herîrî, wê bê pêşeng ji gelek zaneyên Kurd ên ku piştî wî re tên. Bandûra zimanê wî yê herikbar û xweş û zanebûna wî, wê li ser civatê û zaneyên demê wê her hebe. Di vê çerçoveyê de wê hertimî hizrên wî werina ser ziman. Piştî wî re ku weke wî xwediyê zimanekî herikbar û xweş a seydayê Cizîrî û Feqiyê Teyran wê werin û wê bandûra xwe li ser civatê bi kûrahî wê bidina nîşandin. Wê rewşenbîrî û nivîskariyek hemdem bi xwe re bidina nîşandin. Giringiya wan, di vê çerçoveyê de wê hertimî wan di mejiyan de zindî bide hiştin. Em hinekî li ser rastiya seydayê Cizîrî di vê çerçoveyê de bisekin in.

Seydayê Cizîrî, zanistvanekî Kurd yê ku di 1570 û wan de hatiye dinê. Weke ku tê gotin ji, di sala 1640 wan de çûya li ser dilovaniya xwe. Seydayî Cizîrî, ku mirov behsa wî bike, divêt ku mirov hinekî mezin behsa wî bikê. Ji ber ku ew ji mirovekî kî mezin bû. Bi hizre xwe re di dema xwe de gelek kifş kirinên mezin dana çê kirin. Bi hizir û ramana ji xwe re ji mezin bû. Dema xwe baş û qanc fêhm kirî bû û tê gihiştî bû. Dema ku behsa wî têt kirin, têt gotin ku wî pir nivîsandiye. Lê ji wan pirtûkên ku wî nivîsandina zêde ne hatina dema me. Gelek hê ji winda ne. Hizre Seydayê Cizirî pir mezina û pir bi kifşa. Ji ber vê yekê ji, pêşî em ji hizre wî dest pê bikin û behsa wî û jiyana wî bikin. Wî bi hizre xwe rê gelek kifşkirinên mezin dana çê kirin. Wî bi hizre ji xwe re demek da vekirin. Di sedsala 15'an wan de, hizir bi nêzîkatiyeke bi pergal bidest pêşketinê dikê. Ew ji di vê yekê de, li Kurdistanê pêşavaniyeke mezin ji gel rê dikê. Ji ber vê yekê, çend ew û hizre wî werê fêhm kirin û tê gihiştin, ev çend ji wê rastiyê wî û pêşketinên ku wî bi hizire xwe re pêşengitî ji wan re kiriye wê bêne dîtin. Bi vê yekê re, ew wê mezin werê fêhm kirin. Divêt ku ji ew baş û qanc werê fêhm kirin. Ku ew hata fêhm kirin hingî Wê baş û qanc werê fêhm kirin. Seydayê Cizirî, di dema xwe de bi hizrê ji xwe re, temenê demekê diafirêne. Temenê hizrê hemdem û nûjen bi wî re li Kurdistanê di dema wî de mezin tê afirandin. Ew bi hizre ji xwe re pêşavaniye vê yekê dikê. Pişt wî rê, çend zanistvan werin, bandora wî, li ser wan xwe dide xuyakirin. Di wê demê de, Li Anatoliya hinek pêşketin hene. Lê pêşketinên ku dibin ji, pêşavaniya wan herêmê Mezopotamya dikê. Bi zêdeyî ji, naqabine Dijlê û Ferat, di vê pêşavaniyê mazin bidest kirinê dikê. Di wê demê de, Wek Semerkandê, Bexdayê û Şamê, Cizîra Botan ji navendeke ku mazina. Li hewbûneke mazin li wir dibê. Ne tenê mirovên Misilman yên Fileh ji û Êzîdî ji li wir dicivin. Wêderê ji xwe re weke navendeke dibînin. Bi vê yekê rÊ, mirov divêt ku bêje

ku Cizîre Botan, navendeke ku mezina. Bi vê navenditiye xwe re di li serê mirovan de û di nav gelê de û di pêşketinan de cih û war digirê. Bi vê yekê rê, divêt ku mirov navê wê ji bi rêz hildê û bêne li ser ziman. Seydayê Cizîrî, li Cizire Botan dimene. Li wir têt nav kirin. seydayê Cizirî li wir mezin dibê. Ew bixwe, bi malbatî ji ji wir e. Ji derûdore wî re. Ne ji deştê lê ji torê ye. Ji ber vê yekê ji, ew zû bi pêşdikeve. Malbate wî bi ahlitiye xwe ve ji digihe malbatiye mîr. Nêzîkî hevdû ne. Ya rastî ku mirov bêje, malbate wî ji bi navê heya û mezina û mîrîtiyeke wan ji heya. Bi vê yekê re mazina. Divêt ku mirov wî mazina bêne ser ziman. Malbate wî, ji ber rewş û waxtê wan xweşa, êdî ji bo xwandin û pêşketinê ji seydayê Cizirî re ji, gelek derfet derdikevine hole. Ew ji wan derfan, mezin bikar têne û û xwe bi pêş dixê. Piştî ku zaroktiyê xwe li malê li gunde Hasetê Dibuhurêne, êdî ku tê dema ciwaniya xwe ji, êdî bi pêşavaniya bavê ji xwe re û xwedi derketine mîre botan rê, tê Cizîre botan û li wir bidest xwandina xwe dikê. Li wir ew xwandineke mezin dikê. Di nav ilm (hizir) de diçê kur dibe û mezin dibe. Bi vê yekê rê di demeke kin de bi hişmediye xwe, derdikeve pêş di nav gelê de. Ji ber ku di xwandinê de jîr û bi fêhme, êdî zû bi pêş dikeve. Seydayê Cizirî, bi wê zû pêşketine xwe rê, di demeke kin de xwe digihinê asteke mezine, di zanebûnê de. Bi vê yekê re, ku ew ji digihê wê qinyatê ku di hizir de mezin bûye, êdî dike ku xwe bigihinê zanistên dema xwe û bi wan re bide û bistêne. Ji ber vê yekê ji, êdî ew bîryara xwe dide ku ji Cizîre Botan derkeve û herê herêmên din yên Kurdistanê. Di wê demê de, herêmên ku navê wan hen, Sêrt, Çemişgezeg, Amed, Xîzan, Îdir, Heskîf û hwd. Ev der, tenê derne ji wan derên ku navê wan hene. Ew ji dixweze ku xwe bigihinê wanderan. Di mala xwe de, Seydayê Cizirî birayê mezin e. Ji ber vê yekê ji, piştî ku bavê wî diçê li ser dilovaniya xwe êdî divêt ku ew werê dewsa wî. Lê ew vê yekê erê neke û birayê xwe yê ku ji xwe biçûktir didêne dewsa xwe û ji wir diçê. Êdî ew te wan herêmên Kurdistanê yên ku navê wan hene û di wan de zanist wan ji hene. Piştî ku ji Cizirê Botan derdikeve, êdî tê û li gelek deverên Kurdistanê dimene û wanderên ku lê dimene de ji, li wanderan, di nav civatên wan de dimene û diaxivê û xwe dide naskirin. Piştî ku diçê gelek deveran, êdî tê û xwe digihinê Heskîfê. Li wir wir ji li cem Şêx Hisên dimene. Demeke dirêj ji li cem wî dimene. Li wir meleyê Cizirî xwe digihinê asteke mezin. Piştre ku demekê li wir dimen, êdî piştre tê Amede, Li amede di wê demê de mele Taha heye. Mele Taha, bi zanebûn û alimtiye xwe rê mirovekî ku pir mezine û bizane ye. Meleyê Cizirî tê cem wî û li cem wî ji weke demekê dimene. Li wir ji xwe bi pêş dixe. Pir dixwene. Pir eşqa xwandina. Piştî ku demekê li wir dimenê piştre, êdî ku ew di zanebûne xwe de û di ilmê xwe de hê ji mezin dibe, êdî mele Taha qiyantê pê têne ku ew mirovekî ku alime, êdî wî dişene gundekî bi navê Sirba ku li wir seydetiyê bike û fêran bide feqiyan. Ew ji ku Mele Taha jê re vê yekê dibêje û dixweze, êdî ew ji bidilekî xwêş dibêje erê û piştre rê digirê û diçê wir û li wir demeke dirêj dimene û seydetiyê dikê. Piştre ku demekê li wir dimene, êdî

piştre careke di tê Amede û li wir hinekî di ji li Civata mele Taha dimene û dirûnihê û piştre careke dî rêya xwe digirê û tê cem Şêx Hisên Heskîfê. Piştî ku tê wîr êdî li wir ji, wê carê ji demekê dimen. Piştre ku demeke dimen, piştre rêya xwe digirê û tê Cizîre Botan. Piştre ku carek dî tê Cizîre Botan êdî li wir bidest seydetiyê dikê. Meleyê Cizîrî, li herême botana hema bêja hemûkî digerihê û wanderan dibinê. Bi mirovên herêmê yên zanist rê hemûnkan rê dirûnihê û li wan dihisenê û xwe li wan dide hisandin. Bi vê yekê qedr û qiymetê wî hê mezintir dibe. Seydayê Cizîrî, piştî ku vegerihê ji, careke dî derdikeve geran û li herêman digerihê. Lê êdî ne weke berê derdikeve geran. Êdî ew demên xwe bêhtir li Cizîre Botan bi fêrdayina faqayên ji xwe re dibuhurêne. Di wê demê de ji di nivîsene. Biqasî ku em zanin. Wî li ser gelek mijarên hizrî nivîsên mezin nivîsandina. Gelek ji wan nivîsên wî ne gahana roja ma. Lê gelek ji wan ji, yên ku gahana roja ma bidev gahana roja me. Haya dawiya umrê xwe li cizîre botan dimene. Li wir li Medresa Sor ji, demeke mezin seydetiyê dikê. Gelek faqa jê fêran digirin. Gelek feqiyên wî ji, dibine zanistvanên mazina, piştre. Piştre heya ku digihê dilovaniya xwe li wir dimen. Piştre ku digihê dilovaniya xwe, wî ji wî cihê ku wî lê fêr didana feqiyan û şîret li mirovan dikirin, na vaqatênin.

Feqiyê Teyran, wê xwe weke şagirdeyekî Seydayê Cizîrî jî bide nîşandin. Li cem wî bi salan maya. BI hevdû re danûstandin kirina. Di vê çerçoveyê de rewşa Feqiyê Teyran û zanebûna wî, bi jiyana wî re wê weke ku di dewama Seydayê Cizîrî de bê. Bo vê yekê jî, divê ku mirov di dewama wî de werênê ser ziman. Li gor hinek dîrok zanan ji têt gotin ku di 1590 de hatiyê dinyê û di 1660 de ji çûya ser dilavaniya xwe. Lê li ser van dîrokan ji vegotinên çûda tên gotin. Lê ya rastî ewê ku Feqiyê Teyran di 1590 wan de hatiyê dinyê û jiyanake mazin û bi zanist berdewam kiriya. Feqiyê Teyran, dema ku mirov bahsa wî bike, divêt ku mirov hinekî bi zane bahsa wî bike. Di gelek vegotin û nivîsanan de bahs têt kirin ku ew helbestanaveka an ji mirovakî ku şaira. Lê ya rasti ewê ku ew ne tenê mirovekî ku helbestvan an ji şaira. Ew fîlozofekî ku mazina.Di dema xwe de li ser hizir pir kur bûya û pir nivîsandiye. Çend ku haya iro roja me, zêde pirtûkên wî ne hatibin ji, em zanin ku wî ne yek an ji du, hinek pirtûk ji nivîsandina.Li ser felsefe, dîrokê, dema xwe de û pêşketinên dema xwe hizre xwe aniya ser ziman.Bi vê yekê re ku mirov jiyan wî bêne ser ziman, mirov wê bibinê ku wî zanistvanîtiyeke mazin di dema xwe de kiriya. Feqiyê Teyran, xwediyê tegihiştine dema xwe ye. Têgihiştine wî ji ya dema wî ji, mirov karê bêje ku buhurtiya. Ji ber ku em vê yekê bêjin, di destê me de hin dokument hene. Ew dokument ji pirtûka wî ya k heya rojeme me maya û ew helbestên wî yên ku gihiştine roja me. Hizre wî mazina. Mazin dihzire û mazin têne ser ziman. Li ser dîroke olê ji xwediyê hizir û têgihiştineke ku mazina. Dîroka olê baş û qanc zane. Ew hizre olê bi felsefe re dihilde dest pê têne ser ziman. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku ew mirovekî ku mazina. Dibêjê ku ´ew, bi hizir û pêşketine xwe, ji dema xwe buhurtiya´. Ya rasti ji ku mirov li

jiyana wî û pêşketinên pêre dihizire, mirov vê yekê pêre dibîne. Mirov hizre pêre dibîne. Feqiyê Teyran weke helbestvanekî, dema ku têt şîrovekirin têt ser ziman. Lê di rastiyê de ew mirovekî hizira. Filozofekî mazina yê Kurd yê dema xwe ya. Feqiyê Teyran, di hizre xwe de xwediyê hizreke bi pergala. Li gor civeke Kurd û Kurdistanê dihizirê û hizre bi pergal dikê û têne ser ziman. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku bi wê hizre xwe ya bi pergal re hizre pergala civeke Kurdistanê ji têne ser ziman. Bi vê yekê re divêt ku werê fahmkirin û naskirin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov hinekî li ser hizre wî ji bisekinê. Hizre Feqiyê Teyran mazina. Hizreke ku rê şan dide ye. Ew bixwe ji mirovekî ku rê şan dide ya, bi hizre di serê xwe de. Feqiyê Teyran, Biqasî ku mirov ji berhemên wî yên ku mana ta roja me, mirov têdigihê ku ew di dema xwe de bihizre xwe de mazina û di nav civeke Kurdan mazina û xwediyê rêzeke ku mazina ji. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew mazina. Filozofên Kurd, yên weke Êlî Herîrî ku berî jîn bûne, her çend ku ji wan hinek hizir gahabibina dema wî û bandûr li dema wî kiribin ji, lê dise divêt ku mirov bêje ku ew mirovekî bêgotin yê ku dema xwe de awa daya ye. Bi vê yekê re divêt ku mirov rastiyê wî bêne ser ziman. Feqiyê Teyran, jiyaneke ku mazin jîn dikê.Li gelek herêmên Kurdistanê digerihê û li wanderan ji dimene.Lê piştî ku li mala bavê xwe li Çolemergê li dore Verezuzê ku hinek mazin dibe û digihê dema xortaniya xwe, demeke li Îdirê li cem Şêx ji dimene. Di wê demê de Li Îdirê, dergaha Şêx heya û bandûreke wî ya mazin li ser herêmê ji heya. Piştre, ku demakê li wir dimene, êdî divegerihê mala xwe û li wir ji ku demekê dimene piştre, êdî dikeve riyan de û diçê Cizîra Botan. Li Cizîre bota, demeke jiyana xwe ya dirêj dimene. Li wir biqasî ku ji dev têt gotin û ew gotin heya dema me hatine, têt gotin ku wî hinek pirtûk li ser hizir, dîrokê, olê û hinek mijarên din ji nivîsandina. Her ku çend ew pirtûkên wî yên bahsa wan têt kirin, ku heya roje me ne hatibin ji, em digihijne wê qiyantê ku wê pir nivîsandiye û hin pirtûk ji nivîsandina. Ev hizrê bi temen di pirtûka di derbarê jiyana wî de tê ser ziman.

Feqiyê Teyran ku demeka dirêj li cizîre bota dimene, piştre ji wir diçê û têt herême başûre Kurdistanê. Têt Zaxo.Piştre ji wir ji diçê Rojhelatê Kurdistanê, Kirmaşanê, Dînwerê. Li gor hin gotinan, têt gotin ku wî xwe gahandiya herême Xorasanê ji. Di derbarê beşa jiyana wî ya li Cizîre bota de, pir tişt têne vegotin. Têt gotin ku mîre bota yê wê demê, di wê demê de li ser hin gotinne li xaziyekê digerihê. Demeke dirêj lê digerihê.Lê çidik û nakê na bine. Piştre têt gotin ku li ser gotina keşeyekî bi navê Tuma, ew Feqiyê Teyran ditenê cem xwe û jê dixweze ku ew xazîne jê re bibine. De ne, têt gotin ji mîr re, ku Feqiyê Teyran ji zimanê teyrikan fahmdikê û karê bi wan re bi peyîve. Li ser vê yekê, ew yeka jê têt xwestin. Piştre têt gotin ku bilêgerineke ew xazîne ji mîr dibine û radestî wî dikê û jê ji ti tiştekê ne hilde û piştre ji wir ji divaqatihê. Di jiyana Feqiyê Teyran de, berî ku bigihê Cizre Bota, di rê de rastî keçeka bi navê Dilberê ji têt. Ew keçik i gelek tişt hatina serê wê. Ew ji bandûreke mazin

li ser Feqiyê Teyran diberde. Feqiyê Teyran, Alî wê keçikê dikê wê dikê ku ji wir rizgar bike. Keçik di mala bavê xwe ji Hêz kurememe xwe Dilşad dikê. Piştre bi hev re diravin û têne herême din ku li wir mirovekî bi nav Raşit beg mîre. Xwe di sipêrine wî. Lê ew çav diberde keçikê û kurik dibujê. Lê keçik ji destê wî rizgar dibe û xwe di sipêre Çiyayê Raş. Li wir, keçik rastî Feqiyê Teyran têt. Ku rastî wê têt, keçik wî dişene mala bavê xwe ku xabera wê bide wan.

Ev buyar ji, bûyareke ku di jiyana Feqiyê Teyran de pir bandûrê lê dikê ya.Wî di jiyana wî bi hest û raman digihêne asteke mazin. Bi navê Dilberê ji, piştre hêbesteke wî ji derdikeve hole. Ev zanistanê Kurd ê mazin, bi hizre xwe re, iro ji li pêşiya pêşketine demê dimeşê. Ew mirovekî ku mazina.Li ser jiyana wî, ku mirov dihizirê, mirov dibne, ku divêt ku mirov hê ji gelek aliyên din ve ji divêt ku mirov wî bêne ser ziman. Ew roniyeke mazina di hizir û ramana Kurdan de û ya herême xwe bigiştî de.

Pêvajoyên civatî ên ku li Kurdistanê pêşve diçin, divê ku mirov werênê ser ziman ku wê di van deman de bi zanebûna van zaneyên weke ê seydayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ahmedê xanî û hwd re wê bikeve pêvajoyek nû de. Wê bandûra wan, pirr zêde hebe. Li vir, di dewama wê de divê ku mirov werênê ser ziman ku aqilê zane û filosofên Kurd ên weke şemsedinê şehrezorî, wê bi navaroka xwe re serdest bibê. Di vê çerçoveyê de wê têgînên felsefî û mantiqî û ankû vacî û hwd, wê derkevina li pêş. Di aslê xwe de di vê demê de kûrbûna di van rengên têgînên felsefî de wê xwe bide diyarkirin. Li herêmê, çendî ku di wê de kûrbûn dibê jî, bi xwe re pêşveçûn dibin.

Pêvajoyên îslamê ên di demê de ku dihên jiyîn jî, wê bi vê rewşa kûrbûna di navaroka aqilê felsefî de ku dibê, wê bi wê re ne di hevrastî û ahengekê de bê. Bo vê yekê ya ku çendî ku di wê de kûrbûn dibê, wê pirsgirêk, derkevina li holê. Gelek zane û fîlosof, yan wê aqilê xwe newênina ser ziman û yan jî, wê li ser awa û ankû şeklê, wê werênina ser ziman. Wê ji şeklê ne bûhûr in. Ev jî, wê di jiyanê de tenê bê alîkarî bo parastina wê pergale olî û serdestiya wê desthilatdarî a li herêmê. Lê aqil bi navaroka wê re wê ne li pêş bê.

Di aslê xwe de weke ku mirov bi teybetî bi filosofên Kurd ên demê re kifş dike, herêm li ber kirina ronasansekê ye. Her wisa, temenê wê û zanebûn di vê çerçoveyê de bo wê xwediyê têrbûnekê jî ye. Her wisa, li herêmê, serdestiyên civatî bi dîmenî weke li pêş in. Ev jî, xwe dide diyarkirin. Li herêmê, di vê demê ya ku mirov dibînê bi serdestbûna osmaniyan a li herêmê re wê pirraniya wê zanebûn û filosofên herêmê wê goçÎrojava bikin. Di vê çerçoveyê de gelek zane û filosof, bi hêncetên cûr bi cûr ên ku li ser hebûna mezhebên olî ku pêşketina re dihên qatil kirin. Yan jî, wê rastî hêrîşê werin. Di aslê xwe de ev desthilatdariya osmaniyan, mirov dikarê weke derbeyekê li pêşketina herêmê a ji vê demê û pê ve. Piştî wê re, wê li herêmê tengezeriyên şariştanî û civatî wê xwe bidina diyarkirin. Di vê çerçoveyê de piştî vê desthilatdariyê re wê, gelek hizrên ku tên ser ziman jî, wê werina qûsandin û bi wî rengî wê di rengekê de

wê bên danîn li pêşiya gel. Her wisa, rewşa filosofê cihane îslamê ´îmanê xazalî´ di vê çerçoveyê de wê nîşanayeke baş bê. Di nava hizrên wî de têgînên felsefî, wê werina piştgûh kirin, wê gotinên ku ew dihênê ser ziman ên li ser baweriyê û olê û hwd, wê tenê werina esas girtin. Di vê çerçoveyê de wê bi demê re tenê di vê çerçoveyê de rewşek derkeve li holê. Îmamê Xazalî, di hizrên wî de temenê pêşxistina metafîzîkekê û felsefeyeka mantiqê heya. Lê ew hertimî li şûn ma. Bi wê re jî, tenê birengê gotinên olî û şîroveyên olî ku ew dike re wê were bi sînor hiştin. Heman rewş, wê wê bi zane û filosofên din re jî were dîtin. Wê bi awayekî şêwayê aqil ê felsefeyê wê bi kirina wê re ji jiyanê were dûrkirin.

Em dema ku li vê rewşê dihizirin, her wisa em vê yekê jî bi wê re divê ku werênina ser ziman ku ji jiyanê felsefe û kirina wê dûrkirin, wê temenê gelek pirsgirêkên civatî ku rû didin bê. Her wisa, divê ku mirov werênê ser ziman ku Zaneyên Kurd ên weke bavê henifê dinwerî, şemsedînê şehrezorî û hwd, wê di şêwayekî ku felsefeyê bi mijarên wê yên weke metafîzîk, mantiqê û hwd ku derdixina li pêş re wê hizrên xwe di çerçoveya baweriya xwe de werênina ser ziman. Her wisa, heman rewşê miirov bi filosof û dîrokzanê Kurd Aliyê Êsir re jî kifş dike. Piştre bi Êlî Herîrî û piştî wan re bi seydayê Cizîrî û Feqiyê Teyran re jî, vê rastiyê dibînin. Giringiya van filosofan, ew a ku ew dikin ku cardin, felsefeyê li ser gotinên ku dihênina ser ziman re bikina nava jiyana mirov de. Di vê çerçoveyê de giringiyê didina hizir kirinê.Bi wê re jî, hizrên xwe yên ku dihênina ser ziman, wê bi bal kişandina li ser pirsgirêkên wê demê û bi wê re jî dîroka demên bûhûrî a berî demên îslamê jî.

Her wisa jiyana civatê w piştî sedsalên 16´min û pê de, wê di vê çerçoveyê de pêş bikevê. Zaneyên civatî û rêvebir ên ku Kurd ên weke Idrîsê bedlîsî û kûrê wî Abûfezl mihemed, ku bi dehan pirtûkan li şûn xwe dihênin, dema ku mirov li navaroka pirtûka wan dinerê, di vê çerçoveyê de dîmenên ku di pirtûkên xwe dihênina ser ziman, weke wêneyê wê rewşa xirab a li rojhilat ku bi osmaniyan re pêşketiye ye. Ev serdema Kurdistanê, wê di nava xwe de gelek pirsgirêkan re bijî. Hêrîşên ku Osmanî, li Kurdistanê û civata Kurd dikin, wê di serî de derbeyê li rewşa rewşenbîriya Kurdistanê bixe. Bi wê re, wê tenê, jiyaneka wan ya bi olî re li holê bimênê. Piştî serdemên sedsale 16´min û pê de, ji van aliyên pêşveçûnên li Kurdistanê ve divê ku mirov rewşê hilde li dest û bike ku fahm bike. Em dema ku van rewşan baş fahm bikin, emê bi wê re hinekî jî rewşa ku bi desthilatdariya osmaniyan re ku li Kurdistanê li ser serê civata Kurd ku rû dide, wê di derbarê pirsgirêkên giştî ên li rojhilat de jî hinek hizirna bidê me. Di vê çerçoveyê de wê Kurd, bikevina bin pêvajoyê hêrîşê ên ku li wan dihêne kirin. Piştî desthilatdariya Eyûbiyan ku li herêmê êdî cihê xwe ji osmaniyan re dihêlê, wê rewşa civata Kurd êdî hin bi hin bi ber jêr ve herê. LI başûr û rojhilatê Kurdistanê, wê desthilatdariya Kurd a ardalaniyan, wê heta sedsale 18´min wê hebûna xwe bide domandin. Lê ev jî, wê bi demê re bi pirsgirêkên herêmî, aşîrî û hwd re wê hebûna xwe bide domandin.

Li herêmê rewşa piştî şerê çardiranê ku wê di nava dewleta sefewî ûya osmaniyan de bibê, wê bandûra wê zêdetirî li civata Kurd bibê. Ev desthilatdariyên ku bi demê re derdikevin, divê ku mirov baş rastiya wan fahm bike. Li herêmê, ji sedsale 13´min û 14´min û pê de, wê Kurd bikevina nava lêgerînekê de. Her wisa, wê li herêmê pêşî Kurdên rojhilat û başûrî bi aşîrên xwe re wê bi farisan re di pêşengiya şêxê Kurd Seyfedînê Erdebîlî re wê desthilatdariya sefewiyan ava bikin. Şêx Sefedînê Erdebîî û ankû **Şêx Sefiyedîn Îsheqê Erdebîlî**, di sale 1252 de dijî û ku di sale 1334 de diçê ber dilovaniya xwe, wê Kurdekî navdar xwedî dergeh ku terîqeta Sefewiye ava kiriye û navê wî li dewleta Sefewiyan hatiye kirina. Şagirtê Şêx Zahidê Gîlanî yê ku ew jî damezrînerê terîqeta Zahidiyeyê bû. Seydeyekî pirr zana bû. Sefiyedîn Îsheq dibe kalikê Şah Îsmaîl jî. Şêx Erdebîlî bi zimanê wî Kurdî ya û bi Kurdî gelek jî helbest nivîsandi ye. Helbestên wê yên ku hatine parastin, binavê *Dubeytî* tên bilêvkirin. Kalikê Şêx Erdebîlî mirovekî dewlemend bû ku li Gilanê dijiya. Piştre jî ew, di nava desthilatdariya Kurd de jî weke mirovekî zane derketiye li pêş. Li herêma Erdebîlê, weke malbateke Kurd ku wir kontrol jî dike, wê xwediyê erkê bê. Bi wê re jî, desthilatdariya dema a Kurd ku dawiya xwe dijî ya desthilatdariya şadadiyan, hê di dema bavê wî de ew herêm bo ku biparêzên weke ku radestî wan kiribûn. Piştre dema ku desthilatdariya Kurd a Ardalaniyan de wê hikimdarên Kurd, wî û malbata wî weke hikimdarê wê herêma erdebîlê jî nas bikin. Di vê çerçoveyê de dergeha wî, wê ji dergehekê zêdetirî, weke navendeka rêveberî a Erdebîlê wê jî wê li herêmê pêş bikeve. Malbata Sefiyedînê Erdebîlî, wê weke serdest û serwerê herêma Erdebîlê jî wê li herêmê bimênê. Dergeha wî, hemû hêrem li dora xwe daya hevdû. Ew bixwe jî, weke zane, filosof û şexekî Kurd, li herêmê wê werê nasîn. Di nivîsên ku tên nivîsandin ên di derbarê wî de secera Erdebîlî halo hatiye nivîsandin. ´Şêx Sefiyedîn bavê Fetah Îsheq kurê Şêx Emîn Cebraîl kurê Salih Qudbedîn Ebûbekir kurê Selahedîn Reşîd kurê Mihemed Hafizê Kelam Ellah kurê Cewad kurê Pîroz Şahê Kurdê Sencanî´.

Ev desthilatdariya sefewiyan, wê piştre destbigûharênê. Her wisa, heta wê dema ku wê şerê çardiranê were kirin de tenê ji serî ve hikimdar û ankû şahên Kurd wê bi rê ve dibin. Lê ji binî ve hin bi hin hemû saziyên din ên wê desthilatdariyê faris dikin ku li wê serdest bibin. Lê şerê çardiranê, wê derbeya mazin li rewşa Kurdan a li ser serê wê desthilatdariyê da. Dema ku sefewî, di wê şerê li çardiranê de têkçûnên mazin dixwûn, wê hingî, rewşa şahên wê ên weke şah îsmaîl ku bi aslê xwe Kurd in jî, wê bikeve zorê de. Êdî ew jî, dikevina nava wê de ku jiyana xwe ew biparêzên. Piştî şerê li çardiranê wê, wê êdî ev malbata Kurd a li ser serê wê desthilatdariyê wê bi tememî were ji desthilatdariyê dûr kirin. Piştre jî, şahên faris ku tên ser desthilatdariyê, wê li herêmên Kurdan seferên leşkerî li dar bixin û wê herêman di şûr de derbas bikin. Herêm û bajar û çavçeyên civata Kurd bi xelkê wê re ji naqşeyê bibin. Bi vê rengê, wê bixwezin ku Kurdan bihêzî kêm bikin, dakû karibin

desthilatdariyê di destê xwe de biparêzên. Di dewama wê de çendî ku Kurdên bakûr û rojavayê Kurdistanê ku di serokatiya idrîsê bedlisî de li rex osmaniyan in, lê wê ew jî rewşa wan ne di awayekî baş de bê. Osmanî dixwezin ku hemû serdestiya herêmê bikina destê xwe de û her wisa hemû serdestiya civatî ya civata Kurd ku heya jî, çavên xwe diberdina wê. Di vê çerçoveyê de Kurdên berteka xewe didina diyarkirin, wê rastî komkujiyan werin.

Ev rewş, bi vê rengî, wê bandûrê li zane û filosofên Kurd ên demê jî bike. Her wisa, di vê demê de bi hêrîşên ku ev desthilatdarî li hebûna civata Kurd dikin bo tûnakirinê, wê bandûrê li xwe pêşxistina civata Kurd bike. Lê tevî wê jî, em dibînin ku wê dem bi dem wê zaneyên Kurd ên weke Macin, Ehmedê Xanî, Ehmedê mûrsîdî, Feqiyê Teyran, Îsmailê bazîdî, Îlyasê Kurdî, Mistefa bêseran, şerefxanê çolemergî, Nabî, Mihemedê kendûlaî, Seyda yunisê erqetînî, Sêlim silêman, Seyda xalîlê sêrtî, Nalî û hwd, wê weke wan bi dehan zaneyên Kurd wê derkevina li holê. Bi wê re divê ku mirov werênê ser ziman ku bi wê di dehan wêjavan û helbestvanên Kurd, wê derkevina li holê. Di vê çerçoveyê de civata Kurd, bi tengezeriyên ku dijî re derfetê ji xwe û pêşketina xwe re nabînê. Weke ancama wê tengezeriya wan, wê helbestên ku wê kul û êşa wan dihênina ser ziman, wê bên nivîsandin. Hinekî jî, divê ku mirov helbestan bi vî rengî werênê ser ziman.

Helbestegerî, di aslê xwe de weke teybetmendiyeka civata Kurd a dîrokî ye. Bi hezaran salan Kurdan, di civatên xwe de hêst, raman û rewşên xwe yên jiyanî bi wê rengê bi gotin kirina. Ev helbestvanên Kurd ên dîrokî, hinekî jî, li ser vê kevneşopiyê hatina. Bi du rengan mirov dikarê di vê warê de behsa helbestvanên Kurd bike. Yek, ew a ku di vê çerçoveyê de ramanên xwe bi wî rengî hanîna ser ziman. Ya duyemin jî, her wisa bi dengbêjî, bi wê rengê hêst û rewşên xwe hanîna ser ziman. Mêrenî û ankû lehengiyên xwe, xweşî û nexweşiyên xwe, êş û şahiyên xwe û hwd, bi wê rengê bi wan helbestgeriya xwe re hanîna ser ziman. Ev, weke karekî xwezayî ê civatî bûya û bi xwezayî pêşketiye ye.

Ji sedsalên 18´min û pê de, wê asta hêrîşên li civata Kurd, wê bi komkujiyên mazin re wê xwe werênê ser ziman.Di vê çerçoveyê de wê, di civatên Kurdan de wê dema ku Kurd lihevdû dirûniştin, bi gotinî û ankû ´zargotiniyên´ xwe ew rewşên xwe û serboriyên xwe dihanîna ser ziman. Kurdan, ev di her demê de hanîna ser ziman. Di van serdemên ku felsefe ku ji jiyana civatê hatiya dûrkirin de wê Kurd di nava civatê de wê, bi helbestan û bi ankû li ser helbestgerî û dengbêjiya wê re weke ku xwestina wê felsefeyiya civatî li gorî nirx û rastiya wê bikin, ew helbestî, bi zargotin û dengbêjiyê re hanîna ser ziman. Mejiyê Kurd ê civaknas, hertimî xwestiya ku xwe werênê ser ziman. Dema ku derfet ji xwe re bi felsefeyê nedîtiya, wê rêya helbestê li şûna wê bikarbênê û wê wê rêya helbestê bi wê rengê bi erk bike di mejiyê xwe de.

Pirsgirêkên civatî, di nava wê de hatina ser ziman. Li vir, ez dixwezim ku minaqek pirr giring li vir, bidim. Minaqe Ahmedê xane û helbest û ankû

şîroveya wî ya bi destana ´mem û zînê´ li vir, wê pirr watedar bê, ku mirov wê werênê ser ziman. Di demên bûhûrî ên kevn de jin, di nava nirxên civatî ên civata Kurd bi pîroziyeka ku li wê hatiya baxş kirin re ew dihat ser ziman. Her wisa naqşaya şahmaran, weke naqşayeke ku nirxên pîroz, ku bi reng, tefsîr û hwd, ku çi hena, wê bi wan re were afirandin. Jin jî, nirxek ji wan nirxên pîroz ku di afirandina naqşaya şahmaran de hatiya bicihkirin e. Minaq mar, weke ku di ola êzdayî de dihê dîtin pîroziyek li wê dihê baxşkirin. Hersê rengên weke ´kesk û sor û zer´ jî weke rengna pîroz in. Ev di dema Mîtra de jî wisa bû. Di dema Zerdeşt de jî wisa bû. Di dema Manî de jî wisa bû û piştre jî wisa bûya. Manî, bi jineka bi navê ”danaq” re wê, vê rewşa pîroziya bi jinê re wê bi nêzîkatiya xwe re bi wê re bike ku werênê ser ziman. Piştre jî, wisa jî di nava bawermendên wî de jî bicih bûya. Ev rewş, di nava baweriya êzdayî de jî wisa ye. Di xate baweriya Yazdanî de jin, pîroz e. Piştî derketina îslamê re van baweriyên civata Kurd, êdî derfet ji xwe re nedît ku werênina ser ziman. Weke êzdayî û yarsaniyan û hwd, dema ku xwe hanîna ser ziman rastî komkujiyan hatina. Bo vê yekê, di mejiyê xwe de heta ku karîna wê bi van nirxên xwe yên civatî re bijî. Lê di dema serdestiya misilmanetiyê de jî civata Kurd, pêwîstî bi wê hêsta pîroziya bi jinê re dîtiya ku werênê ser ziman. Li vir, weke teybetiyekê ya ku pirraniya helbestên helbestvanên Kurd ên demên bûhûrî û hwd, wê xweşikatiya jinekê ji xwe re navend bigrin bi dilê wê re û wê xwe werênina ser ziman. Minaq, dema ku mirov weke ku mirov ku tenê li helebestên nivîsarên Kurd ên demên dawî jî dinerê, mirov wisa dibînê. Êlî herîrî bi navê ´gûlîstanê´ re, seydeyê cizîrî bi navê ´xaçê´ re, Feqiyê Teyran bi navê dilberê re, ahmedê xanî bi navê zînê û hwd re dihênê ser ziman. Ahmedê xanî pêwîstî bi wê re dibînê ku wê evîna ku bi navê zînê re dihênê ser ziman ku bi gotinên pîroz û bi evîneke xwûdaawendî ku wê werênê ser ziman. Ev rengê hanîna ser ziman a Ahmedê xanî, wê bi zêdeyî li gorî wê pîroziya jinê a ku weke nirxekê kevneşopîkî a di nava civata Kurd de ku heya, wê li gorî wê bê. Ev rewşa hanîna ser ziman a jinê bi pîrozî, Ahmedê xanî derxistiya asta herî bilind, şîroveya xwe ya pîroziyê.

Ev şêwayê helbestiyê ê ku Kurdan bikarhanîn, wê bixwezin ku wê di rengê kirina felsefekirinê re wê bikarbênin. Wê dikin jî, Bo vê yekê, dema ku mirov dibînê ku ji hadê xwe zêdetirî helbestvan derkevin û helbestên ku ew dinivîsênin, di wê de pirsgirêkên civatî, hizrî ên felsefî û hwd di wan de dihên hanîn li ser ziman.

## Hiş, civak û şariştanî

Li dîrokê, ku mirov hinekî dimeyîzenê, mirov pir pêşketinan dibîne. Dîroka Kurdan, her weha pir dîrokeke kur û duvdirêje.Lê li hê li gor rastiyê wê ne hatiye nivîsandin. Ji dema sûmeriyan haya dema Hirrî û Mîtaniyan, Kurdan piştketineke mazin kir.Wê pêşketine wan, xwe di sazbûne wan û di dewletbûna wan de xwe da der.Berî zayînê di nav xwe de hizre civaktiye bi pêşxistin.Ji dema sûmeriyan haya dema Hurî û Mîtanniya di vê qadê de pêşketineke mazin dikin.Lê belê, ku mirov li wan û pêşketine wan dimeyîzenê, mirov weke demne taybet demên hurrî û mitaniyan û pişt wan re dem Naîriyan dibîne.Demên Hurrî Û Mîtaniyan, bi serê xwe demne ku werine lêkolinkirin û werine ser ziman in.Em li ser wê ne sekinin.Emê hinekî naheke li ser Naîriyan bi sekinin.

Bi qasî ku ji lêkolinên erkologan derdikeve hole, naîri, di naqabina 1300 û 800 wan de jîn bûne. Li ser van deman, hinek teblet mana dema me.Lê ew tebletên ku mana ji mirov biqasî ku ji wan fahmdike, pêşketine naîriyan ji dema hurrî û Mîtaniyan, hebûne xwe berdewam dike.Di dema Hurrî û Mîtaniyan de pêşketineke mazin hebû. Hizre civeketiyê derketibû holê û bi pergal bûbû û bidest pêşketinê ji kiribû. Wilqasî mazin û baş pêşketibû, mirov karê bi pêşketine roje me ya hemdem re bitijbene.Gelek wekheviyên hevdû hene.Hûrrî û Mîtanî, ku xanadana wan ya dawiyê dikeve êdî jev belav bûn di nav wan de derdikeve hole.PIştî ketinê re, êdî ew civaktiya di nav wan de ku pêşketibû ji, di demeke kin de cihê ji kombûn li dore mîre re dihêle.Ew rewşa ku bi vê yekê re derdikeve, weke hebûne aşîrên roje me awa distênin.Her Mîr li herême xwe serweriya denazene.Bi vê yekê re rewşeke nû pişt Hurrî û Mîtaniyan re derdikeve hole.Ev rewş, piştre ne bi gelekî re, dibe hîmê hinek pêşketinên din, yên weke dewletbûnê.Hîmê vê yekê heye. Demên hurrî û Mîtaniyan, bi hizir û pêşketinên xwe re hîm û rewşeke mazin damazirandibûn.Ew hîm di aslê xwe de hîmê civeketiyê ye. Di nav vê deroniyê de êdî li cem hevdû bûn û cih girtin çêdibe. Ev hîm, Kurdan di wê demê de, li cem hevdû digirê. Lê mîrîtî ji ji wê demê pêde, weke serekê dewletekê bi pêşdikeve.

Piştî hurrî û Mîtaniyan re, êdî ew hîmê ku wan re çêbûya, careke dî wan têne cem hevdû û dewletbûnekê dide avakirin.Navende vê dewletbûnê ji, Nêzîkî zagrosan li Zapê ku haya ku digihê botanê Amedê Mêrdînê Rihe Êlihê û hê gelek deverên din yên Kurdistanê.Her çend ku dewlete hurrî û Mîtaniyan dikeve ji, ji ber ku wan di nav xwe de hizreke mazin û civaknasiyeke xurt damazirandiya, ev damazirandin careke dî wan dikişene cem hevdû.Bi vê yekê re, ew herêmên bi serê xwe û aşîrên ku li herêman awa standina careke dî digihine hevdû û dewlete avadikin. Navê wê dewletê ji, Naîriya ye.Naîriya, di

nav´qabine 1300 û 800 wan de avadibe.Ser 500 salî Temenê wê heye.Tê gotin ku ew dema ku her weha dewlete xwe ava dikin, weke paytaxta xwe ji Araretê kifş dikin û bi serê xwe jîn dibin. Têt gotin ku piştî ku paytaxta Araratê kifş dikin piştre bi demekê re êdî Tuşpa yê ji xwe re dikine paytaxt.Her weha guharandinekê dikin. Dewlete Naîriyan, tê avakirin. Lê li ber serê wan Asurî hene.Car bi car ji hin êrîşên wan ji li wan çêdibin.Di tebletên ku derketine hole de, bahsa van êrîşên li ser serê naîriyan tê kirin.Di tebletên ku derketine hole de, tê gotin ku dema ku Asuriyan êrîşî wan kir, 43 keyên wan dil girtin û piştre di berdêla gelek diyariyan de ew serbest hatina berdan û piştre dewlete Naîriyan ji bi bêş bi Asuriyan ve hatiye girêdan.Di berî zayînê de di 1128 de şerkeî ku pir mazin û navdar di nav wan de dibe.Di vî şerî de ji nêvî bêhtir dewlete Naîriyan dikeve bin destê asuriyan de.Keyê Asuriyan yê vê demê Tiklat palazar bi vî şerî serwerî denaznene.

Biqasî ku tê gotin, pergala Naîriyan weke konfederesyonê ya û her herêm weke ku ji aliyê mîran ve werê bi rê ve birin, tê rastkirin. Bi vê yekê re, gelek herêm yên ku bi serê xwe ne, lê bi ve dewlete ko hîmê konfederesyon ve girêdayî ne.Di vî şerî de Tiklat palazar ji wan herêmên konfederesyon dewlete Naîriyan Nêzîkî 23 herêman dike bin destê xwe de.Dike yên xwe.Piştî vê serketinê re, Asuriyan, ne sekinin û piştre ji êrîşan berdewam dikin.Biqasî ku em ji tebletên(kêvalbaran) ku haya roje me hatina ji wan fahm dikin li herême Muredê êrîşên wan zêde dibin.JI ber ku ev herêm ku bikeve dest de, li gor wan, ev herêm herêmeke ku herême 'bidestê xistina' herêmên din tê dîtin.Ev herêm, herêmeke stretejîk dihata dîtin...

Piştî vê yekê re ji gelek şer dibin. Lê dewlete Naîriyan li ser lingan dimene.Lê di demên xwe yên dawiyê de weke ku tê zanîn, bi dewlete Asuriyan ve girêdayî hebûne xwe berdewam dike.Her mîrên herêmê bêşan didina dewlete Asuriyan.Ev yek, wan kal dike.Her weha dewlete Naîriyan hebûne têne haya dema keyê Asur Tukulti Ninurta yê duyemîn.Tukulti Ninurta yê duyemên ji, ku tê ser text, êdî êrîşekê li Naîriyan dike û gelekî xisareke mazin dide wan û herêmên Naîriyan yên weke Amed û mêrdînê ji dike dest de û hebûne dewlete Naîriyan têne ber dawiyê. Bi vê yekê re, bindestiyeke mazin ji bo Naîriyan dest pê dike.Lê ew ji li ber xwe didin.Piştî êrîşe Tukulti Ninurta yê duyemên ku amed û mêrdîn ji ji dest Naîriyan diçê, êdî piştî wî re di dema Keyê Asur Şemsî Adadê pêncemîn de naîrî careke dî têne cem hevdû û bi hev re biryara serhidanake li hemberê wî didin.Di wê dema ku serî hildidin, gelek serî hildan êdî dibin. Lê belê, j serhildanan encamên ku dixwzin bidest naxin.Lê hebûne xwe ji bi wan serî hildanan di parezên.Dewlete asuriyan, di destpêka dewlete naîriyan de hertimî êrîş li wan dikir û bi zirereke mazin ew girêdayî xwe û bêşê dikir.Naîrî ji ji vê yekê ne xweş bûn û timî ku derfet didin serî di hildan li ber wan, lê belê, di her carê de ji bi zirekeke mazin serhildanên naîriyan biencam dibûn.Lê serhildanên Kurdên naîrî bidawi nabin. Nêzîki du sad salî berdewam dikin. Ta dema Kurdên Mediyan, ku ew bi ser dikevin û

asuriyan têk dibin serhildanên wan berdewam dikin. Ku Kurdên med bi ser dikevin, êdî demeke nû, bi Kurdên med re dest pê dike..

Civat, bêjeyeke ku di çand û kevneşopiya Kurdan xwediyê cihekî ku pir girînge.Civat, cihê li hev kombûnê ne. Civat, axlabe ji, di malan xwe de û axlabe ji, di malên mazinan yên weke mîr an ji serekeyan de li hevdû gahana hevdû û li hevdû rûniştin ne. Di civatan de, pirsgirêkên civakê li ser dihata axiftin.Civat, bêjeyeke ku pir girînge. Di hîmê bêje civatê de çandeke mazin û dîrokî heya.Civat, xwediyê pir kevneşopiya na.Bêje civatê, ku mirov li ser dihizrê pir hizir têne aqlê mirov ji bo gotinê.

Civat, dema ku mirov bahsa wê dike, divêt ku mirov hinekî li ser rastiye wê ji bêne ser ziman. Di demên berê de, li malakê hertimî mirov bi jin û zarokên xwe re li hev digahana hevdû û li hevdû dirûniştin û li ser hizir û pirsgirêkên ku di nav wan de hebûn diaxiftin. Herkesekî hizre xwe di dema axiftinê de dianî ser ziman. Lê di dema axiftinê de riye axiftina pêşî hertimî ya mirovên ku navserî xwe bû. Mirovên navserî xwe ji, yên ku pîr û ji aliyê zanebûne ve ji di asteke de bûn. Ew mirovên ji gotina wan re ti kesekî ne digot ne. Dema ku mirov li ser civatê di hizirê, mirov hinek rastiyan dibîne. Ew rasti ji ji aliyê çand û kevneşopiya Kurdan ve pir giringin. Civatan de mirovên pîr hertimî li pêş bûn. Rêzeke ku mazin ji wan re hebû. Ew mirovên ku di pirsgirêkekê de an ji di rewşeke de girînge yên ku serî li wan dihata dihata dayîn bûn. Li wan dihata rûniştin. Ji wan re pirsgirêk an ji rewşên ku hebûn dihatina vegotin. Wan ji li ser wan pirsgirêk an ji rewşan hizre dihanî ser ziman. Dema ku wan hizre dianî ser ziman, êdî wan çi hizir anîbana ser ziman, weke riyeke çareseriye dihata dîtin. Pirsgirêkên di nav aşîran de û yên di nav xelkê de di civatan de bi wan mirovên navserî xwe dihata çareser kirin.Bi pêşavaniya wan rê dihata dîtin. Her aşîrek civatê wê hebû.Her maleke ku mazin bû, li wê malê, civat li dar diket. Civat, hem di nav aşîran de û hem ji di nav xelkê de ji cihên ku mirovên têde hizir û rastiyên ku zanibûn dianîne ser ziman bûn. Cihên ku di wan de pirsgirêk dihatina ser ziman û ji wan pirsgirên ku dihatina ser ziman re çareserî dihata dîtin bûn. Bi vê yekê re di nav çand û kevneşoiiya Kurdan de civat, xwediyê cihekî ku pirr girîng bûn.

Dema ku mirov li ser civatan dihzirê û têne ser ziman, mirov dibîne ku di hebûn û rastiye xwe de pir bi weyn in. I ro, di roje me de, çawa ku parlamentoyên ku hene, çi weynê di leyizin, civat ji, bi hebûnên xwe re, di wê weynê de ne. Bi vê yekê re, divêt ku mirov pir baş û qanc li ser civatan bi hizirê û bêne ser ziman. Civat, di rastiyê de ku mirov di nav Kurdan de şîrove dike, hîmê perlementoyên ku iro hene, di nav Kurdan avêtiya. Di dema Medan de û berî wan ji di dema Naîriyan de civatan di pêşketin û li hewbûnê de weyneke pir girîng leyistine. Di dema Naîriyan de, civat, li hewbûn û bi hev re gavavêtinên ku dibûn, hîmê wan diafirand.Bi vê yekê re hîmê civeketiyê ji pir baş di nav Kurdan de dike. Civat, di rastiyê de, divêt ku mirov bêne ser ziman

ku hîmê civatiyê mazin afirandi ye. Bêjeyeke ku hîmê civeketiyê afirandi ya.Bi vê yekê re civat, dema ku tê şîrove kirin û rastiya wê tê ser ziman, mirov dibîne ku weyneke pir mazin di pêşketinê de di nav Kurdan de leyistiya.Di serê Kurdan de, civat, hertimî bi wate ya, û bi wateyeke ku pir mazina.Rêzeke mazin jê re heya. Di civatan de mirovên mazin yên sereke û pîr hertimî pêşang bûn. Ji wan re ji rêzeke mazin hebû.Bi vê yekê re, di nav xelkê de rêz û gireniya civatan mazin dibû û hebûne xwe berdewam dikir. Civat, dema ku werine ser ziman û şîrovekirin, mirov nikarê tenê weke hinek li hew civinên ku li dore mîr an ji yên ku hinek mirovan mazin li hevdû dirûniştin in bêne ser ziman.Civat, di nav civakê de, xwediyê weyneke pir mazinin.Hzire civakê di civatan de afiriya. Hizir, ku gaha her beşên civakê dibe ya civakê. Bi civatan re ev yek pêk dihat.

Di vir de divêt ku mirov ji bîr neke û bêne ser ziman. Di dema Medan de ´koma pîran´ hebû di nav Kurdan de. Wan weyneke mazin di nav civakê de di leyistin. Wan pêşketine civatê kifş dikir. Wan rastî kifş dikir.Ew weke serkeyên xweza yên xelkê bûn. Berî wan ji, di dema naîriyan de ev yek wilo bû. Di dema naîriyan de Kurd li dore ´mîr´ û ´pîran´ di rûniştin û li gor wan gavên xwe diavêtin. Wan ku riye mirinê ji şanî wan dabana, ew diçûnê de. Hebûne civakê, bi vê yekê re, bi civatan re li ser lingan bû. Di nav Kurdan de, bi zêdeyî ji di demên piştre derdikeve hole. ´Civata mîrê bota pir bi nav û deng bû.Her weha li gelek herêman civatên wilo yên ku bi navê mîrê xwe re mazin dihata ser ziman hebûn.

Ku mirov rasti û hebûne iro û pêşketinên wê ji li ber çavan bigirê û şîroveyekê bike, divêt ku mirov bêje ku Kurd bi civatan re herdemî xwediyê perlementoyekê bûn. Di vir de, civêt ku mirov gotinke din ji bêne ser ziman. Civat li gor rewşan dihatina li dar xistin. Rêze û hûrmete civatan bi mirovên ku têde bûn bû. Ji ber vê yekê ji, ji ber ku xelkê girîngî dide civatan, di civatan de mirovên mazin yên navserî xwe û mîr dirûniştin.Ew mirovên ku têde dirûniştin û bigotin bûn, yên ku di nav xelkê de ji yên ku xwedi biryar bûn. Yên ku xelkê pir mazin li gotina wan dihisand bûn.Di civatan de ji, ku wan çi gotibana, di cih de di nav xelkê de dihata bihîstin. Bi vê yekê re, gotina ku ji devê wan derdiket, dibû hîmê kevneşopiyne. Civat, li gor rastiya xwe ku iro ji werê şîrove kirin, wê bê dîtin ku hîmê civînên civakê ne.

Sumerî, dema ku mirov li ser wan bidest hizirandinê dike, mirov têgihiştineke pir kevn e dîrokî û dîrokeke ku pir dirêj û temenê wê ta bi 5 an ji 4 hezar salan diçê mirov dibîne. Sumeriyan, ´dîrok bi xwe re da dest pê kirin´. Her weha têt gotin.Li ser sumeriyan, lêkolin û nivîeên ku têne nivîsandin, ji sadsala 18. mîn dest pê dikin.Haya wê demê zêde wilo ti kesekî di derbarê wan de ti tiştek nizanîbû.Lê di wê demê de, dema ku bidest kolanên arkolojik hata kirin û kêvarbarên wan derketina hole, êdî li ser wan, pir lê kolin hatina kirin. Pir mirov li ser wan bidest lêkolinê kir.

Li ser dîrokê sumeriyan bidest nivîsandinê hata kirin.Lê divêt ku em bêjin, haya iro ji, hê nuqtên ku divêt ku werine rohnî kirin di derbarê wan de hene.Hê ji, dîrokê sumeriyan de baş û bi tememî ne hatiya zelalkirin. Gelek kêvarbarên wan ji bîn ardê derketin. Wan kêvarbaran, di derbarê wan de pir agahî dana me.Di derbarê dirokê wan de, di derbarê jiyan û rewşê wan de pir zanebûnên girîng dana me.Lê belê, hê ev yek têre nakê ku em wan bi tememî fahm bikin. Sumeriyan, dirokeke ku pir dîrêj jîn kirin.Di naqabîna Diclê û Firatê de jîn bûn û şaristaniyeke pir mazin û demdirêj avakirin. Bi hizir û nêzîkatiyên xwe û bi pêşketinên bi xwe re pêşangî ji demên pişt xwe re kirin.Bi hebûn û hizir û nêzîkatiyên xwe bûne hîmê gelek şaristaniyên ku pişt wan re hatin û bûn.

Sumerî, dema ku mirov bahsa wan bike, divêt ku mirov pir baş û qanc bahsa wan bike.Divêt ku mirov li ser wan pir bi zanist biaxivê.Divêt ku mirov di derbarê wan de pir bi zanist biaxivê. Tenê bêja ´sumerî´ bi serê xwe, ku tê ser ziman û tê gotin, di wate xwe re hebûneke pir mazin têne ser ziman. Dema ku mirov bahsa sumer dike û bêja sumer têne ser ziman, mirov divêt ku di wê têgihiştinê de be ku mirov bahsa dirokeke ku ne bin 4 hezar salan re mirov bahsa wê dike.Bi zêdeyî li ber diclê dore Cizîra Botan û haya ku digihê ber firatê ku ber li dore reha yê û pêre ji, başûrê Kurdistanê di nav de, herême derketine wan ne.Ev herêm, herêmne pir bi dîrokin.Herêmne ku divêt ku pir li ser wan werê sekinandinin.Hîmê hersê olên mazin yên weke cuhutî, xiristiyaniyetî û musulmanetî ji li vanderan têt avêtin. Birehim xalil li reha yê ya.Ew, di hîmê hizre hersê olan de cih digirê. Ew bixwe ji, li ser wî û hizre wî xelkê wî yê ku hê li wê herêmê xwe jîn dibe, hê ji nîqaş têne kirin.Sumerî, divêt ku mirov bêje ku xwediyê dirokeke ku pir mazinin.
Li gor hinek lêkolinan ev diroke di derbarê wan de, ya ku dibêje di vê demê de ji jîn bûne, hê kevntir diçê.Li Kurdistanê, Li gundikê xiraraşkê, cihê bergkirin(diakirin)ê hata dîtin.Ev cih bi xwe, dide nîşandin ku diroke wan hê kevntire.Sumerî, demeke mazin û dirêj jîn bûn.Wan di dema xwe de hîmê şaristantiye mazin afirandin. Pergala şaristaniyê wan hîmê wê bi hizre olê re afirandin.Sumeriyan digote parastgahên xwe "Ziggurat. li Wan, hizir, pir baş û mazin bi kar anî.Ti keskî, biqasî wan, hizir baş û mazin bi zanetî bikar ne aniya.Bi vê yekê re, divêt ku mirov bafê wan bide wan.Weke demên şaristaniyê yên pir mazin damazirandin. Di van deman de bajar-dewletên weke Uruk, Raşgal, Ur, Nîppur, Lagaş, Sîppar, Êrîdu, Larsa, Kiş, Bad-tibira,Umma, Ngirsu, Hamazî, Adab, Marî, Aksak, Aqqad, Isîn, Kuara, Zabala, Kîssura marad, Dilbat, Borsîppa, Kutha, Der, Eşnûna û nagar pir hatina denazandinin.Demên piştre ne.Mirov dema ku li wan deman dimeyîzenê, mirov pir pêşketineke mazin dibîne. Destna Gilgamiş, pêşketin û hizre wan deman pir mazin dide nişandin.Wan deman weke demeke serwextî dide nîşandin. JI dema neolitikê buhurîne dema şaristaniyê, bi wan re mazina. Di dema neolitikê de, hizrên ku pêşketine, di dageriyan de hebûne xwe tênine ser ziman. Di dema şaristaniyê de, ew dagerî, dibîne hizir û bi pêşdikevin.Bi vê

yekê ji totemizmê-anamizmê buhurîme mitojiyê bi derdikeve û bi pêşdikeve. Ev dem, demeke ku pir mazin bi pêşketiye.Mîtolojî, di aslê xwe de derketin û pêşketine hizir û pergala şaristaniyê ya bi hizire.Vê demê têne ser ziman. Li ser vê yekê pêşketin derdikeve hole.Di hizir de kurbûn û pêşketin derdikeve hole.Bi vê yekê re, ol êdî derdikevin. Ol, di pêşketinê û pêşketine şaristiyê de, dema nû ye. Sûmerî, vê yekê pir baş bi pêş dixin û bi pêşve dibin. Pir baş ji bikar ji tênin.Bi vê yekê re mirov divêt ku pir mazin bahsa wan bike.Hizir, dema ku bi pêş dikeve, bi wan re pêşî, dibe hîm. Ev hîm, bi sazbûnê hebûne xwe bi pêş dixe.Bi vê yekê re, parastgahên pêşî, bi vê yekê re bi wan re bi pêş dikevin.Di vir de, divêt ku mirov pir baş û qanc bahsa aliyekî wan yê dî ji bike. Ew ji, her weha ziman û pêşxistina zimana. Zimanê xwe, pir baş bi kar tênin. Bi zimên, li ser mirovan bandûrkirin, ji aliyê wan ve tê kirin. Ziman, ji bo xaberdanê ya.Ol, ji bo sazbûne ye. Ew, vn herdûkan ji weke kifşekê kifşdikin û bikar tênin.Nivîsandinê kifşdikin. Bi vê yekê re, zimanê xwe bi teybet dikin.Bi xoslet dikin.Bi têgihiştin dikin.Bi olê ji, li ser mirovan farz dikin.Bi vê yekê re, hêdî hêdî dewlet û pergala wê, hîmê wê diavêjin.Pêşî key derdikevin, hîmê wan ji, bi hizre ´xwûdê´ re tê avêtin. Hizre xwûdê, ji aliyê wan ve, tê bi têgihiştin kirin û pê pêşketine xwe mazin dikin. Hizre xwûdê, ya pêşketi, ku wan bi pêşxistiî, demên pişt wan re ji, hebûn û bandûra xwe berdewam dike. Bi vê yekê re, gelek pêşketin derdikevinê hole. Bi hizre xwûdê re, û kifşkiirne wê re, demên şaristaniyê ji, dikevine demeke nû de.Di demên hizre xwûdê de bi sumeriyan de sê pêvajo hene. Pêvajoya pêşî ya afirandinê ya.Ev pêvajo, pêvajoyeke ku pir girînge.hertişt bi hzire xwûdê tê şîrovekirin û bi mirovan tê erêkirin.Dema duyemîn ji her weha dema pêşketinê ya.Di wê demê de gelek hizir û xwûde derdikevin, di vê de, ya rasti ku mirov bêje her xwûdeyek demekê û pêşketine demekê têne ser ziman.Ev dem, demeke ku mirov pir li ser bi sekinê ye. Ev dem, ya rasti ku mirov bêje, rasti û hizrê wê û nêzîkariyê wê afirandiya û bi têgihiştin kiriya û bi mirovan daya erêkirin.Bi vê yekê re ev dem, girînge.Ev dem, dema pêşketin û kur bûne şariyaniyan ji ya.Hîmê pêşketine demên Asuriyan û Naîriyan vê wê demê tê avêtin. Ev dem, bi hizire xwe re mazina.Ev dem, ji aliyekî ve ji, dema bidest hizirkirinê ya ji.Bi vê yekê re, hizir, nêzîkati şîn dide. Hîmê pêşketina xelkan tirh dide.Bi vê yekê re êdî dewletên nû ava dibin.Her dewletek, bajareke. Lê her yek ji mazina.Ji ber ku êdî hizir û bi pê ji, pergala wan ya xelkîtiyê heye.Pergalbûn, pêşketine herî mazina.Hîme. Ev dem, û pêşketine wan, dema sêyemîn ji derdixe hole.Dema sêyemîn, demeke dî ye.

Di vê demê de êdî şer ji zêde dibin.

Nêzîkati, bitêgihiştin dibin û pergalbûn xurt dibe û bi hêzbûn mazin dibe.Hêz, ku bi têgihiştine xwe re dibe, dibe hîmê serweriye.Hêz bi xwe re zore têne.Di vê demê de, tenê, yên ku bi hêze xwe karibin xwe li ser lingan bigirin, dimênin.Yên din, bi şaristaniya xwe re ji dîrokê têne jêbirin.Ev dem, her weha demeke wilo ye. Di vê demê de, bi vê yekê re şerê şaristaniyan yê bi

hev re ji derdiekeve hole.Her hizir û şaristanî dixweze ku xwe bi pareze.Bi vê yekê re, yên bi hêz ji, dixwezin ku li ser serê yên bêhêz bi serwer bibin.Ev yek, şerê şaristaniyan têne.JI dema sumeriyan ta dema babiliyan, her weha demeke mazin diafirê. Di dema babiliyan de, demeke nû diafirê.Ew dem ji, mirov karê bêje serê dema me ya iro ye. Hammurabî, di dema babiliyan de derdikeve û destûre bigihîn ya pêşî di nivîsêne.Bi vê yekê re êdî demeke nû diafirê. Demeke ku wê bi xwe re serdest û bindestiye bi hizir ji û bi hebûnê çêbike, erêbike û kur bike dibe.

**Felsefeya dema medan** li Kurdistanê, pêşketinê bi hizir devêt ku baş werina fahm kirin. Ku newina fahmkirin wê dema me ji zêde di pêşketina xwe birê ve neçê. Ji ber vê yekê, divêt ku em li ser demên berê pir bi hizirin û kifş bikin û bênin ser ziman. Bêje felsefe medan, bêjeyeke ku di wê demê de hizrên ku hatina afirandin têne ser ziman. Medan di dema xwe de Hizreke mazin afirand. Pêşketineke mazin çêkir. Herême Anatolya ji, ji felsefe wan sud girt. Thales, Heredot û Arîstoteles çûna Mediyan û ew û pêşketina wan dîtina û fahmkirina. Weke wan, pir zanistên demê yên din ji çûna wir û li wir mana û li wir xwe bi pêş xistina. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku felsefe medan di dema xwe de weyneke pir mazin leyistiya. Medan, bingihê felsefe xwe mazin afirandibû. Yên ku ew felsefe bi nêzîkatiyeke sazî bi rê ve dibirin. "Magî" hebûn. "komên pîran" hebûn. Keşeyên ku li parastgahan diman hebûn. Hê weke van koman, gelek komên din ji hebûn. Wan koman, bi sazî hizre hizre bi pêş dixist û bi pêş ve di bir. Miorvên mazin ji yên ku derketibûn hebûn. Deyakos heyek bû.Lê mirovekî ku zanist ji bû. Zerdeşt, filozofekî ku pir mazin bû. Yên weke wan hê hebûn. Hizre wan, civak bi pêş dixist û bi rê ve di bir. Li dore parastgahan, li herêman kombûn dibû. Wan koman hizir û zikir dikir. Medan, di dema xwe de pir rêz û girîngî dide pîran. Pîr, di nav xelkê de weke filozofan bûn.Her pîrek weke filozofekî bû. Wê hizre wan û rêze li wan, civak li gor nirx û hebûne xwe bi rê ve di bir.Di felsefe medan de, bi vê yekê re pîr pir xwediyê cihekî ku pir mazin bûn. Civat, cihê kombûn û nîqaşkirinê bûn. Civat, hertimî li dar diketin. Di pêşketin û belavbûna felsefe wan de "Civat" ji pir girîng bû. Civat, bêjeyeke ku di nav Kurdan de pir girîng û mazin û dîrokî ye. Pir bi rêze.Di felsefe medan de pêşketin pir mazin bû. Wan, di dema xwe de Pirtûkxaneyên pir mazin avakiribûn.Bi vê yekê re, di dema xwe de bingihê felsefe xwe û pêşketina wê çêdikin. Nêzîkatiyên medan li ser hizir bûn. magiyên wan bi xwe re Astronomî û matematîk pir bi pêş xistibû bûn. Biqasî ku mirov ji wê demê, fahmdike, û ji hizre wan fahm dike, hizre metafîzîkê di wê demê de bi wan re pêşketibû. Têgihiştina wa li ser vê yekê hebû.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku li ser tênduristiyê ji, xwedi hizir û pêşketin bûn. Li ser başkirina sawal û heywanatan bi wan re pir li pêş bû. Di jiyaneke asayî de wan bi xwe re ev yek bi pêş xistibûbûn.

Wekî dî ji di hizre wan de hebûne lipît Îştar û Eşnuna hê bi wate bû. Zagonên wê di jiyanê de bi hebûne xwe re hebûn. Li herême Gerzûbaqartanê, li Kalden Ur ê û hwd, li gelek deverên weha hizre wan li jiyanê bû. Li gelek deverên din ji li jiyanê bû. Weke Lipît Îştar û Eşnuna, hê gelekên din ji hebûn. Ew ji, hizre wan, weke filozofên demê weyn di leyistin.Li ser xelkê û pêşketinê pir bi hebûn bûn.Hizre Medan, hîmê wê yê pêşketi, di dema naîriyan de pir mazin derdikeve hole. Naîriyan, ku em bêjin hîmê wê felsefe wan avêt li gor demê, wê ne xalat bê. Naîriyan, di hizre dema xwe û demên pişt xwe pir bi diyar kifş kirin. Pişt dema Sumeriyan, naîriyan demek da dest pê kirin. Bi pêşxistin û bi formûl kirin.Lê medan li gor wê dema xwe, nûjeniya wê pêşketinê, jînkirin. Bi vê yekê re ew pir pêşketi bûn. Ji medan ji, dema wan bi hêzên xwe re pir sud û hizir girt.

Dema ku mirov pêşketina Medan bêne ser ziman, divêt ku mirov zanibe ku divêt ku mirov pêşketineke mazin têne ser ziman. Hizre Medan pir mazin bû. Wan di xwe de pêşketineke mazin çêkir û da çêkirin. Dema ku mirov li wê pêşketina wan dimeyîzenê, mirov dibîne ku têde rûniştineke pir mazin heya. Bi vê yekê. divêt ku mirov bêje ku demên wê yê pêşketinê yên berê hene û divêt ku werine fahm kirin. Divêt ku mirov li ser rawastihe. divêt ku mirov fahmbike û çend pêşketineke mazin bi wan heya.

Di demên berî dema Medan de pêşketinên li Kurdistanê pir mazinin. Şaristanî di dema Medan de dest pê dikê Bi pêşketina şaristaniyê re êdî hizre wê û saziyên wê ji bi taybet têne afirandin û dibine bingihê pêşketinên ku di bin. Hizir, dema ku mirov bêne ser ziman, hingî mirov divêt ku mazin bêje ser ziman. Hizir bingihê pêşketina şaristaniyê ye. Şaristanî li Kurdistanê berî demên medan pêşdikevin.Berî demên Medan diafirin. Di dema Sumeriyan de şaristaniya mazin di afirê. Her çend ku iro di gelek qadanda em li ser pêşketinên dema sûmeriyan rawastihin û bênin ser ziman ji, mirov kêmesiyekî di binîne. Ew kêmesi ji her weha kêm zanebûna di derbarê wan de. Lê em zanin ku ew xwediyê pêşketineke pir mazin bûn. Hizreke wan ya mazin hebû. Bi wê hizre xwe wan pêşketinên xwe afirandin. Di dema sûmeriyan de ax û av pir pîroz bû. Li wir wê dihata kirin. Li gor baweriya wan her mirov ji axê hatiya afirandin. Av ji bi vê yekê re ye. Ev ne tenê baweriyak bû. JI xaynî wê ji divêt ku mirov bêne ser ziman ku hizreke ku divêt ku weke felsefeyekê were ser zimana ji.

Di dema şaristaniya wan de wan her afirandinên xwe yên malî û avadanî bi axê çêdikin. Ax pir bi kar dianin. Ji ber vê yekê, avadaniyên wan zêde ne gahana dema me. Gelek ji wan di demê de û gelek ji wan ji di amcama êrîşên ku li wan dibûn de hatina xuruxandin. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku zêde ji demê wan na buhurun. Lê ew di avakirin û û afirandinê de pir xurtun. Awa didina ava. Malên xwe, weke ku iro hê li Kurditsnê li rihayê heya ji hariyê çêdikirin. Cihê ku nanê xwe têde çêkin weke teniran ji çêdikirin. Tenur iro ji di nav Kurdan de hê têne bi kar anîn. Tivifik çêdikirin ji ber ku li ser xwarina

xwe çêkirin. Kuar çêdikirin ji bo tiştên yên weke zad û tiştên wio bixinê de. Ev yek ji dide nîşandin ku ew çênd pêşketi ne.

Piştî demên wan ji di demên Mîtanî û Gutî û Hurî û Naîriyan de ev kevneşopiyên wan yên şaristanî berdewam dikin. Haya dema Medan ew kevneşoipiyên wan berdewam dikin. Hizir ku zêde pêşnekeve wê her weha ew pêketin ne bin. Pêşketinên hizir di demên şaristaniyê de diafirênin. Di wê demê de ji diafirandin. Dema ku mirov li dîrokê dimeyîzenê, mirov vê yekê di binê. Ji dema Sumeriyan nidest nivîsandinê hatiya kirin. Bi vê yekê re Lêvalbarên ku dihatina nivîsandin, bi xwe re di bûne bingihê hizrên nû yên diaifirîn. Nivîsandin, di nav Kurdan de li ser kêvalbaran berê hebû. Ne di dema Medan de di dema berê de ku mirov bêje ji demên Gutiyan ve li ser ayaran nivîsandin dest pê kiriya. Bi vê yekê pêşketin derketiye hole di nav wan de. Kurdan, bi hzirên xwe yên pêşketin re bûna bingihê pêşketinê olî yên ku pişt wan re bûn ji. Mûsa pêxêmber bi xwe ji dema ku ji Frawun bazdide, tê û xwe li Kurdistan digirê û lê demeke dirêj digirê. Di vê demê de di nav Kurdan agir pîroz bû. Ew ji piştre baweriya xwe bi wê têne û piştre hizre xwe ya olş diafirêne û diçê misre û qawmê xwe têne. Piştre ku ji misre derdikevin ji têne Kurditanê û li Kurdistanê demên dirêj dimênin. Kurd wan diparêzin. Gelek ji wan li Kurdistanê ji dimênin. Bi Kurdan re weke wan jîn dibin.

Li Kurdistanê li ber dicle xosisî ku mirov şîrove bike û bêne ser ziman, di vir de wê pir girng be. Divêt ku ev yek bê kirin. Ji ber ku di wê demê li ber diclê pêşketineke mazin hebû. Weke berdiclê berfiratê ji pêşketineke mazin hebû. Jiyaneke pêşketi hebû. Jiyaneke bi zane hebû. Hizre olî ji pêşketi bû. Di kevneşopiya Kurdan jin di wan deman pir li pêş bû. Ew li pêşbûn, haya dema Medan ji berdewam dike. Mitra bi xwe di dema Medan dema ku hizre wî ya olî tê ser ziman, wekheviyekê têne ser ziman. Lê piştre ku Med têk diçin û rêveberiya wan têk diçê, êdî rêveberiya ku tê cihê wan ya Persan, hin bi hin Mîtra lê xwedi derdikevin û têne weke mêr didina nîşandin. Di dema wan de wilo li mitra û hizre wî ya olî tê, ku ew êdî ne hêle ku jin bikeve parastgahên wî ji. Ketina ji jinan di parastgahên wî de di dema Persan de di dema ku ew lê xwedi derdikevin, tê "qadaxa." Li vir, di dewama vê de li ser têgîna çandê re divê ku mirov çend gotinan bi aqil re werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de em divê ku têgîna ´wêjeya Kurdî û Kurdistanê bibîr bikin. Di vê çerçoveyê de rengê pêşketina bi vegotinên weke ên ´gilgamêş´ û hwd re wê rengê pêşketina wan bi hizirkî bi me bide baştir bide fahm kirin. Di nava jiyana şariştaniyê de ya ku hatî jiyankirin û ankû weke ´serborî´ ku dih bi navkirin, wê çawa were dîtin, wê ev rewş bi xwe re wê werêne ser ziman. Her tişta ku bi tevgerî û kirinî hatî jinkirin, wê weke çandekê jî xwe di nava wê jiyana şariştanî de bide diyarkirin.

**Wêjeya** Kurdî, wêje ya ku ji berhemên bi Zimanê Kurdî hatine nivîsandin pêk tê ye. Wêjeya Kurdî, bi zaravayên Goranî, Dimilî, Hewramî, Kurmancî, Soranî û hwd hatiya nivîsandin. Bi zaravayên Kurdî yên din jî wêjeya Kurdî hatiya nivîsandin. Di roja me de, wêjeya Kurdî, ji nû ve xwe di afirêne. Lê ku mirov li dîroka wê dinerê, ji dema sûmeriyan ve heta ku tê dema Gûtî û hwd û ji wê demê jî, heta ku tê dema ku misilmantî derdikeve heya. Çanda ola êzîdî, bi pergalî, di temenê pêşketina demên wê yên berî misilmentiyê de heya. Lê di dema derketina misilmentiyê de, êdî weke ku ew pêşketina berê ya ku bi wêjeya Kurdî bûya, êdî ji holê were rakirin bi ji holê rakirina pergela civakî ya êzîdîtiyê re dibêt.

Wêja Kurdî, demne wê yên berî zayinê, demne pêşketinê yên pirr mazin û dirêj hene. Kurdî, hê di wan de, bi awayekî pêşketî, weke zimanê helbestî tê bikarthanîn. Weke naveneka çandî ya wêjeya Kurdî jî, Cizîra bota heya. Li dora nivîsêbinê Mîtannî û li Dora Cizîrê jî Gûtiyan demên xwe yên zêr jîn kirin. Ku di wêjeya Kurdî de xwediyê giringiyeka bêhempa ya, destana Şahmaran jî, wê ne kêmî oleka yek xwûdayî, wê weyn û rol bileyizê. Li ser Şahmaran û dîroka wê re dahûrkirina çanda Kurd û Kurdî û bi wê re dahûrkirina civaktiya Kurdî, wê aliyekî wê yê pirr giring bêne li holê. Ji dema sûmeriyan. Heta ku demên din yên piştre, wê pêşketineka mezin biafire. Salixkirina, jiyanê û tiştên di jiyanê de bi ziman û têgihiştinê, wê pêşî bibe. Minaq, Bêja "ga". ku Îro jî Kurd wê bikardihênin, wê hê di wan deman de di wateyên weke yên "hêzbûn", "mêrbûn", "girbûnê" di xwe de bi têgihiştinî wê salix bike. Gotina "gilgamêş" jî ji wir têt. Ji wê tê afirandin. Ji bêja "ga", mirov fahm dike, bi bêjeyên bi vî rengî ku bi kasî hevokekê giring in di hanîna li ser ziman re, wê demeka zimanê Kurdî û pêşketina wê ya bi pêşvajoyî jî tê dîtin. Gotina "gilgamêş jî, her wisa, demeka din ya pêşketî ya di zimên de tîne ser ziman.

Bi destanî, hanîna li ser ziman, minaq, weke vegotinên gilgamêş û hwd, wê demeka ku bi aqil ku pêş dikeve wê bi me bide têgihiştin. Wêjeya Kurdî, bi vê yekê re, weke ku êdî weke ku di nav Kurdan de hê jî tê ser ziman, bi civatan re wê pirr zanistên xwe yên ku mirov wan weke wêjavan bi navkê û ku bênavbûn, wê bi afirêne. Vegotinên ku di civatan de dihatina gotin, wê "li ser navê civatê" wê biman. Hin bi hin, êdî gotinên weke ên mal, jin, mêr, malbatîtî, rêz, mazinbûn û hwd, wê bêne salixkirin. Ev dem, bi vî rengî demeka giring a di wê heya Kurdî de. Wê, heta ku dem were dema Gût û Hûriyan û hwd, wê êdî bi zihniyetî pêşketineka mazin bi destanên weke yên Şahmaran û hwd re wê bi afirê û derkeve li holê.

Dema gûtî û Mîtaniyan, wê ne tenê ji aliyê rêveberiyê ve mazinê bê, bi demê re wê bi aqilê xwe yê ku di afireêne re jî, wê mazin bê. Ji van deman de, Ola Êzîdîtiyê çêbûya. Hin bin, ew jî, mazin dibê û pêşdikeve. Êlîtî û aşîrîtiya. ku di nava Kurdan de hebû, wê bi nirxên ku bi çanda weke ya şahmaran û ola

êzîdîtiyê re wê ji holê hin bi hin rabê û wê pergaleka civakî ya pêşketina rêvengê derxe li holê. Şahmaran, wê bi awayeê oleka ku di demeka bi vî rengî de derkeve û bijî, wê awa û şekil bistêne û mazin bibe û bandûra xwe bide nîşandin. Malbatîtî, wê li ser temenê xwe pirr mazin rûnihê. Hin bi hin, her bûyerên ku di qawimîn, wê bi devkî, werina gotin û vegotin. Di civatên ku di wan de lev tê rûniştin de wê ew vegotin bi zimanekî xweş jevre werina vegotin.

Jiyana wêjayî, wê di civatan de rengê xwe bistêne û bide jiyanê. Minaq, her mala Kurd ya ku wêneyekê Şahmaran yê ku bi naqş hatî çêkirin ku têde nebû, ne dihat dîtin. Ew wêna, di malê de bi cih kirin, pîroz jî di hat dîtin. Di wan deman de, nivîsarên ku dihatina nivîsandin, wê li ser Kêvalbar û ayarên sawalan bin. Ayar, yên dema piştre na. Kêvalbar, yên dema berî van deman in. Lê di nav Kurdan de, giringî û giranî dihat dayin li ser ya vegotinî ya bi devkî. Mirovên ku karibûn ku di aqilê xwe de jiber bigirtan, di civatan derdiketin li pêş û di vegotin ji mirovên ku li dora wan rûniştî na. Heta ku dem tê dema Mediya, wê dem bi vî rengî, weke ku Gûtyan jîn, wê bê jiyîn. Lê dema Mediya, weke demeka zêr li ser nirx û pêşketina waqas demên ku berê jiyîna wê derkeve û bijî. Wêjeya Kurdî ya dema Mediya, wê bi aqil bê. Mirovên weke Mîtra û Zerdeşt û hwd, wê derbikevin û pêşavaniyê ji wê dema xwe re bi aqil bikin. Wê hizrên civatê, bi aqil bişon. Jiyaneka pêşketî, di wê demê de bi wan re afirîbû. Medî, piştre ku rêveberiya wan, ji dest diçê jî, wê ji ber wê çand û hunera wan ya xort, wê desthildariya wan ya çandî û hunerî û aqilî bidomê. Li ser wan demên pêşketinê yên ku bi aqil bê û çandî û civatî û hwd bê, wê êzîdîtî jî, dem bi dem karibê xwe bi awayekî pêşketî bijî. Piştî Zerdeşt re, wê Mirovên weke Manî û hwd wê derkevin. Bi aqilê xwe re, ew jî, wê bina temenê serdemeka nû ya di wê wêjayê de. Du tişt, hertimî di wêjeya Kurd der derdiketa li pêş. Nirx û rêzîtiya li dijî mirovên kal û di kesetiya wan de ya ku li civakê bû. Bi vê yekê re, wê Ahlaq, hertimî, weke xalak pirr mazin li pêş bê. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku her mirovê ku hizra xwe hanîna li ser ziman, weke yekî pîroz jî hatiya dîtin ji ber wê ahlaqiyê. Bi wê re, hizrên wan, hizrên olî jî, ji temen rastûrast kifşkirina. Di çanda Kurd û wêjeya wê de, Nebî Nuh´ê ku hê tirba wê li Cizira botan ya, û Birehimê xalîlê ku ji rehayê bû, bandûra wan mazin e.

Li ser wê re, piştî Mediya re, wê Şadadî, welatê xwe ava bikin, û bi demeka ku ne bin dusadsalî re wê çandeke xwe ya demî li gor demê wê bi afirênin. Misilmanetî, di dema wan de derdikeve û wê bi wan re, wê di dema wan de li Kurdistanê bicih bibe.Misilmentê, ji ber ku nirxên li ber Diclê û Firatê ji xwe re dike pêşeng ên weke Nebî Nûh û Birehim Xalîl, wê li ser wan re zor nebê ku li Kurdistanê pêş bikeve.

Ev dem, wê weke demeka nû bê. Çend ku wan nirxên berDiclê û Firatê misilmantiyê esas digirê jî, wê piştî çûna ber dilovaniya xwe ya Mihemed re, wê êdî bi hêzî û artişî hatina li Kurdistanê di bin şêrkêşiya Xalid bin Welîd û

hwd de wê bibe. Navên din yên olî, yên ku misilmenetiyê ne hildana nava xwe, wê werina qadaxakirin. Ola Êzîdîtî, ji wê demê û pêde, êdî hin bi hin ji pergaltiya civatî dikeve. Lê çanda wê, hebûna xwe dide jiyîn û berdewam kirin. Mirovên weke Ebû Henîfe Dînewerî, Îbn Quteybe, Evdilsemedê Babek û

Şihabedînê Suhrewerdî û hwd wê derkevin.

Kurd, wê bi Şedadiyan re, Misilmantiyê nas bikin. Lê di demak kin de wê bi wê re pêşketina mazin bi xwe re bdiina jîn kirin. Dergahên olî di afirin û di wan de ol, li herêmê pêş dikeve. Şêx, weke serokê olî derdikevin. Ji devê wan, bi awayekî wêjeyî, wê ol were vegotin. Qasîde, wê ji wan derkevin. Qasîde, mirov divêt ku bibêje ku weke binaterna olî na, lê wêjeyî na jî. Minaq, ji devê Zanistekî ku Kurd bû Bawe Tahirê Uryanî, wê wêjeyeke mazin ya Kurdî ya dema ola misilmnetiyê wê were kirin. Rengê jiyanê, ew wê bi gotina xwe ya wêjeyî, wê di nav xelkê de bicih bikin. Di demên gelê piştre de, wê mirovên ku hem oldar û hem jî bi hizra xwe ya ku tênin ser ziman re fîlozof ên weke Elî Herîrî wê derkevin.

Di van deman de, her dergah, mirov karê bibêje ku bi pirtûkên bi Kurdî yên ku têde na, weke ku xwediyê pirtûkxaneyeke xwe ya taybet e. Her şêx, bi hezaran pirtûk di bin destê wî de na. Bi wê yekê, ew zanîna civatê di destê xwe de digirê û pêşavaniyê jê re dike. Wêjeya Kurdî, di vê demê de, wê dergah, ne tenê weke dibistanna ku mirovên civakê perwerde dikin, weke cihna pêşketina wêjeya Kurdî jî bin.

Piştî Şadadiyan re, wê dema Merwaniyan, wê li Kurdistanê pêş bikeve. Merwanî, wê serweriya desthiladariya xwe ji Kurdistanê bi buhurênin. Li herêmê, weke rêveberiya misilman ya xort wû pêş bikeve. Piştre Salahedinê Eyûbî, wê li ser wê serweriyê re bibe xwedî hêz û qûdret. Wê hêzeka herêmî bide afirandin. Dema Merwaniyan û Salahedînê Eyûbî, dide nîşandin ku Kurd, di pêşketina çand û gotina xwe ya wêjeyî de xwediyê pêşketineke hemdem in. Bi wê re, mirov karê bibêje ku xwediyê temenekî pirr mazin ku karin li ser mazin bibin. Herêmê botanê, di heta demî wî jî, wê ewder wê navendîtiya xwe ya çandî bidomêne.

Çand, ji aliyekî ve, mirov dikarê weke hişê mirov ê afirî ê di jiyanê de jî bi aqil re werêne ser ziman. Her wisa çand, dema ku mirov weke gotineka li ser aqil re werêne ser ziman, wê bi awayekî zanîna mirov a ji jiyanê û jiyankirinên mirov bê. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov hewl dide ku gotina ´hiş´ hilde li dest û fahm bike, di vê çerçoveyê de bi wê hewldanê û fahmkirinê re wê ev jî bi jiyanê re xwe bide fahmkirin. Bi hiş re fahmkirina çandê û hwd, wê temenê afrîneriyekê jê bê bi wê re. Her wisa di vê çerçoveyê de wê aqilê mirov, bi wê re xwe bi zanebûnî bike û biafirênê. Hiş, wê li ser zanebûnê re weke afirandineke aqilî jî bê. Di vê çerçoveyê de di nava gotinan de ku mirov bimeşê, mirov wê wê li ser aqil re bimêşê. Di vê çerçoveyê de em li ser ´hiş´ hişkirinekê bi zanebûnî bikin.

**Hiş**, pir li ser têt axiftin. Ji xaynî vê yekê ji, Bêjeyeke ku pir têt bikaranîn. Di jiyanê de ji, wate wê, bi hizir kirinê re derdikeve hole. Hiş, bêjeyeke ku hîmê xwe ji ´hii´ digirê. Hii, degekeke. Lê di wate wê de, di mejî de hinek zanebûne û hizrên ku hene ji anîne bîrê ye. Bi vê yekê re, mejiyê biçûk mirov bahsa wê dike. Mejiyê biçûk, têde pir hizir rewş hene. Lê hatina ji bîrkirin. Hinek gotin û cerna hinek dîtin, dike ku ew hizir û rewş werine bîre mirov. Bi vê yekê re, ew bêje, an ji dîtinên ku tênine bîre mirov, weke miftên hişin ji. Ji xaynî degekekê ji bi bîr anîneke ji. Ji ber vê yekê pir divêt ku mirov li ser Bi sekinê. Hiş, di felsefe de bêjeyeke ku pir girînge. Hiş, herdû aliyên wê yên weke bûjen û arîşan, bi hev re diafirênin. Bûjenî, yên ku diafirinin û tên hole ne.Bi vê yekê re, ku afirandin û hatina hole çêbû, êdî mirov di wê pêvajoya dawiyê ya bûne de careke dî bahsa hebûne bûjenê bike. Ji bûyin bûya. Piştî bû, êdî ya bûyî heya. Ji bûjeniyê gahana arîşanîtiyê û ji arîşanîtiyê buhurîna bûjênîiyê, di vir de bi hiş re ji wateyeke wê heye.

Hiş, li ser hebûne hişmenditiyê ava ye. Jî aqil bi bîrkirin, hiş têne ser ziman. Ji aqil bi bîrkirin, hişkirine. Hiş û hişkirin du bêjeyên jev cude na. Hiskirin, bi du wateyan xwe dide der. Wate pêşî hizirkirina. Yanî, ew ji li ber çav girtine.Wate wê ya dî ji, her weha bi bîrkirina. Yanî, hatina bîra. Di felsefeye Kurdî de, bêje hiş, bêjeyeke ku pir girînge. Pir zanistan ji li ser serî wastandiya.Di jiyanê de, car bi car di wate hatina bîrê(aqil) de ji têt bi karanîn. Lê ku bi wate ji têt bikar anîn, dema ku mirov li avayê bikaranîne dimeyîzenê, mirov dibêne ku ne tenê di wate aqil de têt bîr karanîn.Ji xaynî wê yekê ji, weke ku car bi car wate bîr ji, bi hinek awayan dikeve nav wê wate wê ya ku têne ser ziman de. Bi vê yekê re divêt ku mirov baş li ser bi sekinê. Weke bêja ji hiş, di jiyanê de dema ku tê bi kar anîn, car bi car di wateyeke dî de ji têt bi kar anîn. Di wate deynekirine de têt bikar anîn. Minaq, cerne ku dêyek ji zaroka xwe hêrs dibe, dibêjiyê de´ hiş ba´. Carne ji, ji bo ku hinek li hinek tiştne bi hiseênin û hineke din ji di ber wan de bi peyivin, di wê heyeme de, ji wan re têt gotin ´hinekî hiş ba, ka ez lê vê bihênim´. Her weha hê bi gelek wate awayan ji têt ser ziman.Lê hiş di vir de emê li ser wate wê ya hizir bi sekinin.Ew wate wê girînge. Hiş, bi mirov re bi hîme ji. Di mejiyê mirov de, ji bo ku hiş bê kirin û bi wateyeke dî ji ji bo ku hiş bi pêşbikeve cihê wê hene. Ew cih, di xwe de gelek pêşketine dide çêkirin.

Ew pêşketinên ku çêdibin ji, bi mirov re di şaxsiyete mirov de didine nîşandin. Hiş, ji xaynî vê yekê ji, aqilê mirova.Ku mirov hizir kir, Mirov di aslê xwe de hiş ji dikê. Zanistvanê Kurd Feqiyê Teyran, hiş weke beşek ji pêşketine aqil dibine. Bi vê yekê re, dema ku hiş têne ser ziman, bahsa dîtine dike.Dîtin, li gor wî di hişkirinê de pir girînge. Hiş, bi xwe re di jiyana mirov de ji hertimî pir afirandina tênet. Di gelek beşên jiyana mirov de xwediyê kifşkirineke mazina.Zanistên Kurd, yên dema sadsala 15, û 16, pir li ser vê yekê sekine. Wan bi hiş, weke ku kevneşopiyek dianî ser ziman.Ji xwe, dema ku mirov li dîroke hizir ya Kurdan dimeyîzenê, mirov kevneşopiyeke ji bi hiş

re di bîne. Di dema Medan de, remilvan hebûn. Wan, di nav xelkê de geleki û gelekî deng dabû.navê wan hebû.Wan, li gor xelkê, pêşiye mirov di dît.Wê di pêşiye mirov de wê çi derkeve pêşiye mirov, wan didît. Bi vî awayî, li wan dihata bawerkirin. Ew mirovne ku xwedi hişmedî bûn. Bi vê yekê re mirov karê bêje navê wan hebû. Hişkirin, vê yekê re, di dema wan de, di wateyeke dî de bû. Di wê wateyê de bû ku mirov karê xwe bigihine paşaroja xwe ji. Wan li ser vê yekê wateyeke hiş ava dikir.Wê wate de, rênîşan hebû û remilvanê wê rênişanê hebû. Remilvan, hizir dikir û bi hizirkirine xwe re xwe digahanda ew nişanakên ku wê rêyê bide ber çavan. Li gor remilvanên Mediyan, di serê mirov de ji bûne, hin hizir hena. Bi hizirkirinê wê bêne hişê mirov.

**Li vir, di dewama wê de dema ku mirov li mengîweriyê**û ankû felsefeya **mengîweriyê** an jîkû li **îdealîzm dihizirê**, mirov dibînê xwediyê dîrokek mazin û kevn e. Pirr dîrokzan û hizirzan li ser hizre tênine ser ziman û ani ser ziman. Lê ti kesekî heya naheke xwe ne gahandiye dewiyê ancama wê. Ji ber ku fersefe mengîwer, li ser baweriye xwûde ava ye. Ji bo ku mirov xwe bidigihê wê amcama dawiyê, divêt ku mirov xwe bigihinê hizre xwedê ji, ji ber ku ev yeke nebe, êdî xwe gahandina dawiyê wê ji nabe.Dîroke giştî ya mirovahiyê de pir filozofên mazin derketine û hizre xwe li ser vê felsefe anîne ser ziman. Felsefevanên ku têne ji vê koma felsefê re felsefecîti kirina derketine.

Di demên berî zayîne de, filozofên weke Artîstoteles û Platon yên ku weke felsefevan yên ku hizre xwe herî mazin û kur anîne ser ziman bûn. Pişt wan re ji gelek filozof derketin û hizre xwe di wê xata felsefê de anîne ser ziman. Yên ku herî mazin nav dan, weke Spinoza, Calvin, Berkeley û pişt wan re ji Hegel bû. Felsefezanên weke Êlî Herîrî û Mela Hisênê Bateyî û Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran ji derketine û di dema xwe de nêzîkatiyeke hemdem lê vê felsefe kirina. Van felsefeciyan û hê gelek felsefeciyên weke wan, li ser vê xata felsefe hizre anîne ser ziman û kur kirin.Ya rastî ku mirov li ser vê xata felsefe dihizirê mirov gelekî û gelekî hizreke kur û mazin dibine. Ji xayni vê yekê ji mirov dîrokeke ku pir mazin dibine.Dema ku mirov li ser hizre mengîwerê dihizirê, hingî, mirov rastî dîrokeke mazin ya hizir têt. Ew dîrok diçêt ta dema serê dîroka mirovahiyê.Destpêka vê hizrê, bi destpêkê, derketine hizre olê re dest pê dike. Berî ku mirov bi kevine dema şariştaniyê de, hêdî hêdî hizrên wan çêbûn. Hizrên ku ´xwedê heya´ çêbû. Dema ku mirov di serê xwe de xwe gahandina wê hizrê, hingî êdî bidest hizirkirine sr xwûde kirin. Hizirkirine ser xwûde, di serê mirovan de gelek hizir dana çêkirin. Gelek hizrên ku jiyana wan bi rê bibin û wan bi pêş bixin di serê wan de çê bûn. Bi vê yekê re, mirov karê karê bêje ku ew xate hizir, bi destpêka pêşketine mirovahiyê re dest pê dike.

Hizir, di pêşketine hizir de, bi hizrên weke hizre ´xwedê´ re hinek pêvajoyên pêşketine di buhurêne. Ew pêvajo, hemû bi hev re hizre xwedê di ancama xwe

de diaxifênin.Bi vê yekê re mirov karê vê yekê ji bêje ku hizir, çend ku hizre xwûde di serê mirovan de hinekî dî zelal dibe.Mirov, êdî di serê xwe de xwe digihênine wê hizre ku ku xwûde heya.Ew ancameke ku pir mazina di pêvajoya pêşketine hizir de.Lê ku xwûde hebe ku ´li kuderê ya´ û ´ka´ ye. Herweha hinek pirs ji di serê mirovan de bidest çêbûne dibin.Ew ji, bu xwe re hinek pêvajoyên din têne. Pirsa ´ka´, di serê mirovan de çêdibe. Bi çêbûnê re, lêgerîn dest pê dike.Lê berî ku mirovahî di vê xata vê hizrê de werê wê astê hinek pêvajoyên din di buhurêne.Weke pêjoyayên ´xwedê-mîr(´king´).Mîrên ku derdikevin ji, xwe weke xwedeya danezênin.Bi vê yekê re, weke demeke weke ku hizre xwûdê tê bibersivandin. Lê ku hinek dem têve diçê, êdî hin bi hin zanabûna mazin dibe û hizir hinekî dî derdikeve hole, êdî hizre ´afiradinê´ derdikeve hole û di dawiyê wê hizrê de ji pirse ´kê´ têt pirsîn. Bi vê yekê re, êdî ku li bersive wê pirse tê lêgerîn, êdî dema xwedê-mîran ji bi ber dawiyê ve diçê. Hin bi hin êdî demeke dî diafirê. Ew dem ji, li ser Hizre xwedê ya.Ew hizir ji piştre her weha têt formûlakirn, têt ku gotin ku ´ yekî ku mirov diafirêne û çêdike heya´.Bi vê hizrê re, êdî têt têgihiştin ku ewê ku mîre ku dibêje ku ´ez xweda´ me ji, yekî ew ji afirandiya.Bi vê yekê re, êdî li xwede lêgerîn dest pê tê kirin.Di dema xwûde-mîran de xwûde li ardê bû.Ji ber ku wan xwe xwûde daneza kiribû.Lê ku têt têgihiştin ku ew mirova ne xwedaya, êdî piştre têt têgihiştin ku xwede li azmana ya.Bi vê yekê re, êdî têt hizirandin.Bi vê yekê re, êdî hizre ku ´ew afrînerê hertiştî ya´diafirê.Bi vê afirandinê re êdî xwe dana fahmkirin û têgihiştine wê hizrê çêdibe.Lê hê ji hizre xwe gahandina hizre xwede ji hole ranabe.Mirov, hê ji di xweze xwe bigihinê wî û hizre wî. Bi vê yekê re, hizirkirin, lêgerîn û çûnûhatin çêdibe.Divêt ku mirov ji bîr neke û bêne ser ziman, ku hizre xwede, di wê de di nav mirovan de wan digihê hevdû û wan bi hev re di gihinê pergaleke navxweyî. Êdî mirov di nav xwe de bi pergal jîn dibin.Bi vê yekê re, divêt ku mirov di cih de ji bêne ser ziman ku êdî dema çêbûn û pêşketine şariştaniyan de ji diafirê. Bi vê yekê re, divêt ku em êdî bahsa çêbûn û pêşketine şariştaniya sûmeriyan bike.Dema ku mirov bahsa şariştaniya sûmeriyan bike, divêt ku mirov vê yekê bêje ku sûmeriyan ´dewletê xwede´ ya pêşî avakir. Sûmeriyan, di dîrokê de gava pêşî avêtin. Wan bi vê yekê re, navê xwede, li azmana bicih kir û li ardê ji bi avakirina şariştaniya xwe re xwe kirina nimînêrên wî li dinyê. Bi vê yekê re, êdî bi wan re demeke nû ji ji bo mirovahiyê dest pê kir. Dema şariştaniyê, ji vê xata felsefe û pêşketine wê û di nav mirovahiyê de bicihbûna re demeke girîng diafirêne. Bi vê yekê re hizir ji bi pêş dikeve. Mirov bi pêş ve diçê. Çend bi pêş ve çûbûn bû, êdî bi pêşketine hizir re pirsîn çêdibe. Bi pirsîne re, êdî bi hizir re, lêgerîn û hizir dest pê dike. Lê berî ku em her weha di afirandina rêzên xwe de pêde herin, divêt ku em vê yekê ji bêjin. Derketine olê, divêt ku em bênine ser ziman. Ji ber ku ew ji demeke nûya di vê pêvajoya pêşketine de. Ne tenê ji bo vê xata hizir, ji bo mirovahiyê ji demeke nû ye. Ol, ku mirov bi çend gotinan bahsê bike, mirov

wê bibine ku di pêşketinê de û di pêşketine hizir de demeke pêşketi ye. Dema pêşketine şariştaniyê ye. Ol, bixwe ji, dibe bîrdoziya şariştaniyê bi hebûn û pêşketin û hizre xwe re. Bi olê re, pergalbûn ava dibe.Pergalbûn ji, hîmê şariştaniyê diafirêne.Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku hizre mengîweriyê, bi pêşketine xwe re, her weha demên pêşketinê kifş dike. Di demên nû yên ku tên ji, êdî ´olperestî´ û ´olperestvan´ derdikevine hole.Olperestvan ji, olperestiyê dikin. Ew, di rastiya xwe de, filozofên wê hizrê yên herî mazinin. Dema pêşketine olan ji bi sê pêvajoyên demdirêj dibe. Dema pêşî, ku di serî de hê ku mirov ji nû ve bi hizir dibe ye. Di vê demê de, ji ber ku hizir bi pêşneketiye, û ku hin bi hin hizir bi pêşdikeve, êdî tişte ku dibine û nasdike, ji xwe re weke xwûde an ji afrîner dibine. Ev dem ji, dema totemê ye. yanî dema dageriya ne. Dema duyem ji, dema mîtolojiyê ye. Ev dem ji, bi totem û dariyên dema pêşî ku bûna bi watekirin û bi hizirkirin û bi xwe xwûda danezandina mirovên mîr re bi pêş dikeve. Dema sêyemîn ji, bi fahmkiiriin û têgihiştine wan dagerî û totem û mirovên ku xwe xwede daneza û kifşkirine ´hizre xwûdê´ re diafirê. Ev dema sêyemîn, dema olana.Êdî ol derdikevin. Êdî têt têgihiştin ku ´xwedayak heya ku hemû kesî û tiştî´ diafirêne. Bi vê yekê re, êdî dema olan dibe dema vê demê.Bi vê yekê re, gelek mirovên ku bi hizirin û bi hizirkirne xwe re mazin dibin ji, hizrên vê demê diafirênin. Ew ji dibine filozofên hizre mengîweriyê. Li gor, van pêşketin û dema, gelek dem û pêşketin û pêvajo êdî diafirin û jîn dibin. Weke ku ji bo wan deman bê bi navkirin, têt gotin Mezopotamya û iro navê wê Kurdistan e, navende van pêşketina na. Hersê olên mazin, yên ku van deman de derketine weke cuhutî, filahî û musulmantî hîmê xwe li vederê diavêje û derdiekeve û bi pêşdikeve û mazin dibe.
Naqabine, Dicle û Firatê, weke navendeka mazina ji wan pêşketinan re. Weke du navendên mazin ji li ber Diclê Cizîre bota ku warê Nebi Nuh a, û li ber Firatê ji Rihe ku warê Îbrahîm Xalîl a, divêt ku mirov di vir de bi navkê û bêne ser ziman. Piştî pêşketine li van herêman re, êdî pêşketin digihê rojava û herêmên din. Êdî li wan deran ji mirovên ku wan pêşketinan mazin dikin derdikevin.Hizre mengîweriyê, hizrek ji wan hizre na ku hîmê xwe ji van navendên digirê ya

**Pêvajoyên pêşketina zanebûnê**

Zanist bi awayekî giştgir tevahiya wê zanîna îroyî yan ya demekê dî yê mirovî vedigire ko bi şêwazên weha bidest hatiye ko dikarin bihên selmandin û îspatkirin. Bi awayekê nemazeyî û bertesik, zanist ew dozen anko sîstema bidestanîna zanînê ye ko li ser bingehê ezmûnbaweriyê û empîrîzmê, ceribandinan û ezmûnan, û xweristbaweriyeka (naturalîzm) şêwaznasane bidest hatibe. Zanîn ku em behsa wê bikin, divê ku em ta destpêka mirovatiyê

herin. Bi taybetî, zanîna me, em ji demên şariştaniyê û pêde, bi pergalî tênin ser ziman. Di demên ku weke dema aqil jî, ev tên hesibandin. ..

Lê di dema ku behsa zanîn û têgihiştina di hundirê wê de tê kirin jî, pirr zêde, dîroke wê dihê dirêj kirin. Ev dîrok, di mejiyê mirov de, di dema ku mirov bidest aqil kirinê kir û êdî hizirkirina wî pêşket, dihêne ser ziman. Aqil ji dema sumeriyan destpêka wê pirr mazin pêşketiye, Di wê demê de, ku weke demeka şariştanî jî ya, aqilê bi pergal heya û di temen û rengê mitolojiyê de tê ser ziman. Lê di dema sumeriyan de, nivîsên bizmarî hena ku hatina nivîsandin. Bi wan nivîsên bizmarî, jiyane, bawerî, hizir û têgihiştinên xwe bi têgihiştinî nivîsandina. Dema sumeriyan, weke dema pêşî ku têde tîp hatina kifşkirin û bi wan nivîsandin pêşketiye. Dema sumeriyan, weke destpêka wê nivîsandina mirovatiya jî tê dîtin. Care pêşî, wan nivîsandiya. Wan bidest nivîsandînê kiriya. Piştî wan re, êdî demên weke demên şariştanî, wê zûtir pêş bikevin. Ji ber ku sumeriyan bi kifşkirina tîpan û bidestkirin, êdî ew nivîsandinên wan bûna temenê pêşketinên piştre.

Li ber Diclê û Firatê şaristaniyên gutî, Hurî û mitaniyan pêşketin. Wan jî, gelek demên pêşketinê buhurandin. Aqilê wan mazin pêşketibû. Di nivîsandin. Gutî, hurrî û Mîtaniyan, di demên xwe yên pêşketî de bidest bikarhanîna çerm jî kiribûn. Ev wê heta dema Mediya jî wisa were.

Di dema gutî, hurrî û Mîtaniyan de, ya ku em kifş dikin ku wan pêşketinake mazin di nava xwe de jîn kirina. Piştre jî, wan aqil bi vaca wê û ankû bi mentiqê wê bidest karhanîna. Minaq, Mîtra, wê weke destpêkak giring bê di vî warî de, pergale olî jî êzdatî ye. Piştî Mîtra re, wê Zerdeşt were û Zerdeşt wê li ser wê pêşketina Mitra re wê pêşketina xwe bi hizrên xwe yên ku nivîsandina bi navê Avesta wê bêne ser ziman de, wê bide domandin. Zerdeşt, hizrên wî, di dema wî de wê bandûra wan li hewirdora wan jî bibe. Bi teybetî li ber behra Reş li Hallesê wê ev pêşketin pirr mazin xwe bide diyar kirin.

Ev dem, wê weke demeka giring ku dibê temenê pêşketinên hizrî û wejeyî û helbestgerî jî. Avesta, li gorî ku bi devkî tê gotin ku li ser 14 hezar çermî tê nivisandin. Hin vegotin jî dibêjin ku li ser 18 hezar û hin vegotin jî behsa 22 hezar çermî dikin. Ev nivîsarên wisa dirêj wê bale mirovan bikişênin û bike ku mirovên ku bi aqil ve mijul in werin û wan bibînin û bixwênin û jê sûd vergirin.

Med û Medya, wê demeka aqil bê. Bandora wê, wê li ser hem dema wê û pêşûketinên dema wê û hem jî pêşketinên piştre ên ku dibin wê bibe. Xate ku bi Mediya tê û bi hizrên Zerdeşt re pêş dikeve, wê heta dema manî, wê ser 800 salî re pêşketina xwe bijî. Piştre di dema manî de jî, wê manî jî bi heman rengî ne bin 300 salî re wê pêşketina xwe li ser wê xate bijî.

Di vê demê de, wê dema şariştaniyê ya bi aqil û bi aqilê bi rengê "felsefe" bibe. Di vê demê de, weke destpêka felsefê bi fîlozofên weke Thales re tê kirin. Piştî wî re Anaksîmanes û Anaksîmandres tên û hizrên wan jî bandûrekî û temenê diafirênê. Thales, bi salan, weke Heredot, wê li welatê Medya

bimêne û hizrên xwe di serê xwe de li wir mazin bike. Di dema ku Şerê Medya û Lîdya li ber Rûbara Sor bû jî, Thales di wê demê de li wir li rexê Medya bû. Piştî Thales û van herdû fîlozofên piştî wî re, wê fîlozofên weke Sokrat, Platon, Arîstoteles û hwd wê werin. Sokrat, weke fîlozofekî mazin tê dîtin û gelek hizrên wî bi rêya nivîsên ku Platon hildan penûsê mana roja me. Platon, Sokrat weke mamosteyê wî jî tê zanîn. Piştî Platon re, wê li wê dibistan wî, ku mazin dibe wê Aristoteles wê were û wê hizrên wê xwe bêne ser ziman. Bi felsefe, rewîst, derûnî û hwd, wê di gelek waran de serî biwastêne û wê hizrên xwe bêne ser ziman.

Ev hersê fîlozof, wê demekê bi aqail bi xwe re bidina destpêkirin. Wê dema felsefê bidina destpêkirin. Wê şariştaniya aqil bidina destpêkirn. Piştî wan re, demeka dirêj, wê dîrok ser aqilê wan re pêş bikeve. Bandûra wan, wê bi gelek awayan li ser têgihiştinên ku diafir in, wê werina ser ziman.

Serdema navîn, piştî zayinê, di sadsale 5'an û hwd pêde dest pê dike. Heta sadsale 12'an weke dema wê ya pêşî tê zanîn. Dema wê ya sêyenin jî, ji sadsale 12'an ta sadsale 14'an û ankû 15'an, ku dema ronasansê destpê dike. Di vê demê de, weke demeka xwandin û fêrbûnê bê. Di temenê wê fêrbûnê de, wê pirtûk, nivîsar û hwd, ên ku berî zayinê û pêde hatina nivîsandin û hizrên ku afirîna, wê werina xwandin û fahm kirin, Li ser wan re jî, wê êdî derketina ronasansê were û bibe.

Di vê demê de jî, wê zaneyên weke Spinoza, û hwd wê derkevin. Kopernîk, wê li ser astonomi û dunyanên dervî me serî wastêne. Li rojhilat jî zaneyên weke Elî Herîrî, Ibn Sîna, Ibn Ruşd, wê derkevin û wê bandûra wan bi felsefe wan re mazin bibe. Her wisa îmamê Xezalî ku bi aqilê xwe li gorî hin alimna ku faris bû û ku li gorî hin alimna jî tê gotin ku Kurd bûya û ji ber vê yekê jê re îmamê Xazalî hatiya gotin, kartêkirina wan mazin e.

Li rojava, wê zaneyên weke Kopernik, Galileo, Bruno û hwd wê derkevin. Hizrên ku ew dihênin ser ziman, di warê felsefê, astronomî, fizik û hwd de, wê demeka nû ku bi navê "dema aqil" wê bide vekirin. Piştî ku dema aqil ku ankû dema ronasansê destpêkir, wê êdî ji felesefê bi ber zaniyariya felsefê ve dem herê û bi herike.

Gelileo yek ji destpêkerê zanista dema modern a Dema ronesansê, ji xwe bi navê wê kifşa. Wateya navê wê, *ji nû ve bûyîn e.* Di vê demê de, ji aliyê aqil ve pêşketina mezin dibe. Di jiyanî de, huner, çand, wêje û hwd jî pêş dikeve. Roman, tên nivîsandin. Cervantes, wê romana Don Kîşot dinivîsîne. Weke wî gelek mirovên din diderkevin. Huner û wêje pêşdikevin. Piştre di qada avadaniyê de demeke piştî dema ronasansê tê, ku zanist jê re dibêjin dema barok ku weke kûrbûna dema ronasansê jî tê dîtin û şîrove kirin. Di vê demê de peyker, huner û avadanî û hwd pirr zêde pêş dikevin. Nîgar û çêkirina wan, bi destê yên weke Leonardo Da Vinci, Michelangelo û hwd wê pêş dikeve. Nîgarên ku ew çêdikin, wê piştre weke nirxa hunerî ya giranbuha werina dîtin.

Piştî dema ronsansê, zanistên weke Descartes, Bacon û hwd diderkevin. Bandora wan bi teybetî di felsefê de xwe dide der. Ew felsefeyê bi jiyanê re pêş dixin. Lê felsefeya wan dibe temenê zanîsta mezin û ankû felsefeya zanîstî jî. Di vê demê de fîlozofên weke Jean Calvin, George Berkeley û hwd diderkevin û nêrînên nû di aqil de didina çêkirin. Ev filozof, xwediyê rêbaza bi navê îdealîzm bûn. Ji bilî vê rêbazê, materyalîzm (ango pêzewarî) bi pêş dikeve. Piştre jî, wê hin bi hin kutubên din jî pêş bikevin. Mînak, emprîzm û hwd ku zanistên weke John Locke, David Hume û hwd pêşengiya wê dikin pêş dikevin. Piştre jî, li ber wan gelek zanistên din jî diderkevin.

Zanîn, weke beşeka giring ku divê ku mirov bi dema ronansansê de bêne ser ziman. Ev zanîna ku di vê demê re bi ronansansê re tê ser ziman, rengê wê li ser felsefe û lêkolînkirin l ser felsefê ku ser fêran û cerban re ye. Yanî, bi awayekî gin û gotineke din, felsefeya zanistî, pêş dikeve.

Di dema ronasansê de, bi pêşketinên wê yên piştî wê re weke pêşketineke giring wê weşangerî û ankû "matbaa" pêş bikeve. Êdî wê pirtûk, werina weşandin, bi pirr minaqên wê re. Ronasans, ji vê re jî, bûya xwediyê destpêkekê. Çand, pêş dikeve. Ji xwe, gotina "netew"tiyê wê piştre li ser vê rewşa çandî û hwd re, wê rengê xwe bi pergalî û pêşketiniya xwe raxê li berçav. Ev dem, weke demeka destpêka pêşketina netewtiyê û pêşketina wê jî hatiya şîrove kirin.

Aqil, li ser temenê fêr û cerbê pêş dikeve. Mirov, ji bo ku kifş bike ji cihekî diçina cihekê din. Hertimî, mirov dixwezê ku tiştên nû bibîne. Bi wê re jî, milletên nû jî dibînin. Hevnasî û pênasî dibêt. Bi vê re, lis er aqil re, demeka serdestî û serweriyê wê hin bi hin li gorî wê pêşketinê û asta wê pêş bikeve.

Dema barokê, weke demeke ku tê gotin, herî zêde dema awadanî û mînariyê ye. Di vê demê de, ser wê re huner pêş dikeve. Bi wê rengê, Barok, weke demeka hunerî jî tê nasîn û bi nav kirin. Li ser wê re, êdî wê hizrên nû û beşên nû ên hunerî û awadanî pêş bikeve.

Ev dema barokê, herî zêde weke dema wê sadsale 17'min û hwd tê hasibandin. Piştî wê re jî, dema aqil wê bi pirr awayên xwe pêşketina xwe bide çê kirin û pêş bikeve. Dema Barok, weke ku ji vê re jî, dibê temenekî şenber ku bi awadanî û minaritiyê hatiya çê kirin e. Aqilê demê ku fêr û cerbê ji xwe re esas digirê, vac û ankû ku bi navê wê yê din mentiqê bêhtirî li pêş û esas digirê. Ev jî, dike ku bêhtirî bi nerînê re fêr û cerb derkeve li pêş bi qiymettir bibe.

Dema zanistê, weke dema ku piştî dema ronasanê û barok ku destpêkiriya û dîroka wê ji sadsale sadsale 18'an û hwd tê dest pê kirin e. Di vê demê de, wê felsefe û ankp felseyefeya zanist êdî bi metodên xwe derkeve li holê. Minaq, felsefeya diyelektikê yek ji wan felsefeya. Her wisa, êdî di vê demê de wê bi tememî zanist pêş keve. Zanista ku li ser esas û temenê cerîbandinê êdî pêş dikeve. Dema zanistê, weke dema aqilê ku ji di ancama ceribandinê de hatî bidest xistina jî.

Piştre zanistên weke Kant, Hegel, Marks û hwd wê derkevin û wê hizrên xwe bênina ser ziman û wê bihizrên xwe re demekê bidina destpê kirin. Zanyarên weke Albert Einstain, Sigmond Freud, û hwd, wê demekê bidina destpê kirin. Einstein bi fizikê wê hizrên xwe bêne ser ziman Teoriya Dîtbarî û ankû 'rolatîvît' ya wî ye. Fureud jî psikanalizê pêş dikeve. Piştre Marks Blank, wê Kuantumê, teoriya wê bi ya fizikê çê bike.

Ev dem, weke dema sadsale 19'an jî tê binavkirin. Sadsalên 18'an û ya 19'an weke sadsalên zanist û pêşketina wê na. Piştre jî, wê ev pêşketina van sadsalan wê heta sadsale 20'an jî bidomê. Di êdî di sadsalan de, wê felsefe bi rengê felsefeya zanist û ku bi tememî li ser esasê ceribandinê bi rê ve diçê û pêş dikeve wê bi pêşve biçe. Ceribandin, êdî weke rêbazeka giring ku di de kifşkirina. Di ancama wê de, fizîk, teknolojî, biyolojî û hwd, weke beşên ku bi zanistî pêş dikevin in. Di ancama wê zanin û zanist û felsefe û û dîroka wê de ev pêşketin dibêt·

Rêbazên felsefekî, rêbazên fêr û cerbê bûn. Bi teybetî, weke rêbaza vacê û ankû mentiqê, wê di temenê dîtin û bi çavdîtinê re wê pêş bikeve. Li ser wê re jî, di temenê fahm kirina wê de, naskirin û bi wê re fêrbûn, wele rênbazê wê ya bû.

Ev rêbaza cerbê û fêrê, wê piştre jî, pêş bikeve. Li ser wê re zaynarî wê pêş bikeve. Zanyarî, di temenê ceribandinê de û bi wê re weke ku di roja me de tê gotin "deneyê" re pêş bikeve. Bi wê re, bi zaynariyê re di temenê ceribandin û deneyê re, care pêşî, gotina "kûbay" ketina jiyanê de. Kûbay, weke jînda û ankû mirov jî bê ku di nav de, tişta ku li ser wê bi ceribandinî rêzbaz tê pêşxistin e.

Teknoloji, divê ku mirov weke ancamake giring ku di ancama wê pêşketina serdem û dema zanistê de ye. Teknoloji, bi wê êdî serdestiya wê li jiyanê bûya. Înternet pêşketiye. Bi wê re gelek cûreyên din ên teknolojiyê pêşketina. Serdema pêşiya pêşketina teknolojiyê di sadsale 20'an de destpê dike. Lê serdema wê ya duyem ji sale 1950 û hwd, dest pê dikiriya û di vê demê de rengên teknolojuyê û awayên wê pêşketina. Înternet yek ji wan e. Telefonên berîkan yek ji wan in. Şandina peykan li azmana bi ragihandin û TV'yan û hwd jî bûya.

Lê teknoliji, bûya temeneki giring bû pêşketina bilojiyê jî. Hemû amûr û tiştên ku bi wan lêkolîn tê kirin bi kifşkirinên teknolojiyê û teknikî re pêş dikeve. Minaq, amûşrên lêkolînî ên bo biolojikî û hwd jî ji wê na.

Teknolojî, wê zewecek mazin ya dîrokî bi bîolojiyê re bike. Her wisa divê ku mirov werêne ser ziman ku wê bi hevdû re pêşketinekê bidina jiyankirin. Bi wê redi pêşketina hevdû de wê pirr zêde ji hevdû re alikar bin. Lê her pêşketina ku bû jî, wê ne tenê yekê wê herdûyan pêşbixe. Wê di vê çerçoveyê de teknolojî û biolojî, wê pêvajoyên teknikê û hwd, wê bi hevdû re bijîn.

Biyolojî, di dewama wê de pêş dikeve. Lê biyolojî, ji wê pirr sûd digirê. Îro, weke ku çawa gelek cûreyên teknolojiyê weke înternet û hwd pêşketina, her

wisa, di qada biolojiyê de jî, pêşketinên weke genetikî ku weke şoreşê tên hasibandin di vê warê de bûna.

Îro, li ser pêşketinên biolojiyê re, di qada beşkirin û ankû şifakirinê de û dermankirinê de jî, gavên mazin hatina avêtin. Bi wê re jî, ji nexweşiyên weke pênceşêrê û hwd re jî, li ser çareyên wan ku wê çawa derman were kirin û başkirin bibe, li ser lêkolîn tên kirin. Bi wê re jî, li ser dermanan jî, lêkolîn tên kirin. Pêşketinên weke genetik û hwd jî, ji van re derfeteka mazin diafirêne ku werina pêşxistin. Genetîk, di salên 1960'î hwd de, ji aliyê Creg û Biston ve hatina pêşxistin. temenê wê hat avêtin. Piştî wan re jî, li ser lêkolînên wan re lêkolîn hatina kirin û pêşketinên hê maztir bûn. Lê ew weke destpêkê bûn.

Bandûra biolojî û teknolojiyê li civaknasiyê, wê pirr zêde bê. Divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku wê di hûrgiliyên wê ên jiyanî de pirr zê de xwe bide diyarkirin. Civaknasî, ji wê zewece biolojî û teknolojiyê, wê paya xwe bigrê. Teknolojî, wê ji gelek aliyan ve wê civaknasiyê ji piretikî û ankû kiriniya jiyanê derxe û bike nave xwe de bi rêyên bernemeyên weke ´înternettê û hwd.

Civaknasî, dîroka wê bi dîroka şariştaniyê re dest pê dike. Di dema sumeriyan de, pêşketineka wê hin bi hin tê ser ziman. Bi teybetî, di dema gutî û hurrî û Mîtaniyan de, divê ku em bahsê ve bikin. Heredot, di pirtûkaya xwe *Dîrok*ê de, behsa civaknasiyê dike. Bi teybetî, di dema ku behsa Medya û keyê wê Diyaqos dike, dibêje ku "Wî gotiya ku ezê xwe bidima civekesiyê û pêşxistina wê."

Bi vê rengê pêşketina wê heya. Bi teorîkî, pêşketina wê, bi felsefê re êdî ji van deman û de, wê zêdetir bidest pêşketina xwe bike.

Di demanên piştî zayinê de, bi teybetî, emê bibînin ku hê zêdetir, ev pêşketin heya û pêşketiye. Zanistên weke Ibn Rust. Ibnî sîna wê li ser civaknasiyê bisekin in. Bi teybetî Bawê Henifê Dînwerî, divê ku m bi teybetî behsa wî bikin. Lê berî wî jî di dema Xwe Mazdek, wê li ser têkiliya di nava mirov û civatê de bisekinê. Wê di temenê têgihiştinî çînî de wê li ser bisekinê. Di dema Mazdek de, wê mazdek bibêje ku "xaniyên key tişî zêr in lê xelkê di bin destê desthilatdariya wî bixizanî dijîn." Bi gotinên bi vî rengî wê balê bikişêne li ser civaknasiyê û pêşketin û jiyana civatê. Piştre jî, Zaneyên weke Îbnî Haldûn, wê di pirtûka xwe ya bi navê "mûqaddîma" de jî, em çerçoveyeka xort ya civaknasî dibînin.

Di sadsale 20'an de, wê zaneyên civaknasiyê wê derkevin. Bi teybetî, wê bi teorîkî li ser mijarê bisekin in. Civaknasin weke Gordin Cild, Max Weber û hwd çend ji wan civaknasan in. Wê dîroka wê civaknasiyê binivîsênin û wê temenê wê bi darêjkên wê yên civakî û civakî pêş bidixin.

Zanista ramyariyê (siyesetê), ku em behsa dîroka wê bikin, divê ku em dîroka wê herina heta dema sûmeriyan. Bi teybetî, emê bi hizirî û teorîkî pêşketina hizra wê, di demên berê zayinê de di sadsalê 5'min pêde, di temenekî hemdemiya dema me de em dibînin. Homeros, di pirtûkên xwe yên bi navê

İyada û Odeseus û hwd de, dimenekî têne ser ziman. Her wisa, Aristoteles, siyeseta demê dîmenekî wê di nivîsandinên xwe de daye der ziman. Platon, di pirtûka xwe ya mazin ku ji axiftinên sokrat pêktên, wê dîmenekî pirr mazin ê desthilatdariyê di temenê nêzîkatî û têgihiştina wê de bide ser ziman. Di pirtûka Arîstofanes ya bi navê "şerên peleponezê" de, ku behsa şerên di navbera Athena û Îsparta de dike de, ku ev şer bi salan didom in, behsa rêveberî û gavavêtinên wan dike.

Ji aliyê felsefe ve hanîna wê ya li ser ziman, wê bi vê yekê, di demên piştre zêdetir bibe. Îbnî haldûn bixwe jî, di pirtûka xwe ya bi navê mûqaddîma de di çerçoveya wê de hin gotinna xwe jî dihêne ser ziman. Her wisa Ahmedê xanî, jî behsa wê dike û di temenê ku mazinbûna zaneyên mazin ê civatî ku pêşengiya civatê bikin de têne ser ziman. Gotina "ku heba siltanekê meyê heba li ser serê me, .." di berhema wî ya Mem û Zîn'ê de di buhurê û ji dil dihêne ser ziman.

Bi teybetî, di dema sadsale 20'an û pê de, wê bi zanistê beşên zaniyariya siyesetê werina vekiirn û siyesete were xwandin. Wê di derbarê felsefe siyesetê û ankû ramyariyê de wê wê were pêşxistin. desthiatdariya siyesî 20'an, bi zaninekê bi rê ve herê.

Siyeset, li ser esas û nirxên civatî ên pêşketî na tê kirin. Bi wê re tê meşandin. Siyeset, bi teybetî, civata ku di nava wê de tê kirin, divê ku zimanê wê hilde cidiyetê û gotin û têgihiştina xwe bi wê bêne ser ziman, da qana ew siyeset bibe ya wê û bi navê wê. Di temenê parastina ziman û dîrokê de û buhurandina li demên pêş de siyeset bi pergalî û bidestê rêveberiyê karekî giring dike û roleka giring dileyizê. Zimanê siyesetê, bi qasî gotinên bi navê têgihiştinê di wê de tên ser ziman û giringiya wan, her wisa, giirngiya bikarhanîna zimanê civatê jî weke wê heya û ji wê zêdetira jî. Bandûra teknikê bi pêşketina biolojiyê re wê li ser pêşketina tendurîstiyê jî pirr zêde bibê. Her wisa, wê amûrên teknikî ên lêkolîn û lêgerîn û dîtinê û kifşkirinê wê werina pêşxistin. Dema ku em di vê çerçoveyê de bi zanyariyê re behsa teknikê bike, wê bi pêşketina teknolojiyê re pêşketin biolojiyê jî xwe werênê bîra me. Tendurîstî, di destpêka jiyana mirov de pêşektina wê dibê. Di dema ku devereka me, birindar dibe, em hewl didin ku wê baş bikin. Dema ku ji deverkê xwûn di herikê, em pêşî dikin ku wê xwûnê bidin sekinandin. Di serdema dema sumeriyan de wê mirovên ku êdî başkirinê bikin, wê pêş bikevin. Bi teybetî, wê vê yekê êdî weke karekî bidina berxwe. Lê dem ku tê sadsale 6'an û hwd, êdî wê bi zanistî pêşketina wê bibe. Tendurîst, yê ku rêgezên nêzîkatiyê bi navê "Sûnda Hîpokrat" bû, fîlozofê dema antîkî ê Hîpokrates bû. Wî, ev pêşxist. Piştre jî, ev weke temenekî giring, di hemû beşê tendûrîstiyê de ên ku heta roja me afirîna de bicih bûya.

Bi felsefî ji, wê zanyar li ser bisekin in. Herî zêde ku ne bin 22 berheman re nivîsandiya Bawê henîfê Dînwerî, wê bi teybetî çend berhemên wî tenê li ser dermankirin û şifakirinê bin. Weke wî, Ibn Rust û îmanê Xazalî jî çend gotin li

ser wê gotina. Bi teybetî, ji dû aliyan ve li ser hatiya sekin. Aliyê pêşî başkirina laş û ankû fizîkî ye. Aliyê din jî başkirina giyanî û ankû derûnî ye. Heta roja me jî, ku divê ku em genetikê jî weke pêşketineka di temenê tendûrîstî û pêşketina dermankirin û başkirina wê de bênina ser ziman, pêşketinên mazin bûna. Di roja me de, li ser pirr nexweşiyên weke pênceşêrê ku dihat gotin dermanê wan tûna ya êdî hin bi hin dermanê wan tê çê kirin. Yanî, êdî bi wê re jiyana mirov bi awayekî hê baştir bi tendûrîs bi rê ve diçê. Çend ku tndûrîst pêş dikeve, her wisa, êdî mirov jî ji nexweşiyên xwe re çareyan dibîne û bêhtirî bi başî êdî dijî.

Rew rewşên pêşketî ên bi teknik û biolojiyê re wê bandûra wê pirr mazin li derûniya mirov jî hebe. Bi wê re bandûra wê li civaknasiya mirov bibê. Civaknasî aliyekî wê yê bi derûnî re heya. Ev jî, wê di vê çerçoveyê de xwe bide diyarkirin. Li vir, bi wê re jî, divê ku mirov werêne ser ziman ku şîroveyên bi derûniyê re û teoriya terûniyê re ku dihên pêşxistin, wê di vê çerçoveyê de bi keseyetiyê û kirin û tevgerên mirov re civaknasiya mirov hilde navende xwe. Her wisa bi demê re derûniya civaknasiyê û di dewama wê de civaknasiya derûniyê û fahmkirina wê, wê weke mijarna wê yên teorîkî jî wê xwe bidina diyarkirin. Weke ku çawa ku ew heyîna teknolojiyê û biolojiyê bi hevdû re dikeve rewşek pêşketinê û hevdû pêşxistinê de w biheman rengî derûnî û civaknasî bihevdû re zewecekê bi jiyana mirov re li ser keseyetiya mirov re bi hevdû re çê bikin.

Derûnî, û ankû bi navê ku tê naskiirn psikolojî, weke aliyekî giring ê mirov ku bu tendûrîstiya mirov ve tê ser ziman e. Di sadsale 20an de, mirovên weke Sigmond Freud, navê wan bi psikanaliz û danîna temenê wê re navê wan derket. Lê dîroka wê berî wî jî hebûya. Bi teybetî, gelek zaneyên weke Baweê henîfê dînwerî, Îbnî Sîna, Ibn Rust û hwd jî li ser wê sekinîna û jî aliyê giyanî û ankû derûnî ve ew kirina ku bênina ser ziman.

Nexweşiyên ku weke xweşiyên derûnî na, nexweşiyên depresyonê û hwd hena. Bi teybetî, di sadsale 20'an û pêde, derûnî, weke beşek giring a tendurîst di jiyana mirov de bicih bû. Mirovên ku derûniya hinekî xirab bû, berê di nava Kurdan de ji wan re "dîn" dihat gotin. Ji ber vê yekê û gotinên bi vî rengî, piştre jî, gelek mirovan, ji bo ku ev gotin ji wan re newê gotin, piştre ku pirsgirêkên wan hebûna jî, ne hiştin ku were li berçav. Bi wê yekê, her pirsgirêkênx we di nava xwe de dijiyan. Lê di sadsalêe dawiyê de hin bi hin di vê warê de jî pêşketineka giring di temenê başkirin û ankû li ser derûniyê sekinîn pêşket. Mirovên weke Sigmund Freud, Erich Fromm û hwd, çend ji wan derûnvanên dema me na ku gelek berhem jî nivîsandina û li şûn xwe hiştina. Hê jî, di gelek warên derûniyê de nîqaş tên meşandin ku werre hê pêşxistin. Civeteka ku hemdem û pêşketî, wê hertimî pirsgirêkên derûnî pirr zêde di nav de rûbidin. Ji ber vê yekê, weke pêwîstiya pirr giring êdî lê tê nerîn.

Di temenê ceribandinên derûnî de, bi mirovan re gelek sawalên weke meymûn, sa û ankû kuçik û hwd jî dihên bikarhanîn, Bi teybetî, ji her aliyê ve dihê xwestin ku were fahm kirin. Derûnî nexweşiya jiyana mirovên jiyana dema hemdem e. Ji ber ku di dema hemdem de pirsgirêkên hizirkirinê gelek in. Ji ber vê yekê weke Depresyon, stress û hwd, çend ji wan nexweşiyên ku dikarin bibina temenê nexweşiyên fizîk jî diafirin. Hatiya kifşkirin ku stress dikarê bibe temenê wê ku xwûn herê ser mejî.

Li vir divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku pêşketina teknolojiyê, biolojiyê û ya civaknasî û derûniyê jî, dîrokeka wan ya pirr kevn heya. Berê astronomî û ankû stêrzanî hebû. Bi wê re mirov hewldide ku hemû cism û heyînên li azmana fahm bike. Dixwezê ku azmana û fezeyê fahm bike. Di vê çerçoveyê de mejiyê xwe de weke ardnigariya stêrzaniyê bikardihênê û li ser wê re stêrzaniyê bi pêşketina aqilê xwe re pêşdixe. Dîroka stêrzaniyê, wê serdemên dîrêj ên şariştaniyê bi xwe re werêne ser ziman. Her wisa, bi wê re wê hin bi hin pêşketin li ser pêşketinê were kirin. Ji dema sûmeriyan û bi vir ve bi ppêvajoyên şariştaniyê re wê stêrzanî, bi awayekî zanîstî û zaynarî wê pêşbikeve. Heta ku dem tê roja me, wê stêrzanî, êdî weke beşek zanist û zaniyariyê wê pêşketina xwe ya di jiyana mirov de bi aqil û zanînê re bide domandin.

Stêrzanî, weke beşeka giring ku di dema sumeriyan de jî pêşketiye. Di demên berê de û ankû di dema sûmeriyan de, li stêran dinerîn û roj û dema xwe kifş dikirin. Ev kevneşopî, heta roja me jî, di nava Kurdan de pirr mazin hebûna xwe dide domandin. Di dema Sûmeriyan de, dihat bawer kirin ku "dunya weke tepsiyekê rast e." Dihat gotinku stêr û dunya û ankp gêrverk hemû, bi azmanan ve dalaqandîna. Ev bawerî jî, hê jî, di nava Kurdên botanê de mazin dijiya. Dihat zanîn. Stêr, weke amûrna û ankû tiştan ku baxtê mirov jî dihat kifşkirin bi wan, BI vî rengî dihat bawer kirin. Ji ber vê yekê, "fal" pêşketina. Yanî, bi wan pêşaroja xwe dîtin û hwd. Di dema Mediya de, Rêmildan hebûna. Rêmildar, mirovên ku li azmanan û stêran dinerîn û dizanîn ku wê sibaroja me çawa bê.

Piştre ev zanînên bi stêrzaniyê re, wê pêşbikevin û wê fizîkê û zagonên wê pêş bixin. Mirovên weke Kopernik, Galileî û û hwd, wê ji wê rewşê gav biavêjin û hinekî bi pêş de herin û fahm bikin. Bi wê re, wê hewl bidin ku ka rewşa azmana çawa ye. Piştre di domana wan de, mirovên weke Einstein, wê werin û bi teybetî, destûrên fizîkî bi awayekî pirr mazin bidina kifşkirin. Nivîsandina wan, wê weke şoreşekê were dîtin. Di rastiyê de jî wisa bû. Piştre, ev rewş, wê di sadsale me de, bibe temenê ku heta ku mirov bi kiştên fezeyê herê serheyvê û li dunyên din ê dervî me rêwîtiyê li wan bike. Bi vê yekê re, êdî cihane di dervî me, zanîna me, di derbarê wê de mazin bû û pêşket. Îro fîzîk, weke beşeka giring a aliyê pêşketina mirovatiyê ya.

Bi stêrzaniyê re mirov karê hasibandinê kifş dike. Bi wê re jî, bi demê re gaometrî û hwd, pêşbikeve. Ev jî, wê pêvajoyna wê yên piştre ku xwe bi wêrzê

û ankû bi navê yê din re bi matamatikê re wê xwe bide domandin. Matamatik, wê di vê çerçoveyê de pêşketinên mazin bi xwe re werênê. Her wisa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Matamatik, wê destpêka wê bi stêrzaniyê û piştre bi geometriyê re bê. Piştre jî, wê weke beşek zanist û zanyariya mirov, bi aqilê mirov û kifşkirinên bi aqilê mirov re xwe bide domandin.

Werza û ankû matamatîk, û ankû bi navê wê yê dîn matamatîk, pêşketina wê, ku mirov lê dinerê, divê ku em herina ta dema sûmeriyan, bi teybetî, di temenê şekl û ankû awayan de, xîzkirin kirina. Li ser sêkoşa û ankû çarkoşayan de di rastkirina wê de di rastkiirinê de bûna xwediyê afrîner. Lê piştre, wê bi navkirina wan xîz û afirandinan wê bibe. Minaq, hijmartina hijmaran, gaomatri û hwd wê bibe. Bi teybetî, êdî piştre rengê gaomatriyê pêşdikeve. Minaq, gaomatriya Oklîd û ankû oklîda dahûrî û hwd pêş dikeve. Li Masopotamya, pêşketina matamatikê, weke aliyekî zanistî ê pirr giring ku pêş dikeve ye. Minaq, hasibandina bi stêran li di dema masopotamya de pêş dikeve. Piştre jî, di dema felsefe de di dema antikî de wê bi felsefe re pêş bikeve. Zaneyên weke Melayê Cizîrî û hwd li ser 'Cebir' sekinî na. Ev bi gotinî jî pirr tê gotin û li ser tê sekin in.

Zaneyên weke Ebû Hanîfe Dînewerî, Ibn Sîna, Ibn Ruşd, Omer Xeyam û hwd, wê li ser bisekin dihizrên xwe de. Piştre jî, bi astronomiyê re pêş dikeve. Zaneyên ku bi kifşkirina asmanan re bi erk in wê pirr li ser matamatikê bisekin in. Descartes wê li ser wê bisekinê û 'kartezyanî' wê bi wî re were bi nav kirin. Galileo Galilei, Kopernik, Bruno û hwd, wê di hizrên xwe cih ji matamatiikê re vaqatênin. Aristo, bi dema xwe re li ser sekiniya. Galilaî wê hinekî dîn aristo û teoriya wî pêş ve bibe. Piştre wê di sadsale 20'an de zaneyên weke Einstein, wê matamatikê weke rêbazekê di gelek beşên zanistiyê de weke temen bicih bikin ku li ser wê re lêkolîn were kirin. Ji aliyê teorîkî ve li hijmaran, gaf û gaomatriyê nerin û bi wê re têgihiştin hatiya afirandin. Minaq, Kepler, weke filosofekî li ser tevhgeriyên gêrverkan sekiniya û bi wê re kiriya ku bi hijmartinê re pêş bixe. Nawton wê prensibên Matamatika hemdem bi nivîskî bêne ser ziman. Bi wê re, heta roja me, wê gelek zanyar û zanist li ser matamatikê bisekin û her roj, roj bi roj aliyên wê ên din ên nû kifş dikin. Mezopotamya, li wê, matamatik pirr pêşketiye. Minaq, rêmildarên Medî, bi astoromiyê pirr mijul bûn. Bi wê re jî, karê hijmartinê û hwd pirr pêşxistin. Thales, bi salan di nava wan de li Mediya dimene. Tê gotin ku Thales bixwe jî matamatik ji wan pirr baş fêrbûya.

Di dewama pêşketinên zanistî ên weke stêrzaniyê û hwd de ku matamatikê û hwd pêş dixe wê de sîmya û hwd pêş bikeve. Pêşiya sîmyayê bi aqil, berê li ser afsûnê re jî hatiya hanîn li ser ziman. Tişta ku were kifşkirin û li ser wê lêkolîn werê kirin, wê bi xwe rewerêne ser ziman. Ev, taqabûlî zanista xwezayê jî dike.

Sîmya, weke beşeka zanistî ku heyîn û awayê ku lêdikolê ye. Berî jiyanê, ji bo behsa tişta bikin û wan bênina ser ziman hizrên bi rengê ku tê gotin ku weke av, agir, hewa ax hatiya ser ziman. Hatiya bawer kirin ku hertişt ji wê diafirê. Sumeriyan bawer dikir ku "mirov ji axê ya". Bi wê re, piştre jî, di demên felsefe pêşket, hêdî hizrên ku li ser wê temenê jî lê bikolin pêşket. Minaq, Demokrîtos, tê gotin ku pêşî hizra "atom"ê avêtiya li holê weke temenê wan jî. Ev, wê êdî bê temenê pêşketin û hizirkirinên din jî. Piştre, ev wê bê temenê hizirandin bi filosofan re. Piştre jî wê bê temenê lêkolînê jî. Di serdema navîn de, bi navî "sîmya" hatiya ser ziman.

Bi wê re felsefe, hertimî hatiya niqaş kirin. Minaq, hatiya niqaş kirin ku "jiyanê, ji kîjan nûqtayê destpê kiriya. Ev pirseka ku hatiya ser ziman. Hizra, ku hemû "jiyayê ji nûqtayekê destpêkiriya", wê piştre jî, were pêşxistin. Di temenê fahmkirinê de, wê piştre kîmya pêş bikeve. Minaq, êdî weke beşên wê ên din jî, ên ku wê pêş bikevin hena. Sîmya fizîkê, Sîmya Biolojiyê, Sîmya benetan û hwd, wê pirr navên din wê derkevin. Di temenê lêkolinê de, ku ka 'tişt, ji çi diafirê' hewl didê ku wê fahm bike. Bi vê yekê, weke pirse herî giring ya sîmya, ew a ku "tişt, ji çi diafirê ya." Bi vê yekê, hewldane fahm kirinê pêre pêşketiye. Sîmya, weke awayekî biolojikî ê felsefeya berîzayinê û hwd jî bûya. Minaq, Aristo, bi aqil û mentiqê ku meşandiya xwestiya ku fahm bike ku ka destpêka jiyana çawa bûya. Piştre wê ji çi pêşketîn bûya. Dawiya mirov çawa dibê û hwd, weke pirsan ku hertimî li bersivan hatiya lêgerin. Hizrên ku piştre temenê felsefeyên filosofan afirandin ên weke "guharandin" û ne guharandin" û hwd jî ji wê nûqtê destpêkiriya. Biqasî fahm kirina ku 'tişt, ji çi diafirê' wilqasî giringa ku simya bersiva wê bibîne ku çawa pêş dikeve û di dawiyê de wê çi bibe jî ya.

Ev pêşveçûn hemû wê bi dîrokê re xwe bidina diyarkirin. Her wisa, bi dîrokê re çendî ku pêşketina aqilê mirov çê dibê û pêş dike, wê bi wê bi re dîrok jî werê nivîsandin. Dîrok, li ser ya ku hatî jiyankirin re xwediyê têgîna xwe ya hebûnî ye.

Dîrok, weke beşeka giring divê ku mirov bibêje ku bi têgihiştinî heya. Di dema ku em gotina dîrokê hildina li dest, ji du aliayn ve wê wê hildan li dest, Aliyekê, ew a ku ji aliyê rûdawên dîrokî ve ye. Aliyê din ve jî, her wisa lis er metod û awayê nêzîkatiya bihizirî û felsefî ya li wan rûdawên di dîrokê de na. Ji vê aliyê ve, bi teybetî, di demên berê de, di dema ku dîrok hatiya hildan, di temenê weke dîrok weke bûyarna ku rûdaye hatiya ser ziman. Lê piştre, Zanyerên weke Platon, Aristo û heta ku tê dema Îbnî Rûst, Îbnî Sîna Îbnî Haldûn û hwd, hizrênx we li ser dîrokê û nêzîkatiya wê hanîna ser ziman. Îbnî haldûn, di pirtûka xwe ya bi nav "muqaddîma" de dibêje ku "dîrok bi hev ve girêdayî û li dûvhevdû tê divê ku were ser ziman." Bi vê rengê ew nêz dibê. Piştre wê ev nêzîkatî, weke metod û nêzîkatiya giring wê pêş bikeve. weke metodeke zanistî wê pêş bikeve. Zanyarên ku piştre hizra xwe bi dîrokê re û di derbarê wê re hanîna ser ziman de jî, di vê temenê de hanîna ser ziman. Marks,

bi heve girêdayî têne ser ziman û piştre wê di wê xate wî de ew awayê hanîna wî, wê temenê hemû zanyarên di wê de de ku tênina ser ziman. her wisa, beşên din ên zanistî û felsefî de jî, wisa tê ser ziman. Yê ku herî zêde ji vê aliyê ve temenê nêzkatiya dîrokê bi gotina "diyalektîkê" de mazin bi teorîkî pêşxist l gorî dema hemdem ya sadsale 20'an, Hegel bû. Piştre jî, zanyar û zanistên ku felsefe hanîna ser ziman, bi wê nêzîkatiyê û di temenê de wê hanî ser ziman.

Di roja me de gelekî karê nivîsandinê pêşketiye. Ev hemû bi zanebûnên bi dîrokê û pêşketinên bi jiyanê re bûna. Îro, rojnema, tv´, radio û hwd, pêşketina, li ser van pêşketinan re mirov ji wan re gotina ´çapameniyê´ bikardihênê. Çapamenî, wê ancameke dîrokî ya wekw ancama hemû pêşketinên aqilê mirov ên ku mirov dikarê behsa wan dikê jî bê.

Çapemeni, piştre di demê de pirr zêde pêşket. Çapemeni, hem temenê ragihandinê û hem jî temenê serdestî û serweriya desthilatdarî a hem li hundurê welêt û hem jî car bi car dervî welêt e. Di temenê afirandina nirxên civatî bi bi civatê dane herêkirin û pejirendin a rewş û tiştan, çapameni pirr tê bikarhanîn. Weke amûrên çapameniyê televîzyon, rojname, kovar, radyo, înternet, pirtûk û hwd bûna û pêşketina.

Çapameni, bi ragihandinê re, çend ku dem tê ve diçê giring û bandûra wê zêdetir dibê. Ji ber vê yekê jî, weke beşake serdestiyê ku herkesek û ankû her civat di xweza xwe bigihêne pêşketina herî baş bi çapameniyê re. Îro, hin bi hin awa û şeklên nû ên ragihandinê li ser teknolojiyê û pêşketina peykan û şandina wan a li azmana re pêş dikevin. Teknoloji, pêvajoyên peresendinê bi civata re dane çê kirin û dide çê kirin. Li ser wê re, civatên teknik û ankû teknolojikî pêş dikevin. Nifşên ku êdî li wê herî zêde serdestiyê çê dikin bi xwe re pêş dikevin. Bi wê re jî, pêvajoyên xwe yên pêşketinê ên nû dijîn.

Îro, tendûrîstî û hemû beşên din ên zanistiyê, pirr mazin pêşketina. Di tendûrîstiyê de, kifşkirina genetikê, û bikarhanîna, Kifşkirin di derbarê teknolojiya Molekulan de, û hwd hena û bandûra wan pirr mazin e. Teknoloji, pirr mazin pêşketiye. Kompîtûr, teleskop, mikroskopên elektronîkî û hwd, pêşketina û bi wan ceribandin û lêkolîn û kifş tên kirin. Kompîtûrên ku qaydên ceribandinan digrin, êdî xwediyê arşîveke mazin ku êdî di her demê de ji wan sûd tê girtin in.

Di vê temenê de, îro, beşên din ên weke botanîkê, matematîkê û hwd jî, divê ku mirov bi teybetî bêne ser ziman ku ev beşna ku di temenê wê pêşketina zanistî ên dema me na. Matematîk û fizîk, bi hevdû re zewicendineke mazin di roja me de kiriya. Bioljiyê û botanîkê û hwd, bi hev re lis er xwezayê lêkolînên mazin dikin. Bi genetikê, kifşên mazin tên kirin. Teknoloji û înternet, çend ji wan aliyên din ên ku dihên bikarhanîn in.

Bi teybetî, îro, weke beşên bioloji, teknoloji, fizîk, û hwd, beşên ku êdî bi serê xwe pêşd dikevin hena. Bi wê re jî, beşên Derûniyê ên weke 'beşa derûniya civaknas', 'beşa civaknasa derûnî' û hwd, hin bi hin pêşketinên xwe

dikin. Beşa rewîstê û ankû ahlaqê pêşketiye û ji felefê û olê cuda xwediyê pêşketina xwe ye. Çînîkirina beşan û salixkirina wan, aliyekî din ê pêşketina zanistê ya ku di roja me de pirr pêşketiye.

Ku em behsa olê bikindivê ku em biyetê, behsa dîrokeka pirr dem dirêj bikin. Ji dema Sûmeriyan û heta ku tê roja me, pêşketina wan bûya. Ola pêşî ya di temenê totem û animismê de ye. Piştre mîtoloji pêş dikeve- Wê piştî wê re jî olên yek xwûdayî pêş bikevin. Ola pêşî ya yek xwûdayî jî Zerdeştî. Ola duyemin ya yek-xwûdayî Cihûtî ye. Ola sêyem ya yek xwûdayî Xiristiyanî ye. Û ola çarem ya yek-xwûdayî jî Îslamiyet ye.

Felsefeya zanistê, divê ku mirov bibêje ku wê ji piştÎronsansê re temenê wê hin bi hin pêş bikeve. Lê ji sadsale 19'min û pêde, wê bi lezeke mazin êdî pêşbikeve. Mirovên weke Agust Cemte wê pirtûka "ceribandin û metodên zanistê" binivîsêne. Ev jî, wê bandûra wê mazin bibe.

Her wisa felsefeya pozîtîvîzmê û felsefeya dahûriyê û ankû felsefeya analîtîkîtiyê, çend ji wan felsefeyên dema zanistê û ankû ên felsefeya zanistê na. Weke beşna ku em bi navkin, vac û ankû mentiq, tiştayîtî, Rexnegirîtî, aqilmendî û ankû realisim, Sedemgerî, û ankû fesefelya ku tenê li ser sedema ava ye. û hwd, çend ji wan beşên ku li berçav tên girtin in di felsefeya zanistê de. Her wisa her yek ji wan felsefeyan, xwediyê metodên xwe yên bikardihênê jî ye. Di bin vê beşê em dikarin çend ji van beşan bênina ser ziman: Felsefeya ku bi teybetî li ser nûqteykê mijul dibê ye. BI teybetî, di wê nûqtê de kûr dibê û hewl dide ku bi wê r bide fahm kirin. Her nûqta, di felsefê de xwediyê wateyekê ya.

Li ser çapameniyê re bi zanistî lêkolîn kirin û axiftin e. Minaq, di roja me de kovar "sciense" û hwd, yek ji wan komarên giring ê zanistiyê ye. Hertimî mijarên zanistî bi felsefê dihilde li dest û dihêne ser ziman. Ol, di dema ku lê tê nerin, weke mijarekê ji aliyê zanistê tê hildan li dest û lêkolîn. Ji dêla ku olekê hilde li dest û olzaniya wê fahm bike, hemû olan bi dîrokê re li dûv hevdû li gorî rêza wan dihilde li dest. Bi wê re dixwezê ku ji destpêkê heta roja me, hewl bide ku fahm bike Bi vê re jî, gotina "ol û zanist" weke gotineke teybet û giring derketiye li holê. Îro, zaniyar û beşên zanistê ên ku bi teybetî dîroka olan lêdikoln hena. Metoda wan jî, ew a ku hemû olan bi nirx û dîroka wan û awayê pêşketina wan re fahm bikin.

Sadsale me û ya berî me, tevkiriyeke pirr girigin li zanistê kiriya. Gelek beşên wê pêşxistina. Beşên zanistê bi perwerde jî pêşxistin. Îro, em dikarin bêjin ku zanebûneka me ya pirr giring heya ku em li berçav bigrin. Ev zanebûn, tenê hewceyî pê heya ku mirov li ser lêkolîn bike. Rojeva, piştî dema ronasansê re pêşketina wê mazin bû. Bi wê re jî, weke pêşengiyek ji bi zanistî kir. Îro jî, bi pêşketina wê zanistitiyê re ew didomê. Beşên zanistê û çînîkirina wan û pêşketina wan mazin bûya. Zanist, bi teybetî, temenê serdestiya mirov a li jiyanî diafirêne. Bo bê yekê jî, ji ber ku rojava di zanistitiyê û pêşketina wê

de pêşket û ket rewşa pêşengiyê de Îro ew weke hêze mazin ya serdest û serwer a li cihanê.

Di sadsale 20'an de, zanîn, ji her demê zêdetir pêşket. Zanin li ser temen û esasê lêkolîn, ceribandin û fêrê pêşket. Dîrokeka ku buhurî, weke ku bû temenê şoreşan di qada zanîn û têgihiştinê de. Teybetmendiya sadsale 20an a bi zaninê û pêşketina wê re ew a ku beşên zanînê pêşdikevin. Zanist êdî bi awayekî sazûmanî tê kirin. Êdî enstûtiyên zanistiyê ava dikin. Enstûtiyên ku hizir diafirênin ava dibin. Bi wê re, ev dibê temenekî mazin ku zanin pêşke bikeve. Her wisa, sazûman pêş dikeve bi sazîtî. Ev jî, aliyekî nû ê ku divê ku mirov wê bi teybetî bêne ser ziman e. Sazîtî, ew a ku êdî ne weke berê li ser milê filosof û ankû zanyaran pêş ve diçê. Her wisa sazî bi sazûmana wê tên ava kirin û pêş dikevin. Di sadsale 20'an de, zanyarin weke Einstein, Freud û hwd, wê temenekî baş û mazin biafirênin. Fîzîk, biyolojî, teknolojî û hwd, wê şoreşekê bidina kirin bi heyîn û hebûna xwe re di nava jiyana civatê de. Leze pêşketinê û bûyîna wê zûtir dibê. Ev jî, dibê. Zanîn, êdî tê we astê ku herkes dikarê wê biafirêne.

Sadsale 20'an, pêşketinên wê ên weke şoreşa zanyariyê ku em dikarin bênina ser ziman, bi zawaca matamatik û fizîkê re ku zanyarin weke Einstein dane kirin re wê mirov êdî herîna ser heyvê. Wê li gêrvêrk û ankû dunyayên din ên dervî me, wê xwe bigihênina li wan û wê tirhikên jiyanê bigirihin. Li Emerika NASA, weke navenda lêkolînên vê, pêşket û hat nasîn. Her wisa, pêşketina dîn jî, bi biolojiyê re kifşkirina kodên genetîkê bû. Genetik, di dema ku ji sadsale 20an buhurîna li sadsale 21'ê, weke pêşketina hezar salê hat şîrove kirin. Ji ber ku buhurîna li sale 2000'an, weke "mîlanyum" bûn. Yanî buhurîna ji hezarsalekê buhurîna li hezarsale din bû. Kifşkirina milanyumê bûna genetik û çûyîna serheyvê bûn. Ev herdû pêşketin, bi serê xwe jî dîrok in û di zanistê de şoreş dan çê kirin. Gelek teorî, di vê sadsalê de pêşketin, weke ên temen. Hinek ji wan bi sereke ev bûn, ku hemû pêşketin ji binî didan kifşkirin.

Teoriya dîtbar, avakerê weke Albert Einstein bû. Ji du beşan pêk dihat. "Teoriya rolativt a teybet" û "teoriya rolativt ya gelemper" û ankû giştî bû. Ev teorî, di wê de, matamatîk, gaomatrik û û hwd bi hevdû te bia wayekî sereke tên bikarhanîn. Formula teoriya Rolativt jî $E=mc^2$ e.

Kûantûm, avakerê wê, bi çend navan em dikarin bênina ser ziman. Max Planck, Albert Einstein, Niels Bohr, Werner Heisenberg, Erwin Schrödinger, Max Born, John von Neumann, Paul Dirac, Wolfgang Paull û hwd mirov dikarê bêne ser ziman. Lê gelek navên din jî ku mirov bi rûmet bêne ser ziman û ku di pêşketina mirovatiyê re rol leyistina hena. Di avakirina vê teoriyê de, teoriya van mirovan li pêş bûya. Ev teorî danîna ser temenê wê û destûrên wê kifşkirina.

Jin, di dîrokê de jî, di pêşketina zanistê de bûya xwediyê roleka mazin. Herî zêde, di demên berê de, ji ber ku jin hîskirina wê xort bû, weke ya "falvan"

hatiya û derketiye li pêş. Piştre jî, ev bûya. Di serdema navîn de, bi wê yekê, weke "pîrabûk" û hwd hatîna şîrovekirin û bi hezaran ji wan hatina qatil kirin. Ev jinên ku bi wisa hatina denezendin û kuştin hemû jî, jinên ku bi mejiyê xwe derdiketina li pêş bûn. Lê piştre jî jin rola xwe leyist. Bi teybetî, di sadsale 20an de, rola wê pirr mazin derdiketiye li pêş. Di hemû beşên zanistê de jin, weke mêr û biqasî wî û di hin beşna de ji mêr zêdetir jî derketiye li pêş bûya xwedi rol û û kar.

Bi **şoreşa Kurdistanê** re pirsgirêka jinê pirr mazin hat ser zima. Şoreşên berê ku tenê di temenê bidest xistina mafê xwe yê weke zilêm ku were hasibandin de dihat ser ziman, di vê şoreşê de rol erka wê jî hin bi hin hat kifşkiirn, ew jiyanê de ji wan hat xwestin ku rol û weyna xwe bileyizin. Îro, rewşenbîr, wêjavan, zanist û hwd, di hemû beşên ku tên zanîn û pêşketina de jin heya. Li cihanê jî jin, pêşketina wê bi hizirkirina wê û bi xwe afirandina wê pêşketiye. Bi teybetî, di her beşên zanistê de cihgirtin. Li her welatê, zanist, rewşenbîr, wêjevan û hwd, weke mêr û biqasî wî, jin jî heya û xwedÎrol û afirîneriyeka wê heya. Jin û zanîn, bi hevdû re êdî pêşketiye.
.

## Ziman, felsefe û xate pêşketina wê li Kurdistanê

Zimanê daayikê ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, mirov wê giringiya wê bênîqaş kifş bike. Pêşketin ziman, wê weke pêşketina aqilê mirov jî bê. Her wisa, li vir, çendî ku mirov li ser giringiya zimanê dayikê bisekinê, wê cihê wê bê. Li vir, di dewama wê de divê ku ez vê jî bibêjim ku heta roja me, bi zanyarî lêkolînên ku li ser ziman û bi teybetî jî zimanê dayikê hatina kirin, dana nîşandin ku sînorê pêşketina wê bi mirov tûna ye. Mirov, bi wê re heta ku bixwezê dikarê bi pêş de herê.

Li vir, divê ku mirov ziman û gotina aqil bi hevdû re hilde li dest. Her gotina ku hat pêşxistin di ziman de wê bi kirde, wate û darêjka xwe ya ku bi wê afiriya û heya, wê weke têgîneka aqilî jî bê. Bo vê yekê ya ku di serdemên kevnera de gelek fîlosofan li ser wê hizirkiriya ku ´aqil, ji gotinên zimên pêk tê.´ Di vê çerçoveyê de wê hizrên xwe li ser gotinên zimên re werênina ser ziman. Sînorê ziman, weke sînorê dunya mirov a civatî jî ye. Bo vê yekê, mirov divê ku mirov werêne ser ziman ku çendî ku di wê pêşketina xwe ya ziman de kûr û bi berfirehî herê, wê ew bê pêşketineka mirov jî ya bi aqil di nava jiyana mirov a civatî û hwd de.

Li vir, divê ku mirov bi teybetî, vê rastiyê binxat bike ku ziman û aqil, weke çerçoveyeka ku bi xwe re didina me, em divê ku bi wê çerçoveyê bihizirin. Her wisa, gotinên ziman, wê hişna mirov ên aqilî ku pêşketina jî bin. Mirovek, herî baş dikarê bi zimanê xwe yê zikmakî wê serdestiya xwe ya jiyanî û aqilî çê bike û bi wê pêşbikeve. Wê di vê çerçoveyê de sînor ji mirov re nebê. Aqil, her wisa bi zêhnê mirov re bi pêşketina xwe re wê ziman jî pêşbixe. Lê çendî ku ew pêşketin bû jî, wê aqil û zêhn jî pêşbikeve.

Divê ku mirov zimanê dayikê û ankû zikmakî, weke temenê mirov ê ku pêşketî jî û heyî jî werêne ser ziman. Lêkolînên ku li ser gotina aqil û zêhnê re hatina kirin, di vê çerçoveyê de giringiya zimanê dayikê bi awayekî vekirî hanîna ser ziman.

Heta roja me, pêşketinên ku bûna, kevneşopiyên ku afirîna di nava jiyana civatî de û her wisa aqilê ku bi gelek rengan pêşketina xwe daya der, wê bi wê re were ser ziman. Ziman, wê weke xêva mirovî a jiyanî bê. Her wisa, dema ku mirov bi nivîsandinê re jî ziman werêne ser ziman, wê minaqa girtina di mejî û xêvê de ji wê re pirr watedar bê. Di vê çerçoveyê de wê rastiya pêşketina ziman û bi wê re nivîsandinê jî werêne ser ziman. Weke ku, çawa ku xêv di mejî de heyîna girtinê bi wate dike bi xwe re wê nivîsandin jî bi heman re bi ziman re di jiyanê de biheman rengî di jiyanê de bi wate bike. Rengê din ê girtinê ê di jiyanê de ê beremberî xêvê wê nivîsandin bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov di çerçoveyeka teherekê de bihevdû re werêne ser ziman.

Heta roja me zimanê Kurdî, qadaxaya. Lê tevî wê jî, xwe haniya heta roja me. Ya ku wê haniya heta roja me, ew serdestiya ku em divê ku bi gotina zimanê zikmakî ku heya re werênina ser ziman e. Ya ku parastiya jî ev e. Zimanê zikmakî, di vê çerçoveyê de giringiya wê, bi parastina zimanê civatê re xwe dide diyarkirin.

Em hebûna civatekê bidina berçav. Dema ku em ziman ji wê hebûnê derxin, wê ew hebûna civatî, weke laşekî bêhastû bimênê. Wê ew laş, nikaribê xwe bijî û werêne ser ziman. Wê nikaribê hebûna xwe bide domandin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê behsa giringiya zimanê zikmakî bike. Her wisa, hemû hêrîş û qadaxayên li ser zimanê zikmakî, mirov dikarê di çerçoveya tûna kirina wê civatê de jî werêne ser ziman.

Li Kurdistanê, zimanê Kurdî qadaxa ye. Kurd, dibin metingeriya rejimên herêmê ên weke rejima tirk de dijîn. Nikarin bi zimanê xwe, perwerde bibînin û zaroyên xwe perwerde bikin. Hemû hêrîşên li ser ziman re, mirov dikarê weke hêrîşna çandî jî werêne ser ziman. Ziman, wê aliyekî wê rastiya çanda civatî bê. Her afirandina bi zimanî û aqilî ku dihê li holê, mirov dikarê bi rastiya çandî a civatî re werêne ser ziman. Ev jî, hemû jî, li ser ziman re dibin. Ziman û çand, hevdû diafirênin û bi xwe re jî wê civatê bi wê afirandina xwe re barî pêşarojê bikin. Dema ku em behsa şêwayên wê afirandinê bikin jî, xwandin û nivîsandina bi ziman, hanîna ser ziman a bi wî zimanî û hwd e. hemû cûreyên afirandinê ên li ser ziman û bi wê re bi aqil û çandê re wê di vê çerçoveyê de xwe di vê çerçoveyê de bidina nîşandin.

**Zimanê Kurdî û qadaxa li ser wê heya**

Zimanê Kurdî qadaxaya. Zaroyên Kurd nikarin bi zimanê xwe perwerde bibînin. Pêvajo û bernemeyên komare tirk ên ´bişavtinê´ li ser serê civata Kurd hate roja me hatina meşandin. Dibistanên ku Kurdan vekirina jî, rastî hêrîşên rejima tirk ên li ser pergela dadê û hwd re hatina. Her wisa, dibistanên Kurdî dana girtin. Li Kurdistanê, tenê li bakûrê Kurdistanê ser 20 milyonan re Kurd dijîn. Lê win rastî tenê dibistanekê jî nayên ku bi Kurdî perwerde dide zaroyên Kurdan.

Hewldanên ciwanên Kurd ên di dibistanên bingihîn û heta zanîngehan ku dixwênin, dem bi dem doza perwerdeya bi zimanê dayikê kirina. Lê gelek ji wan rastî cezayên cûr bi cûr hatina. Bi hêncetên cûr bi cûr yan ew ji dibistanên wan hatina dûrkirin û yan jî, rastî cezayên din ên ji wê girantir hatina. Ev jî, bi armanca ku ew ciwanên Kurd cardin doza mafê perwerdeya bi zimanê Kurdî û ankû zimanê zikmakî nekin hatiya kirin. Her wisa, piştî salên 2014´an, Kurdan bi derfetên xwe yên kêm hinek dibistan vekirina. Her wisa, weke li Geverê dibistana seretayî a dayika uweyş, li Cizîra bota dibistana seretayî a berîwanê û li baxlara amedê dibistana fersad kemanger û hwd vekirin. Li hin deverên din

jî bi heman rengî dibistanên ku vekirina bûna. Lê ew dibistan jî, rastî serdegirtinên rayadarên tirk hatina û mohr li devê wan hatiya xistin. Ji ber ku ew dibistan biKurdî perwerde didan, rastî van hêrîşan hatin.

Piştre jî, li kûdera Kurdistanê û li kîjan bajarê Kurd, ku saziyeka ku di wê de perwerdeya bi Kurdî hatiya dayîn û ankû xabat li ser zimanê Kurdî kirina, rastî hêrîşên raaydarên tirk hatina. Yan jî, biryarên girtinê li ser wan re dana. Gelek saziyên zimanê Kurdî bi vî rengî hatina girtin.

Li dibistanan, ti carî derfet ne hatiya dayîn ku Kurd, zimanê xwe bikarbênin. Bo Kurdan bikarhanîna zimanê Kurdî qadaxa bûya. Ev qadaxakirin, heta roja me jî domiya ye. Kurdan, serî li hemû saziyên hundûrîn û derveyî dana bo ku wê qadaxaya li ser zimanê Kurdî rabikin. Lê heta roja me, ti ancamên li berçav bidest nexistina. Li Kurdistanê, di vê pêvajoyê de şerê ku li hemberî civata Kurd dihê meşandin de ku mirov li wê û çerçoveya wê şerî dinerê, mirov dibînê ku bi teybetî di nava wan hêrîşan de saziyên çandî ên civata Kurd û zimanê Kurdî di serî de armanc hatina girtin û hatina rûxandin. LI Cizîra bota, Sûr, geverê, Nisêbînê, Hezexê, Farqînê û hwd, li hemû bajarên din ên Kurdan rewş û rastî bi vî rengî bûya. Bi gotineke din, şerê ku rejima tirk, di vê çerçoveyê de li dijî civata Kurd meşandiya, kiriya ku bike şerekî rûxandina çandî jî. Di vê çerçoveyê de ast û rengê hêrîşan daya domandin. Pêvajoya hêrîşan a li civata Kurd, hertimî li ser zimanê Kurdî re bûya. Zimanê Kurdî hatiya qadaxakirin û bernemeyên bişavtinê li ser serê civatê hatina meşandin. Ev rewşa qadaxakirina zimanê Kurdî û bi wê re meşandina bernemeyên bişavtinê(´asîmilasyonê´) li ser civata Kurd, wê heta roja me li dijî Kurdan bi hevdû re werê domandin. Di vê çerçoveyê de jî şerê jenosîdkirina civata Kurd li ser serê wê tê meşandin. Dema ku zimanê civatekê were qadaxakirin û bernemeyên bişavtinê li ser wê civatê were meşandin û bi wê re jî şerê tûnakirinê û rûxandinê li ser serê wê û bi wê re werê meşandin, ew şer dibê şerê jenosîdkirina wê civatê. Ya ku tê serê civata Kurd jî ev e.

**Tekoşîna civatî û zimanî, li Kurdistanê tê dayîn**

Li Kurdistanê, pirsgirêkek pirr mazin ew a ku pirrraniya sazî û weşanên ku li ser înternettê re bê û ankû bi nivîskî bê bi zimanê tirkî tê meşandin e. Ji civateka ku zimanê wê Kurdî re bê, weşanên bi zimanê tirkî û hwd tên kirin. Her wisa, gelek miriovên ku ji xwe re dibêjin ´em nivîskarên Kurd´ in jî bi zimanê tirkî ji civata Kurd re dinivîsênin. Bi gotineke din, ev dordor, zimanê tirkî li ser civata Kurd ferz dikin û bi şêwayekê bişavtina civatê li ser navê rejimê dikin. Li vir, niyet çi bê bila bibe, lê rastî ev e.

Her wisa li vir, di çerçoveya ragihandinê de pirsgirêka civatî a di nava civata Kurd de ku afiriya, ji gelek aliyan ve rastiya civata Kurd, bi destê van dordorên ku ji xwe re dibêjin ´em nivîskarên Kurd in´ ve hatiya hanîn

bertûnakirinê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku van dordoran, pêşiya pêşketina zimanê civata Kurd di nava wê de jî girtiya. ´Îpotek´ danîna li ser pêşketina wê ya bi zimanê wê.

Ragihandinên li ser înternettê re bê û ankû bi nivisîkî û hwd bê, bi şêwayekî bi wan pêşiya ragihandina civatî ya bi zimanê Kurdî hatiya girtin. Her wisa, ev rewşa nivîskarên Kurd, di reng û şêwayên nivîskarên Cezayîrî a di dema tekoşîna wê de bû. Dema ku ji wan dihat pirsin ku ´çima bi zimanê xwe nanivîsênin?´, bersiva ku didan ew bû ku "ez bi baştir dikarim xwe bi vê rengî werênima ser ziman.´ Ankû, bi rengekî din, ´ji aliyê deronî ve zimanê civata xwe bi wê re piçûk didît û zimanê weke zimanê zanist û zanyariyê ne didît. Di vê çerçoveyê de pirsgirêkên ku li pêşiya pêşketina zimanê Kurdî, em nikarin tenê ji rejimê werênina ser ziman. Di serî de ji van aliyên ku me hanîna ser ziman ve divê ku mirov van dordorên ku li ser navê civata Kurd dihênina ser ziman jî gûnahber bikin. Ew jî, biqasî, wê rejima tirk a ku zimanê Kurdî qadaxa kiriya û bernemeyên bişavtinê li ser serê wê dimeşênê û şer li hemberî hebûna wê dimeşênê sûcbar bibînin û werênina ser ziman.

Her wisa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku ya ku bûya sedem ku di malên Kurdan de jî ji zimanê Kurdî zêdetirî zimanê tirkî ku were bikarhanîn. Her wisa, bi wê re ku zarokên Kurd, bi zimanê tirkî werênina ser ziman. Ti saziyên Kurd ên ku bi zaroyên Kurd, bi zimanê Kurdî pirtûk û weşanan çê bikin û bigihênina wan tûna na. Her wisa yên ku hena jî, ti plan û bernemeyên wan ên bi vî rengî ku mirov bidest bigrê pêşnexistina. Bi gotineke din, hertişt, li bayê pêvajoyên bişavtinê hatina berdan û hiştin.

Di vê çerçoveyê de di serî de tevger û tekoşînek civatî ku karibê ji her aliyê ve xwe bi zimanê civatê ragihênê û werêne ser ziman û pêşketinê di nava civatê de pêşketinê bide çêkirin pêwîsta. Di serî de di vê çerçoveyê de ciwanên Kurd, di wan waran de projeyên civatî ku pêşbixin û bibina sêrî. Valahiya li ser zimanê Kurdî re ku afiriya dagirin. Ya ku wê bi xwe re pêşaroja civatê jî biparêzê wê ev bê. Di vê çerçoveyê de hemû weşanên ku ji civata Kurd re weşanê dikin ku bi dîtbarî bin û ankû nivîskî bin, bi zimanê civatê bin. Ragihandina civatê, hemû bi zimanê wê bê.

Li vir, divê ku miirov di serî de vê rastiyê jî werêne ser ziman ku parastina hebûna civatê, bi Pêşxistin û parastina zimanê civatê ve girêdayî ye. Her wisa, afirandinên civatî ên çandî û hwd, bi zimanê wê, wê temenê pêşketina wê û parastina wê bin. Di vê çerçoveyê de di serî de divê ku tevgeriya civatî were pêşxistin. Heta roja me, gelek sazî û dordorên Kurd, gotina ´hê zimanê Kurdî qadaxaya´ û ev gotin ji xwe re kirina hêncet ku bi zimanê tirkî xwe werênina ser ziman û ti karî di zimanê Kurdî de bo civata Kurd nekin. Yan jî, gotina ku ´heta ku zimanê Kurdî nebê fermî, emê nikaribin ti tiştî bikin.´ Lê ev ne rast e. Ev tenê hêncet e. Ku xwestiban û xîret kiriban, karîbûn gelek tiştan bikin. Di vê çerçoveyê de bi awayekî di fiîliyetê de saziyên Kurd jî bûna hevkarê rejimê û asîmlekirina civata Kurd jî.

## Ziman hebûna stûna civatê ya

Ji kîjan aliyê ve ku mirov lê binerê, mirov wê giringiya zimanê dayikê bibînê û werêne ser ziman. Her wisa, ku ev ji aliyê aqilîve bê û ankpû ji aliyê çandî ve jî bê. Civat, dema ku xwe bi zimanê xwe yê civatî hanî ser ziman, wê karibê xwe biafirênê û barî pêşarojê bike. her wisa, di vê çerçoveyê de asta xwe afirandina civatê, mirov dikarê bi pêşketinên di zimanê wê de re werênina ser ziman.

Ku mirov ji kîjan civatê bê, divê ku mirov zimanê wê zanibê. Her wisa, weke pêwîstiya têkilîdanîna ib civatê re jî ev yek pêwîsta. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov di serî de li mijarê binerê. Kurdekî ku bibêje ku ´ez bizimanê Kurdî nizanin´, dev jê berda ku ew karibê ji xwe re bibêjê ez Kurd im, ew nikarê ti têkiliyê bi hebûna wê civatê re jî dênê. Wê tênê têkiliyê, bi çend mirovên weke wî ên ku asîmlebûna û zimanê civata xwe dûrketina û nizanin re wê têkiliyê dênê. Ev jî, nabê têkiliyek civatî. Her wisa, di vê çerçoveyê de di serî de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev dordorên ku Kurd in û zimanê Kurdî nizanin, divê ku mirov weke yên ku di civatîtiya xwe de windakirina, wan werêne ser ziman.

Zimanê dayikê, hebûna stûna civatê ye. Di serî de divê ku mirov di vê çerçoveyê de li wê binerê. Bi vê re, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hemû dordorên ku ji civateke ku zimanê wê yê dayikê Kurdî ya û ku bi zimanê tirkî "ji wê re" dinivîsênin jî, weke rengekî azabê wê civatê werêne ser ziman. Ew gotina ku "ji civatê re" û ankû "ji wê re" ya, ku bikardihênin, tenê ji wê kirina wan re dibê ´maske.´.

Kurd, di vê demê de ku tevgerek giştî a netewî li ser zimanê xwe re bidina destpêkirin û pêşbixin, wê hem xwe pêşbixin û hem jî wê gelek pirsgirêkên xwe re bi wê re çareseriyê jî werênin. Ev pêvajoya hêrîşan a ku rejima tirk û hwd, li hemberî wan daya destpêkirin, wê ji wê re jî bê bersivek dîrokî. Ya ku wê di aslê xwe de bê bersiv û wan biserbixe jî, wê ev bê. Di vê çerçoveyê de temen jî heya. Lê tenê xîret pêwîsta. Ew bêxîretiya ku bi deroniya di bin metingeriyê de dijî re ku bi wî re afiriya, divê ku mirovê Kurd ji ser xwe biavêje û pêvajoyek bi vî rengî di nava civata xwe de bide destpêkirin.

***Ziman, bi hebûn û gotinên xwe re destpêk e.***
***Divê ku mirov wê baş fahm bike***

**Zimanê bav û kalan**, û ankû **zimanê dayikê**, weke **zimanê pêşîn** ev ziman e ku zarokên ji dê û bavên xwe hîn û fêr dibin. Peyva zimanê zikmakî ne di cîh de ye. Jiber ku zarok di zikê dayika xwe de ziman fêr nabe. Ev yek li gor lêkolînên zanistî jî hatiye pejirandin. Zimanê dayikê, zimanê mirov ji dê û bavên xwe dihilde. Zimanê Kurdan ê dayikî zimanê Kurdî ye. Li gorî dîroka ziman, dîroka zimanê dayikê tê ser ziman. Lê di sedsale 20´an û pêde, ew zimanê dayikê ê mirov ku bi dîrokê ve hatiye pêşketin, bi têgihiştina wê re hat redkirin. Ji dêla zimanê dayikê, gotina "zimanê fermî" hat bicih kirin. Wate wê jî, ew bû ku zimanê rejîma serdest kîjan bû, ew tenê wê bihata fêrkirin û bi wê perwerde bihata dayin.

Zimanê dayikê, rojek bo bîrhanîn û pîroz kirina wê hatiya kifşkirin. Ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) re roja 21'ê sibatê weke "Roja Cîhanî ya Zimanê Dayikê" hatiye erêkirin û pejirandin li giştiya cîhanê. Ew roj, di encama xwepêşandineke li Pakistanê ku ji bo zimanê dayikê ciwanên xwendevan li dardixistin ku li darxistin û di xwepêşandanê de çend ciwan jî hatibûbûne kuştin, di encam de hatiye denezendin.

Roja zimanê dayikê di sala 1999´an de weke roja cîhanî ya zimanê dayikê ji aliyê UNESCO'yê ve hat erêkirin.

**Roja** zimanê dayikê ji aliyê UNESCO'yê ve hat herê kirin di sale 1999´an de. Di vê rojê de di sale 1952´an de, dema ku ciwanên xwe xwandavan li dijî rejima Pakîstanê ku xwepêşandin li dar xistin ku bû ku zimane bengledî weke zimanê dayikê ê wan were kirin xwepêşandin werina li darxistin. Hingî li paytaxta Bangladeşê li Dakkayê di encama wê xwpêşandinê de, piştre hêzên pakîstanî gûlayan di reşênina li ser xwandavanan û di ancama wê gûla reşandinê de 5 ciwanên xwendavan tên qatil kirin. Piştre jî, Bagladeş dema ku serbixwebûna xwe bidestxist, ev roj weke "roja pekrawanên ziman" hersal pîroz kir. Piştre di sale 1999´an de rayadarên bengladeşî ew roj ji saziya Unesco a neteweyên yekbûyî re pêşniyar kirin ku weke roja zimanê dayikê li cihane were herê kirin. Unesco jî ev pêşniyar nirxand û piştre pejirend û regihand li cihane weke roja zimanê dayikê here kir.

***Li Kurdistanê, roja zimanê dayikê***

Li Kurdistanê, bo ku zimanê Kurdî ji aliyê rejima tirk ve hatiye qedexekirin, êdî ev roj di hersala ku zimanê wan qadaxa bû de pîroz kirin bigirseyî. Bi teybetî di sale 2013´an de, bigirseyî li hemû bajar, navçe û hemû deverên wê hat pîrozkirin. Di aslê wê de, ev roj, weke "roja tekoşîna bo zimanê dayikê" care pêşî Unesco herê kiribû.

Kurd, ev roj, weke roja tekoşîna bo zimanê xwe yê dayikê bi girseyî di vê rojê de xwepêşandinên girrseyî bi milyonan Kurdan re li darxistin. Ji xeynî Başûrê Kurdistanê, li piraniya Kurdistanê navê “Kurd” û “Kurdistanê” qedexe ye.

Kurdan, bi dirûşma “zimanê me rûmeta me ya”, bi dehan xwepêşandin bo ku ew qadaxaya li ser zimanê wan were rakirin li darxistin.

**Zimanên dayikê li cîhanê**

Li cihane, heta nûha bi hezaran ziman, ji aliyê rejimên serdest ve hatin tûna kirin û ji dîrokê birin. Li gorî zaneyên unesco, tê bawer gotin ku tenê di sadsale me ya ku em têde na û ya berî ya me de, bi hezaran ziman ji ber ku êdî nema hatina bikarhanîn tûna bûna û ji dîrokê çûna.

Li Tirkiya jî, îro, tê gotin ku 29 ziman hê ku ji aliyê mirovan ve tên bikarhanîn. Lê ji wan, tenê çend ziman dikarin bijîn. Hemû zimanên din li ber tûnabûnê na. Li tirkiya, tevî ku gelek ziman dijîn, tenê zimanê tirkî weke zimanê fermî heya û li ser hemû mirovan tê ferz kirin. Ji bilî zimanê tirkî, hemû zimanên din qadaxa ku di beşên jiyanê de werina bikarhanîn li Tirkiya.

**Girîngiya zimanê bavûkalan**

Dema ku mirov bahsa ziman û dayikê bikê, bêguman, wê gelek tişt hebin ku mirov bêje. Bêja ziman û ya dayikê bi serê xwe ji, her yekê pir watên wan hene û girîngin. Ziman, hebûna mirova. Bê ziman ne jiyan dibe û ne ji pêşketin dibe.

Lê divêt ku mirov vê yekê ji bo zimanê dayikê bêne ser ziman. JI ber ku zimanê dayikê pir girîne. Zimanê dayikê hîme pêşketine mirov çêdike û avadike û dide der bi mirov re. Dema ku mirov bahsa ziman bike, Divêt ku mirov bahs û qanc zanibe ku ziman pir girînge.

Divêt ku mirov di derbarê hebûne wê de baş bi zanebûn bê. Naxasim vêce zimanê dayikê. Iro pir lêkolin ji aliyê lêkolînvanan ve li ser ziman têt kirin. Di hemû lêkolînên ku têne kirin de ji, girîngiye zimanê dayikê derdikeve hole. Mirovekî ne serdestî ziman xwe yê dayikê bê, di serî de temenê xwe û pêşketine windakirya. JI ber vê yekê ji divêt ku mirov baş û qanc li ser zimên birawastê. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku çend dem têve çû û pêşketin mazin derketine hole, êdî wê girîngîtiye zimên wê xwe hê bêhtir bide ber çavan.

Dîroke ziman ku mirov li ser rawastê, divêt ku mirov dîrokeke mazin ya mirovahiye bêne ser ziman. Temenê hebûn û pêşketine dîrokê mirovahiye ji, ziman çêdike. Ji ber vê yekê ziman pir girînge. Ziman, ku mirov bahsa wî kir,

divêt ku mirov di du beşan de wê bêne ser ziman. Beşa pêşî, ya axiftinê ku mirov bêjan bi kar têne ye. Ya din ji, beşa bîolojîke. Bêşa biolojikî, hîme ya din çedike. Ji ber vê yekê divêt ku mirov pir gîringiyê bide wê beşe. Mirov, hê ku di zikê dayike xwe de ya, zimên fêr dibe.

Çi ziman, dayike wî zanibe, ew ji wî zimanê dihilde û pê bi pêşdikeve. Hê ku pitik di zikê dayike xwe de ya, dayike wê/wî çi zane û çend bêjan ji zane, hîme wan bi pitikê re çêdibe. Ew hîm ji, piştre, dibe hîmê pêşketine wî. Di vir de divêt ku mirov bêje ku zimanê dayikê zimanê dayikê pir girînge. Bi vê yekê re ku têt gotin bişavtin dijminê mirovahiyê, ne gotineke xalat têt ser ziman. Gotineke rast têt ser ziman. Ji ber ku, bişavtin, mirov ji zamenê dayike mirov dûr dike, bi vê yekê re ji, ji hebûn û pêşketine mirov dûr dike. Zimanê dayikê, divêt ku mirov baş li ser bisekinê. Divêt ku mirov mazin hebûne wê bîne ser ziman. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku ziman, ne tenê ji hinek bêjeyan pêş têt.

### Zimanê dayikê û genetîk

Ji ber ku ziman, wekî din ji, genetîke ji. Divêt ku mirov ji aliyê genetîke ve ji lê meyîzenê. Genetîk, di hundurê beşa xwe ya hucrê de gelek afirandina bi zimên dide çêkirin. Bi vê yekê re, hêjeye ku mirov bêje ku mirovekî ku bitememî hati bişavtinkirin ji, zimanê dayike wî di aslê xwe de di wî de pêşketine xwe pêre berdewam dike. Lê belê, ji ber ku rê nabîne ku xwe bide der, êdî tevlîhevbûn derdikeve hole. Bi vê yekê re, divêt ku mirov aliyê biolojikî girîniye wê bêne ser ziman. Lêkolîn li ser divin. Pêşketinên ji dema iro pêde, bi zêdeyî, yên kînetîkin. Ji ber vê yekê di pêşketinên kînetîkî de zimanê dayikê pir girînge û xwe yê vêneye kifşkirinê ya ji. Ji ber vê yekê ji divêt ku mirov pir li ser bisekinê. Bi vê gotinê re, em girîngiyê ziman dayikê careke dî bênine ser ziman.

### Ziman, nasnema ya mirov e

Divêt ku mirov bêje ku ziman, ne tenê weke nasname mirova. Ji xaynî wê yekê ji, hebûn rastiye mirov û pêşketine mirova. Dema ku mirov li pêşketinên mazin dimeyîzene mirov zimanê dayikê di hime wê de dibine. Zanistvanên mazin ji, yên ku heri mazin karîn zimanê dayike xwe bi kar bênin in. Çend ku karin bikar bênin, avçend ji karin biafirênin. Afirandin, di hime xwe de zimanê zikmakî di pareze.

Ku mirov li demên berî demên Neolîtîkê meyîzenê, mirov bibine ku çend ku mafê axiftinê bidest ket, pêşketin û bipêşketin bi rê ve çûyin çêbû. Dîroke zimanê dayikê, bi dîtina xwe re têgihiştinê re dest pê dikê. Piştre, biafirandin bêjeyan re berdewam dike. Piştî wê re ji, bi axiftin, xwandin û nivîsandinê re

berdewam dike. Zanistanê Kurd Êlî Herîrî, pir li ser xweşik axiftinê di sekinê. Piştre yên piştre tên ji, wî fahm dikin û weke wî girîngitiyê didine xweşik axiftinê. Xweşik axiftinê, ew ji rastiyêke mirov dibine. Ji ber vê yekê re girîngiyê didiyê de.

## Zimanê dayikê û klasîkên Kurd

Wekî di ji, Êlî Herîrî, di xweşik axiftinê de rastteqiniyeke dibînê. Ji ber vê yekê ji, pir li ser di sekinê. Li gor wî, axiftineke bitêgihiştin û zelal, dîrokeke mirov bixwe ye. Bi vê yekê re li ser di sekinê. Weke wî, yên ku pişt wî re tên weke Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran ji wî girîngitiyê didine axiftinê. Ew bixwe, divêt ku mirov bêje ku zanistvanên zimên ji bûn. Di roja me de, iro pir teknolojî bi pêşketiyê, Bi kar anîne wê ji, dise bi zimanê dayikê ve girêdayî ye. Ku mirov ne serwerî zimanê dayîke xwe bê, wê nikaribe bi tememî wê teknolojiyê ji bikar bêne. Bi teknolojiyê, bi serketin ji, bi zimanê dayikê ve girêdayî ye. Afirandina wê ji bi zimanê dayikê ve girêdayî ye. Bi vê yekê re, ku mirov bêje teknoloji, ji aliyekî ve, encameke zimanzaniyê ya ji, wê ne xalat bê.

Bi vê yekê re, divêt ku mirov li ser girîngiyek din bi sekinê.Ew girîngi ji xalatiyeke ku di ziman têt bi kar anin.Hinek dibêjin, ku mirov dema ku hata dinyê ku mirov bi zimanekî mazin bû, ew ziman wê bê weke zimanê dayike mirov.Ev nêzîkatî, nêzîkatiyeke pir xalata. Ji ber ku ziman, ne tenê bi bêjeyan û bi kar anina wan heya.Bi genetîkê ji heya.Divêt ku ev yek ji, li ber çavan bêt girtin. Mirov, hingî, karê zimanê ku mirov pê mazin bûya, baş bi kar bêne, têde hinek afirndinan ji çêbike.Lê belê wê ev yek, ti carî nebe weke zimanê zikmakî yê dayikê.

Ku mirov bi zimanê dayikê ji mazin bû, hingî ku mirov zimanê xwe bikar anîn, hingî di afirandinê de, zanebûne meye ziman û zanebûne genetike mirov bi hev re dibe yek û di mirov de dibe temenê afirandinan.Ji ber vê yekê zimanê zikmakî pir girînge. Bi vê bêje weke ku di çanda Kurdan de ji demên berê heya iro berdewam kiriye, ew rêze li hevberê dayikê divirde em careke di bênine ser ziman û destê dayike xwe maç bikin..Kurdi û dîrokê wê ya bi kurtî..Bi vê yekê re divêt ku mirov hinekî li ser zimanê Kurdi ji bisekinêhaya naheke şîrove ku me kir, hinek xosletên zimanê Kurdi ji dide dest.

Zimane Kurdî, zimanekî ku pir kevne.Bi pêşketinê xwe ya bi pergal re ne bin deh an pazdeh hezar salî re ya.Her weha xwediyê hebûn û dîrokeke ku kevne.Ji ber vê yekê, divêt ku mirov bêje ku di xwe de gelek pêşketin û pêvajo afirandiya. Her pêvajiye wê, demeke wê ya pêşketinê têne ser ziman.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku zimanê Kurdan, çend ku mirov ji axê bûya dest pê kiriya.Her weha baweriyek ji xwe di nav Kurdan de heya.Di zimanê Kurdan

de, dema şariştaniyê di dema sumeriyan de dest pê dikê.Di wê demê de, pêşketin, mazin di zimên de derdikeve hole.

Hebûne şariştaniye di zimên êdî têt ser ziman. Lê berî wê demê, ziman bi temen saz bû ya.Dema neolîtîkê divêt ku mirov baş û qanc ji bo wî zimanê şîrove bike û bêne ser ziman.Minaq, bêjeyên weke bêjeyên ´şivan´, ´koçeri´,´ax´, ´agir´, ´mal´, ´cih´, ´war´,´wan´û hwd, di wê demê de bûne û bûne navê hine sazkirinan.Bêje ´mîr´ hê di wê demê de mazin hatiyê ser ziman û navê serekê koman bûya.Piştre di demên piştre de ji, ev yek berdewam dikê.Li ser wan hîmên ku têne avakirin û diafirin, pêşketin piştre mazin hebûne xwe berdewam dikê.Di dema sûmeriyan de, ev bêjiyan û ku hinekî bêjeyên din ji, dibine bingihe pêşketinê û sazkirinê. Bêje ´pergalê´ ji ´b(p)êrxit´kirinê têt.B(p)êrxit ji, navê bi sazî rûniştandinê ya.Di dema sûmeriyan de têt bi kar anîn.Zimanê Kurdi, piştre dibe temenê pêşketinê gelek zimanê din.Zimanê Mezopotamya, ku li wan têt meyîzendin, têt dîtinn hema bêja hemû ji wan, bêje û wateyê ne dûrî hevdû bi kar tênin.Zimanê wan ne dûrî hevdû ya.

Zimanê Kurdan, di dema Medan de ji, dema xwe ya hemdem û nûjen dide dest pê kirin. Di wê demê de ziman, mazin bi pêş dikeve.Dema Medan, weke dema Ewropa ya iro ya ji bo Kurdan.Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku pir girînge.Dema Medan, demeke pergaltiye zimên, ku dibe ya jiyanê.Bi vê yekê re mazin pêşketin derdikeve hole.Êdî weke ´zimanê rojê´ têt nas kirin.Wate bûne zimanê rojê ji, bûna zimanê jiyanê ya.Îbrahîm Xalil, Yunis û yusuf û hê gelekên din bi kar aniya. Zimanê Zerdeşt bû ya.Wan, ziman mazin di nav xelkê de bicih kiriya.Wan di jiyanê pêxamberti kiriya,lê bi vê yekê re, pêxambertiye wî zimanî ji kirina. Ji ber vê yekê, ev ziman, êdî di jiyanê de mazin bicih dibê û têt bi kar anîn.Mirovên weke wan nivîsanên xwe bi Kurdi di nivîsenin.Bi vê yekê re êdî ziman mazin di nav xelkê de bicih dibe û bi pêş dikeve. Demên pişt wan re, demên bicihbûne hizre wana.

Bi vê yekê re yên pêşketine ne.Bi vê yekê re ji, yên pêşketine zimanê Kurdi ne.Di dema xiristiyanete de ji mazin bi pêşdikeve.Gelek bêjeyên Kurdi, bi wê rê yê digihinê îngilîzî ji, Weke bêja ´nû´.Lê dime Musulmanetiyê de zêde bi pêş ne keve. Ji ber ku bûya zimanê olên weke Êzidîtiyê û manîtiyê, û êdî ev ola ku ji nû ve derdikeve ji, li hevberê wan olan bidest şer dikê.Bi vê yekê re, ku ew ji têt diçin, êdî ew têkçûna wan, bandûre xwe di zimên de dide nişandin.Ola nû bi ziman Arabî bi pêş dikeve. Êdî ev ziman, dibe ziman dinyeyî.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku zimanê Kurdi, hebûne xwe di pareze. mazin bi pêş dikeve.JI ber ku di demên pêş mazin û bi pergal bi kar hatiye anîn, ew hebûn hebûne xwe di pareze.Di vir de, divêt ku em weke Kurdekî bêjin, bi ti Kurd dilê xwe ji me ne girin, lê iro ji ti Kurd, weke Êlî herîrî û Feqiyê Teyran zimanê Kurdî nikarîn bi pergal bi kar bîkar bênin. Dev ji wê ji em berdin, hê bi tememî ne hatiyê fahm kirin ku wî û Feqiyê Teyran, çawa û çend bi pergal bi kar anî ya ji.Ew pergala zimanê wan, ne hatiya têgihiştin. Ew pergala zimanê wan, hê li bendî têgihiştine xwe ye. Zimanê Zerdûst yê

Kurdi, çend bi pergal bû?Bersive vê pirsê hê ji nayê dayîn.Iro, di roje me de, Ziman, mazin bi peşdikeve.Gelek rê û rêbazên pêşketin ji bo ziman derketine hole.Lê wan mirovan tenê rê û rêbazek bi kar anîn. Ew rê û rêbaz ji, mejî bû.Zimanê Kurdi, pêşketinê wê, hê di wan mirovan de veşartiya.Divêt ku werê fahmkirin û têgihiştin.

Pergala zimanê Kurdi, ya ku iro bi kar têt anîn, ya dema Medan û jê wirde ye. Zimanê Kurdi, hê li bendî pêşxistine pergala xwe ya iro ya.Ji ber ku ev bibe ji, divêt ku ew dem û pêşketinên wan deman yê ziman û zimanê ku di wan deman de bikar dihata anîn divêt ku werê fahm kirin û derkeve têgihiştinê.Bi vê yekê re,divêt ku mirov mijareke dî ya girîng di zimanê Kurdi de em bênine ser ziman.Ew ji ´kurmancitî´ ya.Kurmanciti, iro navê şîvêyeke zimanê Kurdi ji ye. Lê belê divêt ku mirov zanibe ji, navê dema zimên ya dema şariştantiyê ya ji.Bi vê yekê re, kurmancitî, navê demeke ji ye. Navê demeke pêşketine ya.Piştî dema sûmeriyan de dema Kurmancitiyê dest pê dikê.

Di dema Medan de ji, bi pargal mazin bi peş dikeve û bi dibe zimanê jiyanê.Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku di wê demê de mazin bi pêş dikeve.Ev pergalbûne di dema Medan de, piştî dema Medan re, haya iro demên xwe yên pêşketinê jîn dikê.Iro, Kurdiya kurmanci, hinek demên nû di xwe de afirandina.Lê belê ew dem, hê bi tememî bi pêş neketine.Ew demên nû, hê hewceyên pêşketinê ne..Kurdi û iro, û pêşketinên demê..

Kurdiya iro, mirov nikarê bêje ku di cewherê xwe ji ya dema Medan pêşketîtira.Ji ber ku ev pergala zimên ya ku em iro bi kar tênin, di wê demê de hata bi kar anîn.Lê ji wê demê û virde ji, mazin bi pêş ji ket. Di demê de mazin bi pêşket, dema wê ya mazin pêşketinê, piştî dema Medan re, dema Ji sadsala dehemin û haya şazdamin e. Ev dem, demeke dirêje di zimên de.Zimên mazin bi pergal dikê.Gelek kirinen di zimên de dike, çêdike.Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ziman, piştî vê demê re, êdî weke dema Avrupa ya iro jîn dike.Lê ji ber hin serdestiyan, zêde ew bi kar anin, pêşnekeve.Lê dise divêt ku bê gotin ku bi pêş dive ji.

Dema ku iro di ziman de, têt jînkrin, weke dema sadsala yazdamina.Yanî wilqasî li şûn ma ya.Ku ziman derfet ditibana ji bo pêşketinê, bêguman, wê mazin bi pêşketibana.Lê zêde ew derfetê pêşketinê mazin ne dît.Ji ber vê yekê, ew demên ku wan deman jîn bike, iro jîn dike.

Lê dise mirov karê bêje ku mazin bi pêş dikeve.Wê hê maztir ji bi pêş bikeve.Ji zimanê Kurdî, em di wê baweriye de ne, wê her demê ji ya dî zûtir wê bi pêş bikeve. Ji ber ku temenê wê bigiştî xweza ya û di jiyanê de zû karê xwe biadilêne.Ev xosletê wî mazin heya..Zimanê ku rast hata bikar anîn, hingî dibe dinamizme pêşkeşketinê.Bi vê yekê re, iro ew derfet mazin derfetiye hole. Teknoloji, ziman mazin bi pêşve dibe.Mazin dide tegihiştin.Lê ku mirov zanibe, wê teknolojiyê bi kar bêne.

..

Nîşe: **Ez vê pirtûkê atfî hemû jin û mêrên Kurd û ciwanên Kurd ên ku di hêrîşên rejima tirk ên li ser Cizîra bota, Silopî, nisêbîn, hezex, şirnax, gever, farqîn, Sûr û hemû deverên din ên Kurdistanê de ku hatina qatilkirin dikim. Ez bi vê pirtûkê, wan bibîr tênim û dibêjim ku wê ew hertimî weke rûmetên civata Kurd wê di mejûya civata Kurd de bijîn.**

Adara 2016, Kurdistan, Cizîra Bota, Abdusamet Yigit